



DİLAVER DÖĞER



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ

**TEZA
LÎSANS
BİLİND**

**BÊJARA NETEWEPARÊZ
DI KOVARA HAWARÊ DE**

DİLAVER DÖĞER

**ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZİNDÎ
ŞAXA MAKEZANİSTA ZİMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

SİBAT 2017

SİBAT 2017

**BÊJARA NETEWEPARÊZ
DI KOVARA HAWARÊ DE**



**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ
TEZA LÎSANS A BILIND**

BÊJARA NETEWEPARÊZ DI KOVARA HAWARÊ DE

ŞÊWIRMEND

Alk. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

AMADEKAR

Dilaver DÖĞER

VAN-2017

Teza Lîsansa Bilind

Dilaver Döger

**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Hezîran, 2017

BÊJARA NETEWEPARÊZ DI KOVARA HAWARÊ DE

KURTE

Em di vê xebatê de li xwe dikin armanc ku; di biwara bêjarê (discours) de hûrgeriyê li ser Kovara Hawarê bikin. Xebata me ji sê beşan pêk tê. Em ê di beşa yekem de, di biwara modernîzmê de, li ser netewe û neteweparêziyê û têgih û palderên wan ên hîmî bisekinin. Di vî aliyê de, em ê sedem û egera derketina zanav, netewe û neteweparêziyê daynin rastê û bi awayekî giştî û berawirdî li ser pênaseya wan bisekinin.

Em ê di beşa duyan de, ji hela dîrokî ve, sedem û jêderkên ramana neteweparêziya Kurd binirxînin û dê amaje bi tevgerên rewşenbîriya Kurd a di dema Dewleta Osmaniyan de bikin. Em ê di beşa sêyem de, li ser Kovara Hawarê bisekinin. Em ê sedem û egerên derketina Kovara Hawarê dahûrînin. Pê re jî em ê amaje bi nimandin û asta rewşenbîrî a nivîskarên Kovara Hawarê bikin û ji alî çîna civakî ve binirxînin.

Her wiha, em ê di biwara bêjara neteweparêz de, hûrgerîn û hûrkolînê li ser nivîsarên cure cure bikin û di rûxar û zemîna bêjarê de nivîsar û şeweyê wan ê bêjarî dahûrînin.

Peyvên Sereke: Netewe, Kurd, neteweparêziya Kurd, bêjar, Kovara Hawarê

Yüksek Lisans Tezi

Dilaver Döğer

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ ANA BİLİM DALI**

Haziran, 2017

HAWAR DERGİSİNDE ULUSALCI SÖYLEM

ÖZET

Bu çalışmada, Hawar dergisinde, Kürt milliyetçiliğinin aldığı biçim ve derginin bir milliyetçi söylem alanı olarak yaptığı etkiyi incelemeyi amaçlamaktadır. Bu çalışma üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde, kısaca modernizm, ulus ve milliyetçilik kavramları üzerinde durulup bu kavramların tarihsel, düşünsel ve siyasi dayanakları açıklanacak ve düşünürlerin bu alandaki çalışmaları karşılaştırmalı bir metodla değerlendirilecektir.

İkinci bölümde, Kürt milliyetçi düşüncesinin doğuş aşamaları tarihsel düzlemde verilecek ve bu düşüncenin söylemsel, düşünsel ve yazınsal dayanakları aydınların davranış biçimleri açısından değerlendirilecektir. Üçüncü bölümde milliyetçi söylem alanının olarak Hawar dergisi ele alınarak dergide yayımlanan yazılar üzerinden, söylem olarak Kürt milliyetçi düşüncesinin ulaştığı aşama ve dönemselsel olarak yaptığı etki üzerinde durulacaktır.

Bu çalışmada, Hawar dergisinde bulunan yazı ve makaleler üzerinden, ulusalcı söylemin nasıl biçimlendiği ve sonuçları üzerinde durulacaktır.

Anahtar Kelimeler: Ulus, Kürt, Kürt ulusalcılığı, söylem, Hawar dergisi

M. Sc. Thesis

Dilaver Döger

**YUZUNCU YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGE
DEPARTMENT of KURDISH LANGUAGE**

July, 2017

DISCOURSE NATIONALIST IN HAWAR MAGAZINE

ABSTRACT

This study intends to examine the effect of Hawar Magazine as a nationalist discourse domain and the metamorphosis of Kurdish nationalism. The study consists of three parts. In the first part, the concepts of modernism, nation and nationalism will be mentioned; and the historical, spiritual and political bases of these concepts will be explained and the studies of philosophers in this field will be evaluated in a comparative method. In the second part, the origin phases of Kurdish nationalist idea will be explained in a historical form and the discursive, spiritual and literary bases of this idea will be evaluated in terms of the behaviours of the intellectuals. In the third part, the Hawar Magazine will be approached as a nationalist discourse domain and the phase and the periodic effect of the Kurdish nationalist idea will be emphasized via the articles published with the magazine.

Key Words : Nation, Kurdish, Kurdish nationalism, discourse, Hawar Magazine

SPASÎ

Di hemû qonaxên vê xebatê de şêwirmendê teza min, Doçentê Alîkar Nesim Sönmez, piştgirî, rênîşandêrî û tevkariyên xwe ji min teksîr nekirine; bi vê boneyê ez spasiya xwe lê dikim.

Ez bo Alk. Doç. Dr. Mahmut Dünder û Alk. Doç. Dr. İbrahim Sürücü spas dikim ku wekî endamekî juriyê, der barê tezê de dîtinên xwe bi min re parve kirine.

Spasiya xwe li Hikmettin Attı dikim ku di demajoya amadekirina vê tezê de, digel pêşniyazên xwe, tevkarî li min kirine û her wiha malavayî bo Leylî Leyla dikim ku di warê wergerandina Tîrkiya Osmanîkî a bo Kurdî de, tevkariyên hêja li min kirine.

Dilaver Döger

Hezîran-2017

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
SPASÎ	IV
NAVEROK	V
RÊZÎLEYA KURTE Û SEMBOLAN	VIII
PÊŞGOTIN	IX
DESTPÊK	XI
1. MODERNBÛN, NETEWEPARÊZÎ Û ZIMAN	1
1.1 Dîroka Modernbûnê	1
1.1.1 Heyama Ronakbûnê	2
1.1.2 Şoreşa Fransiz	2
1.1.3 Şoreşa Endustriyê	3
1.2 Modernbûn û Neteweparêzî	4
1.2.1 Ranêzikiya Seretayîparêz	4
1.2.2 Ranêzikiya Etno-Sembolîst	5
1.2.3 Ranêzikiya Modernîst	5
1.3 Raman û Îdeolojiya Neteweparêziyê	6
1.3.1 Modernbûn û Kirûya Ziman	12
1.3.2 Ziman Di Çarçoveya Çand û Civakê De	13
1.3.3 Zimanê Neteweyî Di Demajoya Avakirina Neteweyê De	15
1.3.4 Hestê Xwejêzanînê: Zanav û Ziman	17
1.3.5 Zimanê Neteweyî	19
2. JÊDERKÊN NETEWEPARÊZIYA KURD	24
2.1 Serîhildanên Kurdan Di Dema D.Oyê De (1880-1923)	24
2.1.1 Serîhildana Mîr Bedirxan Beg	24
2.1.2 Serîhildana Şêx Ubeydullah	25
2.1.3 Serîhildana Koçgîrî	26
2.2 Serîhildanên Kurdan Di Dema K.T.yê De (1923-1932)	27

2.2.1	Serîhildana Şêx Se‘îd û Rêkxistina Azadî	27
2.2.2	Serîhildana Agirî û Rêkxistina Xoybûnê	28
2.3	Tevgerên Rewşenbîriya Kurd Di Dema Osmaniyan De	30
2.3.1	Rojnameya Kurdistan û Bêjara Neteweparêz	30
2.3.2	Cemiyeta Teavûn û Terakkî a Kurd	33
2.3.2.1	Rojnameya Kurd Teavûn û Terakkî	37
2.3.3	Cemiyeta Hêvî	39
2.3.3.1	Heyama Yekem a Cemiyeta Hêvî	39
2.3.3.1.1	Kovara Rojî Kurd û Bêjara Neteweparêz	41
2.3.3.1.2	Kovara Yekbûn û Bêjara Neteweparêz	54
2.3.3.1.3	Kovara Hetawî Kurd û Bêjara Neteweparêz	55
2.3.3.2	Heyama Duyem a Cemiyeta Hêvî	57
2.3.3.2.1	Hînger	59
2.3.4.	Komeleya Pêşketina Kurdistanê	60
2.3.4.1	Kovara Jîn û Bêjara Neteweparêz	61
2.5	Neteweparêziya Kurd û Bêjara Wê	69
3.	KOVARA HAWARÊ	73
3.1	Mercên Dîrokî ên Derketina Hawarê	73
3.2	Jêderkên Rewşenbîrî ên Derketina Hawarê	75
3.3	Rewşenbîrî û Taybetiyên Çînî ên Nivîskarên Hawarê	76
3.4	Nimandina Zanava Kurd Di Hawarê De	81
3.5	Ranêzikiyên Zimanî ên Berî Hawarê	87
3.6	Avakariya Celadet Bedirxan û Kovara Hawarê	88
3.7	Biwarên Bêjara Neteweparêz Di Hawarê De	92
3.7.1	Dîrok û Rûdanên Dîrokî	92
3.7.1.1	Berpêbûnên Di Warê Rûdanên Dîrokî De	96
3.7.2	Sembolên Neteweyî	99
3.7.2.1	Ala û welat	101
3.7.2.2	Marş (Sirûd)	104
3.7.3	Cografya û Etnografya	109
3.7.3.1	Berpêbûnên Di Warê Cografya û Etnograyayê De	110
3.7.4	Çand û Folklor	114

3.7.4.1	Berpêbûnên Di Warê Çand û Folklorê De	117
3.7.5	Bîrûbaweriyên Olî	122
3.7.5.1	Ranêzikiyên Di Warê Olê De	123
3.7.6	Ziman	129
3.7.6.1	Bêjara Neteweparêz Di Biwara Ziman De	132
3.7.7	Wêje	135
3.7.7.1	Bêjara Neteweparêz Di Biwara Wêjeyê De	137
3.7.7.2	Hêmaya Şûr û Qelemê û Çîroka Gazinda Xençera Min	142
ENCAM	147
ÇAVKANÎ	
KURTEJIYAN	

RÊZÎLEYA SEMBOL Û KURTENAVAN

Sembol û kurtenavên ku di vê xebatê de hatine bikaranîn, li jêr bi tevî dirêjenavên xwe ve hatine aşkerakirin.

Kurtenav

CH

CTTK

Çev

hwd.

K.T.

RKTT

vgz.

Dirêjenav

Cemiyeta Hêvî

Cemiyeta Teavûn û Terakkî a Kurd

Çevirmen

Her wekî dî

Komara Tirkiyeyê

Rojnameya Kurd Teavûn û Terakkî

Veguhêzker

PÊŞGOTIN

Li ser kirûya modernbûnê raveyên pircure hene. Çawan ku em ê nikaribin çêla demajoyeke diyarkirî a modernbûnê bikin her wisan em ê nikaribin çêla teoriyeye wê a diyar û pêdandî jî bikin. Lê belê em dikarin bêjin ku heyama ronakbûnê bûye sedem ku têgiha modernî bêtir diyar û zelal bibe.

Bi taybetî li Ewrûpayê, piştî ku tevgera ronakbûnê di nav gelên etnîk ku di bin desthilata împaratoriyan gevre de dijiyan, geşe dide xwe, hişyariyeye jêcihêbûnê çêdibe bi van gelên etnîk re. Bi lidarketina şoreşên Fransîz, şoreşa Endustriyê û pêşketina kapîtalîzmê, vê hişyariyê digel felsefeyên pozîtîvîst û rasyonalist, raman û îdeolojiya neteweparêz jî her ku çûye hîm girtiye û xurttir bûye.

Hemû rave û pênaseyên ku bo modernbûnê tên kirin, bi pêşketina civakî re dibin yek ku di navîna sedsala 20. de pêk hatiye; yanî her civak, ji derveyî gera dîrokê û cîgeha xwe a cografîk, berveyî pêşketina şaristaniyê ve çûye û digel vê pêşketinê pircure jî gelek kirû derketine pêş. Yek ji van kirûyan jî kirûya dewleta neteweyî ye. Loma jî gotinên netewe û neteweparêz jî di ser vê yekê re, wekî kirûyên modern tên qebûl kirin. Ji bo gelek ramanweran ku hewl didin gotinên netewe û neteweparêziyê digel modernbûnê rave bikin, netewe kirûyeye çêkirî û dahêrandî ye. Loma jî, zanavên neteweyî di her dem û qonaxê de ji nû ve tê pênasekirin û li gorî pêwîstiyên demê tên guherandin.

Ramana neteweparêziya Kurd di destpêka sedsala 19. de geşe bi xwe daye. Bêjara neteweparêziya Kurd jî, digel vê geşedanê bi her xebat, çalaki û hewldanê re rengêkî dîtir daye xwe û kartêka xwe li ser civaka Kurd kiriye. Ev çalakî heta avabûna K.T'yê ava bûye, di warê ramanî û bîreweriyê de her ku çûye xurttir bûye.

Neteweya Kurd ku bi sedan salan, wekî gelekî etnîk, di nav sînorên dewleta Osmanî de heyîna xwe didomîne, piştî avabûna K.T'yê ji hemû alî û hêmanên xwe ên etnîkî ve ku heyîna netewebûna wê datîne rastê, tên neyînkirin û tune tê hesibandin; loma jî ji vê qonaxê û bi şûn de neteweya Kurd bi arîşeya hebûn û tunebûnê re rû bi rû dimîne. Wekî encama vê arîşeya çêbûyî, ramana neteweparêziya Kurd, ji bêjarê zêdetir, hewla danîna dewleteke neteweyî dide û ji bo bicîanîna vê

armancê sê serfihildanên mezin î sereke li dar dikeve. Piştî têkçûna van serfihildanan, bêjara neteweparêz a Kurd, ku di qonaxên berê de hîm û sedem û palderên wê kêr zêde hatibû danîn, dikeve nav hewl û xebata xurtkirin û berbelavkirina vê ramanê.

Kovara Hawarê jî, bi derketina xwe ve, dibe biwara xurtkirin û berbelavkirina bêjara neteweparêz a Kurd. Û di Kovara Hawarê de, bi gelek hêmanan ve ku heyîna gelekî etnîk dipeyitîne û wê digihîne dûrahiya dîrokê, bêjara neteweparêziya Kurd, di riwangeyeke awirmodern de, tê danîn û afirandin û rûpelên kovarê jî, ji bo hişyarkirina civaka Kurd û berbelavkirina vê ramanê, wekî biwareke neteweyî tê bikaranîn.



Dilaver Döger

DESTPÊK

Di vê xebatê de, pêşî ji bo danîna bingeha tezê, hewl hatiye dayîn ku; bi kurtasî têtîliya têtîghên modernî, netewe û neteweparêziyê bê diyarkirin. Di ser vê bingehe re, pêşî lêkolîn li ser sedema afirîna neteweyan hatiye kirin da ku sedem û qonaxên netewebûnê ku di ser gelên etnîkî re û di ser afirandina neteweyan re pêk tê, bê aşkerakirin.

Her wiha, ji bo çêtir têtîghîştina mijarê, wek gelekî etnîk, lêkolîn li ser neteweya Kurd hatiye kirin û wekî destpêk ramana neteweparêziya Kurd hatiye gengeşekirin. Û digel van yekan jî, ji bo baş danîna bingeha tezê, bal li ser jêderkên etnîkî û ramana neteweparêziya Kurd hatiye kişandin.

Ji bo dazana reng û awa û qonaxên afirîn û avabûna ramana neteweparêziya Kurd, Kovara Hawarê wekî qonaxekê hatiye hîlbijartin û dîsan wekî weşînekek ku xwe gihandiyê her dera ku Kurd lê hene, bi metod û rêbazeke hûrgerînî û hûrkolînî, di gelek waran de lêkolîn li ser Kovara Hawarê hatiye kirin da ku bê nîşandan ku wekî biwareke bêjara neteweparêz, Kovara Hawarê qonaxeke diyarker û girîng e di bikaranîna bêjara neteweparêziya Kurd û di bimakbûna ramana wê de.

1. MODERNBÛN, NETEWEPARÊZÎ Û ZIMAN

Li ser kirûya modernbûnê raveyên pircure hene. Û ne gengaz e ku em li ser vê kirûyê polînkirinê pêk bînin. Çawan ku em ê nikaribin çêla demajoyeke diyarkirî a modernbûnê bikin her wisan em ê nikaribin çêla teoriyeye wê a diyar û pêdandî jî bikin. Loma jî di vê rewşê de, em ê hewlê nedin ku di serî de pênaseyekê bo modernbûnê peyde bikin, lê belê em ê hewlê bidin ku riwangeyên cuda ên pênaseyên modernbûnê bidin zanîn.

1.1 Dîroka Modernbûnê

Pirsa “gelo destpêkeke modernbûnê heye an na?” pirseke berbelav a bêbersivmayî ye. Li gorî hin ramanweran destpêkeke wê heye, lê belê her û her gengeşe heye li ser van destpêkan. Li gorî A. Giddens, destpêka modernbûnê sedsala 17. e (Giddens, 1994: 9). Beranberî vê yekê, Peter Wagner jî dibêje, “Mirov dikare, serdema şoreşa demokratîk û endustriyê, yanî werçerxa sedsala 18. wekî destpêka modernbûnê qebûl bike (Wagner, 1996: 11).

Di vê biwarê de hin têgih tên bikaranîn da ku karibin pêşedemên dîrokî, ên wekî Ronakbûn, Şoreşa Endustriyê, Şoreşa Fransîz, Ronesans û Reform û paşedem bînin diyarkirin; û ew dem wekî “gerdîş” û “modern” tînin derbirandin. Di analîzên modernbûnê de ji her du têgihan, têgihên gerdîş û modern, pir zêde havil tê girtin. Ji ber ku civakên Rojavayê, ev demajoya guherîn û jihevkartêkgirtinê di 400 salan de temam kiriye. Lê belê dîsan jî di her rewş û kawdanê de, jihevçihêkirina gerdîş û modernê bi piranî di nav çarçoveyeye teorîk de dimîne.

Her wekî Black jî dibêje, “Çi gerdîş çi jî hevçaxî, her du jî razberkirin in. Ji ber ku du civakên ku bişibin hev tune ne û hemû civak di nav guherîneke domdar de ne” (Black, 1989: 45). Giddensê ku dibêje, di hîma ramana modernbûnê de dijgerdîşiyek heye, wiha didomîne, “Dibe ku di seqa û destûdariyên civakî ên berbiçav de, gelek pêkhate hebin ku tê de gerdîş û modernbûn pêkve bin” (Giddens, 1994: 41). Ji van raman û pênaseyan em fam dikin ku hewl tê dayîn ku jihevçihêtiya gerdîş û modern bê ravekirin da ku modernî jî karibe xweşîkî bê pênasekirin.

1.1.1 Heyama Ronakbûnê

Heyama ronakbûnê, rehenda ramanî a modernbûnê pêk aniye. Gelek ramanwer “Ronakbûnê” wekî çavkaniya modernbûnê şîrove dikin. Ronakbûna ku wekî xala şikestinê a demajoya derbasbûna ji gerdfiş bo biwara modernbûnê tê dîtin, wekî (Gökberk, 1999: 289) jî diyar dike, “Mirov di ramîn û nirxandinê de, xwe ji gerdfiş û dîtinên ku li ser bîrûbaweriyê ava bûne, rizgar dike, bi wan re pêbestî namîne û bi aqil û dîtinên xwe roniyê dide ser jiyana xwe” tê pênasekirin. Li vê derê, kesê ku dixwaze ronak bibe, mirov bi xwe ye, tiştê ku tê ronakkirin jî wate û pergala jiyana mirovî ye. Her wiha, yek ji taybetiya serdema ku wekî “serdema ronakbûnê” tê binavkirin, ew e ku; “Aqil û ramana bipêşdeçûnê” (Çiğdem, 1999: 42) derdikeve pêş. Felsefeya hîmî a ronakbûnê bawer dike ku; mirovahî dikare bi rênîşandêriya aqil û zanistê, xwezayê têxe bin pişkinîna (kontrola) xwe û dikare piştî xwe bide feraseta dîroka bipêşdeçûnê û bigihîje jiyaneke xweş û rihet.

Digel ramana ronakbûnê, feraseta zanista pozîtîvîst jî peyde bû û ramanweran dîtina xwe wekî ‘civak bi pêşdeçûna dîrokî bi pêş ketine,’ anîn ziman. Digel vê yekê jî feraseta peresînparêz jî pêşbîniya girîng a wê serdemê ye. Bi kurtasî, peresînparêzî û pozîtîvîzm, sereke bizavên Ronakbûnê ne. Digel bizava Ronakbûnê, ferasetên sereke ên wekî “hewngirî (rasyonelîzm)”, “humanîzm”, “mafên mirovan”, “laîkî”, “demokrasî”, “azadî”, “wekhevî” û “feraseta zanista pozîtîv” bi demê re xurttir û berfirehtir bûne û bûne parçeyekî jêneqet ê civakên modern (Aygül, 2008: 23).

1.1.2 Şoreşa Fransiz

Şoreşa Fransiz, rehenda siyasî a modernbûnê pêk tîne. Şoreşa Fransiz, pergalên ku piştî xwe didin feodaliyê rûxandine û dirûv û naveroka pergalên sosyo-ekonomîk, çandî û siyasî guherandine. Wekî encama Şoreşa Fransiz, serê pêşîn “neteweparêzî” û pê re jî gelek guherînên siyasî, pêşî kartêka xwe li Rojavayê kirin piştî jî li hemû dinyayê belav bûn. Têgihên wekî, wekhevî, azadî, cumhuriyet, demokrasî, bi demê re û wekî bêjarekê hemû دنیا xist bin kartêka xwe. Û bayê neteweparêziyê kartêka xwe li hemû dinyayê nîşan da.

Şoreşa Fransız ku li dor gotinên xwebirêvebirina gel teşe da xwe, der heqê tayînkirina gel a çarenûsa xwe de (self-determination) jî bû wekî model û rêbaz û bêjarekê. Dewletên neteweyî ku li ser hîma demokrasî û cumhuriyetê hatin danîn, bi xwe re pergaleke siyasî û civakî ava dike ku tê de gel bi awayekî giştî tê birêvebirin. Û piştî sedsala 18. dewletên neteweyî tev li ger û çerxa dîrokê dibin û her wiha di hemû dinyayê de awayekî nû ê pêwendiyê û serdemeke nû dest pê dike.

1.1.3 Şoreşa Endustriyê

Şoreşa Endustriyê, yek ji wan pêşketinan e ku mohra xwe li sedsala 18. xistiye. Aliyê herî cihêker ê modernbûnê ev e; di dema modernbûnê de, ji berhênana adetî beveyî berhênana modern qonaxeke têreborînê pêk tê. Û ev dema têreborînê wekî “şoreşa endustriyê” tê binavkirin. “Keşfên cografîk ên di sedsala 15. û 16. de pêk hatine, bûne sedem ku bazirganî berfirehtir bibe û çîna ku wekî “bazirgan” tê binavkirin, xurttir be (Aygül, 2008: 25). Loma jî welatên ku cara pêşîn şoreşa xwe a endustriyê pêk anîne, hêza ekonomîk kirine destê xwe û di siyaseta dinyayê de bûne xwedî gotin.

Gava çêla jihevcihêtiya gerdîş û modernê tê kirin, gelek ramanwer reng û awayên vê şoreşê, şoreşa endustriyê, didin pêş. Loma jî, “civakên ku ji berhênana kiştûkalî derbasî berhênana endustriyê bûne, wekî civakên modern tên qebûlkirin” (Aygül, 2008: 25). Her wiha em dikarin bêjin ku van şoreşan, di serî de pergala demografîk, kartêka xwe rasterast li ser pergalek siyasî, civakî û çandî jî kiriye.

Ji alî dewletên neteweyî ve girîngiya endustriyêbûnê gelek zêde ye. Dewletên ku serbixwetiya xwe bi dest xistine, serê pêşîn pergala xwe a ekonomîk li gorî helûmercên dinyayê ji nû ve saz kirine. “Netewe-dewlet, bi hev re dikevin pêwendiya bazarê û di demajoya endustriyêbûnê de, pergala xwe a aborî saz dikin” (Aygül, 2008: 27).

Bi taybetî, şerên serxwebûnê ku di sedsala 20. de pêk hatine, piştî bidestxistina serxwebûnê, di warê ekonomiyê de jî têkoşîn dane. Her wiha, pêşdeçûna dîrokê ew demajo bû ku nedikarî bi paş de were vegerandin; û helbet di xwe de gengaziyeke wiha jî dihewand; dibû ku civak ancax karibin di modernbûnê de bigihîjin jiyaneke xweş û rihet. Civakên ku bi vê riwangeyê teşe dan xwe, ji bo

modernbûnê heta tu bêjî bes rêbazên cuda cuda pêk anîne. Û wekî hevpariyeke giştî, hemûyan jî li xwe kiriye armanc ku di dîrokê de şûnde nemînin.

1.2 Modernbûn û Neteweparêzî

Netewe çi ye, neteweweyek çima û çawan diafire? Netewe li ku derê û kîngê derdikeve mexderê? Neteweparêzî çi ye? Gelo netewe pêşî tê an jî neteweparêzî? Der heqê netewe û neteweparêziyê de ranêzikiyên ew çend cuda hene ku mirov dê tu carî nikaribe wan bi hin kategoriyan rave bike.

Gengaz e ku mirov di navbera têgihên neteweparêziyê de polînkirinekê bike. Lê belê dibe ku sînorên vê polînkirinê pir zêde berteng bimîne. Ne hêsan e ku mirov ji van sînoran hilbore. Ji ber ku ranêzikiyên ku ji bo van kirûyan tên kirin pircure ne û objektîviya wan jî car caran dibe mijara gengeşeyê. Wekî di jî hemin ku cureyekî û awayekî diyar a modernbûnê tune ye, em dikarin bêjin cureyekî û awayekî neteweparêziyê jî tune ye. Nexwe em ê bêfîkar karibin dikarin bêjin, neteweparêzî jî li gorî welat û gelan cihê ye.

Ramanwerên ku hewl didin ku netewe û neteweparêziyê di ser demajoya modernbûnê re pênase û rave bikin, ne hindik in. Lê belê, di der barê mijara me de, sê riwange hene ku derbar netewe û neteweparêziyê dîtin û ranêzikiyan ava dikin.

1.2.1 Ranêzikiya Seretayîparêz

Ranêzikiya seretayîparêz, di berhemên teorîk ku heta sala 1960î hatine berhênandin de, serdest e; û ev ranêzikî ji xebatên etnîsîteyê tev li lîteratura neteweparêziyê hatiye kirin. Heke em ranêzikiya “xwezayîparêz” nehesibînin ku neteweyê wekî taybetiyeke zikmakî qebûl dike, seretayîparêzî di xebatên neteweparêziyê de bi sê awayan derdikeve pêşberî me. (1) *Kevnparêzî*, diparêze ku netewe ji serdemên kevn û ji mêj ve heye û ji borîrojê heta roja îroyîn zêde guherîn tê de pêk nehatiye. Ev ranêzikî dîtina xwe wiha bi pêş de tîne û diparêze ku; çendî ku hin cudahiyan dirûvî hebin û xuya bikin jî, puxtuya neteweyî her wekî xwe maye. (2) *Sosyo-biyolog*, lêgerîna jêderka pêbestiyên etnîk di taybetiyên genetik û di dozînan de dike. Li gorî vê dîtinê, netewe malbatên mezin û berfireh in. (3) *Seretayîparêziya*

çandî jî, di pêbestîyên etnîk de bîrûbaweriyê datîne rêza pêşîn. Tê bawerkirin ku hêmanên wekî ol, ziman û borîroja hevpar; kesîde, komika etnîk û neteweyê ji “ên dî (dîke)” cihê dike; di heman demê de, wan bi hev ve jî girê dide û ev hêman, rengûawayên wan ên seretayî ne û berî her tiştî ew hene. Ev bawerî seqayeke mîstîk, girîngiyeke giyanî tev li van hêmanan dike (Özkırmılı, 1999: 86-87). Mantiqa sereke a vê ranêzikiyê ev e: “Netewe her û her hebûn, tiştê ku guherî bes ev e: ew hay ji xwe bûn û hayjixwebûna xwe jî pratîze kirin” (Smith, 1994: 76).

1.2.2 Ranêzikiya Etno-Sembolîst

Ranêzikiya etno-sembolîst ku wekî rêyeke navîncî tê qebûlkirin, giraniyê dide ser hêmanên çandî û sembolîk û wekî pênaseyeke sosyal li ser neteweparêziyê disekine. Li gorî vê ranêzikiyê, ji ber avakirina sosyal e ku mirov dikare komikeke mirovan wekî netewe bi nav û reng bike. Tevgera neteweparêz jî, ji hebûneke bi navê netewe dide ser rê ku her kes li ser wê xwedî dîtineke hevpar e. Zanyarên polîtîk, çî gava ji bo neteweyê hêmanên wekî welatê hevpar, dîroka hevpar û zimanê hevpar kirine merc, her û her rastî avakirina sosyal a realîteyê hatine. Yanî ji bo qebûlkirina neteweyê “avakirina sembolên hevpar” tiştêkî bivênevê ye. Bi kurtasî netewe û neteweparêzî di her dem û mercê de çêkirî ye. Piştî ku sembolên hevpar tî avakirin kesayetiyeke kollektîv ava dike û hinek be jî dibe sedem ku kesayetiya kesîdeyê biguhere. Di vê wateyê de sembol wekî hêzên ku jiyanî komelî û tofî bi yek dikin, derdikevin mexderê û “Ew sembol dibin hokara ku kesîdeyan bi tevdehiyekê re dibestîne, di navbera wan de piştevanî saz dike û wekî dî jî digel ku kesîdeyan araste dike jî çarçoveya famkirina ji kesên dî jî diyar dike” (Aygül, 2008: 30).

1.2.3 Ranêzikiya Modernîst

Ev ranêzikî, beranberî her du ranêzikiyan, di dîrokê de gengaziya netewe û neteweparêziyê û pêwendîya wan a bi modernîteyê re daniye rastê. Di çav gelek ramanwer û zanyaran de gengaz e ku mirov karibe wekî tevger û îdeolojiyekê, destpêka neteweparêziyê ji salên dawî ên sedsala 18. bidin destpêkirin. Digel ku di navbera wan de hin cudatîyên xuya hene jî, hemû ramanwer jî hevraman in ku

“Netewe bi tevayî pêkhateyeke modern e” (Smith, 1994: 77). Li gorî vê dîtîne, ne gengaz e ku mirov netewe û neteweparêziyê digel demajoyên modern ên wekî kapîtalîzm, endustriyîbûn, avabûna dewletên navendî, bajarvanî, demokrasî û laîkbûnê an jî ji van demajoyan cuda bihizire. Jixwe di serdemên kevn de mercên civakî, siyasî û ekonomîk tunene ku bibin sedem ku neteweparêzî derkeve rastê. Ev helûmerc di serdema modern de çêdibin; bi gotineke dî netewe ancax di serdema neteweparêziyê de dibin divêtiyeke sosyolojîk. Û loma jî, wekî ku di (Özkırımlı, 1999: 98) de jî hatiye diyarkirin, “Neteweparêzî neteweyan diafirîne ne ku netewe neteweparêziyê diafirînin.” Bi giştî di vê ranêzikiyê de, di ser neteweparêziyê re li ser neteweyê tê sekinandin û tê destnîşankirin ku civak neteweparêziyê ji bo xwe û armanca xwe dixebitînin û bi vî awayî berê xwe didin armancên diyar û li xwe dikin armanc ku di demajoya modernbûnê de rabin û bi pêş bikevin. Piştî van gotinan, em ê berê xwe bidin dîtîna û ramanên ramanwerên ku serê xwe bi van demajo û kirûyan re eşandine û hewl dane ku rave bikin.

1.3 Raman û Îdeolojiya Neteweparêziyê

Neteweparêzî bi awayekî giştî, bi taybetî ji alî helûmercên ku derketiye rastê ve, mijareke sosyolojîk, îdeolojîk, felsefîk û teoriya siyasetê ye. Loma jî, ji famkirina ramana neteweparêziyê wate ew e ku; mirov dîtîna mirov û civakê, mengiyên siyasî ên mirov û civakê û daristina (sêwirîna) wan a sosyo-polîtîk lê dikole. Lêkolîna ku dê ji awirê sosyolojîk ve bê kirin, belkî dê nikaribe bi awayekî tekûz “wateya wê” bi me bide zanîn, lê belê dê karibe kirûyên “zanistî” ên bi neteweparêziyê ve pêwendîdar bo me rave bike.

Em dikarin bêjin, mirov ew heyîn e ku hewcetiyeke pê re çêdibe ku xwe ji ciyekî/tiştêkî/civakekê/ bihesibîne. Û nayê zanîn ka jêderka vê hewcetiye heta ku derê diçe; belkî jî diçe wê dema ku cara pêşî dîrok hat nivîsîn, ew dema ku bavik, qewm û eşîr peyde bûn. Isaiah Berlin destnîşan dike û dibêje “Di rastiya xwe de zayîna îdeolojiya neteweparêziyê, bi hebûna hişberiyêke kollektîv a xwejêzanîne (aîdbûnê) a bi mirov û civakê re û bi birîndarbûna vê hişberiyê ve bestandî ye.” (Erdoğan, 2008: 2) Ji vê peyta hanê ev encam dimîne ji me re; neteweparêzî ji “arîna” nexweşokî (patolojîk) a vê hişberiya xwejêzanîne (aîdbûnê) dizê. Her wiha ji

bo zayîna îdeolojiya neteweparêziyê merceke dîtir jî divê. Divê civak xwe wekî hebûneke kollektîf bibîne; yanî xwe wekî neteweyekê bibîne ku hin taybetiyên wekî ziman, jêderka etnîk, dîroka ku hatiye daristin (sêwirandin) an jî dîroka heyî û rasteqîn di xwe de dihewîne.

Heke em bi awayekî dî bêjin, çendî ku îdeolojiya neteweparêziyê ji civakeke ku hatiye êşandin û tehde lê hatiye kirin re dibe bersiv, di her rewş û carê de ev yek meyla xwe berveyî îdeolojiya neteweparêziyê nake. Ji bo vê yekê, mirovên ku di wê civakê de dijîn, hewcetî bi dinyabîniyeke hevpar dibînin ku karibin li dora wê kom bibin û ji xwe re jiyaneke nû ava bikin. Loma jî, hewcetiya nûzayî êdî di asta hişberiyê de ye û îdeolojiyek pêwîst e ji wan mirovan û ji wê civakê re; îdeolojiyeke ku karibe berxwedana civakê (û mirovî) a li hember hêzên dijber rave bike, wê berxwedanê mafdar derxîne û pê re jî rê nîşanî wan bide û ji bo zanava wan a hevpar navendekê nîşan bide. Ji bo afirîna ramana neteweparêziyê, hewcetî bi komik û beşeke civakî heye ku karibe kifş bike ku ‘gel’ êdî ‘neteweyek’ e da ku li ser wê hiş û hoşa “neteweyî” ava bike. Di vê qonaxê de hokar û kartêkeke dîtir derdikeve holê. Rewşenbîr û xwendeyên civakê.

Wekî dîtineke giştî hatiye qebûlkirin ku neteweparêzî, bi wateya xwe a modern ve, serê pêşîn wek îdeolojiyekê di nav sînorekî terîtoriyal de (axeke dewletî a sînorkirî), bi pêş de tê û bi xwe re wek paldêreke meşrûbûnê, kirûya neteweyê ava dike. Ji alî gelek teorîsyenan ve pênaseya neteweyê hatiye kirin. Pênaseya Ernest Renan yek ji van pênaseyan e ku wek pênaseya seretayî qebûleke zêde heye li ser. Renan, di konferansa xwe a ku di sala 1882yan de daye, li hember kesên ku “modela etnîk” diparêzin, “modela peymanandinê” tîne pêş û têgiha neteweyê bi vî rengî pênase dike: “Çend merc hene ku neteweyekê pêk tînin. Ew merc ev in: yekîtiya nîjad, yekîtiya olî, yekîtiya ziman, cografyayeke hevpar û berjewendiyên hevpar ên civakê.” Renan piştî ku ev hemû yek bi yek gengeşe dike, wiha dibêje, “Tu yek ji van jî bi tena serê xwe ne watedar e.” Renan bi gotina, netewe bi çi awayî pêk tê bila bê, ‘giyanek’ e, didomîne û wiha dibêje, “Ev tişt in ên ku neteweyan dikin netewe; 1- Borîrojeke ku tê de mîrateya bîranînan dihewe. 2- Îradeya parastina mîrateya hevpar. 3- Serokên mezin. 4- Serkeftinên berayîn. 5- Jibîrkirinên komelî” (Çuhadar, 2009: 202). Her wekî ku ji pênaseya E. Renan tê famkirin, netewe ji civakeke ku her yek endamên wê xwedî nirxên hevpar in, pêk tê; lê belê heta ku mîrateyeke hevpar a der

heqê van nirxan de tunebe û pê re jî giyan û xwesteka parastina van nirxan bi kesên wê komelê ve tunebe, netewe pêk nayê.

Karl Deutch ku yek ji serkêşê ranêzikiya modernîst e, avakirina neteweyê bi demajoyên civakî-demografîk ve pêdibestîne: Ew dibêje, geşedanên wekî; jêderkîbûn, tevgera civakî ku her ku diçe zêdetir dibe, rêjeyên xwendin û nivîsînê û teknolojiya ragihandinê ku her ku diçe bi pêş dikeve, avabûna neteweyan hêsantir dike. Li gorî wî, serkeftina vê demajoyê bi hevtemamkirina livdariya civakî û biyekbûna çandî ve pêbest e (Özkırımlı, 1999: 68). Yanî li gorî Deutch, avakirina neteweyekê divêtiyeke demajoya modern e.

Elie Kedourie jî dibêje, “neteweparêzî” îdeolojiyek e ku di destpêka sedsala 19. de hatiye dahêrandin. Ev dîtin angaşt dike ku; dikare şênî û gelheyekê ava bike ku xwe bi xwe bi rê ve bibe; dikare dewletê bi awayekî meşrû bi kar bîne û koma dewletan li gorî pêwîstiya xwe birêkûpêk bike. Bi kurtasî ev îdeolojî dibêje, mirovahî bi xwezaya xwe ve li neteweyan dabeş bûye; netewe bi reng û çawanîyên diyar hatine nasîn û tekane awayê hikumkirinê xwebirêvebirina neteweyan e (Kedourie, 1971: 1).

Ernest Gellner têgiha neteweyê serê pêşîn wekî rewşeke çandî û rêvebirinê qebûl dike. Li gorî wî, “Heke du mirov xwe wekî du endamên neteweyekê bizanin û heman çandê parve bikin, mirov dikare çêla neteweyekê bike” (Gellner, 1992: 225). Loma jî Gellner dixwaze bêje, çî gava ku hem yekeyên siyasî û hem jî yekeyên çandî pêk hatin wê hingê netewe pêk tê. Û li gorî Gellner, “Netewe û neteweparêzî arizî civaka endustriyê ye; çendî ku di civaka kiştûkalî de yekeyên bi vî rengî derketibûn mexderê jî, ev yek ji bo dinyaya modern tiştêkî bivênevê ye” (Gellner, 1992: 225). Em dikarin bêjin, çendî ku Gellner netewe û neteweparêziyê bi civaka endustriyê ve dibestîne jî, dîsan jî neyîn nake ku yeke û nîşaneyên neteweyê ji mêj de hebûne û di civaka kiştûkalî û di civakên ku hê negihîştine asta endustriyê de ava bûne.

Li gorî Gellner “Neteweparêzî, berî her tiştî doktîrîna meşrûbûnê a demajoyên siyasî û çandî ye ku qonaxa sanayîbûn û modernbûnê ew afirandiye” (Gellner, 1992: 13). Lê gava em berê xwe didin Calhoun, ji bo neteweparêziyê wiha dibêje; “Tu kesekî wisan tune ye ku em karibin jê re bêjin yekem neteweparêz e” (Calhoun, 2011: 54). Di vê qonaxê de pirseke sereke derdikeve rastê; gelo neteweparêzî destpêkek e ku em ê karibin bêjin li ser îdeolojiyekê rabûye an jî wekî

ger û demajoya dîrokê ji mêj ve ye bi hin rengên xwe ve heye? Gellner, digel vê dîtina xwe a li jor dikirandî, neteweparêziyê bi serdema modern ve vedibestîne û wiha dibêje, “(...) Nexwe arîşeya neteweparêziyê di civakên bêdewlet de dernakeve holê” (Gellner, 1992: 24). Li vê derê me divê em hema di serî de bala xwe bidin ser vê gotinê ku Gellner, hebûna dewleteke teritoryal ji bo raman û pêkhatina neteweparêziyê tiştekî bivênevê dibîne û wan bi hev ve girê dide. Yanî her wekî Özkırmılı jî dibêje, “Neteweparêzî, li xwe dike armanc ku di nav sînorekî terîtoryal de hemû çîn, tof û zanavan bi hev bigihîne û wan biyek bike; û neteweparêzî bi vî aliyê xwe ve jî ramanêke wekhevker û wekhevîparêz e.” (Özkırmılı, 1999: 153).

Herçî Hobsbawm e, angaşt a wî ew e ku; neteweparêzî berî neteweyê hatiye û neteweparêzî hokara sereke ye ku neteweyê ava dike. Li gorî Hobsbawm, “Neteweparêzî çandên ku ji berê de hene ji xwe re dike bingeh û wan vediguherîne ser neteweyê; carinan neteweyan ava dike carinan jî çandan tune û winda dike” (Hobsbawm, 1995: 24). Yanî li gorî Hobsbawm, di rûxareke analîtîk de neteweparêzî berî neteweyê tê; ne ku dewletên neteweyî û neteweparêziyê ava dikin, berevajiya wê; dewlet û neteweparêzî neteweyan ava dikin. Hobsbawm ji bo vê angaşt a xwe vê mînakê dide û dibêje, “Massimo d’Azeglo ku di avabûna dewleta Îtalyayê de bi roleke mezin rabûye, gotiye, ”Me Îtalya afirand a niha jî dor hat ser ku em Îtalyanan biafirînin” (Gökalp, 2007: 279-298). Her wiha Hobsbawm, destnîşan dike ku “Li her welaî rengê neteweparêziyê cuda ye û sedema wê jî ne îdeolojîbûna wê ye, lê belê sedem ew e ku; neteweparêzî guherîneke sosyo-polîtîk e ku xwe dispêre rasteqînên sosyal” (Özkırmılı, 1999: 98). Hobsbawm bi vê jî namîne û neteweparêziyê wekî berhemeke “endezyariya civakî” rave dike (Hobsbawm, 1995: 55) û ji bo neteweyê sê pîvanan datîne: “Pîvana yekeme ev e; divê netewe ji dîroka xwe ve û bi roja îroyîn ve bi dewleta heyî re bestandî be. Pîvana duyem jî, divê komeke elîtan (kesên bijare) hebe ku ji mêj ve binelî be û zimanekî wî î dayîkê hebe ku xwedî wêjeyêke neteweyî û awayê rêveberiyê be. Pîvana sêyem jî, divê gevileke wê a fetihkirinê a peytandî hebe” (Hobsbawm, 1995: 55-56). Bi kurtasî li gorî Hobsbawm, heke dîrokeke domdar, çand û zimanekî li ser kok û ripina xwe rûniştî û kevneşopiyêke fethkirinê jî hebe, ev yek têrî netewebûnê dike.

Anthony D. Smith, ku ramanwerekî girîng e di nav wan ramanweran de ku xwedî ranêzikiya etno-sembolîst in. Smith gava pênaseya neteweparêziyê dike kartêk

û qewîniya çandên etnîkî neyîn nake û ji aliyekî ve jî balê dibe ser wê yekê ku; çendî ku îdeolojiya neteweparêziyê bi ramana modern û bi sîstema kapîtalîzmê ve hatibe meşrûkirin da ku ev îdeolojiya hanê di armanca xwe a avakirina dewleta neteweyî de bi ser bikeve jî; dawîya dawî hin hokar û kartêkên etnîkî hene ku kapîtalîzm “nikare ji wan bixwe” û tevî ku ew ji geşedanên kapîtalîzmê kartêkên neyînî bigirin jî, bi qasî ku karibin jimêjveyîti û jêderkiya xwe bidin der, wekî xwe dimînin. Smith wiha pê de diçe û dibêje, “(...) ‘zanavên etnîkî’ heta tu bêjî bes bergegir (tirûşdar) in. Lê belê divê em ji vê yekê şaş fam nekin û nebêjin qey; ev çandên etnîkî di gera dîrokî de neguherîne, yanî puxteya wan wekxwe/domdar maye”¹ (Smith, 1994: 41). Smith, bi vê gotina xwe re, tevî ku dixwaze puxteya potansiyela neteweyî derxîne pêş jî, li ser puxte û kakil û bergegiriya etnîsîteyê disekine û bi vê ranêzikiya xwe ve alternatîfek derpêşî ranêzikiya modern dike. Me divê em bala xwe bibin ser wê yekê û bizanin ku Smith ger û domdariya dîroka etnîkî, wekî “neguher” qebûl nake. Em dikarin bêjin li gorî wî, “netewe her hebûn; tiştê ku guherî bes asta hayjixwebûna wan û pratîzekirina wan a vê yekê ye.” Gava em bala xwe dibin serê, em dibînin ku Smith ji du aliyan ve nêzikî lê dike; yanî li gorî wî, digel ku netewe yekîtiyeke siyasî û aboriya hevpar e, di heman demê de jî pala xwe dide hêmanên wekî dîrok û çanda hevpar. Û li gorî Smith, “Neteweparêzî wekî ziman û îdeolojî, nehatiye “dahênandin”; neteweparêzî di gelek astan de çalak e û digel ku îdeolojiyeke siyasî û cureyeke tevgera civakî ye jî, di heman demê de mirov dikare wê wekî teşeyeke çandî jî qebûl bike” (Smith, 1994: 129).

Benedict Anderson, neteweyê wekî “civakeke ku hatiye xeyalkirin” pênase dike û dibêje, “Endamên neteweya herî biçûk jî dê tu carî endamên dîtir nas neke, dê tu carî der heqê gelekên ji wan de tiştê nebihîse, lê dîsan jî dê di hişê her yekê ji wan de xeyala tevdeyîbûna wan hebe û dê ev xeyal bijî jî” (Anderson, 1995: 20). Anderson digel vê jî, afirîn û pêşketina neteweyan bi cime’etên olî ve, bi rûxîna milkê xanedaniyê ve û pê re jî bi pêşketina kapîtalîzm û weşangeriyê ve pêwendîdar dike (Anderson, 1995: 83). Lê belê digel vê yekê jî, Anderson ji gelek ramanweran

¹ Li gorî Smith taybetiyên hîmî ên zanavê neteweyî ev in: 1- Axeke/welatekî an jî xakeke dîrokî. 2- Mîlên hevpar û bîra dîrokî. 3- Çandêke hevpar a girseyî. 4- Maf û peywîrên qanûnî ên ku ji bo hemû kesîdeyên civakê têbor in. 5- aboriyeke hevpar ku endamên civakê li welêt azad in di tevgerîna xwe de. (Smith, Anthony D., *Millî Kimlik. İletişim Yayınları, İstanbul, 1994, s, 31-32.*

cuda difikire. Ew li ser sedeman difikire û dibêje, “Gelo çawan dibe mirov bi hestên girgirtin, bîzjêçûn û dijminahiyê tevdigerin û li ser mirina xwe fîdakariyê dikin. Hemin ku neteweparêzî “xeyalkirineke modern û dahênandî” ye gelo çima mirov didin dû vê xeyalê û xwîna xwe dirijînin?” (Anderson, 1995: 19) Hemû ramanwerên ku li ser neteweparêziyê serê xwe êşandine dûrî van pirsan sekinîne. Lê belê li gorî Anderson, “efsûna neteweparêziyê ew e ku rasthatinê vediguherîne ser çarenûsê.” (Anderson, 1995: 21.) Em dikarin li ser vê yekê bêjin, nexwe civakên ku dane dû vê çarenûsa çêkirî û lêqewmî, çi gavê pêwîst bûye teksîr ji xwînrijandinê nekirine û mirin dane ber çavên xwe.

Peter. B. Berger ku bêtir di nav ramanwerên etno-sembolîst de cî digire, neteweparêziyê wekî îdeolojiyê modern dibîne. Ew dibêje, “Di cîhana sêyemîn de, bersiva herî xurt ku bo modernîzasyonê hatiye dayîn, neteweparêzî ye. Neteweparêziya ku ji ramana netewe û dewleta neteweyî afiriye, bi taybetî pêkhateyê Rojavayî ye. Di welatên cîhana sêyemîn de jî heman pêkhate veguheriye ser îdeolojiyên dijRojavayê” (Berger, 1985: 185). Di dîtina Berger de kitekî girîng î balkêş heye, ev e: Berger di pênaseya xwe de dibêje, “(...) Neteweparêzî ji ramana netewe û dewleta neteweyî afiriye” (Berger, 1985: 186) Ev yek teorî û dîtînan ramanwerên dîtir serûbinê hev dike. Ji ber ku hema bêje hemû ramanweran îdeolojiya ‘neteweparêziyê’ wekî destpêk û sedem û jêderka netewe û dewleta neteweyî dibînin û dibêjin; ramana neteweparêz berî pêkhateya netewe û avabûna dewleta neteweyî heye. Lê Berger, bi riwangeyê etno-sembolîst, serê pêşîn neteweyê wek etnîsîteya hayjixwebûyî û xwepratîzekirî qebûl dike; hebûna neteweyê bi îdeolojiya neteweparêziyê û bi hebûna dewleta neteweyî ve nabestîne û wê wek merceke bivênevê nabîne.

Herçî Connor e, dibêje, “Netewe; ji bo endamên civaka ku bawer dikin ku ji bavûkalên hevpar in, biwareke jiyînê ye” (Erözden, 1997: 123). Her wiha, Connor bi vê peyta xwe ve, wek merc datîne ku divê endamên neteweyê ‘*ji bavûkalên hevpar bin*’ û bi vê mercê jî cihêtiya ku di navbera netewe û koma etnîk de heye jî ji navê radike. Pênaseya Connor ku cudatiya komên etnîk û neteweyê ji holê radike û merca hebûna neteweyê bi “*bavûkalên hevpar*” ve girê dide, di nava xwe de nakokiyek dihewîne; ji ber ku di roja îroyîn de, dewletên neteweyî hene ku ji neteweyê saf û

homojen pêk nehatine û gel û mirovên wê dewletê wekî netewe tên pênasekirin. Loma jî *hevpariya bavûkalan* bi tena serê xwe têrî netewebûnê nake.

Em wekî dawî dikarin bêjin, neteweparêzî bi awayekî giştî wekî berhemeke Şoreşa Fransîz û endustrîbûn û kapîtalîzmê tê qebûlkirin. Gelek ramanwer neteweparêziyê bi demajoya modernbûnê rave dikin. Ji ber hindê ye ku netewe wekî; **“dahênana nerîtan”, “veavakirina kakilê etnîk”, “hatî xeyalkirin”, “endezyariya civakî” û “tiştêkî çêkirî”** tê polînkirin. Lê belê, ji ber ku jêderkên dîrokî ên civakên etnîkî nadin ber çavan, rexne li van ramanweran tên girtin. Heke gotina modernîstan di cî de be, nexwe di demên berî modernîzmê de netewe û neteweparêzî tune ye. Lê belê ev yek têr nake ku em ji netewe û ji ramana neteweparêziyê fam bikin; ji ber ku neteweparêziyeke yekreng û yekcure tune ye û her yek rêyeke dîtir nîşanî me dide.

1.3.1 Modernbûn û Kirûya Ziman

Di navbera ziman û neteweyê de pêwendiyê rasterast heye. Zimanê neteweyî, di gelek biwaran, di biwara ekonomî, çandî, perwerdehî û di biwarên dî de kartêka xwe li ser raman û hestên hevpar ên endamên neteweyê dike. Di heman demê de zimanê neteweyekê, hilgir û veguhêzkerê çand û dîrok û mît û nerît û kelepûra neteweyekê ye. Her wiha, ziman; kirûyek e ku hemû awa û dirûvên civakê dihewîne di xwe de û her tim kartêkker û jiyaniye.

Ziman sîstemeke sembolan e ku bi awayekî hişberî hatiye cîbicîanîn û pê re jî bûye kirûyeke civakî. Her mirov bi rêya zimên hest û ramanên xwe radigihîne mirovekî dî. Her wiha, tevî ku biryardan, bikaranîna aqil û karîn û gevila berawirdkirinê kargîna ramînê ye jî ev demajo û pêkanî ji zimên ne bêrî û ne dûr in.

Albert Einstein di vî warî de wiha dibêje: “(...) Beşeke ji agahî û baweriyên me, bi rêya zimanekî ku kesên dî wî diafirînin û em wî dîsan bi rêya kesên dî dikin e xwe. Heke ziman nebûya û hêza aqilê me bi ajalan ve bihata berawirdkirin, dê pir nizm û kêmast bimaya” (Özakıncı, 1998: 111). Einstein di vê destnîşankirina xwe de, amaje bi hêza aqil û ramîna mirovan dike ku ew jî bi gotina Humboldt, bi rêya zimên pêk tê û bala me li ser pêwendiya di navbera aqil û ziman de heyî dihêle. Humboldt dibêje, “(...) Ziman ramanê diafirîne” (Akarsu, 1995: 27). Nexwe em dikarin bêjin,

pêwendiyê neyînnekir heye di navbera ziman, aqil û hişî de; her wekî ku Leibniz dibêje, “(...) Ziman awêneya hişî ye” (Akarsu, 1995: 27). aqil û mirovbûn bêyî zimên pêk nayê; û bi rêya aqil û ziman jî ‘hiş’ û ‘hişnberiya’ mirovan ava dibe û mirov bi van hêmanan dibe mirov.

Em ji kîjan aliyê ve lê binêrin jî; te divê ji alî ranêzikiya rasyonelîteyê ve, te divê ji alî ranêzikiya pozîtîvîstî ve, te divê ji alî ranêzikiya teolojîk ve, hemû jî, li ser wate û girîngiya kirûya ziman disekin. Û aqil dibe sereke pêkanîna kargîna zimên. Loma jî, heke ramînek, avakirineke hizirî û pêkanîna wê hebe, teqez û bêguman ziman lê kargîna li dar e.

1.3.2 Ziman Di Çarçoveya Çand û Civakê De

Ziman ji bo jiyaneke civakî kirûyeke girîng e. Ne tenê pêwendî û danûstendina di navbera mirovan de saz dike, her wiha sereke merc e ji bo mirovan da ku karibin tev li jiyana civakî bibin. Heke em bala xwe bidin em ê karibin bi rihetî bibînin ku di jiyana mirovan a siyasî, di perwerdebûna mirovan, di hînbûna nirxên mirovan a çandî, di endamiya mirovan a komekê û di derbirana mirovî a hest û ramanên xwe de ziman sereke hokar e û her wiha stûna avakar e di jiyana mirovan de.

Em dikarin bêjin, piştî modernbûnê û piştî avabûna îdeolojiya neteweparêziyê hatiye famkirin ku modernbûna tu civakekê û –ji bilî Fransa, Îngilistan û Almanyayê-, neteweparêziya tu neteweyan rengê xwe nadin hev. Loma jî her wekî E. Sapir dibêje, “Ji ber ku her ziman rasteqîna civakê ji aliyekî cuda ve vedibeyîne û dide der, cîhan û jiyana civakan jî ji hev cuda ye” (Aygül, 2008: 72) reng û awayê zimanê her civakan jî ji hev cuda ye. Ji ber hindê ye ku reftara zimanî a civakekê parçeyekî jiyana wê civakê ye jî.

Ziman wekî kirûyeke civakî û wekî parçeyekî jiyana civakê, rasterast bi çandê ve jî pêwendîdar e. Tew em dikarin bêjin, hêmana wê a sereke ye jî. Ji ber ku ziman taybetiya herî girîng a mirov û civakan e. Nirxên civak û mirovan, dîrok û kelepûr û nerîtên civakan, pêkanînen mirov û civakan, wek modelekê, bi rêya gotinan û bi saya serê wan, di nav zimên de dihewin; û bi wan gotinan jî, ziman ji nifşekî vediguhêze nifşekî dî.

Heta serdema modern a kapîtalîst ku çapxane û belavkirina deq û berhemên nivîskî a bi awayekî gelemperî dest pê kiriye û rûniştiye. Veguhastina ku em çêla wê dikin, heta wan serdeman bi awayekî gotinkî û devkî domandiye. Çendî ku nivîs hebûye jî ji ber tunebûna çapkirin û belavkirineke girseyî û berbelav, ev yek her û her dorteng maye. Maurice Duverger jî dibêje, “Heke çand bi zimên afirîbe, zengîniya wê jî bi nivîsê çêbûye” (Duverger, 1998: 96-97). Heke em bidin ber çavên xwe ku zimanê nivîsînê bi rêya perwerdehiyê tê veguhastin, hingê em dikarin bêjin, nivîs bi awayekî ji awayan çandê jî berbiçavtir dike. Ev berbiçavbûna hanê, di îdeolojiya neteweparêzî û bi taybetî di pêkanîna dewletên neteweyî de, zimanê hevpar wekî divêtîyekê derdixîne holê. Ji ber ku ji bo pêkhatina îdeolojiya homojenîparêz û yekrengkirinê, perwerdehiyêke bi yekzimanî pêwîst dike. Loma jî her wekî W. Porzig jî destnîşan dike û dibêje, “Hevzimanî tê wê wateyê ku mirov hevcîhan in jî” (Porzig, 1974: 54). Ev hevcîhanî, hem di warê ramîna di der heqê xwe de hem jî di warê ramîn û hestpêkirina der heqê neteweya xwe de cîbicî tê. Her wiha Porzig wiha didomîne gotina xwe, “Ji ber ku heman tişt kartêkê heman neteweyê dike, di her zimanî de dinyabîniyêke taybet heye” (Porzig, 1974: 54).

Em bi vê dîtîne digihîjin wê encam û dîtîne ku; çanda her neteweyê, awayê ramîna her neteweyê û digel vê jî îdeolojiya neteweparêziya her neteweyê û pê re jî dinyabîniya wê arizî xwe û taybet e. Jixwe armanca sereke a neteweparêzan jî avakirina vê dinyabîniyê ye. Lê belê ev armanc û ramîna vê armancê têr nake; ji ber ku bêjarek pêwîst e ji bo danfamkirin, berbelavkirin û gihandina bo armancê. Di vê qonaxê de, neteweparêz û îdeolojiya neteweparêziyê, di ser hevpariya çandê, di ser hevpariya dîrokê, di ser nerît û kelepûrê re awayekî gotinê, yanî bêjara neteweparêziyê, ava dikin û ji bo pêkhatin û biencambûna armancê, zimanê hevpar hem wekî hokarek hem jî wekî navgînekê bi kar tînin; û bi rêya zimanê hevpar ê nivîskî û devkî bêjara neteweparêziyê ava dikin.

1.3.3 Zimanê Neteweyî Di Demajoya Avakirina Neteweyê De

Ziman ew hokar e ku di jiyana me a civakî, di famkirina me a dinyayê de cîyekî xwe î girîng heye. Ziman, di avakirina yekîtiya neteweyî de ku ji alî dewletên neteweyî ve hewl tê dayîn ku bi yekzimanî, an jî bi zimanekî hevpar were avakirin,

di biwara pênasikirina zanava neteweyî de jî dibe navgîneke girîng û kartêkker. Ji ber ku ziman di veguhastina çandê a bo nifşên siberojê de navgîna sereke ye. Loma jî ne gengaz e ku di demajoya avakirina yekîtiya neteweyî de hêza yekker û pêkhêner a kirûyeke wekî zimên were neyînkirin.

“Netewe, bi taybetî ketine bin bandora neteweparêziya romantîk a Almanan û piştî ku serbixwebûna xwe bi dest xistine an jî di demajoya netewebûnê de, hewl dane ku yekîtiya xwe a neteweyî li ser ‘ziman, çand û dîrok’ê ava bikin” (Aygül, 2008: 74). Sedema vê yekê jî ew e ku; ev her sê hêman, di civakê de hevpar in; yanî di neteweyekê de dîrokek, çandek û zimanekî hevpar heye. Helbet ev yek pêkanîna “neteweparêziya çandî” ye ku wekî ku berê jî me rave kiribû, ranêzikiyeke etno-sembolîst dihewîne di xwe de.

Herder ku dibêje, “Tiştê ku mirov dike mirov, ziman e. Di heman demê de raman e jî. Mirovbûn ew wate ye ku zimanekî te heye û tu di civakê de dijî” (Özkırımlı, 1999: 34). Herder, li vê derê di ser arîşeya hebûniyê, di ser hebûniya mirovî re ziman gengeşe dike; ziman li xwe dike palder û hebûna mirovî rave dike. Digel vê yekê jî em dikarin bêjin ku ziman bi vê palderiya xwe ve mirovî di nav çandekê, di nav neteweyekê de jî heyî dike. Yanî kirûya ziman, bi kartêk û kargîniya hebûna xwe ve xwebûniya mirovî jî ava dike. Herder di raveya xwe de pê de diçe û dibêje, “Her ziman ji ê dî cuda ye, xweserî xwe ye. Ev jî tê wê wateyê ku her civak xwedî awayekî ramîn û hizirînê ye. Helbet ev mantiq ne tenê ji bo ziman, ji bo nerî û adet û delindêz û qanûnan jî têbor û li dar e ku her yek di warê xwe de zimanek e. Mirovên ku bi zimanekî hevpar diaxivin yekem qonaxa neteweyê pêk tînin. Herçî netewe ye, mirov dikare wê wekî dûvelanka xwezayî a malbatê bihesibîne. Ji ber ku tof û grupa herî biçûk ku ziman tê de tê parvekirin, malbat e” (Özkırımlı, 1999: 34). Bi guhdana li Herder em dikarin bêjin ku; çendî ku raman û îdeolojî di avakirina neteweyê de hokarên sereke ne jî, gava em ji alî jêderka ramanê ve bidin ser rê, em ê karibin bêjin, ziman bi afirandina ramana neteweparêziyê û wekî qada pêkanîna bêjara wê, car dî dibe hêmaneke bivênevê. Û her wiha, çendî ku ev jêkvebûn piştî şoreşa Fransîz û şoreşa endustriyê xuyanîtir bûbe jî, wekî jêderk netewe û sedemên peydebûna wê, bi riwangeya zimanî, digihîje malbatê. Herder ravekirina xwe a li ser zimên didomîne û dibêje, “Gelo ji bo neteweyekê, tiştêkî ji zimên hêjatir û giranbihatir heye ku ji bavûkalê wê maye jê re? Di nava zimên de, hemû nerî û

kelepûr, dîrok, ol û rêgezên hebûn (û xwebûniyê) dijîn; ziman dil û giyan e” (Özkırmılı, 1999: 15). Herder, mîna ku hemû îdeolojî û ramanên li ser neteweparêziyê serûbinê hev bike, hewl dide ku malbat û zimanê ku malbat pê diaxive bike jêderk û sedema sereke a hebûn û avabûna neteweyê. Loma jî di vê qonax û di vî warî de, ziman paldereke girîng û xurt e ji bo neteweparêziya çandî û pê re jî ji bo ramana etno-sembolîst. Loma jî Fichte jî ji aliyekî dî ve berê xwe didiyê û dibêje, “Ziman giyanê neteweyî vedibeyîne” (Özkırmılı, 1999: 35) û bi vî awayî di warê avakirina hestê hevpar ê neteweyî de balê dibe ser zimên û rol û para zêde dide ziman.

Ziman ji bo yekîtiya neteweyî û zanava neteweyî hêmana hîmî û a herî girîng e. Heke em netewe û neteweparêziyê wekî kirûyeke modern qebûl bikin, em dikarin bêjin ji bo modernbûna neteweyekê avakirina zimanekî hevpar î neteweyî tiştêkî bivênevê ye. Ji ber ku modernbûn, her wekî me berê jî destnîşan kiribû, hem wekî ramanî hem wekî siyasî hem civakî û hem jî çandî hemû qad û biwara jiyanê dihewîne di xwe de. Ji ber vê yekê ye ku çendî ku ziman ne tekane hêman be jî di avakirina netewe û ramana neteweyî de, hemû gel û netewe di demajoya netewebûnê de ji bo avakirina zimanê hevpar î neteweyî xebitîne û polîtîkayên xwe jî li ser vê yekê meşandine.

Digel vê jî, nivîsîna bi heman zimanî, tomar kirina dîrokê a bi heman zimanî, avakirina siberojê a bi heman zimanî û her wiha perwerdehiya bi heman zimanî ku çanda ku bi kelepûrê gihîştîye îroyîna neteweyekê, dike çandê domdar û zindî, di demajoya avakirina netewe û zimanekî hevpar î neteweyî de armancên îdeolojiyên neteweparêziyê ne.

1.3.4 Hestê Xwejêzanîne: Zanav û Ziman

Di demajoya avakirina zanava neteweyî de, têgihên ‘em’ û ‘dîke’ bi rolên girîng û bi kartkêk radibin. Ji ber ku hestê jineteweyêbûnê, di ser famkirin û têgihên ‘em’ û ‘dîke’ re ava dibe. Îmajên ‘em’ û ‘dîke’ di heman demê de hêmaya “dijmin” jî ava dike. Ê ev yek bi rêya sembolan tê kirin ku simbol, digel rîtuêlan, di demajoya veafirandin û berhênanandinê de hêmanên diyarker in. Ê ev hêman, yanî simbol, ji şanekek an jî ji peyvekê pêk tên; û ji alî endamên civakekê ve pir bi hêsanî tên

famkirin ku endamên civakê nasyarê kod û nerît û adetên wê civakê ne. Ev famkirin dike ku endam 'em'ê xwe ji endamên 'dîke'yê cuda bibînin û wisan hest bi xwe bikin. Ev dîtin û hestpêkirin, bi pênasikirina neteweyê re, li ba endaman dibe sedem û bingeha avabûna zanaveke neteweyî.

Zanavên neteweyî jî her tim bi gelemşeyeke "dîkebûn"ê re dilebikin û wekî berhênana têkiliya 'em' û 'dîke' heyî dibin. Ji bo ku 'em' a neteweyî hebe pêwîstî bi 'dîke'yekê heye. Ji aliyekî dî ve jî, wekî ku Guibernau dibêje, "Jêcudabûn, ji ber angaştê avakirina çandeke hevpar, girêdana bi axeke berbiçav û pêkanîna civakekê diqewime; û her du hêman jî di navbera endamên wê civakê û 'dîke' û "biyanan" de cihêtiyan çêdike" (Guibernau, 1997: 127). L. Palmer jî di vê der heqê de vê yekê destnîşan dike, "Tiştê ku piştê dide ramana jineteweyekêbûnê û zanava neteweyî car dî hildiberîne, ramana yektabûn û wekhevîbûnê ye" (Gökalp, 2007: 279-298). Her wiha, hem hestê jêcudabûn hem jî hestê xwejêzanîne, serê pêşîn ji xwe dest pê dike û wisan dide ser rê; û di wê rêwîtiyê de hay jê dibe ku têrî avakirina xwe nake. Hestê kêmmayîne bi xwe re hest û daxwaza temambûnê jî çêdike. Û tiştê ku 'em'ê kême û temamnabûyî dide hîskirin ne têrîxwenekirin e; tunebûna 'dîke'yekê ye. Loma jî 'dîke'yekê divê jê re. Ji ber ku 'em' bi kuşpenetiyê *yektabûnê* xwe li xwe dike palder, pê re jî şikek jî dihewîne di xwe de; loma jî pêwîstî pê dibîne ku di ser 'dîke'yekê re ji xwe fam bike û xwe ava bike; û jê û şûnde dikeve nakokiyê navxweyî. Êdî ji wê gavê û bi şûn de her tişt li hev digere; 'em'ek heye li rastê ku nikare xwe heyî bike û pêwîstiya wê bi 'dîke'yekê heye; 'dîke' bûye sedema "hebûn" û "xwebûna" wê. Jê re dîkeyekê divê. Heke ew dîke ne li ser sifreya hazir be jî ew ê bi awayekî ji awayan wê biafirîne. An na dê hebûna wê jî bibe mijara gengeşiyê. Êdî 'em' ketiye nav arîşedariya "hebûniyê" ku wekhevîbûn jî tê geriyaye.

Hobsbawm bala me dibe serê û dibêje, "Di bingeha avabûna ramana neteweparêziyê de, her tim kes û civak hene ku bîza wan "ji me" diçe û ew her tim li hember me "komplo" li dar dixin." (Hobsbawm, 1995: 205). Balibar jî balê dibe ser paradoksekê û wiha dibêje, "Netewe bi wateya siyasî beranberî civakeke ye ku hema bêje bi temamî neban bûye. Ji ber ku hem warekê tê aşopkirin ku her endamek neteweyê dê tê de bi rihetî bijî û hem jî tim û tim tê kifşkirin ku dijmin di nava wî warî de ye, bi dijminên derveyî re li hev kiriye û dixwaze warê "me" birûxîne; loma jî ew war li xwediyên dibe dogeh" (Balibar û Wallerstein, 1991: 254-269). Di vê

qonaxê û di ronîdariya van ramanan de, em dikarin bêjin ku ev raman û dîtînên ku ji bo avakirina neteweyekê û zanaveke neteweyî tîr afirandin, bêguman bi ziman, yanê bi zimanekî hevpar tê derbirandin;. Û ji vê û şûnde me divê em bala xwe bibin ser zimanê hevpar ku bi rol û kartêkeke girîng û mezin radibe di vî warî de.

Bêguman, tiştê ku herî baş û herî xurt zanava neteweyî ava dike, ziman e. Ji ber ku di danûstendinên herî biçûk ên rojane de jî jihevcudabûna du zimanan xwe pir aşkera dide der. Wekî me berê jî gotibû, dibe ku ziman car caran bibe tiştê yekta ku neteweyê dike netewe. Schleicher wiha dibêje, “Divê mirov dirûvê qoqê mirovan, rengê poran û xuyangên derveyî ji bo diyarkirina nîjad û neteweyan neke pîvan ji ber ku ev ne tiştên westar û neguher in; ji bo vê jihevcihêkirinê divê ziman wek pîvan û bingeh were qebûl kirin” (Akarsu, 1995: 27). Çendî ku ne pîvaneke sereke ye jî, helbet roleke girîng û diyarker a ziman heye di çêbûna xwejêhîskirin û jîneteweyêbûnê de; û her wiha xwejêcudahîskirinê de. Helbet ji ber ku ziman dikare were hînkirin, di demajoya pênasekirina zanava neteweyî de derpêşî civakê tê kirin. Ev demajoya hînkirinê jî perwerdehiya bi zimanê hevpar pêk tê. Û “(...) Hatiye famkirin ku perwerdehiya hevpar hem pêgirtîtiya neteweyî û hem jî biyekbûna hevvelatîyan xurttir dike. Bi vê yekê re, hem hestên neteweyî xurttir bûne hem jî hevbendiyên monarşîk ên gerdîşî hatine jîbîr kirin” (Sadoğlu, 2003: 22-23).

Hobsbawm meylê dike ku “netewe”yê wekî avakirineke sosyal qebûl bike. Li gorî wî netewe berhemeke “endezyariya civakî” ye. Loma jî dîtina xwe a li ser gotina xwe a “gerdîşên dahênandî” wiha dibêje; “Gerdîşên dahênandî, koma çalakî û pratîkan e ku ji alî qaydeyên aşkera an jî nepen ve tîr birêvebirin û xwedî taybetiyeke sembolk an jî rîtuêlî ne û mîna ku xwezayî bin li ser dubarekirinan bi hev disekin û hin qalibên reftar û tevgerîne li ser kesan ferz dikin” (Hobsbawm, 2006: 11-18). Hobsbawm, gava di warê netewe û neteweparêziyê de, li ser çand û nerîte disekine, îşê xwe ji çanda hîmî û jêderkî nayîne ku ji gera dîrokê bi vir de ye, her hêmanên wê gav bi gav û bi demê re û bi qewamekê re hatiye avakirin. Îcar, tiştê ku em ji têgiha “gerdîşên dahênandî” a Hobsbawm fam dikin ew e ku; “dewlet” –*li vir tiştê balkêş û girîng ew e ku pêkhateyeke bi navê dewlet merc e.*- ji bo ku hestê pêgirtîbûna bo “neteweyê” têxe nav û dilê endamên neteweyê û her kesî bi welat û bi alayê ve –*sembolên dahênandî*- bibestîne, dahênanan pêk tîne.

Di vê qonaxê de pirsêk wek arîşeyekê xwe dide der. Gelo gelekî (neteweyeke) dewleta xwe avanekirî, ne xwedî wan dahênanan e ku wekî ala, delindêz û sembolên etnîsît tên diyarkirin? Helbet, gel û netewe hene ku dewleta xwe dananîne û wekî civakeke etnîsît, xwedî ala, delindêzên olî û gerdîşî ne û di ser sembolên etnîk re pêgirtiyên hev û neteweya xwe ne. Digel vê yekê jî, pirsêke dîtir xwe li me ferz dike. Gelo nerît û gerdîşên heyî nikarin bi rola van “gerdîşên dahêrandî” rabin û bibin sedem û hokara netewebûn û avakirina dewleta neteweyî? Gotina “gengaz e”, wekî bersiva herî beraqil a vê pirsê xuya dike ji ber ku neteweya Almanan, -çendî ku yek ji wan her sê neteweyan e ku di ser sîstem û rabûna kapîtalîzmê re demajoya xwe a netewebûn û avakirina dewleta neteweyî û temam kiriye jî- dewleta neteweyî a Almanan wek dewletekê tê zanîn ku di ser “neteweparêziya çandî” re ava bûye. Loma jî civakên etnîsît ên ku di modernbûna kapîtalîst de dereng mane –an jî di vî warî de bi ser neketine- ji bo avakirina yekîtiya xwe a neteweyî bêtir li ser çand û dîrok û ziman dimînin û xebatên xwe ên avakirinê li ser vê yekê dimeşînin.

1.3.5 Zimanê Neteweyî

Modernite ji bo derbirana xwe hewceyî zimanekî, hewceyî derbiraneke nû bû. Loma jî di demajoya famkirin û sepandina moderniyê de, di navbera ziman û modernûnê de pêwendiyê rasterast pêk hat. Bi taybetî piştî demajoya Ronakbûnê ramanên ku di warê perwerdehiyê de afirîn, kir ku hewldana zimanê hevpar î perwerdehiyê *-em dikarin bêjin zimanê ku girse jî jê fam dike-* li dar bikeve. Loma jî piştî qonaxa pêkanînê neteweparêziyê û avabûna dewletên neteweyî, ji bo homojenî û yekrengiyê û ji bo awayê derbiraneke yekreng, di warê leşkerî, ekonomî û perwerdehiyê de hewcetî hat dîtin ku zimanekî neteweyî (an jî zimanekî ku neteweya afirandî jê fam bike) bê avakirin. Ev yek, li hin welatên wekî Almanayê, li ser ramana “neteweparêziya çandî” hat pêkanîn ku gelek hêmanên ranêzikiya etno-sembolîst di xwe de dihewand; li welatekî wekî Fransayê jî dev ji zimanekî wekî Latînî ku zimanê olî bû hat berdan; li hin welatên wekî Tirkiyeyê jî, zimanê ku bi mirinê re rû bi rû mabû -Tirkiya saf ku tenê li gundan dihat axaftin- hat zindîkirin û

bi xebatên arkeolojîk ên zimanzaniyê û folklorê hat geşkirin; û ew ziman bûn zimanê neteweyî ên dewletên neteweyî.

“Çendî ku ziman her tim nûnerê jê cudabûnekê ye jî, berî sedsala 18. û piştî wê heyamê wekî cudahiyeke neteweyî hatiye kodkirin” (Aktoprak, 2009: 181-182). Pearton jî destnîşan dike û dibêje, “Heke em di ser ziman û çand re bidin ser rê em ê bibînin ku neteweparêzî ji salên 1870yê heta sala 1914an bi bayê bezê geşe daye xwe û bi pêş ketiye” (Yıldırım, 2014: 29). Nexwe, em dikarin bêjin ziman di sedsala 18. de bi roleke diyarker rabûye. Vî rengê diyarkeriyê kiriye ku digel pêkanînen siyasî û leşkerî, zaltiyeye ziman çêbibe li ser rengûawayê geşedana ramana neteweparêziyê. Û hemin ku raman bêyî ziman heyî nabe û ziman di heman demê de sîstem û şixulîna navxweyî a ramanê jî bikevê dike, awayê derbirana ramanê jî li vir mijara behskirinê ye. Û ji hêleke dî ve jî girîng e ku em li serê bisekinin ka ev raman di hişberiyeye bi çî rengî de û bi bêjareke çawan şênber dibe. Aktoprak li ser vê yekê dibêje, “Di serdema navîn de, bes çînekê awayê zimanê nivîskî dizane û zimanê ku tê bikaranîn jî wekî zimanê wê çînekê bi pêş dikeve. Di wê çaxê de zimanê rêveber û rayedaran -*û xwendeyan*- ji zimanê gel cuda ye û ev yek ne xem e ji wan re, ji ber ku ew ziman di heman demê de heman û navgîneke desthilat û hikumkirinê ye jî. Û di vê serdemê de tu kesî neaniye ser hişê xwe ku di ser cudatiya zimanî re şer û têkoşînê bike.” (Aktoprak, 2009: 181-182).

Di vê çarçoveyê de Hobsbawm, li welatên wekî Fransa û Îngilistanê ku dewletên neteweyî ên pêşî ne, rola zimên daye ber çerxa gengeşiyê û destnîşan kiriye ku “Gava ev dewlet ava dibûn hejmareke hindik ji gel bi wî ‘zimanê neteweyî’ dizanibû û çî gava zaravayek di warê siyasî, ekonomîk û perwerdehiya bêgavî de zaltiya xwe daniye rastê, hingê zimanê neteweyî ava bûye” (Yıldırım, 2014: 29). Bi vê dîtina Hobsbawm re pêwendîdar, Andersonê ku neteweparêziyê wekî “xeyalkirî” û “dahênandî” qebûl dike, dibêje, “Heke em li ser roman û rojnameyên ku di sedsala 18. de li Ewrûpayê hatine çapkirin bisekinin em ê bibînin ku zimanê weşanê zimanê neteweyî bi pêş dixê û ev ziman berhema hevpar a entellektuelên sedsala 19. û kapîtalîzmê ye” (Anderson, 1995: 21).

Her dewleta neteweyî gava neteweyê ava dike, ji bo ku homojenî û yekrengiyê saz bike, dest di zimên werdide. Dixwaze zimên beralî bike û tew jê wêdetir jî diçe û dixwaze zimên ji nû ve biafirîne û teşeyekê bidiyê. Ji bo vê yekê jî

serî li gelek rêbazan dide da ku her kesîde, her endamê neteweyê bi zimanê neteweyî biaxive. Her wiha ziman hem dê bibe navgîna afirandina jorzanavekê û hem jî dê kesên ku bi rê ve dibin û kesên ku tên birêvebirin heman zimanî biaxivin û kartêka jihev cudaker a zimên jî ji holê rabe. Bi saya vî zimanî hevpar, dîrokeke hevpar tê berhênandin û bi vî awayî borîroj û siberoj bi hev ve tên bestandin. Û wêje, pêşî dibe navgînek ji bo geşedana wî zimanî û pê re jî dibe yek ji semboleke wê neteweyê.

Ji hêla dî ve, Clemens Menze diyar dike ku “Humboldt zimên wekî fenomenek dibîne ku dikare ji sê aliyan ve li ser were sekinandin. Li gorî Humboldt, a yekem, “ziman dixwedanderek e”, a duyem “ziman belgeyek e ku jineteweyêbûna mirovî diyar dike” û a sêyem jî “ziman taybetiyek e ku mirovî dike mirov” (Kılıç, 2010: 43) Humboldt pê re jî destnîşan dike ku “Ziman ne berhemeke çalakiyê ye, ew derçûna bêhemd a giyên e” (Kılıç, 2010: 45). Encama ku serê pêşîn ji vê peytê derdikeve ev e; em xweşîkî hay jê dibin ku di navbera ziman û hêza giyan de pêwendiyêke xurt heye ku mirov dê zû bi zû nikaribe wê rave û şîrove bike. Hemin ku her mirov xwedî hêzeke giyanî ye û ev hêza giyanî bi reng û awayê xwe ê taybet xwe dide der, nexwe di navbera ziman û mirovan de pêwendiyêke jêderkî û navendî heye. Loma jî Humboldt dibêje, “Ziman ne tiştêkî derveyîn e ku pê sohbet tê kirin, berevajîya wê ziman; ji bo pêşketina hêzên ku di xwezaya mirovan de heye û ji bo avakirina dinyabîniyekê tiştêkî jênager e” (Kılıç, 2010: 45). Gava em di ser hêza zimên re bala xwe didin Humboldt, em dibînin ku mirovek ji ber ku xwedî gevila axaftinê ye zimanekî wî heye. Lê belê ev ziman bes ne ji bo sohbet û pêaxaftinê ye; helbet ew ji bo afirandin û ramîn û avakirina dinyabîniyekê hevpar e jî. Û ev hêz, di çarçoveya zimanên neteweyî de li kar û li dar e.

Digel ku zimanê neteweyî xwedî qalibek e û ev qalib bi rengê xwe î cuda hayjêbûna jêcûdabûnê zêdetir dike jî, tiştê ku di hîma hişberiya vê jêcûdabûnê de cî li xwe xweş kiriye, ziman e. Loma jî Humboldt dibêje, “(...) Karaktereke zimanan heye, her wiha cudatiya neteweyê bi rêya gerdîş û nerît û adet û kirin û banekî û pêkanînan nayê zanîn, lê belê bi rêya zimên tê zanîn. (...) Ziman xuyanga derveyîn a neteweyan e. Zimanê neteweyan giyanê wan e, giyanê wan jî zimanê wan e” (Akarsu, 1995: 52). Humboldt ku zimên wekî “jêdandera bêhemd a giyên” pênase dike, tundiya vê jêdanderê jî, yanî tundiya hêza giyên jî li zimên bar dike; û zimên dike diyarkerê rengûawayê giyên. Loma jî, ziman ji hêlekê ve jî awêneya giyan e û

kartêka hêza giyan ku di kêliya jêdanderê de çêdibe, li ziman dibe rengêkî taybet û xuyanga jêcudabûnê. Ji aliyekî dî ve, Kılıç destnîşan dike û dibêje, “Ji ber ku di navbera ziman û ramanê de pêwendiyê jevneqet heye, ev yek ji alî rengûawayê raman, dinyabînî û zanava neteweyî ve roleke navendî dispêre ziman. (...) Mirovên ku bi heman zimanî diaxivin, ji bo ku dengên ku tên bilêvkirin bikin derbirana ramanan, heman navgîna zimanî bi kar tînin û ji ber hindê jî em dikarin bêjin ku ew xwedî raman û dinyabîniyê hevpar in” (Kılıç, 2010: 49).

Ev dîtîna û ravekirin, zimên hildide û dibe datîna navenda pêwendiya ku di navbera ziman û neteweyê de heye. Ji ber vê hevpariya ku Kılıç rave dike, ramana neteweparêziyê ji bêgavî zimên dike navenda ramana xwe û bêjara xwe li gorî wê ava dike; da ku karibe zimanekî neteweyî ê yekreng ava û berbelav bike. Her wiha, Humboldt jî dibêje, “Li vê derê yekrengiyê neteweyî behsê mijarê ye ku dora endamên neteweyekê bi sînor kiriye û ev yek awayê pêjnîkirina neteweyekê ji awayê pêjnîkirina neteweyê dîtir cuda dike. Karaktera neteweyekê bi vê arizîxwebûnê û bi vê hêza likarxist zindî û bergewde dibe. Ji ber ku netewe xweserî xwe ye, ziman jî dibe xwedî xweserîxwebûnê; û ziman bi qasî ku karibe yekrengiyê pêk bîne, kartêkê li neteweyê dike” (Akarsu, 1995: 59). Lê belê Humboldt yekrengiyê ji bo pêkhatina vê yekê têr û bes nabîne û roleke dîtir li zimên bar dike ku ew jî danîna pêwendiya borîroj û siberojê ye. Humboldt vê pêwendiyê pir bi zelalî rave dike û wiha dibêje, “Mirov di nav zimên de pir bi geşî û aşkera seh dike û hest pê dike ka borîroja dûr çawan bi hestê dema niha ve vebestî ye. Ji lew re jî ziman di nav ajar û pêjn û dilînên kevn re bihuriye ku bêhn û hilma wan hê jî li ser zimên e; û ev ajar, di dengê zimanê dayîkê de, -ev deng dengê dilînên me ne- bi awayekî neteweyî û malbatî dibin lêzimên me” (Kılıç, 2010: 50).

Di vê rewşê de em ê karibin bêjin ku; ziman ji borîrojê bîrek ava dike; borîrojê dixwe nava wê bîrê û bi xwe re tîne dema niha û ev bîra hanê –ku em wê wekî bîra dîrokê bi nav dikin- bi mirovên ku bi heman zimanî diaxivin re hestê zanava hevpar çêdike. Her wiha em dikarin bêjin, hemin ku zimanê neteweyî, *-di borîroja dûr de zimanê qewmî, etnîsî û bavîkî-* kariye bîra borîrojê bigihîne roja îroyîn, nexwe zimanê hevpar ê roja îroyîn jî, *-bi tevî jihev cudatîyên kesîdeyî jî-* dê karibe heman bîrê, digel hêmanên ku tev li wê bûne, bigihîjîne siberojê; û zimanê hevpar ji aliyekî ve jî dibe misogeriya yekrengiya neteweyî ku dê li siberojê bê veguhastin.

2. JÊDERKÊN NETEWEPARÊZIYA KURD

Ji ber ku civaka Kurd civakeke bergirtî bûye, endamên wê karibûne awayê xwe î gerdîşî bihêvişînin û taybetiyên xwe ên etnîkî biparêzin. Helbet ev awayê jiyînê ê Kurdan di dema Împaratoriya Osmanî de jî li dar bûye. Wekî nas e, ji ber ku di nav Împaratoriya Osmanî de gelek civakên etnîk û olî hebûne; û ev civak wekî civakên etnîkî mane, ev yek bûye sedemeke dîtir ku Kurd karibin awa û rengê xwe î etnîkî û gerdîşî biparêzin. Loma jî, eşîrbûna Kurdan û ji aliyekî ve jî çiyayîbûna cografyaya Kurdan kiriye ku vê jiyana bergirtî û adetî di hundirê xwe de xurttir bibe û her bidome. Vî awayê jiyânê ê bergirtî digel ku Kurd ji gelek aliyan ve parastine jî kiriye ku ji gelek pêşketinên dinyayê jî dûr bimînin û dem jî nikaribe kartêkê li wan bike. Vê yekê encamên negatîv jî bi xwe re anîne. Yek ji wan encaman ew e ku civaka Kurd ji alî xwendewariyê ve ji asta civakên dîtir ên dinyayê şûndetir mane û raman û pêşketin û guherînên jiyânî rengê xwe nedaye wan. Loma jî, hem wek awayê jiyânê hem jî wek jiyîna bi yekrengî, her û her ji hev dûr û parçeparçeyî mane.

2.1 Serîhildanên Di Dema Osmaniyan De (1840-1923)

2.1.1 Serîhildana Mîr Bedirxan Beg

Di dema Tanzimatê de gelek guherîn di Dewleta Osmanî de li dar dikevin. Yek ji van guherînan navendîkirina dewletê ye. Di vê demê de mîrekiya Botan yek ji wan mîrekiyan e ku xurt e. Mîr Bedirxan Beg serokê vê mîrekiyê ye. “Mîr Bedirxan, pêşî dixwaze navbera xwe û dewletê xweş bigire. Loma jî digel dewleta Osmanî dikeve şerê li dijî waliyê Misrê M. Ali Paşa. Lê dewleta Osmanî di vî şerî de têk diçe û gelek qels dikeve. Mîr Bedirxan jî gelek leşkerên xwe di vî şerî de winda dike” (Ramzî, 2007: 12). Û ji wê demê û şûnde têkiliya Kurd û Dewleta Osmaniyan her ku diçe xerabtir dibe û her du hêz dikevin ber pozê hev. Digel vê yekê, Mîr Bedirxan dixwaze serdestiya xwe li herêma Kurdan xurttir bike û li dijî siyaseta navendîkirinê a osmanî, bi serê xwe tevdigere. “Di sala 1842an de serbixwetiya xwe dadixuyîne. Ji herêmên Kurdan şervanan kom dike û ji wan artêşek ava dike. Li ser navê xwe xutbe dide xwendin. Di nava mîrê Hekarî, Wan, Hîzan, Mûş, Qers û

Erdelanê de jî aştî û yekîtiyek pêk tîne. Li ser navê xwe pere dide çapkirin. Û mîna rêveberiyê serbixwe tevdigere. Di vê navberê de, Nastûriyan li hember rêveberiya hişk a Mîr Bedirxan serî hildidin. Bedirxan, ji aliyekî ve bi vê serhildanê re têdikoşe ji aliyê dî ve jî bi dewleta Osmanî re şer dîke” (Ramzî, 2007: 14). Di dawiyê de, di 20ê Tîrmeha sala 1847an de li hember Dewleta Osmanî têk diçe û sirgûnî girava Gîrîtê tê kirin. Mîr Bedirxan, di sala 1866an de ji alî Dewleta Osmanîyan ve tê efûkirin û vedigere Stenbolê. Di heman salê de diçe Şamê û heta mirina xwe li wir dimîne.

2.1.2 Serhildana Şêx Ubeydullah

Sedsala 19. ji alî Osmanîyan ve bi temamî serûbinêhevbinêk bi xwe re aniye. A rastî ev yek di vê heyamê de ji bo Kurdan jî têbor e. Tevî ku Kurd heta sedsala 19. bi otonomiyeke diyar û binavkirî di nava Dewleta Osmanî de dijiyan jî, her tiştî ji wê çaxê û şûnde hêdî hêdî guheriye. “Di wê heyamê de, dewleta Osmanî polîtîkayên navendîkirinê meşandiye; û statûya otonom a herêmên Kurdan jî hatiye rûxandin. Û wekî encama vê pêkanîne, valahiyeke xwedîdariyê (otorîteyê) çêbûye” (Bruinessen, 2011: 143).

Piştî ku Mîrtiya Botan ku dawîntirîn mîrtiya Kurdan e, di sala 1860î de têk dişikê û Emîr Bedirxan Beg sirgûnî girava Gîrîtê tê kirin, Mîrtiya Kurdistanê û otonombûna rêveberî û jiyana Kurdan bi dawî dibe. Ev bidawîbûn dibe sedem ku li Kurdistanê aktorên nûtir derkevin holê. Ev aktor, şêxên Kurdan in. Wê hingê şêx, di nav civatê de ew kes in ku gel pir zêde giramgirî nîşanî wan dide û pêgirtiyê wan e. Loma jî, “Piştî şikênandina desthilatiya mîrtiyê, şêx di civaka Kurdan û di polîtîkaya herêmî û navxweyî de dibin xwedî gotin. Ji vê demê û bi şûn de, li şûna mîrtiyan ku heta 1860î wekî desthilatiyekê domandiye û hebûn û dîroka Kurdan veguhezandiye, şêxên Kurdan vê peywira hanê didin ser milê xwe. Şêx Ubeydullah di van helûmercan de dibe serokê terîqa Nexşebendî û bi taybetî li herêmên wekî Botan, Behdînan, Hekariyan û Erdelanê kartêka xwe zêdetir dîke” (Akpınar, Bilir ve Sebüktegin, 2006: 14).

Piştî ku Dewleta Osmanî di şerê Rûsan de têk diçe, valahiyeke otorîteyê çêdibe û gotegot derdikeve ku dê Ermenî li herêmê delectekê deynin. Ev yek dibe

sedem ku ramana avakirina dewleteke Kurdistana Yekbûyî di serê şêx de geştir bibe. (Akpınar, Bilir ve Sebüktegin, 2006: 17). Şêx Ubeydullah di sala 1880yê de, serîhildanê pêşî li hember Îranê birêxistin dike. Piştî demeke kurt gelek dever dikevin destê wî. Lê Rûsyaya ku naxwaze li herêmê dewleteke Kurdan ava bibe, di ser serkeftina xwe a şerê Rûs û Osmanî re zextê li Osmaniyan dike. Jixwe Osmanî jî avabûna dewleta Kurdan naxwazin. Û ev her du hokar dibin sedem ku Dewleta Osmanî hişkîr û dijwartir berê xwe bide Kurdan. “Piştî demekê hêzên dewletê Şêx Ubeydullah diqefêlin û wek sirgûnî ew dişînin Mekkeyê. Şêx Ubeydullah di sala 1883yan de li Mekkeyê diçe ber rehma Xwedê” (Akpınar, Bilir ve Sebüktegin, 2006: 23).

Me divê em bêjin ku tevger û serîhildana Şêx Ubeydullah, wek raman, mîlada tevgera Kurd a neteweyî tê qebûlîkirin. Sedema vê qebûlê ew e; Şêx Ubeydullah di nava Kurdan de yekîtiyeke berfireh ava kiriye û wekî cara pêşî, wî bi vê tevger û yekîtiyê doz û qala Kurdistana Serbixwe kiriye.

2.1.3 Serîhildana Koçgîrî

Piştî ku dewleta Osmanî ji hikum ketiye û berî ku K.Tyê ava bibe, serîhildana Koçgîrî qewimiye. Her wiha ew dem, demeke têreborînê ye ku ji dema Osmaniyan berveyî dema K.Tyê diçe. Piştî şerê dinyayê ê yekemîn, Peymana Sewrê û Rêgezên Wilson, wekî gelek neteweyan, kartêkeke mezin û girîng li Kurdan jî kir. “Di meha Îlonê sala 1919an de, Alîşan Begê serokê eşîra Koçgîrî dîdariyek digel M. Kemal pêk tîne û pê dide zanîn ku ew li ser divêtiyên rêgezên Wilson ji bo Kurdistaneke otonom dixebitin” (Minorsky, 2008: 130). Di vê navberê de, Cemiyeta Te’alî a Kurdistan Baytar Nurî (Nurî Dêrsimî) dişîne Dêrsimê da ku rêxistinekê ava bike. Alîşan Beg û Nurî Dêrsimî digel hev rêxistinê ava dikin. Ji vê û şûnde armanca wan avakirina Dewleta Kurdistanê ye. Û ji bo pêkanîna vê armancê, “Di 6ê Adara sala 1921ê de serîhildan dest pê dike. Lê mixabin pir zêde nadome û di meha Pûşpera sala 1921ê de têk dişikê” (Minorsky, 2008: 136).

Tevgera Koçgîriyê wek yekem tevger tê zanîn ku di nav sînorên Tirkiyeyê de bi xwestek û armanceke avakirina Kurdistaneke otonom li ger û tevgerê ketiye.²

² *Wê hingê hê avakirina Komara Tirkiyeyê wek fermî û meşrû û di dinyayê de nehatiye daxuyandin.*

2.2. Serîhildanên Di Dema Komara Tirkiyeyê De (1923-1932)

2.2.1 Serîhildana Şêx Se'îd û Rêxistina Azadî

Di şerê dinyayê ê yekemîn û rizgarkirina Tirkiyeyê de Kurd û Tirk digel hev şer kirin. Yekem makezagona ku hate danîn, navendparêz bû. Di vê demajoya nû de, neteweparêziya Tirk di polîtîka û rêveberina dewletê de pir zêde kartêka xwe dide nîşan. Hikumeta Enqereyê piştî ku xelîfetiye radike, di sala 1924an de makezagonê ji nû ve dinivîse û di vê makezagonê de Kurd tînin neyînkirin. Bi ser de jî bi qanûna “Girtina Tekya û Zawayeyan” jî, medreseyan Kurdan, ku cî û biwara gihîştina xwende û rewşenbîr û zana û alimên Kurdan e, tînin girtin.

“Piştî peymanê Lozanê Kurd di hevdiînan de tînin bêkartêkkirin. Kurd jî di bin seroktiya Xalit Begê Cibrî de rêxistina Azadî ava dikin. Em dikarin bêjin, taybetiya sereke a rêxistina Azadî ew e ku li Stenbolê, yanî ne li derveyê sînorê etno-cografîka Kurdan, ava nebûye. Rêxistin di sala 1921ê de, li Erzerumê û jî alî serbazên Kurd ku di artêşa Osmanî de cî digirtin, tînin avakirin” (Minorsky û Thomas, 2008: 132.)

Endamên rêxistina Azadiyê piştî ku li ser sedem û encamên serkneketî ên tevger û serîhildanên berî xwe dinirxînin, digihîjin wê encamê ku; “Ew serîhildan û tevger bi giştî tevgerên herêmî ne. Loma jî biryar didin ku tevgera Azadiyê hemû Kurdistanê bihewîne di xwe de” (Çiçek, 2013: 35). Li gorî helûmercên jiyandî û çand û rengê jiyandî a wê demê, tekane hêza ku karibe li Kurdistanê civakê li dû xwe bimeşîne, hêza Şêxan e. Wek me berê jî gotibû, di wan heyaman de, hem wek otorîteya civakî şêx li pêş in û hem jî gel bi xwe zêde zêde giramgirî nîşanî wan dide û pêgirtiyê wan e. Loma jî biryar tînin dayîn ku Şêx bi kar û rol û peywireke sereke rabin di vê tevgerê de.

“Çalakiyên rêxistina Azadî heta havîna sala 1924an didome. Di 3 û 4ê Îlona 1924an de li Bêşebabê (Beytûşebab) diqulibe ser serîhildanekê. Lê mixabin ev serîhildan jî zû tîk dişikê” (Özsoy û Eriş, 2007: 122). Piştî serîhildana Bêşebabê operasyon tînin kirin û rêber û pêşengên rêxistina Azadiyê tînin girtin û rêxistin tûşî derbê giran tînin û jî hêza xwe dikeve. “Di 22’yê Çileyê Pêşîn a sala 1924an de, Xalit Begê Cibrî ji Şêx Se'îd dixwaze bila seroktî li rêxistin û tevgerê bike û serîhildanê

bide destpêkirin. Serhildana Şêx Seîd di 13ê Sibata 1925an de dest pê dika û di 15ê Nîsana 1925an de piştî ku Şêx Seîd dîl tê girtin, ev serhildan jî tîk dişikê” (Özsoy û Eriş, 2007: 137-202).

2.2.2 Serhildana Agirî û Rêxistina Xoybûnê

Xoybûn an jî bi navê xwe î dî, “Yekîtiya Neteweyî a Kurdistan” (Alakom, 1998: 19) girîngtirîn rêxistina siyasî a Kurdistan e ku di destpêka sedsala bîstemîn de ava bûye. Rêxistin di 5ê Cotmehê sala 1927an de hatiye avakirin û heta sala 1946an ava maye. Li gorî Rohat Alakom, “Çalakiyên rêxistina Xoybûnê ku berê xebat û çalakiyên wê bi alî Kurdistanî Tirkîyeyê ve ye, li Suriyeyê hatiye avakirin. Rêxistin du salan piştî têkşikîna serhildana Şêx Seîd tê avakirin û endam û kadroyên wê zêdetir ji Kurdên sirgûnî ku ji alî bakur hatine, pêk tê” (Alakom, 1998: 14). Rohat Alakom, ji riwangeyêke dîtir li vê rêxistinê dinêre û ji bilî aliyên wê ên siyasî, bala xwe dibe ser aliyê wê î modernîst û entellektuelî û wiha dibêje, “Rêxistina Xoybûnê pêkhatiya herî modern a tevger û neteweparêziya Kurd e. Loma jî piştî ku serhildana Agirî tîk dişikê, kadroyên Xoybûnê di biwara civakî û çandî de xebatan dimeşînin. Endamên Xoybûnê ji bo ku ramanên neteweparêz di nava gel de berbelav bibe, awayên dîtir ên têkoşînê dihêçînin. Ev heyama duyem, pir zêde tevkarî dika da ku ber û rehendên ramanî ên neteweparêziya Kurdistan berfirehtir bibe û bi pêş bikeve. Girîngiya ziman û dîrokê a di warê şiyarbûn û hişberbûna neteweyî de di van deman de tê famkirin. Di vê mijarê de, bi taybetî xebatên her sê birayan, Celadet, Kamîran û Sureya Bedirxan, hêjayî şabaş û pesnê ye. Kurd jî êdî bi awayekî micid li girîngiya kaxiz, qelem û ramanê dinêrin” (Alakom, 1998: 15-16).

Ji aliyekî dî ve jî di xalbenda duyem a armancên rêxistinê de wiha tê gotin; “2- Armanca rêxistinê ew e ku Kurdistanî ku di bin nîr û destê Tirkîyeyê de ye, rizgar bike û di nava sînoren xwe ên xwezayî û neteweyî de dewleteke Kurdistanê a serbixwe ava bike”³ (Alakom, 1998: 26). Ji aliyekî dî ve jî Alakom xwe dispêre Ahmet Abdurrahman Axa û rojnameya Armanca ku di sala 1989an de li Stockholmê derketiye û lîsta komîteya navendî a Xoybûnê dide zanîn. Li gorî Ahmet

³ *Me divê em balê bibin ser gotina “sînoren xwe ên xwezayî û neteweyî” ku amaje bi sînorekî terîtoriyal dika ku Kurd lê dijîn.*

Abdurrahman Axa ku tev li avakirina civîna Xoybûnê bûye, “Komîteya navendî ji van navan pêk tê: Celadet Bedirhan, Memduh Selim, Mehmet Şükrü Sekban, Haco Ağa, Ramanlı Emin, Ali Rıza, Mustafa Şahin, Bozan Şahin, Kerim Bey, Tefik Bey, Kamil Bey, Bedrettin Ağa, Liceli Fehmi” (Alakom, 1998: 30). Gava em bala xwe didin, bi taybetî sê kesan, C. Bedirhan, Memduh Selim Beg û M. Şukrî Sekban perwerdehiya xwe li Stenbolê kirine û di warê xwendefî û rewşenbîriyê de di asteke bilind de ne û bi taybetî Şükrü Sekban ku doxtor e, di nava avakarên KTTC û CHyê de ye. Û Alakom, xwe dispêre agahiyên lêkolînên wekî B. Nikitin, E. G. Elphinston, E. Franz û Nazmi Sevgen û dibêje, “Yekem serokê rêxistina Xoybûnê Celadet Bedirhan e” (Alakom, 1998: 57). Ev rewş bi me dide nîşan ka raman û îdeolojiya neteweparêziya Kurd di kîjan astê de ye û serhildana ku bi navê serhildana Agirî tê zanîn, wekî armanc li ser çî bingehê dimîne. Û li gorî agahiya ku Alakom dide, “Kesên wekî K.Cemil Paşa, E. Cemil Paşa, O. Sebri, Hasan Haco, Müküslü Hamza û Cegerxwîn tev li xebatên Xoybûnê dibin û di nav rêxistîna de peywirên girîng didin ser milê xwe” (Alakom, 1998: 49).

Di heyama dawî a serhildana Agirî de, hikumetên Tirk û Fransiz hevkarîyekê pêk tînin û hikumeta Fransiz serkêş û rewşenbîrên Kurdan sirgûnî Şamê dike. C. Bedirhan jî di nava van kesan de ye. Celadet li Şamê bi cî dibe û piştî ku ji Xoybûnê vediqete, li ser ziman û wêjeya Kurdî dest bi xebata xwe a sistematîk dike. Celadet, di sala 1932yan de li Şamê kovara Hawarê derdixîne. Alakom di vî warî de dibêje, “Kovara Hawarê, di navbera salên 1932-43yan de bi temamî 57 hejmar derket û di navbera Kurdan de dengê zêde û bilind veda. Gelek xizmetên wê ji bo geşedana ziman û wêjeya Kurdî çêbûn. Kovar di heman demê de bû ‘*ansiklopediya biçûk a Kurdan*’ û di vî warî de bû çavkaniya sereke” (Alakom, 1998: 38).

2.3 Tevgerên Rewşenbîriya Kurd Di Dema Osmaniyan De

Di dema Osmaniyan de, ji alî rewşenbîr û xwendeyên Kurdan ên wê demê ve çend komele û cemiyet hatine avakirin. Van cemiyetan li xwe kirine armanc ku di nav Dewleta Osmanî de, hişyariyê Kurdên çêbikin. Û van cemiyetan ji weşandina kovar û rojnameyan bigire heta bi avakirina dibistanan û vekirina

bankayan, li xwe kiriye armanc ku di nava Dewleta Osmaniyan de yekîtiyeke Kurdan ava bikin û wan di van weşan û biwaran de bêjara neteweparêz bi kar aniyê.

2.3.1 Rojnameya Kurdistan û Bêjara Neteweparêz

Piştî têkçûna serhildana Mîr Bedirxan a sala 1847an, Dewleta Osmanî malbata Bedirxaniyan sirgûnê girava Giritê dike. Piştî çendekê ku dewletê efû bo wan derdixîne, tevî ku Mîr Bedirxan berê xwe dide Şamê jî, kurên wî û endamên vê malbata fireh jî li gelek aliyên dewleta Osmanî û hinek jê li Stenbolê dimînin û hinek jê jî li gelek aliyên dewlet û dinyayê belav dibin.

Yek ji wan endamên malbata Bedirxaniyan jî, kurê Mîr Bedirxanê Botî, Mîr Mîqdad Mîdhet Bedirxan e. “Mîr Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di 22yê Nîsana sala 1898an de, li Qahîreyê, ji welatê xwe dûr, hejmara yekem a Rojnameya Kurdistan çap û belav kir. Rojname ji sala 1898an heta 1902yan bi giştî 31 hejmar derket. Ango em dikarin bêjin hejmara dawî a di destê me de hejmara 31ê ye” (Dilgeş, 1998: 9).

“Digel ku roja weşandina rojnameya Kurdistanê wek roja destpêka Rojnamegeriya Kurdî tê zanîn jî, ev destpêk amaje bi destpêkên dîtir jî dike. Rojnameya Kurdistan, wek weşana periyodîk, yekem weşana Kurdî ye” (Dilgeş, 1998: 164). Loma jî, hem ji alî welat û ciyê ku lê dest bi weşanê kiriye û hem jî ji alî weşangerê wê ve girîngiyeke xwe heye. Di heman demê de, em dikarin bêjin, piştî kelepûr û adeta nivîsîna şî’îrên kêşsaz î teşeya klasîk, yekem pexşanên bi Kurdî di Rojnameya Kurdistanê de û ji alî Mîqdad Bedirxan ve hat nivîsîn. Her wiha, Rojnameya Kurdistan, ji alî endamê malbateke ku li hember desthilatê serî hildaye, şer kiriye û têk çûye û pê re jî sirgûn bûye ve tê weşandin. Ev rewş bi me dide nîşan ku; doz û daxwazên fetisandî ên serhildanekê, kariye di rûpelên rojnameyekê de bide der.

Mîqdad Mîdhet Bedirxan, di hejmara yekem a rojnameyê de wiha dinivîse, “Heyfa min tê ji Kurdan re. Kurd ji gelek qewma zêdetir xweyhiş û zeka ne, camêr in, dînen xwe de rast û qewî ne, xwurt in û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in; dinyayê de çi dibe, cîranê wan Mosqof çawa ye, wê çi bike, nizanin. Loma min ev cerîdeya ha nivîsî. (...) Navê wê min kiriye Kurdistan” (Dilgeş, 1998: 84.) Mîqdad Mîdhet Bedirxan gava sedem û paldera çapkirin û weşandina rojnameya

Kurdistanê dinivîse, pê re jî hewl dide ku bêjareke neteweyî ava bike. Em dikarin bêjin çendî ku gotina, “Heyfa min tê ji Kurdan re” serê pêşîn wek quretiyeke desthilatî û wek nihêrtina ji jor de tê famkirin jî, sedem û palderên vê gotinê, hestên neteweyî ne. Ji ber ku Mîqdad Mîdhet Bedirxan gotinên xwe bi heman awayî nadomîne û hewl dide ku rewşa Kurdan a heyî dayne rastê. Û di dawiyê de jî, bala me dibe ser semboleke neteweyî û ji bo rojnameyê dibêje “Navê wê min kiriye Kurdistan”; û wek di aşopa me de axeke bi sînor, gelekî etnîk a di nav wî sînorî de dijî, gelekî bi navê Kurd, zimanekî bi navê Kurdî û dawiya dawî jî sînorekî terîtoriyal û dewleteke bi navê Kurdistan, çêdike. Ev bêjar bi tena serê xwe nîşana destpêkeke encamnebûyî ye; ev nîşan bêjara neteweparêziya Kurd e.

Rojnameya Kurdistan, wek navê xwe ne tenê rojnameya roja îroyîn e ku nûçe û agahiyên dide. Tevî ku Mîqdad Bedirxan nav lê kiriye, “cerîde” jî, di roja îroyîn de wateya xwe a “rojname” û “lênûska tomarkirinê” heye. Û ev lînûska tomarkirinê, hewl dide ku di her qad û biwarê de tevkarîyekê li belavbûna ramana neteweparêziya Kurd bike. Ji bo vê yekê jî, ziman bo wî pir girîng e û loma jî sê hejmarên pêşî xwerû bi Kurdî diweşîne. Lê belê, “Xwendevan bi hinceta ku nikarin bi Kurdî bixwînin, daxwaza nivîsên bi Tirkî jî jê dikin. Piştî vê daxwazê rojnameya Kurdistan dibe duzimanî” (Dilgeş, 1998: 83-84). Gava girîngî li ser ziman be, helbet wêje bivênevê ye. Loma jî Mîqdad Bedirxan serê pêşîn berê xwe dide yekem kes û şa’îrê Kurd ku di warê etnîkî de bêjara neteweparêziyê afirandiye. Ew şa’îr Ehmedê Xanî ye. “Mîqdad Bedirxan, girîngiyeke taybetî dide bi Kurdî nivîsînê. Ji ber vê yekê ye ku hê di hejmara duduyan a rojnama xwe dest bi çapkirina Mem û Zîna Ehmedê Xanî dike” (Dilgeş, 1998: 86). Her wekî Dilgeş jî destnîşan dike, li ser vê girîngiyê û girîngîpêdanê, Mem û Zîn tê weşandin. Di vê qonaxê de, pirsê “çima ne berhem an jî şî’îra şa’îrekî dî na lê Mem û Zîn?” xwe dide der. Bersiva vê pirsê di Mem û Zîn û Xanî de veşartî ye. Xanî, yekem kes e ku digel navê Faris, Ereb û Tirkan (Osmaniyan) navê neteweya (gelê) Kurd (Ekrad) bi kar aniye û bêjarek ava kiriye. (Xan, 2009, 39-40).

Mîqdad Bedirxan, bêjara xwe ne tenê di warê hestên neteweyî de ava dike. Pê re jî, bang li mîr û axa û begên Kurdan (desthilata navxweyî a Kurdan a wê hingê. d.d.) dike da ku beş û aliyê herî girîng a civakê mil bide vê hewl û xebatê. “Gelî mîr û axano! Îttifaq bikin, bigihin hev! Hekî waliya, mutesserifa guh neda we, ji Xunkar

re telgrafa binivîsin, erzihala bişînin, da îzna vê cerîdeyê bidit ez ji we re rêkim. (...) Loma jî gelî mîr û axano! Qenc bizanibin xwendin, ilm û marîfet, dinya û axretê rûyê mirov sipî dike, mirov muhtacî tu nabe” (Dilgeş, 1998: 88-103). Di vê banga hanê de, daxwazeke yekbûna ototrîteyî û siyasî jî heye ku bi gotina “Îttifaq bikin, bigihin hev!” tê ziman. Pê re jî em hay jê dibin ku Rojnameya Kurdistan ji alî belavkirinê ve rastî asêkirin û astengiyan tê ku li gorî Mîqdad Bedirxan ev yek bi “yekbûna” Kurdan dikare pêk bê; û nîşaneyê vê yekbûnê jî dê nivîsîna erzîhalan û şandina telgrafan bo Xunkar e. Heke ev yek bi cî bê, dê bê zanîn ku civaka Kurdan bi xwende, rewşenbîr û desthilata xwe ve alîgirê belavkirina vê weşanê ne ku li ser hîma neteweyetiyê radibe; û pê re jî dê meşrûbûna civakî pêk bê. Digel vê yekê jî, bi gotina, “Qenc bizanibin xwendin, ilm û marîfet, dinya û axretê rûyê mirov sipî dike...” bal li ser xwendewarî û bîreweriyê tê kişandin ku dê di warê hezkirin û parastina gelê xwe de bibe sedema hişyariyê; û geşedan û xurtbûna ramana neteweparêziyê. Û Mîqdad Bedirxan, bi gotina “...mirov muhtacî tu nabe.” Jî amaje bi têrkirina xwe bi xwe; yanî amaje bi xwesarbûnê dike.

Her wiha Mîqdad Bedirxan, wek axeke ku berendama dewleteke terîtoryal e, li Kurdistanê dinêre û wiha dinivîse di hejmara 8. a rojnameyê de. “Gelî Kurdno! Un qenc bizanibin ku heger welatê we de memûrên serê we ji edaletê dûr ketin, welatê we destê xweyî de namîne. Nuho Kurdistan jî weke welatê di binê Tirka, binê destê Ebdulhemît de ye; memûrên serê we Ebdulhemît rêdike. Lakîn xweyiyê Kurdistanê Kurdi in. Wekî neyarek hat Kurdistanê, Kurdê xwe ser bidin kuştin. Erdê wê derê Kurd dikolin, darê wê derê Kurd diçinînin; perên memûrên Xunkar rêdike serê we, un Kurd didin. Loma Kurdistan ya we ye...” (Dilgeş, 1998: 122). Em dikarin bêjin ku; çendî ku şîrovevên me kirî wek şîrovevên rapir xuya bikin jî, hewldana Mîqdad Bedirxan a li vê derê avakirina bêjareke neteweparêz e. Loma jî, ew çêla xweyîbûna li axekê ku ne wek erdekî zevîyî ye dike. Ew çêla axekê dike ku sînorê wê, wekî jîyanî, zimanî û çand û nerîtî, ji alî koma etnîkî ve, ji alî neteweya Kurd ve tê diyarkirin. Û banga parastina dad û edaleta desthilatî a li ser wê axê dike.

Piştî pênc hejmaran Mîqdad Bedirxan, “Dewlet jê daxwaz dike ku vegere Stenbolê û heke ew venegere dê hemû mafên xwe ên dewletî winda bike û ew ê ji Misirê bê daxwazkirin ku bi zorê wî bidin” (Dilgeş, 1998: 89). Piştî vê gefxwarin û asêkirina hewla weşandina rojnameyê, Rojnameya Kurdistan tê qedexkirin. Mîqdad

Bedirxan vedigere Stenbolê û ji hejmara pêncan û bi şûn de birayê Mîqdad Bedirxan, Evdirehman Bedirxan di şûna wî de karê weşandina rojnameyê berdewam dike. Û piştî ku di navbera 1898 û 1902yan de çend caran ciyê xwe î weşanê diguherîne û 31 hejmar derdiçe, rojname weşana xwe disekinîne.

2.3.2. Cemiyeta Teavûn û Terakkî a Kurd

Li gorî ku Malmîsanij agahî dide û dibêje, “Heke em “Cemiyeta Azm-î Kavî a Kurd” ku Zinar Silopî (Kadri Cemil Paşa) qala wê dike, nehesibînin, CTTK. yekem rêxistina Kurd e” (Malmîsanij, 1999: 9). Malmîsanij, piştî vê peytandinê, pêde diçe û der heqê sedem û armanca avakirina CTTKyê de vê agahiyê dide me: “Piştî ku di sala 1908an de meşrûtiyet hat danîn, hin rewşenbîrên Kurd ku di sirgûniyê de bûn û piştgiriya meşrûtiyetê dikirin, veqeriyên Stenbolê û ev cemiyet ava kirin” (Malmîsanij, 1999: 15). Tiştê ku li vê derê bala me diçe serê ew e ku mirovên Kurd ên rewşenbîr, ên ku ev cemiyet ava dikin, berî her tiştî piştgiriya meşrûtiyetê dikin; yanî ew girêdayî pergala heyî ne û tu niyet û xwesteka wan tune ye ku pergala rêvebirina dewletî bi awayekî ramanî û îdeolojîk têk bibin. Berevajîya wê ew alîgirê berdewama vê pergalê ne. Loma jî di sedem û armancên avakirina CTTKyê de wiha tê gotin: “1- Ji bo ku makezagona ku xwe dispêre hikmên şerî’etê li dar be, cemiyet parastina aqûbet û selameta xweş li xwe dike armanc. 2- Bi vî awayî jî, armanc ew e ku qewmê Kurd ê torin û pîr û pak, li gorî hewcetiyan sedsalê bi pêş bikeve û ji alî xwendewariyê ve xurttir bibe û kam û bextewariya wî pêk were” (Malmîsanij, 1999: 20).

Her wiha, gava em bala xwe didin ser rengûawayê çînî ên avakarên vê cemiyetê, em dibînin ku bi giştî ji giregirên civakê, ji xwende û rewşenbîr û zengîn û ji kesên ku di nav civakê xwe xwedî gotin in pêk tê ku hin jê bi nasnavên mîr, şêx, seyîd, paş û hwd. tên zanîn û nasîn û pê re jî rêz û bihayekî giran di wan tê dayîn. Malmîsanij, piştî xwe dide Dr. Bleç Şêrko û navên avakarên CTTKyê wiha bi me dide zanîn.

1. Emîr Emîn Alî Berdirxan
2. Ferîk Şerîf Paşa
3. Seyîd Evdîlqadir Efendî

4. Damat (Mûşîr) Ehmed Zilkîf Paşa û çend kesên dî. (Malmîsanij, 1999: 23-24).

Çendî ku navê kesên mayî nehatine dayîn jî Malmîsanij xwe dispêre gotineke Dr. Şukrî M. Sekban û dibêje: “Mirov dikare bêje Dr. Şukrî M. Sekban û Naîm Baban jî di nava avakarên vê cemiyetê de ne” (Malmîsanij, 1999: 24). Her wekî ku ji vê lîstê jî tê famkirin, avakarên vê cemiyetê, an xwende û rewşenbîr in, an di warê desthilata navxweyî de xwedî gotin in, yanî mîr û paşa ne an di warê aborî û zengîniya gelê Kurd de nûneriya çîna arîstokrat dikin an jî di warê bîrûbaweriya olî de şêx û seyîd in.

Wekî dî jî, ji bo kesên ku dê bibin endamê desteya rêveberiyê hin şert hatine danîn; piştî ku wek şert tê gotin, “Divê kesê rêveber li Stenbolê danişê”, pê re jî bi taybetî bal tê kişandin û bi van hevokan, “Divê kesê berendamê rêveberiya cemiyetê karibe bi Tirkî û Kurdî bixwîne û binivîse û heke ku bi Kurdî jî nizane divê zimanekî dî ê têbor bizanibe” (Malmîsanij, 1999: 26) û bi vî şertî tê xwestin ku bila Kurdên xwende û zana xwe li cemiyetê bigirin.

Gava em berê xwe didin benda duyem a armanca avakirina cemiyetê ku di rêznameya cemiyetê de jî cî daye xwe û bi hevokên wekî, “Bi vî awayî jî, armanca ew e ku qewmê Kurd ê torin û pîr û pak, li gorî hewcetiyan sedsalê bi pêş bikeve û ji alî xwendewariyê ve xurttir bibe û kam û bextewariya wî pêk were” (Malmîsanij, 1999: 20) hatiye derbirîn, yekser em dikarin bêjin, bêjara neteweparêziya Kurd di rêzîknameya cemiyetê de bergewde bûye. Ev bergewdebûn bêtir di awayê gotina, *Kurd ê torin û pîr û pak* de xwe dide der. Ê ji bo aqûbeta qenc a vê gewdeyê, bêjara, *pêşketina gelê Kurd a li gorî hewcetiyan sedsalê* tê avakirin û her wiha sedem û armanca danîna cemiyetê jî tê qayîmkirin û pîlankirin.

Di rêzîknameya CTTKyê de hatiye diyarkirin ku dê di bin banê Wezaretê Perwerdehiyê de dibistanên seretayî, navîn û lîse bînin vekirin û heke wezaret nikaribe li hin cîyanan van dibistanan veke, cemiyet dê bi vî barî rabe. Loma jî di vî warî de, Kadri Cemil Paşa (Zinar Silopî), Xelîl Xeyalî, Ehmed Cemîl û Ehmed Ramîz li Stenbolê ji bo zarokên Kurdan dibistan vekirine û çapxaneyek ava kirine. Ê Li gorî ku Celîlê Celîl diyar dike, “Navê vê dibistanê Dibistana Meşrûtiyetê bûye û ji alî Cemiyeta Neşr-î Maarîf a Kurd ve li Stenbolê hatiye vekirin” (Celîl, 2001: 47). Ê di beşeke dî a rêzîknameyê de jî wiha hatiye gotin, “Ji bo di dibistana seretayî de

perwerdehiya bi Kurdî bi sanahî were kirin, dê zimanê Kurdî bi awayekî nivîskî were bikaranîn û ji bo vê yekê jî dê Rêzimana Kurdî û Ferhengeke tekûz werin amadekirin. Her wiha dê çî berhem hebe ku heta niha li çapê nehatibe xistin, dê werin çapkirin û di dibistanan de jî werin xwendin” (Malmîsanij, 1999: 37). Em ji vê beşa rêzicknameyê fam dikin ku; avakarên CTTKyê qîma xwe bes bi hînbûna zimanê Kurdî nayîne. Her wiha, bi amadekirina rêzimanê Kurdî û ferhengeke tekûz; serê pêşîn hewlê didin ku ji pêwîstiyên serdemê re bibin bersiv; û bi vê yekê re jî, li xwe dikin armanc ku berhemên nivîsandî ne lê nehatine çapkirin, çap bikin û bi vî awayî jî têkiliyekê bi borîroja neteweya xwe re deynin. Loma jî, em ji kîjan alî û di ser kîjan teoriya netewe û neteweparêziyê re xwendina vê hewldan û tevgerîna bikin jî encama ku em ê bigihîjin ev e; ev ranêzikiyên ku hatine kirin û hewlên ku hatine dayîn hemû jî, hewla avakirina netewe û zimanekî neteweyî ê Kurd in ku bêjara xwe jî di ser hîma vê avakirinê re belave dike.

Endamên CTTKyê li xwe kiribûn armanca sereke ku; di nav Kurdên ku di sîwana Dewleta Osmanî de dijîn, rêjeya xwendin û nivîsînê zêdetir bikin. Di vî der heqê de Celîlê Celîl xwe dispêre El-Teahi û bi me dide zanîn ku di bin banê CTTKyê de, “Kürt Neşr-i Maarif (Komeleya Berbelavkirina Xwendin û Nivîsîna Bi Kurdî) hatiye vekirin; û peywira komeleyê ew bûye ku dibistanan veke û pirtûkên bi Kurdî çap bike. Her wiha, vê komeleyê xebatên xwe bi Wezaretê Perwerdehiyê re hevpar meşandiye” (Celîl, 2001: 69). Komeleyê bi bexşandinên dilxwazî ên zengîn û maldar û arîstokratên aboriya xwe dabîn kiriye. Li gorî ku Celîlê Celîl bi me dide zanîn, “Evdirehman Bedîrxan di vekirina komeleyê de 30 lîrayê Tirkan bexşandiye û soz û bext daye ku ew ê her meh van bexşandin û alîkariyan bidomîne” (Celîl, 2001: 69). Digel vê yekê jî, Malmîsanij diyar dike ku ev hevoka rêzicknameyê, “Em ê bi şanazî di hejmarên pêş ên rojnameyê de cî bidin programa bankaya ku cemiyeta me ji mêj ve ye dixwaze ava bike” (Malmîsanij, 1999: 44) bi me dide zanîn ku CTTKyê ji bo avakirina bankayekê xebat kiriye. Em ji vê xebat û hewldanê fam dikin ku avakarên CTTKyê bi tenê avakirina dibistan û weşandina rojname û kovaran nemane; û ew nefikirîne ku qîma xwe bes bi bexşandina pereyan bînin û van biwar û qadên zanîn û perwerdehiyê bihêlin ji daxwaz û dilovaniya kesan û komeleyan bi vê rêyê li dar bihêlin. Ji ber ku wan li xwe kiriye armanc ku xebata van biwaran geştir û leztir û mayîndetir bikin. Loma jî, wan xwestiye aborî û zengîniya Kurdan jî di navendekê de

bigihîjnîn hev û pê sermiyanekê pêk bînin; sermiyana neteweyî ku dê karibe finansoriya xebatên avakirina neteweyekê û zimanekî neteweyî bike û pêwîstiyên wê ên aborî dabîn bike. Û ev yek di heman demê de jî, hewldana danîna sermiyana neteweyî ye û di biwara pênaseya ramana neteweparêziyê a awirmodern de, hewla avakirin dewleta neteweyî ye jî.

Dîsan, li gorî ku Celîlê Celîl dide diyarkirin, “CTTKyê di 9ê meha Mijdara sala 1908an de rojnameyeke bi navê Kurd ku bi Tirkî û Kurdî weşanê dike, derxistiye û weşangerê rojnameyê jî Tewfîqê Silêmanî ye (Pîremêrd)” (Celîl, 2001: 61). Lê belê Malmîsanij, agahiyeke dîtir dide (Malmîsanij, 1999, 56-57) û dibêje, “Di 22yê Teşrîn-î Sanî ya sala 1908an de rojnameyeke bi navê RKTyê ku bi Tirkî û Kurdî weşanê dike, hatiye weşandin. Û bi vê agahiyê re jî Cemil Paşa wiha dibêje, “Yekem mecmua di sala 1908an de, piştî daxuyana hurriyetê (azadiyê), di bin banê CTTKyê de û bi piştgiriya wê, bi rêveberiya Cemîl Begê Mirikikatibzadeyê Diyarbekirî û bi xebatên Xelîl Xeyalî yê Motkîyî û Ehmed Ramîzê Liciyî di nav gel de hatiye belavkirin” (Cemil Paşa, 1991: 35).

Her wiha Malmîsanij der heqê kesên ku di rojnameyê de nivîsîne jî agahî dide me (Malmîsanij, 1999: 65) û navên wekî, Bedûzeman Mela Se’îdê Kurdî, Xelîl Xeyalî, Mihemed Tahîrê Cizîrî, Tewfîqê Silêmanî, Ehmed Şewqî yê Gerok ê Erdîşî, Cemîl Begê Mirikikatibzadeyê Diyarbekirî, Bedriyê Meletî û Babanzade Îsmail Heqî, wek navên sereke dibêje.

2.3.2.1 Rojnameya Kurd Teavûn û Terakkî û Bêjara Neteweparêz

Sê nivîsarên bi Kurdî ku di RKTyê de hatine belavkirin, di warê bêjara netewe û neteweparêziyê de balê dibin ser xwe. Yek ji van nivîsan, nivîsa Bedûzeman Mela Se’îdê Kurdî ye. Se’îdê Kurdî, di gotara xwe a ku di hejmarê duyem a rojnameyê de weşiyaye, pêşî dipirse û dibêje, “Gelo Kurd hewceyî çi ne?” û pê de diçe û pirsê xwe wiha dibersivîne: “Ev pazdeh salên qut û gilover in ez ketime dû bersiva vê pirsê; û min ji bilî du rêyên li jêr ku karibe çarenûsa Kurdistanê têxe nav misogeriyê, peyde nekir: Digel hişberiya olî, ji bo yekîtiya neteweyî û şaristaniyê, pêşketina di warê huner û zanistê de” (Celîl, 2001: 63). Se’îdê Kurdî, bi pirsê xwe a ‘Gelo Kurd hewceyî çi ne?’ hemû bersivan jî datîne pêş me. Ji ber ku di

pirsê de, kes an jî heyîna ku hewce ye, mirovek ji nav mirovan e. Ew kes hatiye diyarkirin. Ew kes Kurd e. Yanî endamê neteweyekê yeû bi navê neteweya xwe nav lê hatiye kirin. Û netewe bi xwe jî kes e û gelek kesên di rengê xwe de jî di xwe de dihewîne. Se'îdê Kurdî pê re jî warê ku Kurd lê dijîn, Kurdistan ku çarenûsa wê ne diyar e datîne rastê. Ev her du awa gotin, di biwara bêjarê de, yekser berê me bi alî bêjara neteweparêziyê ve dike. Lê belê, tevî ku Se'îdê Kurdî xwe ji bêjara neteweparêziyê dûr naxîne û *yekîtiya neteweyî* tîne û datîne mexderê û pêkhatina vê yekê di pêşketina huner û zanistê de dibîne jî, li dûrî afirîna ramana neteweparêziyê dimîne û vê yekê ji derveyî hişberiya olî û jê serbixwe nahizire. Yanî sekuleriya ku raman û îdeolojiya neteweparêziyê ji bo aqûbeta neteweyê datîne pêşberî xwe, ji ramana xwe dûr dixîne. Û *yekîtiyeke berfirehtir û mezintir* datîne tengala *yekîtiya neteweyî* û bêjara xwe a di biwara neteweparêziyê de bi vî rengî tamam dike.

Nivîsa dî jî, nivîsa Îsmâîl Heqî Babanzade ye. Îsmâîl Heqî Babanzade jî di nivîsa xwe de li ser ziman disekine û wiha dibêje, “Tekûzbûna ziman, rêya pêşketina me li me vedike. Dê yekem pêngava rizgariya neteweyê bi perwerdehiyê bê avêtin; herçî ziman e, ew kilfla perwerdehiyê ye. Divê deriyên şaristaniyê bi vê kilflê bê vekirin” (Celîl, 2001: 63). Babanzade, yekem merca ku ji bo neteweyekê tişteki bivênevê ye, dike sedema nivîsa xwe. Gotina wî a, *tekûzbûna ziman rêya pêşketinê li me vedike*, hem arasteyî mêjî hem jî arasteyî nirxa hevpar dike. Babanzade alîgir e ku bêjarek were avakirin. Û rêya avakirina vê bêjarê jî tekûzbûna ziman e; yanî zimanê hevpar ê neteweyê ye. Dê bi vî zimanî, *yekem pêngava rizgariya neteweyê* bê avêtin. Gava em bala xwe didin, em dibînin ku pêşketina neteweyê gelemşeya hevpar a Se'îdê Kurdî û Babanzade ye. Lê Babanzade rêya pêşketinê di tekûziya zimên; û di perwerdehiya ku dê bi vî zimanî were kirin de dibîne. Perwerdehî yek ji wan rêbazên modern e ku hest û hizirînên neteweyî hişyar dike; ev hest û hizir pê ava dibin û pê re jî hevpariyek jî çêdibe. Babanzade, li şûna ku berê xwe bide yekîtiyeke girstir û berfirehtir, yekîtiyeke bi nirx û neteweyî xeyal dike û dixwaze. Û bêjara xwe a neteweparêz jî, di gotina xwe a, ‘tekûzbûna ziman û rêya pêşketinê’ de ava dike.

Her wiha Xelîl Xeyalî, di nivîsa xwe a bi navê “Weten û Îttîfaqa Kumanca(n)” (Malmîsanij, 1999: 128) de, pêşî bi hevokên wekî “Weten tu çiqra ‘ezîz î, tu çiqra letîf î” balê dibe ser hebûna warekî ku ji bo mirovên lê dijîn qîmeta wê di asta pîrozweriyê de ye; û ev pîrozwerî nirxa hevpar a Kurmancan e. Piştî re jî bi

hevokên wekî, “Weten tu îro ji destê zilmê wêran î. Meskenê bûman û maran î” (Malmîsanij, 1999: 128) jî amaje pê dike ku ev pîrozweriya hevpar, tûşî derb û talanên xerab hatiye. Û hevokên wekî, (Malmîsanij, 1999: 129.) *Kurmanc di nav qewmê Usmanî da unsurek mezin e, dîndar e, ciwamêr e, jêhatî ye. (...) Kîjan qîrîn rabûye ku... (...) ji bo hîfza wetenî, ji bo şerefa milletî, ji bo bilindiya diyanetê xwîna xwe nerêtiye... (...) hemiyeta xwe, xîreta xwe, dîndariya xwe nişan nedaye?* jî bo derb û talana ku çêl dike, dike palder. Ji ber ku ev gotinên Xeyalî, di biwara dîrok û desthilatî û ezmûndariyê de ye, em nikarin bêjin bi temamî gazincên ji desthilata Osmaniyan e. Ev hevok ji aliyekî ve jî xet û nexşên hîmî û esasî ên bêrîkirinekê pêk tînin. Di hevokên wekî, ‘Feqet hukûmeta mustebida(n) mêraniya me, zekaweta me daîma înkâr kir’ (Malmîsanij, 1999: 129) de jî bêrîkirinek heye ku fetisiye an jî em dikarin bêjin hatiye fetisandin. Xeyalî rêya vejandina laş û gewdeya ku hatiye înkarkirin û cîbicîanîna helûmercên ku bûne sedema *bêrîkirinê*, di yekbûniyê de dibîne. Loma jî bi hevokên wekî, ‘Gelî Kurma[n]can! [Ji] wetenê xwe hez bikin, çunkû muhebbeta wetenî ji îmanê ye. Gelfî biran! Dijminî û neyarî ji dilê xwe derxin aşt bin! (...) Gelî hevalan! Mekteban vekin, ewladên xwe bidine xwendin, ’arê nezanî li ewladê xwe layiq nebînin (...)’ (Malmîsanij, 1999: 130) bangî Kurmancan dike ku yekîtiya xwe a neteweyî pêk bînin. Helbet di vê yekîtiyê de ku cîbicîanîna wê tê armanckirin, birîna hêviyekê heye ku ji dewleta Osmaniyan hatiye kirin. Ev hêvî, di xizmeta bo dewletê hatî kirin û di bendewariya wan de fetisiye. Hevok û gotinên Xeyalî, çendî ku ne li ser ramanekê rûniştî hatibin gotin û di biwara ramana neteweparêziyê de qels bin jî, bêjarekê ava dikin ku ev bêjar car dî xwe dispêre Kurmancbûnê; yanê cudabûna ji gelên (neteweyên) dîtir.

2.3.3 Cemiyeta Hêvî⁴

Cemiyeta Hêvî yekem ew komeleya aşkera û legal e ku xwendekarên Kurdan ên ku li Stenbolê xwendina xwe a bilind dikin, ava kiriye. Der heqê sala avakirin û avakarên vê cemiyetê de, Malmîsanij ji M. Nuri Dêrsimî vê agahiyê radigihîne me,

⁴ *Navê vê cemiyetê bi gelek awayan hatiye bilêvkirin û nivîsîn. Li gorî Malmîsanij, navê cemiyetê bi awayên, Hêvî Kürt Talebe Cemiyeti, Kürt Hêvî Talebe Cemiyeti, Hivî Kürt Talebe Cemiyeti, Hêvî-Talebe Cemiyeti, Talebe Hêvî Cemiyeti, Kürt Talebe Cemiyeti an jî tenê Hêvî hatiye bilêvkirin û nivîsîn.) (Malmîsanij, 2002, 47.) Em ê ji vê û bi şûn de navê vê cemiyetê wekî Cemiyeta Hêvî bi lêv bikin.*

“Berî CHyê, di sala 1911an de li bajarê Harput (Xarput) a eyaleta Kurdistan a di nav Dewleta Osmaniyan de, komeleyeke bi navê Kürt Talebe Birliği (Yekîtiya Xwendekarên Kurd) hatiye avakirin. Lê belê ji ber ku ev komele neaşkera û îlegal bûye, kartêka vê komeleyê gelek kêr û qels bûye. Loma jî mirov dikare bêje yekem komeleya legal a xwendekarên Kurdan a di nav Dewleta Osmaniyan de hatiye avakirin, CH ye. CH, ji alî xwendekarên zanîngehê ên Kurd ve di 9ê Tîrmeha sala 1912an a mîladî de hatiye avakirin” (Malmîsanîj, 2002: 48). Celîlê Celîl jî dibêje, “Wekî encama krîza siyasî a rêveberiya Jöntürkan ku di siyaseta hundirîn û derveyîn de meşandine, CH. di destpêka sala 1912an de hatiye avakirin” (Celîlê, 2001: 73). Malmîsanîj wekî avakarên cemiyetê van navan dibêje; “1) Kadri Cemil Paşa, 2) Ömer Cemil Paşa, 3) Van Milletvekili Tevfik Beyin oğlu Fuat Temo (Kurê Mebûsê Wanê Tevfik Bey Fuad Temo), 4) Diyarbekirli Cerrahzade Zeki” (Malmîsanîj, 2002: 67). Lê belê Celîlê Celîl jî navê kesên ku cemiyet ava kirine, wiha rêz dike; “Serokê cemiyetê Ömer Cemil Paşa, sekreter Kadri Cemil Paşa û endamên çalak jî, Fuad Temo, Carrahzade, Memduh Selim, Necmettin Hüseyin, Abdulaziz Baban, Ömer Efendi, Zeki Beg û ên dî” (Celîlê, 2001: 74).

Pişti van agahiyan tiştê ku me divê em balê bibin ser ew e ku; berevajîya avakar û çalakgerên CTTKyê, avakarên CHyê. ji xwendekar û xortên Kurdan pêk tê. Her wiha, tiştê ku wekî rengûawayê hevpar ê di navbera van avakaran de bala me dibe ser xwe ev e ku; avakarên her du cemiyetan jî di warê çîna civakî de, xwende û rewşenbîr in.

Li gorî ku Malmîsanîj radigihîne, di armancên cemiyetê de sê xalband, xalbandên yekem, duyem û pêncem bala me dibin ser xwe: “1- Bihevnasandina xwendekarên Kurd û bi vî awayî jî pêkanîna yekîtiya wan. 2- Sererastkirina Wêje û Zimanê Kurdî û çapkirina pirtûkan û pêşxistina wan. 5- Ji bo ku Kurd di warê zanist û pêşketina civakî de ji kêrî civakên dîtir şûnde nemînin, hewldan û têxebitînên di vî warî de” (Malmîsanîj, 2002: 61).

Digel ku piştî danîna ev qas teorî û pêkanînên pratîk, tu guman li ser nema ye ku ziman hêmana sereke ye di warê derbiran û pêkhatina wêjeya neteweyekê de; em bêyî ku têkevin şaşîtiyeke anakronîk, dikarin bêjin ku di wê heyamê de, xwendekarên Kurd xweşikî hay jê hebûne ku ziman di warê pêjnîkirinê de bi roleke hîmî û esasî radibe û loma jî wan pêşketina Kurdan a di warê zanist û civakî de bi

ziman ve girê daye û piştî armanca avakirina yekîtiyê berê xwe dane ziman û wêjeyê. Kifş e ku pêşketin û berbelavbûna ziman û wêjeya Kurdî, dê di heman demê de biwareke bêjarê ava bike da ku hest û ramanên neteweyî karibin pê werin derbiran. Û CH vê biwarê wekî tiştêkî bivênevê dibîne û hem hewlê dide vê biwarê ava bike hem jî xurttir bike.

Di danezaneke cemiyetê de ji bo armanca cemiyetê de, wiha hatiye gotin, “Armanca xizmetkirina Dewlet û Kurdan e ku stûna qewî a misilmanetiyê ye” û bi vî awayî jî armanca cemiyetê tê giştîkirin û pê re jî di xalbenda çarem a rêzîknameyê de hatiye diyarkirin ku “armanca cemiyetê, tenê zanistî û civakî ye û ji derveyî biwara siyasetê ye” (Malmîsanîj, 2002: 67).

2.3.3.1 Heyama Yekem a Cemiyeta Hêvî

CHyê di heyama yekem de girîngiyeke xuya û zêde daye ziman û wêjeya Kurdî. Û kovarên wekî Rojî Kurd, Yekbûn û Hetawî Kurd ji alî CHyê ve hatine weşandin. Û di van kovaran de digel nivîsên bi Tirkî nivîsên bi Kurdî (bi zaravayên Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Jêrîn-Soranî-) jî hatine nivîsîn.

2.3.3.1.1 Kovara Rojî Kurd û Bêjara Neteweparêz

Kovara Rojî Kurd, weşaneke periyodîk e ku bi hewldanên endamên CHyê ve li Stenbolê û çar hejmar hatiye weşandin. Di kovarê de digel nivîsarên Kurmancî û Soranî nivîsarên Tirkî jî ci dane xwe. Di hejmara yekem a kovara Rojî Kurdî de armanca kovarê wiha hatiye ravekirin, “.. Ciwanên Kurd berpîrsê vê armanca pêşketinên zanistî, civakî û siyasî ne... Vê ciwanîyê sond xwariye ku dê bi serkeftî bi vê peywîrê rabe... Û ew ê her şîrmaqa ku li Kurdbûnê hatiye dayîn bi pêşketina di warê zanist, çand û zimanê xwe de red bike...” (Malmîsanîj, 2002: 140). Wekî di jî li gorî Cemil Paşa, armanca û sedema têxebitîna Rojî Kurd ew e ku “... Çanda Kurdî berzûbala bike û xebatên wisa bike ku Zimanê Kurdî di nava Kurdan de karibe were xwendin û pê nivîs werin nivîsîn...” (Cemil Paşa, 1991: 40)

Her wiha mirov dikare bêje piştî nivîsên di rojnameya Kurdistan û rojnameya CTTKyê de weşiyar, nivîsarên pexşanî di kovara Rojî Kurd de jî weşiyar û belav

bûn. Û ji van nivîsarên pexşanî di warê xwe de yekemîn e ku ew jî çîroka Fuad Temo a bi navê “Çîrok” e (Rojî Kurd, hej: 1, 36) ku yekem çîroka nivîskî û honakî a Kurdî ye ku di Kovara Rojî Kurd de weşiyaye. Endamên CHyê hewl dane ku di warê ziman û nivîs û nivîskariya Kurdî de hin nûkirin û guherîn û reforman jî pêk bînin. Li gorî ku Malmîsanîj radigihîne me, “Ji derveyî pêşniyazên Abdullah Cevdet ên der barê bikaranîna tîpên Latîni de ku li civaka Osmanî kirine, di nav endamên cemiyetê de gengeşeya tîpên elfabeyê jî hatine kirin. Loma jî yekem elfabeya Kurdî ku tîpên Erebi ji xwe re dike bingeh, yekem car jî alî Xelîl Xeyalî ve hatibû amadekirin û li Stenbolê hatibû belavkirin” (Malmîsanîj, 2002: 101). Lê belê digel vê yekê jî Cemîl Paşa radigihîne me û dibêje, “Cara yekem di sala 1913an de, Faiz Bey ku endamê CHyê ye û li Stenbolê karmendiya saziya postê dike, pêşniyaza bikaranîna elfabeya Latîni li CHyê dike” (Cemil Paşa, 1991: 47). Helbet di vî warî de kesê ku herî zêde li ser nivîsîna bi Kurdî rawestiyaye Xelîl Xeyalî ye. Ew di nivîseke xwe a di Kovara Rojî Kurd de weşiyayî, balê dibe ser nivîsîna bi Kurdî û neteweparêziya ku divê bi bêjara bi Kurdî hatî kirin û wiha dibêje, “Çiqas mêze dikim, bi tu awayî bi serê min nakeve ku melayê di me, xwendayê di me bo çi qisetê xwe be Kurdî dikin û di medresan da dersê ku dixweynin be Kurdî me’ nayê wî divên. Wextê ku lazim bî, kaxidê xwe temessûkê xwe ya bi Erebi, ya bi Farisî ya bi Turkî dinivêse û be Kurdî nanivêse” (Rojî Kurd, hej: 1, 67). Jixwe ev gotina Xelîl Xeyalî bi xwe jî, bêjareke neteweparêz e ku di rûpelên kovarê de cî daye xwe. Her wiha, Xeyalî vê bêjara xwe bes di reng û asta gotinê de jî nahêle û ji bo pratîk û pêkanîna jî di nivîsa xwe a bi navê “Ziman” de pêşî bi van gotinan, “Ewê Kurd e, ar û namûsê xîretê kurdîtiyê têde heye we ji tenê dost û dijminan diqehire, şerm dike bila ariyê wan bike!” (Rojî Kurd, hej: 2, 87-88) bêjarek ava dike ku ev bêjar balê dibe ser kurdayetiyê û dibe sedema neteweparêziyê jî. Xeyalî piştî di heman nivîsara xwe de bi deh xalbendan pêşniyazan dike ku divê di pratîkê de bîn pêkanîn. Xeyalî dixwaze bila li ser terzeke nû elfabeyê bo Kurdî, ferhengeke Kurdî, kitêba hesab û matematîkê, kitêba rêzimana Kurdî, wergera kitêba mezinên Kurdan, kitêba dîroka Kurdan, kitêba adet û nerîtên Kurdan û digel wêjeya klasîk berhevkarîya wêjeya devkî jî bê kirin. Ev pêşniyaz di heman demê de xwestinên wî ne jî; xwestinên ku di hiş û hoş û pêjnkarîya wî de bêjara netewetî û neteweparêziyê temam dike. Pêşniyazên ku

Xeyalî wê hingê kirine, ji hin beşên xwe ve di dema Hawarê de tîn pêkanîn ku em ê di pêş de behsê jê bikin.

Li gorî ku Malmîsanîj radighîne me, (Malmîsanîj, 2002: 138) Kovara Rojî Kurd wek weşana CH a Heyama Yekem, di sala 1913an de diweşe. Kovar, yekem weşana periyordîk e ku ji alî cemiyetê hatiye weşandin. Kovar bi temamî çar (4) hejmar derketiye û her hejmar 32 rûpelan pêk tê. Xwediyê kovarê Abdulkerimê Silêmanî ye. Kovar bi Kurdiyên Kurmancî, Soranî û Tirkî weşiyaye. Di hejmara yekem a Rojî Kurd de mebesta kovarê wiha hatiye ravekirin: “Bêguman, dîsan bi gotineke herî hêsan, armanceke ku şayesteyî roja îroyîn û siberojê ye; armanceke zanistî û civakî ku ji azweriyên siyasî azad e... Va ye, roja îroyîn xortên Kurd berpîrs e li pêşberî Kurdbûn û xelkê alemê. Xortên Kurd soz û bext daye ku dê vê peywirê bi awayekî herî xweş û serkeftî bi cî bîne û dê derb û şîrmaqa tajang û rûmetşikên ku ji her aliyan ve li Kurdbûnê tê xistin, bi zanîn û xwendin û berzûbalatiyê bibersivîne” (Rojî Kurd, hej: 1, 15). Li gorî Cemîl Paşa jî, “(...) Armanca Rojî Kurd ew bû ku; çanda Kurdî berzûbala bike û xebatên wisa bike ku Zimanê Kurdî di nava Kurdan de karibe were xwendin û pê nivîs werin nivîsîn...” (Cemil Paşa, 1991: 40).

Naveroka nivîsarên di *Rojî Kurd* de weşiyayî bêtir li ser seqa û rewşa Kurdan a wê demê ye. Hewldana hevpar a nivîsan ev e; tê xwestin ku Kurd bixwînin û şiyar bin. Her wiha, yek ji taybetiya *Rojî Kurd* ew e ku, yekem car çîroka nivîskî a bi navê “Çîrok” ku bi teşe û şêweyekî honakî û ji alî Fuad Temo ve hatiye nivîsîn, di hejmara duyem a kovarê de hatiye weşandin. Li gorî ku Malmîsanîj agahiyê dide, “Kêm caran be jî ji Kurdistanê nivîsar û şî’îr dihat şandin bo Rojî Kurd. Wekî mînak, şî’îra şa’îr Zêwer ku di hejmara çaremîn de weşiyaye, ji Silêmaniyeyê hatiye şandin” (Malmîsanîj, 2002: 143). Her wiha, em ji vê agahî û beşbelekîrîna Malmîsanîj fam dikin ku zêdetirî nivîsarên di Rojî Kurd de ji alî ronakbîr û xwendeyên Kurd ên ku li Stenbolê dadinişin ve hatine nivîsîn.

Di hejmara yekem a Rojî Kurd de, nivîsareke bi sernavê “Armanç, Pîşe” (Rojî Kurd, hej: 1, 14) heye ku xuya ye ku di şûna pêşekê de û bi Tirkî hatiye nivîsîn. Nivîs bi helwesteke modern û rewşenbîrîyane bi xwerexnekirinê û bi pêşeka Tirkî dest bi gotina xwe dike, “(...) Divê em li xwe deynin ku ji heyamên berê de pêwendiya Kurdan bi cîhana şaristanyê re qut maye; li ser axa ku bi salan e lê dijî, ne roniyêke hunerweriyê, ne şewqeke şarezatiyê û ne jî li ser navê ‘ilm û zanîne bi

karekî rabûye. (...)" (Rojî Kurd, hej: 1, 14). Ev destpêk berî her tiştî nîşaneyê hebûna borîroja Kurdan e. Ev borîroj, di heman demê de qebûla heyîneke kêmmayî ye jî. Pêşek wiha berdewam dike, "(...) Kurd di nav tarîtiya ku sed sal domandiye de ancax kariye pêwendiya xwe bi şûr û axê ve çêke." Hêmana axê û şûr wek hêmayekê û wek sembola şûndemanê tê bilêvkin. Bi her hal, ax di vê peyî de ne tenê hêmayek e; her wiha nîşaneyêke sînorekî terîtoryal e ku ji dewleta xwe bêpar maye. Û her çî hêmaya şûr e; ew nîşan dike ku Kurd heta wê çaxê desthilata xwe bi tenê şerkirina bi şûr bi dest xistiye. Ev yek bi me dide nîşan ku Kurdan çî ji bo hêzên derveyî çî jî çî bo hêzên navxweyî, wek navgîna tundiye şûr bi kar aniye û vê yekê jî kiriye ku Kurd bi şervanî û mêrxwasiya xwe ve bîn nasîn. Helbet êdî sedsala 20. ne heyama şerkirina bi şûr û mertal e. Ev yek di domana nivîsê de wiha tê ziman. "Gerçî di nav hêmanên ku qewmekî, bi taybetî Kurdbûnê, zindî dihêle de girîngiyeke şûr û axê a neyînnekir heye; lê belê bi mercekê..! Bi merca ku divê mêjiyên ku şûr û axê bi rê ve dibin bi zanîne mişt bin û di vî warî de heta tu bêjî bes gihîştî bin." Pêşeka ku bi peyîte objektîv dest bi xwerexnekirinê dike, hewl dide ku sedemên xwerexnekirinê jî dayne holê. Û amaje bi rûpel û rêzik û nivîsarên di kovarê de dike û dixwaze bêje; kovar ew war e ku tiştê ji şûr û axê kêmmayî, -zanîn û xwendin- di nava xwe de dihevine.

Pêşek piştî xwerexnekirinê, berê xwe dide feraseta serdema ku tê de dijî ku ew serdem wek serdema zanîn û zanistê tê zanîn. "Ev dema me ku divê xwedî dilovaniyeke qedrzanîn be, wer dizane ku taybetiya herî mezin a Kurdan wek hovîti û talankerî ye" (Rojî Kurd, hej: 1, 15). Ev rexne bo dewleta Osmanî û dewletên dîtir e ku hê jî Kurdan wek mirovên şûndemayî û neçê dizanin. Ev xwerexnekirina ku ji qebûleke derbar xwe dide ser rê, dîtina gel, dewlet û serdestên a der heqê Kurdan de heyî, qebûl nake û dixwaze şaşbûn û nelicîbûna wê bide der. Pêşek wiha didome: "Halbûkî ji bilî nezaniya wê, tu guman tune ye li ser torinî û xanezadiya Kurdan; ku ev taybetî di puxte û bastûra wê de heye. Kesên ku vê hêmanê (*mebest Kurd in*) di war û welatê wê ê bi dar û ber û deştên wê ên têr giya û şinahî û giyanê wê î giramîdar û pakbinyad nas nekirine, bila bizanibin ku Kurd gencîneyeke berzûbalatiyê ye" (Rojî Kurd, hej: 1, 15). Di vê qonaxê de, xwerexnekirin ciyê xwe dihêle bêjareke dîtir. Neyînkirinek heye êdî ji bo wan daraz û dîtinên ku li ser Kurdan heye. Û ji vê neyînkirinê bêjarek diafire; bêjara ku sedema sereke a

weşandina kovarê ye jî. Bêjara çêkirina hestê bixwebaweriya Kurdan. Li ser çespendinên kêmasî û şûndemayîna neteweya Kurd, bi van hevokan, ‘... *torinî û xanezadiya wê a ku di puxte û bastûra wê de heye*’, ‘... *bila bizanibin ku Kurd gencîneyeke berzûbalatîyê ye.*’ ku tu guman ji gengaziya mirovanebûna wan nîn e, bêjareke berzûbalakirinê tê avakirin. Ev yek pir xweş li teoriya neteweparêziyê tê û guman li ser tune ye ku hewldana “avakirinê-dahênandinê” heye. Loma jî, neteweyek (an jî gelekî etnîk) ku tê qebûlkirin ku heta wê çaxê di warê şarezatî, zanîn û zanist û şaristaniyê de tu tişt dananiye holê, ji nişkê ve dibe xwedî van hunerwerî û şiyankariyan û tê berzûbalakirin. Û ev yek bi rengdêrên heta tu bêjî bes mirovane tê kirin ku tu yek jî ne ji rengdêrê cîhana zanîn, aqil, modernî, îdeolojî û sedsala 20. e. Bi taybetî rengdêrên wekî “torinî, xanezadî, gencîne” ên serdema feodal û sedsala navîn in. Gengaziya mirovane ku di hewldana berzûbalakirinê de heye, bi vê yekê re têk diçe. Ji ber ku “kovar û rojname” yek ji wan hêman û navgîn û rêbazên modern in ku ji bo belavkirina raman û zanînê û ji bo birêkxistina mirovan wek rê û rêbazeke nû tîr bikaranîn. Û car dî ev berzûbalakirin ne di ser hêman û navgînên serdemê re ye ku tevgerên ronakbûnê, şoreş û pêşketinên endustriyê û pêkanînên siyasî wek bayê bezê bi pêş de diçin û xurt dibin.

Neteweya Kurd jî di wê serdemê de (1913), hê jî bi beş û axeke berfireh û bi hejmarek zêde mirovên xwe ve hêmaneke dewleta Osmanî ye. Di wê heyamê de, Dewleta Osmanî ji ber sedema tevgerên azadî û şerên neteweyî ên gelên ku di nav sînorên wê de ne, pir zêde axa xwe winda kiriye. Digel vê jî, Kurdan bi awayekî xurt du car serî lê hildane; -ku serîhildana Bedirxaniyan ji bo domandina serdestiya navxweyî û mîrekiyê ye û çendî ku gelek kêmasî di xwe de dihewîne jî, serîhildana Şêx Ubeydullah bi doz û daxwaza serbixwetîya Kurdan li dar ketiye.-

Digel van rewşên neyînî ên liberçav, hewldana *Rojî Kurd* hê di pêşekê de xwe dide der û fikrek bi me re çêdike der heqê armanca kovarê de û di dawîya pêşekê de wiha tê gotin, “(...) ji ber ku du berhem li rastê ne; yek jê Hêvî ye û ya dî jî *Rojî Kurd* e; ev her du berhem, pêtala (xetireya) Kurdbûnê ne ku dê xort û ciwanên Kurd ku hilgirin; di nava xwe de kom bikin û dê bibin delîlên hişyarbûnê.”

Ev gotin, encamek e; piştî qebûlkirina rewşa heyî, bi helwest û hewldaneke hêvîda, rabûnek e. Ev rabûn, dê bibe hîm û kakila avabûna doz û îdeolojiya

neteweparêziya Kurd.⁵ CH û kovara Rojî Kurd, di nav hemû rewşên neyînî de jî, hay jê hene ku hêvî dê karibe digel bixwebaweriyê bimeşe.

Gava herî xurt a *Rojî Kurd* ew e ku; kovar bi xwerexnekirineke objektîv dest bi gotin û bêjara xwe dike. Lê heçko ku lingên bêjara berzûbalakirinê zêde erd nagire ku bi danîna îdeolojiya neteweparêz ve bestandî ye. Ev yek pir tiştêkî normal û asayî ye ku Kurd hê di wê çaxê de, di biwara dîrokî û di pêşketinên dinyayî de hestekî şûndemanê dijîn; û hemû hewldana wan; di warê ramanî de avakirina îdeolojiya neteweparêziyê û di warê hevpariyê de jî hişyarkirina hestê Kurdiniyê ye. Loma jî bêjara ku tê avakirin di nava xwe de dibe xwedî nakokiyên û zêde romantîk dimîne.

Di kovara Rojî Kurd de, nivîseke bi sernavê “Xîtabek” heye ku bi Tirkî hatiye nivîsîn û wekî bêjar cuda ye. Nivîs ji alî Abdullah Cevdet ve hatiye nivîsîn û bi hevokeke bi vî rengî dest pê dike: “(...) Em di serdemeke wisan de dijîn ku netewe derdikevin pêş û ava dibin” (Rojî Kurd, hej: 1, 16). Her wekî em ji vê hevoka destpêkê jî fam dikin, armanca nivîsê li ser netewe û neteweparêziyê ye. Loma jî nivîs di paragrafa bi dû de, “Çawan ku gava kesîdeyek ne xwedî kesayetiyeke xuya û bijare be tu hêjahiya wî a civakî tune ye, her wiha neteweya ku xwedîtî li karaktera xwe nekiribe jî ‘jê nayê xebardan’...” (Rojî Kurd, hej: 1, 16). Cevdet, di destpêka nivîsa xwe de bêjara xwe li ser hebûnê ava dike. Hebûna ku bi hemû taybetiyên xwe ên civakî û gerdûnî ve derketiye pêş; hebûna ku di nav xuyaniyan de xuyanî bibe; û jê were xebardan. Her wekî ev ranêzikiya ku li ser daxwaza hebûniyê pêk tê; qîma xwe bi daxwazê re nayîne loma jî dixwaze bila hebûniya wê di nav hebûnên ku hebûniya xwe dane qebûlkirin û meşrûkîrin de heyî bibe. Cevdet di berdewama nivîsarê de wiha dibêje, “Banekiya xistina bîrdankê a ezmûnên jiyânê di kesîdeyan de çi be ji bo neteweyan jî heman tişt e. (...)” (Rojî Kurd, hej: 1, 16). Tiştê ku behsê xeberê ye, bîrdanka civakan û komên xelkê ye ku ronahî dide ser roja wan a îroyîn û siberoya wan diyar dike. Û amaje bi bîrdanka dîrokî a neteweyan tê kirin. “Serdema ku em tê de dijîn ne ji henekên zarokan e, serdema 20. e. Neteweya ku xwedîtî li

⁵ Rewşa heyî: 1-Kurd hêmaneke Osmaniyan e. 2- Kurd di dîrokê de wek şaristanî şûnde mane. 3- Kurd heta wê çaxê jî bi şûr û axê ve bestî mane. 4- Kurd heta wê çaxê zêde pêwendî bi navgîn û amrazên modern, kapîtalîst, siyasî, ramanî û şarezatîyê danîne. 5- Hê jî desthilateke Kurdan nîn e ku karibe di sînorekî terîtoriyal de ‘dîke’yek biafirîne –an jî peyde bike- û xwe wek neteweyekê temam bike.

borîrojê û siberoja xwe neke, nikare xwedîtî li xwe jî bike. Kes û neteweyên ku xwedîtî li xwe nakin dê bibin kole û bendeyên kesên dîtir.” (Rojî Kurd, hej: 1, 16). Cevdet bêjara xwe pêşî li ser hebûnê ava dike û piştî jî balê dibe serê ku hebûna kesekî an jî neteweyekê dê bi xwedîtîlêkirina dîrokê û bîrdanka wê pêk were. Û bi gotinên, “De ka werin em bi hev re li xwe mikur werin ku Kurd bi rastî jî ne şayeseteyî vê sedsalê ne. Û em bipirsin ka gelo Kurd xwedî mengiyekê ne? Heke em bêjin erê, nexwe ew mengî çi ye?” (Rojî Kurd, hej: 1, 16). Cevdet, bêbîrdankiya Kurdan a ji alî dîrokê ve bi tunebûna mengiyê wan ve dibestîne. Ev mengî derbar xwe ye. Ev mengî derbar neteweya Kurd e. Ev mengî derbar neteweparêziya Kurd e ku di serdema 20. de jî nekariye ramana wê, îdeolojiya wê dayne û li serê kar û xebatên xwe bimeşîne. Cevdet jî her wekî nivîsa pêşekê, bi hevokên xwerexneyî û aşkerakirina kêmasiyên neteweya Kurd ku di dîrokê de şûnde maye, ava dike bêjara nivîsa xwe. Li gorî Cevdet, neteweyên ku xwedîtî li bîrdanka xwe a dîrokî kirine, gelên mezinbûyî ne.

Dîsan nivîsa bi sernavê “Derd û Çare” de nivîskar H..., wiha dibêje, “Bi raya min, çi gava qewm (mebest netewe ye) bi kêmasiyên xwe bizanibin û van kêmasiyên xwe bi zanîn û hişberî temam bikin hingê dê karibin rizgar bibin û bi pêş bikevin” (Rojî Kurd, hej: 1, 19). H..., ji riwangeyêke dîtir li mijarê dinêre; ji riwangeya hayjêbûna ji kêmasiyên xwe û temamkirina wan a bi zanîn. Ev rewş amaje bi mezinbûnê dike ku em dikarin ji vê yekê bidin ser rê û bêjin, gelên (neteweyên) ku hay ji vê rewşa xwe bûne, karibûne wekî zarokêkî gava xwe a pêşîn biavêjin berveyî mezinbûnê; berveyî netewebûnê. Û ew gava ku tê avêtin jî dibe sedema mezinbûnê û ev yek di warê neteweyan de dibe pêşketina neteweyekê. Û di çarçoveya şîroveya psîkanalîtîk de jî ev yek merca hîmî û sereke a têrixwekirinê ye ku li vir hewcetî bi ‘bavekî’ tune ye ku rêberî an jî pêşengî bo mezinbûna di jîyanê de dike.⁶ Her wekî Gellner jî dibêje, “Rewşenbîrên neteweparêz, li ser navê neteweya xwe di nav xehtûkoşeke geş û boş û merdane de bûn” (Gellner, 1992: 113). Di çarçoveya ‘bavtî’kirinê de rewşenbîr û xwendeyên civak û neteweyekê bi vê rolê radibin. H..., di vê yekê de hişber e, loma wiha di nivîsa xwe de diçe, “Peywira serok û rêberên neteweyên ku bi kêmasiyên xwe nizanin ew e ku van kêmasiyan ji gelê xwe re bêjin

⁶ Bav: Wek desthilateke ku hem otorîte datîne ser zarok û hem jî ji bo mezinbûna zarok dibe mînakêkî bivênevê.

û wan temam û durist bikin.” (Rojî Kurd, hej: 1, 19). H..., di temamkirina kêmasiyên neteweyan de rê û rêbaza tundwariyê dihebîne. Tundwariya ku ew behsê jê dike, ne ji alî hêzeke derveyîn ve, lê belê ji alî desthilata navxweyî a wê neteweyê ve tê pêkanîn. H..., vê yekê wiha rave dike, “Ez di gelemşeyên civakî de zêde zêde alîgirê tundwariyê me. (...) Qewm û netewe dişibin zarokan. Hezkirin û mistdana serê zarokan li şûna ku wan perwerde bike wan şûm û nazenîn dike. Loma jî ne gengaz e ku bi vî şeweyî civakek ji kêmasiyên xwe were bêrkirin.” (Rojî Kurd, hej: 1, 16). H..., çêla desthilateke navxweyî dike ku ew jî wek pergala dewlet e; û hêza dewletî ye ku dê tundwariyê li ser neteweya xwe bimeşîne ku neteweya wê xwedî kêmasî ye. Û H..., di ser vê tundwariyê re ava dike bêjara xwe; û doz û daxwaza dewleteke neteweyî a Kurdan ava dike.

Bulgaristanlı Doğan, bi sernivîsa xwe a “Peywira we a li pêşberî gelê we (Ji bo Xortên Kurd ên Ronak)” (Rojî Kurd, hej: 2, 47) bang li xortên Kurd ên xwende dike û wiha dibêje, “Li gorî vê serdemê, ji bo ku neteweyek karibe wekî hêmana civakekê hebûna xwe bidomîne, hin merc û wesf hewce ne ku îro roj gelê me ji wan bêpar e. Va ye peywira we a herî mezin û pîrozwer ew e ku hûn bixebitin da ku gelê me bibe xwedî wan merc û wesfan.” Doğan, her çend aşkera nebêje jî di piştperdeyê de çêla kêmasiyên gelê (neteweya) Kurd dike, hayjêbûna xwe a bo wan kêmasiyan çêl dike û di ser vê re jî rol û peywira temamkirina van kêmasiyan û gihîştandina neteweyê *-mezinkirina neteweyekê-* a li gorî ast û merca *civaka gerdûnî* dide ser milê xortên xwende û ronak. Û pê re jî kêmasiyên ku çêl jê dike, bi nav dike û dibêje, “Em dikarin bi du hevokan van merc û wesfan bêjin. Yek jê merca ramanî a dî jî merca aboriyê ye. Neteweyên ku endamên wan bi çekên raman/aboriyê hatine peytkirin dikarin bigihîjin armanca xwe û bextewar bibin” (Rojî Kurd, hej: 2, 47). Doğan, mercên hebûniyê di warê raman û aboriyê de dibîne. Loma jî, hebûna ramanê dê bike ku neteweyek der heqê xwe de bibe xwedî dîtinekê û dê karibe ji bo xwe îdeoljîyekê jî ava bike. Raman di bêjara Doğan de yek ji hokara hîmî û sereke a hebûniyê ye. Pê re jî merca aboriyê tê. Merca aboriyê, bi temamî helwest û sekneke li gorî heyama kapîtalîst e ku çî ji bo kesîdeyek çî jî ji bo neteweyekê rê û sedema xweheyîkirinê ye; û dê cîbicînanîna merca aboriyê bike ku *civaka gerdûnî* qebûlekê bo neteweya heyî pêk bîne. Doğan di pêdeçûna nivîsa xwe de dibêje, “Neteweyên ku di vê sedsalê de şiyar bûne an jî li ber şiyarbûnê ne, ew netewe ne ku çîna xwe a

xwende û ronakbîr ava kirine. Çîna ronakbîran digel neteweya xwe dimeşin û di roj û demên dijwar de li ba gelê xwe ne. Va ye, heke hûn vê peywira neteweyî bi vî rengî fam bikin û bi awayekî serketî bi cî bînin, hûn ê bi awayekî pir felaket û niwaze neteweya Kurd ava bikin ku mirov dê nikaribe jê bawer bike” (Rojî Kurd, hej: 2, 47-48). Ev gotin, navenda bêjara Doğan in. Doğan, digel ku şiyarbûna neteweyekê û avakirina ramana neteweparêz a wê neteweyê di hebûna ramanê neteweyî de dibîne jî, ev raman di heman demê de dibe hêmaneke girîng û sereke a neteweparêziyê. Pê re jî Doğan, aboriyê wekî hêmaneke bivênevê a vê hebûnê datîne rastê û ji bo hebûna di nav *civaka gerdûnî* de, aboriyê dike hokara jênager. Doğan di ser raman/aboriyê re çêla çînekê dike; çîna ronakbîran. Yanî çîna ku hem xwende ye, hem xwedî raman e û hem jî xwedî aboriyê ye. Çîna ku Doğan amaje pê dike, çîna burjuwaziyê ye ku di Şoreşa Fransîzî de bi roleke mezin rabûye. Yanî Doğan, berî her tiştî dixwaze çîna navîn çîneke burjuwazî a Kurdan ava bibe. Ê bêjara xwe a neteweparêziyê jî, li ser ramana hebûna çîna burjuwazî neteweyî a demokratîk ava dike.

Di warê zimên de, nivîseke bi sernavê “Tîpên Me û Hêsanîya Xwendinê” heye ku bi navê Süleymaniyeli Mesud (Mesudê Silêmanî) hatiye nivîsîn. Di vê nivîsê de çêla çetiniya hînbûn û xwendin û nivîsîna bi tîpên Erebî tê kirin. “Ji bo hînbûna şeş tîpan hewce dike ku mirov bi heştê texlît şiklan (tîpan) hîn bibe. Peyta vê yekê jî ew e ku tîpa ‘h’ bi dozdeh awayên ku naşibin hev tê nivîsîn” (Rojî Kurd, hej: 1, 29). Mesud, bi vê ravekirina xwe, helwestek jî datîne li hember elfabeya Erebî ku bi vî awayê xwe ve, ji bo zimanê Kurdî zêde ne kêrhatî ye. Loma jî bi gotinên, “Ev çil şiklên tîpan ku li her derê dikare were bikaranîn û di her çapxaneyê de peyde dibin, têr dikin” (Rojî Kurd, hej: 1, 29) elfabeyê taybet pêşkêşî xwendevan û weşangerên kovarê dike. Ev pêşniyaz helwesteke dîrxistina ruh û qalibê Kurdî a ji qalibê Erebî ye ku berê xwe dide jêderkê. Lê belê Mesud, dîsan di nav forma heyî, yanî di nav tîpên Erebî (an jî Aramî) de ku tîpên kitêba pîroz e jî, çareserîya vê yekê pêşkêş dike. Dîsan di nivîsa bi sernavê “Kurdîtî û Misilmantî” de (Rojî Kurd, hej: 2, 50), Babanzade İsmail Hakkı, balê dibe ser hevrenîya Erebî û Latînî ku her yek wek zimanê pîrozwer ê olan bûn û wiha dibêje, “(...) Bi vî awayî ronakbîr û rêberên hemû neteweyan, girîngiyê layekî (talî) didan zimanê xwe û xwendeyên me jî hemû xîreta xwe didan ser zimanê ola me ku zimanê Erebî ye. Li Ewrûpayê jî

zimanê Latîni bi heman rolê radibû.” Hevok pêşî seqayeke gazinckirinê ava dike lê piştî fikar an jî sawa li hember Erebi heye derdikeve pêş. Pîrozwerî rê nade ku mebesta esasî derkeve pêş; û bêjara xwe a bingehîn ava bike. Babanzade bi van gotinan didomîne, “Divê Tirk bizanibe ku gava ziman û wêjeya Tirkî bi pêş de bibe ew ê di heman demê de Îslamiyetê jî berzûbala bike, her wiha Kurdî jî, Erebi jî...” (Rojî Kurd, hej: 2, 50-51). Bi vê hevokê, rê hatiye dîtin ku zimanê neteweyî ji zimanê pîrozweriyê ku li pêşberî ramana neteweparêziyê asêti û berastengî çêdike, were bêrîkirin û bêyî ku neyînkirinek were pêkanîn, mebesta hîmî hatiye gotin. Babanzade, gotinê li dor raman û mebesta xwe li ba dike û wiha didomîne, “Gava mirov girîngî bide zimên û xebatên berhevkarî û geşepêdana ziman bike tu car nayê wê wateyê ku mirov ramana neteweparêziyê derdixîne holê ku Fransiz jê re dibêjin, ‘nasyonalîte.’ Jixwe ramana neteweparêziyê şer’ên jî hatiye qedexekirin. Divê em ne ji bo ku bi zimanê xwe î neteweyî di Îslamiyetê de ciyawaziyê çêkin, divê em ji bo berzûbalakirina Îslamiyeta ku hestên hevpar û neteweya hevpar di xwe de dihevine, zimanê neteweya xwe hîn bikin.” Babanzade tu bêjareke aşkera danayne holê ku em karibin bêjin di ser ramana neteweparêziyê re û bi mebesta avakirina zimanê neteweyî hatiye gotin. Ew saw û fikarên xwe didomîne û –ji bo ku bi rayedar û desthilatên heyamê ên Osmanî re neyê pêşberî hev- di ser mandelekirina girîngiya zimanê neteweya xwe, di ser prensîba ‘umetiyê’ re çêla zimanê xwe î neteweyî dike û di her şert û mercê de jî car di hemû kar û xebatên ku dê tê de bînin kirin jî bi olê ve girê dide. Her wiha, Babanzade tu gotineke ku em karibin bêjin mebesta avakirina zimanê neteweyî dihevine nake; loma jî bêjara wê jî ava nabe.

Nivîsara bi sernavê “Ziman û Nezaniya Kurdan” ku bi Kurdî û ji alî Modanî X. (*Xelil Xeyalî*) ve hatiye nivîsîn, bi pirsê ku dike, hemû saw û fikara Babanzade pûç dike û berê xwe dide ser rê û xeta bêjara avakirina zimanê neteweyî. Wiha dibêje Modanî X., “Çiqa mêze dikim, bi tu awayî bi serê min nakeve ku melayê dime, xwendayê dime bo çî qisetê xwe be Kurdî dikin û di medresan da dersê ku dixweynin be Kurdî me’ nayê wî divên” (Rojî Kurd, hej: 2, 67). Ev pirs ne tenê sedem û bingeha rexneyê ye. Ev lidijrabûnek e jî. Ev ji wêdetirî mandelekirinê, qîrînek e derbar xwe. Ev xwesteka liwacêxistin û hêjahîpêdana zimanê neteweyî ye; zimanê giyan e. Modanî X., mebesta xwe di nav pirsê xwe de dide der. Û wiha didomîne, “Wextê lazim bî, kaxidê xwe tennessûkê xwe ya bi Erebi, ya bi Farisî, ya bi Tirkî dinivêse û

be Kurdî nanivîse. (...) Çi ye xweş e êdî li ser sê xwedan birîn vî ji wê mêzekirin yê xelas bin” (Rojî Kurd, hej: 2, 67). Modanî X., behsa çemberekê ku ji alî sê zimanan ve dor li Kurdî hatiye kirin dike. Sînore vê çemberê, bi axê, bi neteweyê, bi çand û zimên hatiye xêzkirin. Loma jî Modanî X., wiha di gotina xwe de diçe, “Her çi derheq vê behsê bêjin û çi sebeb nîşan bidin berdayî ye, bergeyê tiştê nagirî. Çira ku îro dunya di dunyayê da hewqa millet û qewm heye ku ‘em yek wan qenc nas nakin’ hed û hesabê wî tune bi zimanê xwe dixwînin û dinivîsin, kitêban çê dikin û mekteb û medreseyê xwe da talîmî zarokê di xwe dikin” (Rojî Kurd, hej: 2, 67). Modanî X., balê dibe serê ku heke sînore vê çemberê neyê rûxandin, wê hingê çember dê gelek berfireh be; ji ber ku *hed û hesabê wî tune* em ê nizanibin ka sînore heta ku derê berfireh e jî. Yanî Modanî X., hewl dide ku bêje; deriyê vê çemberê tune ye; loma jî têderketin nîn e. Û rê û rêbaz ew e ku; divê wekî her zimanî Kurdî jî navend û sînore çembera xwe ava bike. Modanî X., di kovara Rojî Kurd de –û belkî di çaxa xwe de– yekem kes e ku bi nivîsara xwe ve, ne pîroziya Erebi, ne pêşketîbûna Farisî û ne jî desthilata Tirkî wek sînore çemberê –çembera ku zimanê wî tê de ye– qebûl nake û bi helwesteke wekhevîyane Kurdî bi wan zimanan re berawird dike û bêjara xwe a neteweparêziya zimanî di ser vê re ava dike.

Di nivîsara xwe a bi navê “Bilindbûna Kurdîniyê” de Babanzade Îsmâil Hakkî, mîna ku saw û fikarên xwe ên li ser pîrozweriya Erebi şikandibe, wiha dibêje, “Qewmê (*neteweya*) Kurd ku heta niha di nav nezaniyeke reştarî de bû, (...) ji bo ku di nav neteweyan de peywira xwe a pîrozwer xweşikî bi cî bîne, (...) divê rêya wê a ku têr kemîn û kend û kosp e, bi geşî û xurtî were ronîdarkirin.” (Rojî Kurd, hej: 3, 73). Gotina “peywira pîrozwer” bi me dide nîşan ku Babanzade şiqitînek di raman û baweriya pîrozweriyê de pêk aniye û loma jî dikare ji bilî nirx û hêjahiyên ola Îslamê çêla pîrozweriyeke di jî bike; helbet pîrozweriya nepenkirî a di vê hevokê de hebûna gelê (*neteweya*) Kurd e ku divê di nav *civaka gerdûnî* de ciyê xwe bigire. Babanzade, di pêdeçûna nivîsa xwe de, pala xwe dide ser zimên û wiha dibêje, “Tevî ku awayê gotinkî û axaftinkî ê zimanê Kurdî zengîn û rengîn e jî, tu rêz û giramgirî bi awayê wî î nivîskî nehatiye dayîn û jê bêpar hatiye hiştin. Nexwe, divê avahî ji nû ve bê lêkirin û ji niha ve hîm û bingeheke xurt were danîn. Di hafa mîrateya dîrokê de rûmeta Xaniyan çendî mezin be berpirsiya wê jî ew çend giran e” (Rojî Kurd, hej: 3, 73). Babanzade çêla avahiyekê dike; avahiya ku divê ji nû ve bê lêkirin. Nexwe

avahiyek hebûye û rûxiyaye an jî hatiye rûxandin. Jinûvelêkirina avahiyê, doz û daxwazeke wisan e ku sedem û jêderka wê digihîje paşxaneyekê; û ew paşxane jî dîrok bi xwe ye û mîrateya etnîsît a gelê (an jî neteweya) heyî ye. Loma jî Babanzade wekî hîm û bingeh di serî de Xanî û pêşrew û peyrewên wî nîşan dide. Xanî, li vê derê xala werçerxekê ye; ji alî zimên û nivîsîna bi Kurdî ve *–rêz û giramgiriya ku jê bêpar nehatiye hiştin-* pêşrew e û ji alî hestpêkirina cudabûna etnîsît *-neteweya ku hê nehatiye binavkirin-* ve jî wek destpêkek e. Babanzade, di pêdeçûna nivîsa xwe de çêla dara Kurdbûnê dike û du karên sereke wekî çiqlên hîmî ên vê darê destnîşan dike. “A yekem ew e ku divê em zimanekî Kurdî a nivîskî û sade çêkin. Û divê di tîpên Erebi de, ku dê pê bê nivîsîn, guherîn bê çêkin. A duyem jî, divê em kitêbên ku pêwistiya Kurdî pir zêde bi wan heye binivîsin. Wekî mînak rêziman û ferheng. Heta ev tunebin, avakirina fêrgehê nayê wê wateyê ku tu avahiyek lê kî û tê de zarokan kom bikî.” (Rojî Kurd, hej: 3, 74). Babanzade, çendî ku di asta ramanî de be jî bi van gotinên xwe ve, bêjara xwe a der heqê avakirina zimanê neteweyî de ava dike û di warê avakirina avahiyê de jî *–avahiya neteweyî;* yanî dareke gihîştî, mezinbûyî û temambûyî- rê û rêbazan derpêş dike. Ev bernîşankirinek e û divê ev bernîşankirin ji alî hinekan ve bê dîtin û nirxandin.

M.X. (Xelîl Xeyalî), vê bernîşankirinê dibîne û di nivîsa xwe a bi sernavê “Ziman” de, hejmara du çiqlên dara Kurdîniyê ku Babanzade diyar dike û hejmara çiqlan digihîne dehan. Çiqlên ku em jê behs dikin ev in: Ji bo xwendin û nivîsandinê hîref. 2. Ser terzek nû elîfbayek. 3. Ji bo zanîna temamê zimanê Kurdîtiyê “qamûsek” (luxatek). 4. Ilmî halek. 5. Tarîxê bavû kalê Kurdan we an’ane ya wan. 6. Welatê Kurdan we adet û teb’ê wan we mîqdar û navê eşîran. 7. Kitêbê hîsâbê. 8. Ji bo zimanê Kurdan serf û nehvek (rêziman). 9. Tercumeyê halê mezinê di Kurdan. 10. Edebiyata Kurdan we navê şairê wan. (Rojî Kurd, hej: 3, 88) Digel vê yekê jî, M.X (Xelîl Xeyalî) ew kes e ku bi dîtina berşankirina Babanzade namîne; bi vî karî radibe û car pêşî yekem elfabeya Kurdî ku tîpên Erebi ji xwe re dike bingeh, amade dike û ev elfabe li Stenbolê tê belavkirin, (Malmîsanîj, 2002: 101).

Em di Rojî Kurd de, bes rastî şî’îrek tîn ku bêjareke neteweparêziyê dihewîne. Şî’îra bi navê “Xwendin û Xebat” ku ji alî Fazil Mûxlis Eşîrmilî ve hatiye nivîsîn (Rojî Kurd, hej: 1, 4) bi teşeya beytan hatiye nivîsîn. Beyta yekem wiha dest pê dike; “Her nefse Kurd êdî çavê xû lazim vekî/Diz hat gihîşt neqebê tedbîra xû çê

bike” Şi’îr bi bangewaziya şiyarbûnê û bi haypêxistinekê dest pê dike û agahiya xetereyên gengaz ku dê derkevin pêşiya *nefsê Kurd* dide. Pê re jî tiştê ku divê bê kirin dibêje, “Tedbîra xû çê bikin hewesê bikin dil bikin/Mekteb li her cî vekin xo bidin sewlekê” Şi’îr bi giştî eşîr û êl û mirovên Kurdan gazî yekbûnê dike. (Rojî Kurd, hej: 1, 44). Ji vê beytê em fam dikin ku xetereya ku agahiya wê tê dayîn, nezanî û nehişyarî ye ku gengaz e ku di siberojê de bibe sedema şûndemana Kurdan –*Wê hingê hê xweşîkî zelal û aşkera nîn e ka Kurd di dîrokê de şûnde mane an na.* - Ev beyta ku di xwe de gengaziyekê dihewîne di heman demê de hêviyeke nepen jî dixwe nava xwe. Loma jî di beyta li dû wê beytê de wiha tê gotin, “Dunya îro qelibî ser xwendin û ser pere/Her çî kê îro dewletê jêra nikanî qet êkî” (Rojî Kurd, hej: 1, 44). Hêviya çêlkirî, dewletek e ku li ser pere û xwendinê şên bûye. Herçî xwendin e, wek çareya nezanînê û şiyarbûna di warê neteweyî de wek rê û rêbazeke sereke tê qebûlkirin û çendî ku qels be jî hewl tê dayîn ku ramana Kurdbûnê di ser ronakbûn û xwendewariyê re ava bibe. Ev xwestek di nivîsar û nivîskarên *Rojî Kurd* de pir zêde beloq û li ber çavan e. Şi’îr bi her sê beytên xwe ve wiha bi dawî dibe. “Xwendin li ciyê tînin da derhal digihê meriya/Xwendin li her awayî xelas dikî ji tengî/Mexsed li va gotina ser kar hem xwendina/Hûşyar li ser xo bikin derwe hizir ho hêkê/Yarî nema bi cib her millet ho derê/Gotinek ne lazim ji wî zêde bêjin kelîmekî” (Rojî Kurd, hej: 1, 45). Xwendin rizgarker e; hem derbar xwe hem jî derbar gelê (neteweya) xwe. Ê rizgarkeriya xwendinê di milletên (neteweyên) dîtir de hatiye peyitandin loma jî risteya ‘*yarî nema bi cib her millet ho derê*’ bi dû xwendinê de tê ku wek çare û çareseriyê esasî û hîmî tê dayîn û derpêşkirin. Xwendina ku rêya bivênevê ye dê bi xwe re hişyariyeke hişî û ramanî jî çêke; û bi vî awayî dê Kurd hay ji seqa û rewş û guherînên dinyayê bibin û di warê neteweyî de jî bibin xwedî hizir. Ê dinyaya ku *îro qelibîye ser pere* jî digel van her du hêmanên girîng ên ronakbûnê, li mirovan xweş dibe û jê wêdetir jî *gotinek ne lazim ji wî zêde bêjin kelîmekî*.

Gava em li demajo û konjonktura avakirina CHyê. û weşandina Kovara Rojî Kurd dinêrin, em dibînin ku heta sala 1913an, di serdema Osmaniyan de du serfihildanên Kurdan pêk hatine. Serfihildana Emîr Bedîrxan ku bêtir bi doza domandina desthilata mîrtiyê li dar ketiye ku di wê heyamê de dewleta Osmanî polîtîkaya navendîkirinê û dawîlêanîna pergala xweseriyê mîrtî û begtiyan dimeşand. Ev serfihildan, ji raman û îdeolojiya neteweparêziya Kurd a modern bêpar bû; û loma

jî nekarî zêde kartêka xwe li ser civaka Kurdan bihêle da ku ji bo reşexelk û reşekurd bibe sedemeke xurt a hişyariyê. Piştî vê serîhildanê, serîhildana Şêx Ubeydullah li dar ketiye ku doz û daxwaza Kurdistaneke serbixwe kiriye. Lê belê ev doza hanê jî ne di asta ramanêke îdeolojîk de, lê bêtir di asta danîna desthilatekê û xwedîbûna axekê de li dar ketiye û wek raman û îdeolojî mîrateyeke zêde nehiştiye ji neteweya Kurd re.

Em di ser van kartêkan re li naveroka kovara Rojî Kurd û nivîsarên tê de cî girtî dinêrin, em pir xweşikî û bi zelalî dibînin ku; di warê Kurdayetiyê (yanî di warê ramana netewbûn û neteweparêziyê) de hewldanek heye ji bo hişyarkirina gel. Lê ev hewldan jî ji ramanêke xurt a neteweparêziyê a danandî bêpar e. Loma jî, nivîsarên tê de, çendî ku wek mijar bi neteweparêziya Kurd ve pêbestî bin jî, ji alî naverokê ve qels in û her û her meyla rênîşandêriyê dikin û ji aliyekî ve jî hewl tê dayîn ku rêbaza birêkxistinkirinê a modern bê meşandin.

Em dikarin bêjin; ji ber helûmercên heyam û demajoya ku Rojî Kurd tê de weşiyaye, kovar (û nivîsarên tê de cî girtî), di biwara avakirina bêjara neteweparêziyê û zimanê neteweyî de qels e; û ji ber hoy û sedemên heyî ku hatin ravekirin jî, di heman biwarê de wek hewldaneke tênekir derdikeve pêş û wek weşanekê jî –rê û rêbaza birêkxistin û perwerdekirina modern- ji hêla avakirina hest û ramana zimanê hevpar jî kêmmayî –an jî temamnêbûyî- ye.

2.3.3.1.2 Kovara Yekbûn û Bêjara Neteweparêz

Kovara Yekbûn li Stenbolê bes çend hejmar derketine. Li gorî ku Malmîsanîj xwe dispêre Yamulki û radigihîne, Dr. Kemal Mezher Ehmed di vî warî de wiha gotiye, “Xwendekarên Kurd ên li Stenbolê komeleya Hêvî ava kir û di sala 1913an de dest bi weşandina kovara Rojî Kurd kir. Di wan gavan de kovareke dî a bi navê Yekbûn jî dest bi weşanê kir... Rewşen Bedirxan ku pîreka Celadet Bedirxan e, hin nivîsarên bavê xwe Salih Bedirxan dabûn min ku di kovarên Yekbûn û Rojî Kurd de weşiyabûn...” (Malmîsanîj, 2002: 146-147). Heke em bînin ser armanca weşandina Yekbûnê, em ê car dî bala xwe bidin ser Malmîsanîj ku dibêje, “Di hejmara sêyem a Yekbûnê de, bi nasnavê Müncî[î] Kürdî sernivîsek hatiye nivîsîn û di sernivîsê de bi sê xalbandên sereke wiha tê gotin, “1- Divê ji bo Kurdan elfabeyeke hêsan were

amadekirin ji ber ku xwendin û nivîsîn di nava Kurdan de kêmhejmar e. 2- Divê xort û ciwan xwe nedin ber bayê azweriya siyasetê. 3- Divê xort şeref û rûmeta herî mezin di xizmetkirina doza milî de bibînin” (Malmîsanîj, 2002: 147-148). Ji vê sernivîsê jî tê famkirin ku dîsan armanc hişyarkirina pêjna neteweyî ye û ev yek di biwareke weşanî a Kurdî de tê kirin û; car dî ziman wekî sedema sereke û bivênevê a netewebûnê tê dîtîn û qebûlkirin; û ev bêjara hatî derpêşkirin bes bi vê armancê radibe. Her wiha, gelek balkêş û watedar e ku di xalbenda duyem de tê gotin, ‘Divê xort û ciwan xwe nedin ber bayê azweriya siyasetê.’ Çendî ku di xalbenda yekem de jî bo ziman bal tê kişandin jî, ji ber çavan tê windakirin ku xalbenda yekem bi xwe pêkanîna reng û awayekî siyasetê ye. Ji ber ku gava zimanek di bin zimanekî an jî zimanên dîtir de mabe û wekî zimanekî ne li kar, ne zimanekî fermî û ne zimanê perwerdehiyê be, her gotin, bêjar, xebat û pêkanînen li ser wî zimanê ku wek jêziman hatiye dîtîn, siyaset bi xwe ye; siyaseta zimên e. Digel vê yekê em heman nakokiyê di xalband sêyem de jî dibînin ku dibêje, ‘Divê xort şeref û rûmeta herî mezin di xizmetkirina doza milî de bibînin.’ Di vê xalbandê de pirsin hene ku divê em li serê bisekinin: Gelo ji gotina *doza milî* çî tê armanckirin? Gelo peyva milî çî dinimîne û dihewîne? Heke em xalbenda yekem li xwe bikin bingeş û ji peyva *milî* neteweya Kurd fam bikin, car dî em ê karibin bêjin divê doza milî, doza neteweyî a Kurdan be. Û heke armanc ji doza neteweyî a Kurdan be, ev doz bêyî siyasetê nagihîje serencama xwe. Loma jî em bi dilekî hêsa dikarin bêjin; tevî ku xalbenda yekem û sêyem li ser hîm û rengê bêjara neteweyî hatibe danîn jî, xalbenda duyem her du xalbendan jî pûç û bêwate dike. Ev yek di berdewama nivîsê de bêtir dide der. Malmîsanîj ji gotinên Musa Anter radiguhêzîne ku Mûncî[î] Kürdî “ayetek” ji Qur’ana pîroz jêgirtinê dike û wiha dibêje⁷; “(...) Çi kesê ku xwedî Aqlê Mihemediyê ye, divê mîna ku dê qet nemire xizmetî miliyetê xwe bike, ji bo yekîti û pevretî û balabûna wî bixebite û miliyeta xwe ji zilm û zilmkaran biparêze. Lê divê ji bo berjewendiyên xwe ên takekesî jî her tim wekî mirovekî ku li mirinê dipê, tevbigere” (Malmîsanîj, 2002: 148). Mûncî[î] Kürdî bi xwe bi peyva *miliyetê* dixwaze balê bibe ser Kurdbûnê. Loma jî, çendî ku armanca nivîskar a ku di mêjiyê

⁷ Li gorî lêkolîna ku me di Qur’anê de kirine, tu ayeteke Qur’ana pîroz a yekpare a bi vî rengî tune ye, loma jî em dikarin bêjin ku Mûncî[î] Kürdî di van gotinên xwe de, ji çend ayetên Qur’anê şîroveyeke hevpar dike.

wî de zelal e jî, peyv û hevokên wî şermîn û fikarok in û derbirana mêjî û ramanekê ye ku negihaye serencama xwe û hîma xwe dananiye.

2.3.3.1.3 Kovara Hetawî Kurd û Bêjara Neteweparêz

Hetawî Kurd yek ji wan kovaran e ku CHyê li Stenbolê derxistiye û belav kiriye. Cemil Paşa der heqê kovarê de vê agahiyê dide û dibêje, “Piştî ku kovara Rojî Kurd ji alî hikumatê ve hat qedexekirin, kovara Hetawî Kurd hat derxistin. Xortên Kurd di van kovaran de nivîsarên hêja û serkeftî dinivîsîn” (Cemil Paşa, 1991: 41). Li gorî ku Malmîsanîj radigihîne me, “Kovar herî kêr deh hejmar weşiyaye û di her sê hejmarên pêşî de, (20 Haziran 1330/9 Şaban (1332[1914] li ser bergê wiha dinivîse; “Bo vî qasî ji pazdeh rojan carekê diweşe” (Malmîsanîj, 2002: 150). Di kovarê de, nivîsarên Tirkî û zaravayên Kurdî ên Kurmancî û Soranî belav bûne. “Di kovara Hetawî Kurd de kesên wekî Dr. Abdullah Cevdet, Babanzade İsmail Hakkı, Şehab Malverê Bitlisî, Fikrî Necdetê Diyarbekirî, Zêwerê Silêmanî û gelek kesên di nivîsîne” (Malmîsanîj, 2002: 150). “Hetawî Kurd heta daxuyana seferberiya sala 1914an, bi qasî deh hejmar weşana xwe bi awayekî perîyodîk didomîne û piştî ku şerê dinyayê ê yekemîn derdikeve, hew weşanê dîke” (Cemil Paşa, 1991: 41-42).

“Çendî ku nivîsarên di kovarê de bêtir ji bo ku çand û eşîr û bajar û cografyaya Kurdan bi Kurdan were nasandin, hatine nivîsîn jî, di warê bêjara netewe û avakirina zimanekî neteweyî de çend mînak hene li ber çavan. Di kovara Hetawî Kurd de hin name hatine weşandin û di bin sernavê “Nameyên Kurdistanê” de bajar an jî herêm hatine nasandin” (Malmîsanîj, 2002: 154). Heke em bala xwe bibin ser navê Kurdistanê ku di navê “Nameyên Kurdistanê” de hatiye bikaranîn, dibe ku ev yek li me wekî bêjarekê xuya bike û em bilêvkirina peyva Kurdistanê wekî sînor û desthilateke teritoryal fam bikin; lê ev yek dê şaş be. Ji ber ku peyva Kurdistan ku li vê derê hatiye bilêvkin, bes navê cografyayek e ku di wî wextî de di nav dewleta Osmanî de bi awayekî fermî jî wekî eyaletekê dihatî zanîn û wekî herêmekê dihat qebûlkin.

Li gorî ragihandina Malmîsanîj ku dibêje, “Her wekî ku di hejmara dehan a kovarê de jî tê diyarkirin, ‘armanca kovarê xizmetkirina kurdayetiyê ye” (Malmîsanîj, 2002: 155) em dikarin bêjin ku; çendî ku di warê avakirin û belavkirina

bêjareke neteweparêziyê de zêde ne xurt be jî, dîsan armanca kovarê li ser vê mebestê ye. Û pê re jî em dikarin mînakekê ji nameya Nameyên Kurdistanê bidin Malmîsanij wiha radigihîne me û dibêje, "... Endamekî eşîra Têrkan ê bi navê Cindo, piştî ku di nameya xwe de ji herêma Siwêregê agahiyên girîng dide, wiha dibêje, *'Gundên ku min navên wan li jor nivîsîn –ku gundên sereke ên eşîrê ne- heke em du sê axayan wekî awarte bihesibînin, tu yek ji gundiyan ji bilî Kurdî bi tu zimanî nizanin'*" (Malmîsanîj, 2002: 155). Belê, li vê derê bi gotina *'ji bilî Kurdî bi tu zimanî nizanin'* armanc balkişandina jêbûneke (aîdîyet) etnîsîteyê ye ku em dikarin bêjin; heke wê hingê hişberî û zanîna netewetiyê di nav Kurdên xwende de ew çend xurt û pêşketî nebûbe jî, hişberiyê wekî gelê Tirk, gelê Kurd, gelê Ermen, gelê Ereb, gelê Faris, gelê Rûs di nav Dewleta Osmanî de heye û di nav gelan de jî ev yek berbelav e. Loma jî, ev yek balkişandineke taybet e ku gotina *'ji bilî Kurdî bi tu zimanî nizanin'* wekî bêjareke etnîsîtê bikaranîn û di ser zimên re (ev ziman zimanê gelekî-neteweyekê ye) bêjareke zimênî tê bikaranîn û herêm jî ji alî sînorekî cografîk ve û dîsan di ser zimên re wekî cografyaya Kurdan tê diyarkirin.

Çendî ku di Hetawî Kurd de, di biwara bêjara netewe û avakirina zimanê neteweyî de, nîşane û agahî hindik bin jî, em nikarin bêjin di vê kovarê de bêjara neteweparêz qet nehatiye bikaranîn. Em dikarin li gorî helûmercên wê hingê bêjin ku; tevliheviya herêmî û dinyayî dest pê kiribû û hêdî hêdî bilqebilq bi dîza şerê dinyayê ê yekemîn diket û digel Dewleta Osmanî, Kurdan jî wekî teba û kêmarek para xwe ji vê tevliheviyê hildida; loma jî di hin nameyan de ev yek, bêjara neteweparêz, wekî mebesteke nexuya (an jî hatî nexuyakirin) derdikeve pêşberî me.

2.3.3.2 Heyama Duyem a Cemiyeta Hêvî

Di heyama yekem de, ji alî Dewleta Osmanî ve gelek rê û rêbaz hatine hêçandin da ku karibin xebatên CHyê werin sekinandin. Li gorî ku Kadri Cemil Paşa (Zinar Silopî) radigihîne, CH di warê ciyê cemiyetê de dikeve tengasiyê û Hamdullah Suphi Bey ku wê hingê serokê Türk Ocağı'yê ye, pêşniyaz dike ku bila CH tev li Türk Ocağı bibe û ew dikarin di avahiya xwe de cî bidin wan. Zinar Silopî, bi me radigihîne û wiha dibêje, "Armanca vê pêşniyazê fetisandina xebatên kurdayetiyê bû. Lê di kongreya cemiyetê ku di sala 1913an de hatiye kirin, hin nelihewî û geneşeş

derketine. Der heqê rêveberên cemiyetê de doz hatine vekirin û bi destpêkirina şerê dinyayê ê yekemîn re jî endamên çalak ên cemiyetê çûne leşkeriyê û CHyê ji bêgavî kar û xebatên xwe daye sekinandin” (Cemil Paşa, 1991: 42). Em ji van agahiyên Kadri Cemil Paşa fam dikin ku; çendî ku CHyê di heyama xwe a yekem de xwestiye û li xwe kiriye armanc ku di nav Dewleta Osmanî de, bi rêya weşan, dibistan û kovaran hin çalakiyên perwerdekirin û hişyarkirina Kurdan pêk bîne jî, ji ber rewşên konjonkturî û tevger û kirinên xêrnexwazan mebesta wan neçûye serî.

Piştî ku şerê dinyayê ê yekemîn bi dawî dibe, CH li Stenbolê car dî tê avakirin. Li gorî ku Malmîsanîj radigihîne, Memduh Selim Bey ku sekreterê giştî ê heyama yekem a cemiyetê ye û di heyama duyem de jî yek ji avakarên cemiyetê ye, di kovara Jînê de ku weşana cemiyetê ye û bi Kurdî û Tirkî weşanê dike, wiha dibêje, “ (...) Îro tu yek ji kekên me ên mezin tune ye di navbera wan kesan de ku alaya Hêvî car dî bilind dikin” (Malmîsanîj, 2002: 166). Ji vê gotina Memduh Selim Bey aşkera dibe ku heyama duyem a CH ji alî kes û xort û xwendekar û rewşenbîr û xwendeyên nû ve hatiye vekirin. Di danezana cemiyetê de ev gotin bala me dibe ser xwe. “Cemiyeta Hêvî a Xwendekarên Kurd, berî her tiştî bawer dike ku; hokarên hîmî ên ku dê xweşî û aqûbeta neteweyekê abadîn bikin, ji hebûn û maldariya aborî û zanistê pêk tê” (Kovara Jîn, 1986: 905). Ev gotin, bala me dibe ser teoriyên ku ji bo avabûn û pêkhatina neteweyekê, helûmercên kapîtalîst û kartêkên wê sîstemê ji xwe re dikin esas û bingeh. Her wiha rewşenbîr û xwendeyên Kurd ên wê demê jî bawer dikin ku Kurd di nav sîstemeke kapîtalîst de dijîn û kartêkê jê digirin. Loma jî wê hêz û bawerî û zanîne di xwe de dibînin ku bêjareke bi vî rengî bi kar binin li ser netewe û neteweparêziya Kurdan.

Di berdeyama danezanê de wiha tê gotin, “... Ji ber vê yekê ye ku Ciwanên Kurd ji bo ku neteweya Kurd bigihîje cî û asteke bi rûmet ku li gorî reng û taybetiyên wê ye, divê berî her tiştî baweriya Kurdbûnê, namûs û mengîweriya wê were parastin... Wekî dî jî, xortên Kurd hay jê hene ku zengîniya Kurdan ji zengîniya neteweyên dîtir zêdetir e û ew ê nehêlin ku neteweya wan li ber destê neteweyên dîtir bibin parsek...” (Kovara Jîn, 1986: 906). Di hevoka “zengîniya Kurdan ji zengîniya neteweyên dîtir zêdetir e” de balpêkirinek heye ku berê me dide zengîniya neteweyî ku yek ji hêmanên wê zengîniyê, çand û folklor e. Û bi armancekê tê gotin ku dê xebat bê kirin da ku ev zengîniya hanê di siberojê de bigihîje cî û asta xwe a heqkirî.

Piştî van gotinên bêjarî ên li ser neteweparêziyê, di danezanê de gotin tê ser zimanê Kurdî û wiha berdewamî dide xwe: "... Di vê navberê de, zimanê me î ku ji zimanê Farisan e û ji alî jêderk û dîroka xwe ve ji zimanê Aceman serwertir e, di hin waran de şûnde maye. Loma jî dê xebat bîn kirin ji bo ku zimanê me di demeke kin de bibe zimanekî ku pê tê nivîsîn. (...) Ji bo ku bibe zimanê nivîskî, divê lijneyek ku hemû zaravayên zimanê Kurdî dizane bê avakirin û gramerek û "ferhengeke neteweyî" were amadekirin. (...) Û di vî warî de jî dê berhemên kevn ên dîrokî, wêjeyî û zanistî ên Kurdî bîn berhevkirin û ji nû ve bîn çapkirin..." (Kovara Jîn, 1986: 918-919). Di van gotinan de serê pêşîn bala me diçe ser berawirdkirina zimanê Kurdî a bi zimanê Aceman re. Loma jî, çendî ku bi gotinên, "... di hin waran de şûnde maye..." tê qebûlkirin ku Kurdî têrî hemû tiştên jiyanê nake jî, hewldanek heye ku vî zimanî wekî zimanekî serwer bidin nîşandan; loma jî bi zimanê Aceman re tê berawirdkirin; û ev berawirdî biwarek peyde dike ji bo bêjara ku dê bibe hîm û bingeha avakirina zimanekî neteweyî. Û di berdewama danezanê de tê armanckirin ku "... berhemên kevn ên dîrokî, wêjeyî û zanistî..." pêşî bîn berhevkirin piştî jî ji nû ve bîn çapkirin. Li vir bala me diçe ser wê yekê ku; heke kitêbek an jî hin kitêb hebin ku dîroka Kurdan nîşan bidin û bidin zanîn, dê arîşeya jêderkê jî ji holê rabe. Û ev yek dê ne tenê bi kitêbên dîrokê, lê belê bi kitêbên wêjeyê jî bîn kirin ku ji hingê ve tê zanîn ku wêjeya zimanekî ji aliyekî ve jî kewara hiş û bîra dîrokî a neteweyekê ye; loma jî, di cî û warên ku dê kitêbên dîrokî tê de têr nekin, wêje –bi taybetî wêjeya gelêrî û berhemên folklorîk- bi bîra neteweyî a ku di xwe de dihewîne, bibe hîm û bingeha qayîmkirin û qewîkirin û bistûnkirina bêjara neteweparêzî û avakirina zimanekî neteweyî.

Kovara Jîn, weşîneka yekem a heyama duyem a CHyê ye. Li gorî Cemil Paşa "Kovara Jîn, ji alî CHyê ve hatiye derxistin" (Cemil Paşa, 1991: 61). Û li gorî agahiya ku Malmîsanîj dide me jî, "Weşaneke dî a Hêviyê jî "Hînkê Zimanê Kurdî, Rehberê Ziman ê Her Du Kurdî: Kurmancî, Babanî ye" (Malmîsanîj, 2002: 183).

2.3.3.2.1 Hînkê

Hînkê pirtûkçeyek e ku ji bo kesên ku dixwazin hînî zimanê Kurdî bibin wek rêberek hatiye amadekirin û di sala 1921ê de li Stenbolê hatiye çapkirin. Di hînkê

de bi du zaravayên Kurdî, Kurmancî, Babanî deqên xwendên û dersê hatine amadekirin. Piştî salekê ji weşandina Hînkerê, yanî di sala 1922yan de xebatên CHyê hatine qedexekirin. (Hînkerê Zimanê Kurdî, 2008: 36). Li gorî ku Malmîsanîj bi me dide zanîn, li ser pirtûkçeyê nîşankirineke wekî, “Ji neşriyatê Hêvî-Civata Telebeyê Kurdan, jimar: 1” (Malmîsanîj, 2002: 183) heye û em ji vê yekê fam dikin ku Hînker weşana yekemîn a Cemiyeta Hêviyê ye. Di Hînkerê de, nivîseke bi navê ‘çend gotin’ heye ku wekî beşa pêşekî ye û li ser navê Hêvî Civata Telebê Kurdan hatiye nivîsîn. Nivîs wiha dest pê dike, “Ev kitêba piçûk û ne hêja (Hînkerê Zimanê Kurdî) em çap dikin rêberkî bibe bo wan hevalan ku ziman(ê) kurdî nizanin; vî eserê xwe da em dixwazin bi tenê peyivîn(a) ziman(ê) kurdî hîn bikin. Loma em baş bala xwe nedane li imla û qawaid” (Hînkerê Zimanê Kurdî, 2008: 44). Em ji vê destnîşankirinê tê digihîjin ku armanca weşandina Hînkerê, perwerdekirina ji alî zimên ve ye ku bêtir hînkirina xwendinê û famkirina ji zimên dide ber xwe. Ev hewldan wekî giştî ji bo wan kesên ku bi Kurdî nizanin, tê dayîn. Nivîs wiha didome, “Hingî ji me hatiye em xebitîne galegal çawa tê gotin usa bê nivîsîn. Bi nivîsîna ev kitêb carkî dî jî baş xuya dibe em çîqa hewce adilandina wan herfan e” (Hînkerê Zimanê Kurdî, 2008: 44). Ji vê hewldanê bala me diçe ser xebata avakirina zimanekî hevpar ku dê bibe zimanê neteweyî. Di vê hewldanê de a balkêş ev e; zimanê neteweyî ku hewldana hevparbûn û standartbûna wî tê dayîn, ne bi şêwe û desttêwerdaneke ji jor de û jakobenîst tê avakirin, lê bi gotina, *em xebitîne galegal çawa tê gotin usa bê nivîsîn*, xebat di ser zimanê heyî re tê kirin ku ev ziman, zimanê axaftina rojane ye. Ev yek, yek ji rê û rêbazan e ku di avakirina zimanê neteweyî de serî tê pêkanî, lê digel vê jî ne rêbaza hîmî ye. Her wekî Porzig jî dibêje, “Zimanê hevpar ne ew awayê zimên e ku hîm û bingeha wî di devokan de tê parastin. (...) Zimanê hevpar ku dibe zimanê neteweyî, zimanekî bilind e ku bi wêjeyê (wêjeya gelêrî jî tê de) û bi perwerdehiya giştî digihîje teşe û wateya xwe.” (Porzig, 1974: 23-53). Ji bo avakirina zimanê neteweyî hewldan û xebateke taybet divê. Wekî encama vê hewldan û xebatê her endamên neteweyê, heke bi heman rengî neaxive jî, ji vî zimanî fam dike. Loma jî ev hewldana cemiyetê a bi amadekirina kitêba Hînker, her wekî di pêşekê de jî hatiye gotin, tenê hînkirina axaftina bi zimanê Kurdî li xwe dike armanc.

2.3.4 Komeleya Pêşketina Kurdistanê

Piştî şerê dinyayê ê yekemîn, zana û rewşenbîrên Kurd, dixwazin rewşa aloz û tevlihev a ku piştî şer li welêt û di rêveberiyê de derket holê, bi kêrî xwe bînin û ew ji bo geşkirina xebata neteweyî û ji bo hişyarkirin û danîna serdestiya Kurdan ketin nav hewlekê. Xwende û bîrewerên Kurd ên ku di demen bere de jî xebat kirine, digel hin rewşenbîrên dîtir Komeleya Pêşketina Kurdistanê ava dikin.

Li gorî ku Îsmail Göldaş radigihîne, Komeleya Pêşketina Kurdistanê, di 17ê kanûna pêşîna a sala 1918an de ava bûye. (Göldaş, 1991: 13-14) Çendî ku belgeyek di destê me de tune ye ku vê roj û dîrokê piştrast bike jî, li gorî rojnameya Sabahê ku di 23yê kanûna pêşîna a sala 1918an de derçûye, vê agahiyê dide me: “Hürriyet ve İtilaf Fırkası’na ittifakla müzaharet ve muavenete karar vermiştir.” (Çamsoy, 2007: 66) Her wiha, ji alî rêveberên komelê ve daxwaznameyek ku di 30yê kanûna pêşîna a 1918an de bo Wezaretê Karûbarê Hundirîn hatiye dayîn. (Tunaya, 2015: 185) Çendî ku ev nûçeya rojnameya Sabahê piştî şeş rojan hatibe belavkirin û daxwaznameya avakirinê piştî 12 rojan tê dayîn jî, li gorî van agahiyan em dikarin bejin, Komeleya Pêşketina Kurdistanê, di meha kanûna pêşîna a sala 1918an de ava bûye. Her wiha di nav avakarên komeleyê de, kesayetên wek serok, Seyîd Evdîlqadir (Şemzînan), Emîn Alî Bedirxan (Botan), Mîralay Halid Beg (Dêrsim) Şükrü Baban (Silêmanî), Şefik Ervasî (Wan), Evdirrehîm Rehmî (Hekarî) Law Reşîd û Kemal Fewzî hene. (Tunaya, 2015: 186-187).

2.3.4.1 Kovara Jîn û Bêjara Neteweparêz

Li gorî ku Kadri Cemil Paşa (Zinar Silopî) radigihîne, Kovara Jînê weşaneke Cemîyeta Hêvî ye. Z. Silopî wiha dibêje, “Hêvî ku ji nû ve dest bi kar û çalakiyan kir, kovareke bi navê Jîn diweşand û parastina doza neteweyî a Kurdan dikir” (Silopî, 1991: 60) Lê belê, M. Emîn Bozarslan jî radigihîne ku “Jîn di payîza sala 1918'an da li Stenbolê dest bi derketine kirîye. Wisa tê zanîn ku organa ne resmî ya Komela Pêşketina Kurdistanê bûye. Jîn 25 jimare hatîye weşandin. Tarîxa jimareya pêşîna 7/11/1918 ye.” (Kovara Jîn, 1986: 5) Di dema weşîna kovara Jînê de Kurdistan hê jî du parçe bû û bi temamî di bin desthilata dewleta Osmaniyan de bû. Li gorî ku M. Emîn Bozarslan dide zanîn, “Xwende û zana û xwendekarên Kurd ên ji hemû

herêman ên wê demê ku li Stenbolê ne, bûne yek û ev xebat meşandine. Tewr çend Kurden Kurdistanê Rojhilat jî di nava wan da hebûn. Kovara Jîn li Stenbolê û bi temamî bîst û pênc hejmar derketîye. Serkar û berpirsiyarê kovarê, berê Hemzeyê Muksî bûye. Berpirsiyarîya Hemze ji jimareya pêşîn heta jimareya 20î dom kirîye. Ji jimareya 21ê heta jimareya 25an, yanî heta jimareya paşîn jî Memdûh Selîm bûye berpirsê kovarê. Yekem hejmara Jînê di 7/11/1918an da derketiye. Jimareya "Jîn"ê ya dûwayîn di tarîxa 2/10/1919an da derketîye. Piştê wê tarîxê kovar hatîye girtin. Di kovarê de her du zaravayên Kurdî yên sereke, Kurmancî û Soranî, tev hatine bikaranîn; bi her du zaravayan jî nivîsar û helbest tê de hatine weşandin." (Kovara Jîn, 1986: 9-10).

Her wiha Bozarslan bi me dide zanîn ku nivîskarên wekî Süleymaniyeli Tevfîk (Tewfîqê Silêmanî-Pîremerd), Kurdiyê Bitlîsî, Kemal Fewzî, Evdîrehîm Rehmîyê Hekarî, Memdûh Selîm, (Memdûh Selîmbegî), Ezîz Yamulkî, Law Reşîd, Hîlmîyê Siwêrekî, Îhsan Nûrî, Kamran Alî Bedirxan, Qazîzade Mistefa Şewqî, Qazîzade Letîf, Huznîyê Dêrsimî, Mîrzayê Cizîrî, Zaxoyî di kovara Jînê de nivîsarên cure cure nivîsîne (Kovara Jîn, 1986: 11-12).

Di hejmara yekem a Kovara Jînê de, di sernivîsa bi navê Maksadımız (Armanca Me) de, wiha hatiye nivîsîn: "Jîn ne ji bo bi destxistina lişteka (menfeet) maddî derdikeve. Amanca wê, belavkirina zanîne ye li ser jîyana Kurd a dîrokî, heqên wî yên neteweyî, bêjeya wî û rewşa wî ya civakî, ku ji sedsalên dirêj vir da hatine îhmalkirin. Li gora bawerîya me, amadekirina cîyekî layiq jibo neteweyê Kurd di civîngeha neteweyan da, bi xebateka wisa mimkun e ku awayê wê xebatê li gora fama vê demê be. Em têdigihîn ku ev teşebbûsa me, xebateka pirr dijwar dixwaze. Belam, dema ku me ev wezîfa giran da ser milê xwe, me bi rastî hêvî kir ku em dikarin xwe bispêrin alîkarî û hêsanîyên maddî û manewî yên neteweyê Kurd. Ew neteweyê Kurd ku jibo welat û gelê xwe, her tim bi qebûlkirina fidakarîyên mezintirîn hatîye naskirin. Rastanî û lêkanî ji Xwedê ye" (Kovara Jîn, 1986: 9-10).

Em bi vê sernivîsarê têdigihîjin ku kovara Jînê, daye ber xwe ku di qonaxa weşana xwe de, xebatên siyasî, civakî, çandî û neteweyî bike û *bêjeya wî ku ji sedsalên dirêj vir da hatine îhmalkirin* û ziman û hêmanên wê ên neteweyî car dî vejîne û bi komên xelkî ên dîtir û dinya alemê bide nasîn. Û her wiha, hevoka yekem

ku dibêje, “Jîn ne jibo bi destxistina lişteka (menfeet) maddî derdikeve.” jî amaje pê dike ku xebata ku dê bê kirin û armanca ku li ber vê xebatê ye, di asteke giştî yî neteweyî de ye, loma jî hem berkara (obje) vê xebatê hem jî kirdeya (suje) vê xebatê gel û hemû nirx û hêmanên in ku pê netewe ava dibe.

Kovara Jînê, piştî hejmara bîst û pêncemîn ku di 10ê Sibata sala 1919an de derdikeve, weşana xwe dide rawestandî. Lê mixabin der heqê rawestina weşana kovarê de tu agahiyeke zelal û belgeyî tune ye. Lê bes “Di jimareya paşîn da jî ragîhaneka balkêş derketîye. Di wê ragîhanê da hatîye gotin ku, di bunya kovara "Jîn" da qomîteka taqîbkirina karên Kurdan li Stanbolê hatîye sazîkirin û ew qomîte dê karên Kurdan ên îdarî, eskerî û adlî li Stanbolê taqîb bike, ew taqîbkirin jî dê mift be, yanî qomîte dê tu ucretek ji xwedîyên wan karan nexwaze” (Kovara Jîn, 1986: 13). Cemîl Paşa, radigihîne û dibêje, “Di wan deman de rojnameyên Tirkan li dijî Serekê Komela Pêşketina Kurdistanê Seyîd Evdilqadir qampanya vekirine û gotine ku; Seyîd Evdilqadir hem Serekê Şûrayê Dewletê ye, hem jî Serekê Komeleya Pêşketina Kurdistanê ye. Hal ew hal e ku ev komele daxwaza serxwebûna Kurdistanê dike Divê ku Seyid Evdilqadir yan ji serekîya Şûrayê Dewlet, yan jî ji serekîya Komela Pêşketina Kurdistanê vekîşe” (Cemil Paşa, 1991: 59-60). Loma jî, Seyîd Evdilqadir xwe li ber vê kampanyayê negirtiye û ‘Beyanek daye rojnaman û gotîye ku; Gele Kurd serxwebûn naxwaze, muxtarîyet dixwaze.’ Ev beyana wî bûye semedê derketina dubendîyê di nava Komela Pêşketina Kurdistanê da û di dûwayîya wê dubendîyê da jî gelek rewşenbîr û endamên komeleyê xwe ji komele û kovarê dane aliyekî.” (Kovara Jîn, 1986: 14).

Kovara Jînê, bi derketina xwe re, di hejmara yekem de armanca û sedema weşandina kovarê aşkera dike û di nivîseke bi navê “Armanca Me” de wiha dibêje, “Jîn ne ji bo bi destxistina lişteka (menfeet) maddî derdikeve. Amanca wê, belavkirina zanîne ye li ser jîyana Kurd a dîrokî, heqên wî yên neteweyî, bêjeya wî û rewşa wî ya civakî, ku ji sedsalên dirêj vir da hatine îhmalkirin. Li gora bawerîya me, amadekirina cîyekî layiq ji bo neteweyê Kurd di civîngeha neteweyan da, bi xebateka wisa mimkun e ku awayê wê xebatê li gora fama vê demê be.” (Kovara Jîn, 1986: 202). Gava em bala xwe didin ser vê daxuyana armanca derketina kovarê, ji gotina, ‘*Jîn ne ji bo bi destxistina lişteka (menfeet) maddî derdikeve,*’ tê famkirin ku berpirs û weşangêrên kovarê serê pêşîn dixwazin pêşî li hemû mij û gumanan bigirin ku

gengaz e ku perdeyeke reş li ser kovarê çêkin. Loma jî bi taybetî balê dibin serê ku ne ji bo lişteka (menfeet) maddî kesîdeyî ye. Ev şayîşa endamên cemiyetê û berpîrsên kovarê nîşaneyê pênebaweriyê ye; ev pênebawerî ji feodalbûna civaka Kurdan diqewime ku gotegot di jiyana wê de cîyekî xuya digire. Û kovar xîtabî civakekê dike ku bi qaydeyên feodalî dijî; û ji alî rewşenbîr û xwendeyan ve tê weşandin. Çendî ku ev yek wekî nakokî xuya dike jî, em dikarin bêjin jixwe bêjara neteweparêziyê ji aliyekî ve jî daxwaza xelasbûna ji çanda feodal e ku hêmanên desthilatî ên pergala feodal vediguhere ser desthilata dewleta neteweyî. Loma jî hema bi dû re yekser hevoka, “Amanca wê, belavkirina zanîne ye li ser jiyana Kurd a dîrokî, heqên wî yên neteweyî, wêjeya wî û rewşa wî ya civakî, ku ji sedsalên dirêj vir da hatine îhmalkirin”, (Kovara Jîn, 1986: 202) tê sazkirin û ev hevok dibe hîm û sedema weşandina kovarê. Ev hevok berhênana hişberiyekê ye ku ji dem û mîrate û paşxaneyê rojnameya Kurdistan, Rojî Kurd, Yekbûn û Hetawî Kurd maye. Loma jî dixwaze xebata xwe a ku li ser hîma ‘hişyarkirin, perwerdekirin û belavkirina zanîne’ daye rûniştandin, xurttir û berfirehtir belav bike. Lê belê kovara Jîn jî wekî wan weşanan li xwe qebûl dike ku heta wê çaxê jî di warê berbelavkirin û danîna îdeolojiya neteweparêziyê de xebateke xurt û birêkûpêk nehatiye kirin. Loma jî bi dû re hevoka, “Li gora bawerîya me, amadekirina cîyekî layîq ji bo neteweyê Kurd di civîngeha neteweyan da, bi xebateka wisa mimkun e ku awayê wê xebatê li gora fama vê demê be” (Kovara Jîn, 1986: 202) tê sazkirin. Û ev yek digel lixweqebûlkirinê hişberiya divê çî bê kirin û dê çî bê kirin jî di xwe de dihewîne. Jixwe ev hişberî dike ku kovar hê di serî de, bi hejmara xwe a yekem bêjara xwe ava bike; bêjara neteweparêziya Kurd ku di gotinên wekî “Li ser jiyana Kurd a dîrokî, heqên wî yên neteweyî, wêjeya wî û rewşa wî ya civakî” û ‘amadekirina cîyekî layîq ji bo neteweyê Kurd di civîngeha neteweyan da” (Kovara Jîn, 1986: 202) digihîje wateya xwe. Û ev bêjar, di gelek nivîsarên gotarî, wêjeyî, berhevkarî û helbestan de derdikeve pêşberî me.

Di nivîseke bi navê “Giftûgoyek” de, ku ji alî Haydarîzade Îbrahîm ve hatiye nivîsîn, bi gotinên, “Neteweya Kurd a torin û xanezad, îro ro di warê çapemeniyê de bi kovareke bi navê Jîn careke dî jî hebûna xwe bi awayekî geş dipeyitîne” (Kovara Jîn, 1986: 203) çêla hebûna Kurdan tê kirin û nivîs wiha didome; “Ev gelê egîd ku bendetî û pêgirtîbûna xwe a bo Xelîfetiya Îslamê û dewleta Osmanî bi şûr û xwîna

xwe daye peyitandin...” Gava em di biwara hebûniyê (ontolojîk) de bala xwe dibin serê, em dibînin ku di nav van her du hevokan de ku li dû hev tîn, coşeke hestpêkirina hebûniya xwe heye û bêjar jî hema pê re ava dibe. Ji ber ku der heqê torinî û xanezadiya Kurdan de çespendinek tê kirin ku ev çespendin bi awayekî *a priori* (pêşkî) hatiye qebûlkirin û ji mêj ve amade ye ji bo avakirina bêjara neteweparêz. Lê belê ev dîtina hanê piştî ber li xwe dizivirîne û çêla bendetî û pêgirtîbûna bawerî û desthilatekê dike. Nakokî ew e ku; pêşî di ser hebûna xwe a îroyîn re xwe digihîne dîrok û mêjvetiya xwe û hebûna xwe *a torin û xanezad* dide zanîn piştî jî mîna ku ev awa hebûniya xwe neyîn bike hewlê dide ku bawerî û desthilatekê bike sedem û pardarên hebûniya xwe. Pê re jî bi teşeya çarîneke helbestî, pirs tê kirin: “Ka bêje ew kesê biazl, çi ye ew zimanê ku di devê te de ye?/Ew kilîda deriyê gencîneya mirovê hunerwer e/Heke derî radayî be ki dê bizanibe/ka gelo çerçî ye an jî gewherfiroş e?” (Kovara Jîn, 1986: 203). Ev çarîna ku gelek pirs hene tê de, ji kirûya zimên ku gengaz e ku bibe zimanê neteweyî zêdetir, banga *dengderxistinê* dike. Yanî, dixwaze di warê hebûniya Kurdan de, gotin wekî navgîneke peyitandinê were bikaranîn. Loma jî di pêdeçûna nivîsê de wiha tê gotin: “Neteweya Kurd ne di nav wan neteweyan de ye ku ji şaristaniya Rojavayî para xwe girtiye. Ji ber ku zanist û çandên olî, ku hêmanên hîmî ên şaristaniya rasteqîn in, di xwe de dihewîne û xwedî bêhnpakîyeke arizî Rojhilatê ye, loma jî ji neteweyên ku hempayên wan in şûnde nemanê” (Kovara Jîn, 1986: 203). Bi van gotinan em car dî rastî nakokîyan tîn. Şaristaniya Rojavayî ku di ser netewebûn û hebûna neteweyan re çêla wê tê kirin, digel ku zanist li xwe dike bingeş jî, sekuler e û di ser serçavî û referansên olî re ranabe. Û raman û îdeolojiya neteweparêziyê ku pê rabûye, -ronakbûn û modernîzm-nîşane û bêhnpakîyên feodal li xwe nake serçavî.

Her wiha heman rewş di paragrafa dawî de jî, bi van gotinan derdikeve pêşberî me. “Ji ber ku Kurd her yek wek kesek pîr dilgir in, li hember tiştên ku dê rûmeta wan bişikêne tu carî çavên xwe naşikînin. Çendî ku pê şanaz in ku xizmetkarê olê, dewlet û xelîfetiye ne jî, gava neteweyek fermanan li wan bike, ew tu car vê yekê qebûl nakin û ji bo rûmeta xwe mirinê çêtir dibînin ji şermê re” (Kovara Jîn, 1986: 204). Biçûk be jî hin nîşaneyên bêjara neteweparêz heye di van hevokan de. Lê belê bi gotinên, *ji ber ku Kurd her yek wek kesek pîr dilgir in*, car dî referans û serçaviyên tîn dayîn ji feraseta feodal e û her wiha di ser taybetiyên giştî ên neteweyî

çêla taybetiyên kesîdeyî tê kirin. Û pê re jî bi gotinên, pê şanaz in ku xizmetkarê ol, dewlet û xelîfetiye ne, car dî ramana derbar neteweyê ku hewl tê dayîn ku were derbirandin, kût û kêr dimîne û ji bêjara neteweparêzî dûr dikeve. Ji ber ku bêjara neteweparêzî tiştekî tevdekî ye û tu carî di ser endamên neteweyan re nagihîje wateya xwe; berevajîya wê kesîde û endamên neteweyekê di ser bêjara neteweparêziyê re berzûbala dibin û digihîjin hafa jorîn a netewebûnê.

Di nivîsa bi navê “Kurd Ne Di Xewê De Ne” ku ji alî Bir Kürd ve hatiye nivîsîn, cara pêşî çêla îdeolojiyê tê kirin. “Îdeolojiyên kevn, îdeolojiyên siyasî û sosyal ên kevn pûç dibin; rêgezên dîtir, rêberên dîtir radibin; aqil li hêrsê zal dibe, tarî di ronahiyê de difetise.” (Kovara Jîn, 1986: 204). Ev hevok pêşî hêvî bi me re çêdike. Em dibêjin qey em ê nivîsareke ku li ser aqil û ramana neteweyî hatiye nivîsîn bixwînin û dê ev nivîsar bibe jêderka îdeolojiya neteweparêziya Kurd. Lê mebesta nivîsarê ne ew e. Nivîsar berê xwe dide Rêgezên Wilson. Li ser rêgezên ku mafê xwebirêvebirina neteweyan dispêre wan, disekine. Û pê re jî bi bixwebawerî û pêwlebûneke balkêş –ku kakil û naveroka wê netije xuya dike- wiha dibêje, “Ez hewcetî pê nabînim ku biqîrim û bêjim, ‘Gelî Kurdan, şiyar bin.’ Ji ber ku heke Kurd di xew de bin nexwe ji zû de mirî ne. Kurd şiyar e û ew ê efendiyan ku bi sedan salan in ketine xewê û berê Kurdan jî dane xewê jî şiyar bike” (Kovara Jîn, 1986: 205). Ev awa gotin, dahkeke wisan mezin e ku ji bo lidarxistina wê, îdeolojiyeke qayîm, rûniştî, nûkirî û pê re jî aboriyeke xurt û rewşeniyeke temambûyî divê. Û nivîsar bêyî ku çêla îdeolojiyeke bi vî rengî bike an jî hin rêgezên wê dayne rastê, piştî xwe dispêre Rêgezên Wilson û di ser wê re jî, bêyî ku palderên wê, nîşaneyên wê, kirin û çalakiyên wê ên pratîk aşkera bike û dayne holê, çêla şiyarbûna Kurdan dike; û pê re jî namîne çêla şiyarkirina *efendiyan* jî dike.

Nivîsa bi navê Bi Boneya ‘Kurdan’ ku ji alî Kurdiyê Bitlîsî ve hatiye nivîsîn, kesên ku der heqê Kurdan de gotinan dibêjin, nivîsan dinivîsin û dahûrandinên ne zanistî û objektîv dikin, dide ber şûrê rexneya xwe a sosyo-polîtîk. Û bi gotinan dest bi nivîsara xwe dike, “Kesên ku me neyîn dikin, xwe dispêrin vê yekê û dibêjin: ‘Jêderka Kurdan nayê zanîn.’ Û ji bo ku bigihîjin vê encamê dahûraneke dilzîzî jî nakin” (Kovara Jîn, 1986: 230). Em ji vê destpêkê fam dikin ku gelemşe û gengeşiyeke jêderkî heye li rastê. Bitlîsî digel rexneya xwe gazincan jî dike ji ber ku lêkolîneke zanistî nayê kirin. “Ew nahizirin ku sosyolojiya ku di lêkolana zanava

neteweyan de wek hokara yekem tê qebûlkirin, hê zarokeke berçarlepkan e. Ew nayînin bîra xwe ku formulên razber ên cografya, etnografya û zanistên wek wê, tu carî negihane hêza formuleke matematîkî. Û dîrok, hê jî rastiyê nabêje û ne dîtyareke bawerder e” (Kovara Jîn, 1986: 230). Bitlîsî di berdewama gotara xwe de, bi gotina, “Aha ji we re ax; ku di gera dîroka 30-40 sedsalî de, gelekî ku xwedî ziman û rengûawayên arizî xwe ye û ji cîranên xwe cuda ye.” (Kovara Jîn, 1986: 231) pêşî berê xwe dide gelemşeya axê û di ser axê re jî hewlê dide ku hebûna Kurdan bipeyitîne. Loma jî dibêje, “Ji lew re jî rewşa heyî nikare were guherandin û ji lew re jî ji îro û bi şûn de ne dikare were bişaftin ne jî dikare ji navê were rakirin” (Kovara Jîn, 1986: 232). Û pê re jî mîna ku heq bi kesên ku dibêjin ‘Jêderka Kurdan nayê zanîn’ re bihêle, dibêje, “Rastî ye ku heta roja îroyîn karaktera Kurd û rewşa wê a xwezayî hinekî meçhûl maye” (Kovara Jîn, 1986: 230). Nivîs ji afirandina bêjareke zêdetir bi parastin û hewla peyitandina jêderka Kurdan dilebîke. Loma jî, çendî ku wek naverok hinekî di asta teorîk de xuya bike jî, di biwara ramanî de tu riwangeyekê derpêşî me nake û wek ramyarî û îdeolojîk heta tu bêjî bes ji afirandina bêjara neteweparêziyê dûr e.

Di şî’îreke bi navê “Eşqa Welat” de ku ji alî E. Rehmî (ji mala Hekariyan) ve bi Kurdî hatiye nivîsîn, hezkirina bo welêt tê vegotin. Di şî’îrê de, pêşî bi çend risteyên wekî, “Geştan bikin ser kaniya/J’xêzê diçit şibhê ziya/Berraq û pak û safiya” di ser xwezayê re bal li ser pakî û xweşikiya welêt tê kişandin û sedema hezkirinê tê danîn” (Kovara Jîn, 1986: 254). Piştî jî bi risteya wekî, “Carek dî min dîba xwezî/Konêd-i reş, keriyêt pezî” du tişt bi hev re tîr çêlîkirin. Wekî tê zanîn, *konê reş* di nerîta Kurdan de ciyê desthilatê ye. Loma jî di daxwaza dîtina *konê reş* de, doza lidarketina desthilata Kurdan jî dihewe. Û pê re jî, di civakên feodal û kiştûkalî de, digel qût û zad, bi taybetî pez çavkaniya sereke a aboriyê ye. Û bi gotina *keriyêt pezî* jî bal li ser aboriya vê desthilatê tê kişandin. Şî’îr bi van risteyan bêriya ku ji bo welatekî heye tîne ziman. “Kanê welatê serhedan/Sotin ewan ateşgedan/Lewra ku gur bûne şivan/Dengê bilûlan, nalîyan/Dengê hewaran, gazîyan” (Kovara Jîn, 1986: 255). Û bi risteya, *Lewra ku gur bûne şivan*, jî çêla bindestiya heyî dike ku; şivan hem wek çavkaniya aboriyê *pezî* diajo hem jî wek gelekî bindest desthilata xwe li ser gelê Kurd dimeşîne. Loma jî dengê hewaran, gazîyan eşqa welat diafirîne û bi van risteyan jî digihîje asta xwe a jorîn. “Dibêjin welat bo dijmin e/Ez sax bibim qet ne

mimkun e!/Xîret, hemmîyet zamîn e/Eşqa wî mêhvanê min e/Qurban wî ra mêlakê min e” (Kovara Jîn, 1986: 255). Di van risteyên dawî ên helbestê de risteya, *Ez sax bibim qet ne mimkun e*, bêjareke li ser welat ava dike ku ew jî jiyîna digel welat e; yanî hebûn û mayîna endamên neteweyekê digel hebûna welat pêk tê. Û ev digelbûn jî ancax bi fedakariyekê pêk tê ku ew jî di risteya, *Qurban wî ra mêlakê min e* de dide der. Me divê em di vê qonaxê de berê xwe bidin B. Anderson ku dibêje, “Gelo çawan dibe mirov bi hestên gir û bîzjêçûn û dijminahiyê tevdigerin û li ser mirina xwe fidakariyê dikin. Hemin ku neteweparêzî “xeyalkirineke modern û dahêrandî” ye gelo çima mirov didin dû vê xeyalê û xwîna xwe dirijînin?” (Anderson, 1995: 19). Di rastiyê de, xeyala ku Anderson çel dike û balê dibe ser, xeyala eşqê ye ku di vê şî’rê de jî aşkera dibe. Ev eşq gengaziyeke gihîştinê dihewîne û xwediyê eşqê jî gazî vê gengaziyê dike. Loma jî fedakariya ku tê kirin, di gotina *mêlakê min e* de digihîje wateya xwe ku mêlak (ceger) di çanda Kurdan de ne tenê endameke laşê mirov e; her wiha navenda hezkirin û dilpêvebûnê ye jî. Em dikarin bêjin, di kovara Jînê de, wek berhemeke wêjeyî, ev şî’r mînakê herî baş û xurt e ji bo afirandina bêjareke neteweparêziyê. Lê ev neteweparêzî, ji ber ku di biwareke ramanî û îdeolojîk de nagihîje teşe û kan û wate û derbirana xwe, sed korayî ye ku bêjara neteweparêziyê di vê biwarê de jî qels û kêr dimîne.

Di nivîsa bi navê “Şerê Topan Xelas Bû Îro Şerê Qeleman E” de ku ji alî E. Rehmî ve û bi Kurdî hatiye nivîsîn, em rastî metafora ku di kovara Rojî Kurd de jî bi xurtî hatiye bikaranîn tên; şûr û qelem. Di vê nivîsarê de, li şûna şûr, top wek nîşaneyê hêza çekdariyê tê nimandin. Em ji vê yekê fam dikin ku hêza leşkerî êdî ne bi şûr, lê bi amrazên şerên kapîtalîst û emperyalîst, yanî bi top û bombe û demançe û tîfîngên otomatîk tên zanîn. Di nivîsê de, pêşî bi van hevokan, “Hifza heqî bi du usûlan dibit. Yan dê bi qeweta destan, yanî bi wasita tîfîng, top, bomba, tebancan bit; yan jî bi wasita îlmê, huquqê, bi tarîxê dibit” (Kovara Jîn, 1986: 379) bal tê kişandin ku têkoşîna ji bo heqê xwe ji bo her kes û gelfî tiştêkî rewa ye û ev lêgerîn û têkoşîna bo heqî bi du rêyan dibe. Piştî jî, nivîskar dîtina xwe a di vî warî de derpêşî me dike û dibêje, “Wextê top û tîfîngan çû. Çunkî bi wê heq nayête îsbatkirin; belkî heq bi qewetê ye. Kîjka xalib ew xwedanheq e; kîjka mexlûb, bêqewet ew bêheq e” (Kovara Jîn, 1986: 379). Di vê qonaxê de tiştê ku bala me diçe serê ew e ku di kovara Rojî Kurd de nivîskar di ser metafora şûr û qelem re çêla van her du rêyan dikin; û terciha

xwe diyar nakin ka dê kîjan rê bê hîlbijartin; û vê yekê dihêlin ji helûmercan re. Lê Rehmî, bi gotina, *Wextê top û tîfîngan çû*, tercîha xwe datîne rastê. Lê ew diyar nake ka ew wexta şerkirina bi top û tîfîngan ku çûye, ji bo kîjan heqî ye. Gelo heqê neteweyekê ye ku dixwaze bigihîje dawî û aqûbeta xwe an jî heqê dewletekê ye ku dixwaze dewleta xwe mayînde bike. Helbet em ji gotinên Rehmî ku bi dû re dibêje, “Dêmek bi şerê topan heq îsbat nabit. Me tecrube kir, welat bi xwîne şûşt. Hinde biçûk bêda û bab man, êtim û êxsîr ketine kolanan” (Kovara Jîn, 1986: 379). fam dikin ku şerek hatiye kirin û di vî şerî de têkçûn an jî têkşikînek pêk hatiye. Lê bi nivîsa Rehmî ew keys tune ye ku em karibin bizanibin ka ev kîjan şer e û bo çi hatiye kirin. Helbet, gava em berê xwe bidin gera dîrokê em ê xweşikî bibînin û fam bikin ku Rehmî çêla şerê dinyayê ê yekemîn dike ku dewleta Osmanî di wî şerî de têkşikiya. Û di wan çaxan de Kurdan ji bo heqên xwe ên neteweyî tu şer û serîhildan nekiriye. Loma jî dîtînen Rehmî ku dibêje, *Me tecrube kir, welat bi xwîne şûşt*, li ser dewleta Osmaniyan e û ne di biwara neteweyî de ye ku em karibin bêjin rêyeke dîtir dide ber xwe û dixwaze bi dîtineke dîtir ramana neteweparêziyê dayne; an jî bêjara wê biafirîne.

Di kovara Jînê de, nivîsareke temambûyî nîn e ku em karibin bêjin li ser ramanê neteweparêziyê hatiye rûniştandin û di asta îdeolojîk de hewlê dide ku çêla neteweyekê bike; ango bêjara neteweparêz ava bike. Loma jî çendî ku piştî pênc salan a derçûna *Rojî Kurd*, derçûbe jî di warê ramana neteweparêziya îdeolojîk de zêde tişt li ser bêjara *Rojî Kurd* nehatiye kirin. Em dikarin bêjin, ji alî hewla peyitandina hebûna gelê Kurd a wekî neteweyekê de her du kovar –ango weşan-yekreng in. Û di her du kovaran de bala me diçe ser vê yekê; nivîsar hewl didin ku hebûnê bidin nîşan. Pê re jî di warê xwendewariya Kurdan de hewldaneke xuya heye ku berê xwe dide şiyarbûna di warê neteweyî de. Lê belê, ji ber ku her du kovar jî, digel saziyên CTTK û CH, li Stenbolê xebatên xwe dimeşînin, zêde zêde ji gel dûr in. Ev yek dibe sedem ku çarçoveya kovaran berteng bimîne. Ji ber ku bes di derdora xwendeyên heyî û kesên perwerî de dibe sedema şiyarbûnekê û çendî ku hewlê bide û bixwaze xwe jî, wek weşanên modern, bi awayekî berbelav di nava reşexelk de cî nagire û nagihîje armanca xwe ku dixwaze gel şiyar bike. Ji ber hindê jî, kovara Jînê jî wekî kovara *Rojî Kurd* nabe hokar û kartêkeke tekûz û temambûyî a di warê şiyarbûna neteweyî de.

2.5 Neteweparêziya Kurd û Bêjara Wê

Anthony D. Smith dibêje, “Kesên ku derbar netewe û neteweparêziyê têgihan diafirînin û ziman û bêjarekê ava dikin, entellektuel û xwendeyên wekî şa’îr, filolog, antropolog û zargotinzan in” (Smith, 1994: 115). Ev gotin û peyta Smith, di biwara bêjara neteweparêzî a Kurdan de heta tu bêjî bes têbor e. Heke em Kurdan wekî gelekî ku ne xwedî dewletekê ye qebûl dikin û nikarin bi temamî piştî xwe bidin raman û teoriya Gellner û Hobsbawm û hemin ku em nikarin bêjin, Kurd bi saya dewleteke neteweyî an jî bi rêya ‘neteweparêziyeke ku di heyama modern û sanayîbûnê de ava bûye’ dikarin behsa neteweya Kurd bikin, nexwe em ê di vê biwarê de bala xwe bidin Smith ku wek dîtineke etno-sembolî di avabûna netewe û neteweparêziyê de çanda etnîkî wek pêkhatîyeke pêşmodern qebûl dike.

Ji aliyê dî ve, Hamit Bozarslan dibêje, “Xebata entellektuelî a neteweparêza Kurd, te divê bila di biwara lînguîstîk de be, te divê bila hunerî, te divê bila polîtîk an jî îdeolojîk be, serî lî dîrokê dide an jî dîrokê vedibeyîne” (Bozarslan, 2005: 35). Ev peyt, bi me dide zanîn û nîşan ku ne mimkun e ku neteweparêziya Kurdan û bêjara wê ji dîrokê bêrî were hesibandin û qebûlkirin.

Martin Van Bruinessen, berê xwe dide E. Xanî û pîrsa neteweparêziya Xanî dike û wiha dibêje, “Di dîbaçeya Mem û Zînê de, hin beyt vedengekî ew qasî modern û nû didin ku mirov dibêje qey ji alî neteweparêzên sedsala bîstemîn ve hatine nivîsîn. Heçko Xanî banga dewleteke neteweyî a Kurdan dike. Demekê şîkek di dilê min de ma ku ew beyt ne ên Xanî ne. Lê belê, çapa herî kevn a Mem û Zîn; ku ji neh destxetên cuda pêk tê û di sala 1731-32yan de (yanî hê neteweparêziya modern di rojhilata navîn de derneketibû), ji alî M.A. Rudenko ve hatiye kirin, vê şîkê pûç dike ji ber ku heman beyt bi heman awayî di wê çapê de jî derdikeve pêşberî me” (Bruinessen, 2005: 76). Bruinessen piştî ku qala çapkirina Mem û Zînê a di rojnameya Kurdistan de dike, (Bruinessen, 2005: 75) li ser bêjara neteweparêziya Kurd gotinên Celadet Bedirxan wekî mînakekê nîşan dide (Bruinessen, 2005: 77) û dîtina xwe a der heqê serhildana Şêx Seîd de wiha dibêje, “Ev serhildan qonaxeke wisan e ku hê di dîroka neteweparêziya Kurdan de şûna wê nehatiye dagirtin” (Vali, 2005: 181) û pê re jî bi awirek rexnelêgir li ramana Gellner û Anderson ku dibêjin,

“neteweparêzî projeyêke kapîtalîzmê û paşdema sanayiyê ye”, dinêre û wiha dibêje, “Heke ku roja îroyîn Kurd neteweyekê pêk tînin, ev yek, yek ji serkeftina tevgera neteweparêz a Kurd e” (Vali, 2005: 181).

Abbas Vali, piştî ku bi awirekî rexneyî li ser bêjara neteweparêziya Kurdan disekine û wiha dibêje, “Bêjara dîrokî a neteweparêziya Kurd encameke modernîteyê ye; û piştî ku dewletên Tirkîye, Irak û Îran ên terîtoriyal ava bûne, ev encam derketiye.” (Vali, 2005: 126). Lê belê Vali ji berevkî li mijarê dinihêre û nayîne ber çavên xwe ku; di dema CTTK û CHyê de, bêjarên xurt li ser neteweparêziya Kurd hatine kirin. Û pê re jî, em dikarin bêjin, di dema avabûna van cemiyatan de hê dewleteke wekî Tirkîye, Iraq û Îran tunebûn, loma jî ev teza Vali ku dibêje bêjara neteweparêziya Kurd bi modernîte û avabûna her sê dewletên terîtoriyal dest pê kiriye, bes dimîne wekî angaşteke awirmodern.

Mihemed Emîn Zekî Beg, bi pirsra, “Qewmê Kurd ji kîjan neteweyê ye, çi bi serî de hatiye?” (Vali, 2002: 15) dest bi ramana xwe a der barê netewe û neteweparêziya Kurd de dike û ji alî jêderk û dîrokê ve li neteweya Kurd dinêre û lê dikole. Valî ji M. E. Zekî wiha radigihîne me. Zekî dibêje; “Têkçûna ramana gerdûnîparêziya Osmanî û hema bi dû re jî xurtbûna neteweparêziya Tirk biwarek vedaye ku dîroka Kurdan were nivîsîn. Loma jî, pêla lixweşiyarbûna etnîk ketiye şûna *ethosa* seretayî (Îslamî) a ku di sîstema neteweyê de bi roleke berastengker radibe. Ji ber hindê jî M. E. Zekî ketiye nav lêgerîna zanava xwe a Kurd. Nivîsîna dîroka Kurd û Kurdistanê bi qasî ku ezmûneke xwebûniyê ye ew qasî jî hewldana avakirina dara ajarê ye jî” (Vali, 2005: 101). M. E. Zekî, li ser neteweyê etnîsît û binemaleke neteweyî dara xwe a binemaliyê ava dike. “Digel vê yekê jî rexneyên ku li avabûna siyaseta neteweyî dike heta tu bêjî bes modernîst e. Loma jî wî lihevnekirina serokên Kurd û zemîna pêwendiyên wan ku ji mêj ve ye wekî xwe ye, wekî sedema têkçûna tevgerên neteweyî qebûl kiriye” (Vali, 2005: 103) M. E. Zekî, bi gotinên xwe ên wekî, “Ji bo avakirina dewleteke serbixwe du tişt pêwîst in: Zanîn û zengînî” (Vali, 2005: 104) bi awirekî modern, mîna ku li ser xeta Gellner û Hobsbawm bimeşe, dîtina xwe a li ser netewe û neteweparêziya Kurdan di ser avakirina dewleteke serbixwe ava dike. Ev ranêzikiya M. E. Zekî Beg, her wekî Vali dibêje, “Bi awayekî sergirtî demajoya avabûna dewletên neteweyî ên Ewrûpayê bi bîr dixê” (Vali, 2005: 104). Û bi kurtasî, li gorî ranêzikiya M. E. Zekî Beg, merca

serkeftinê a neteweparêziya Kurdan bi modernbûna Kurdan ve ye; û ji bo vê jî divê Kurd demajoyeke wekî demajoya modernbûna gelên Ewrûpayê, bi taybetî gelên wekî Fransî, Alman û Îngilîz bijîn da ku karibin di warê entellektuelî de serkeftinê pêk bînin.

C. Nebez jî, neteweparêziya Kurd, “Wekî hewldana avakirina dewleteke neteweyî, li ser cografyaya Kurdan avakirina Kurdistana Mezin pênase dike” (Vali, 2005: 104). Nebez, bi vê pênaseya xwe ve, axê û her tiştê ku ji alî komeke etnîkî ve ku li ser wê axê dijî û ji alî wê komê ve hatiye afirandin tîne bîra me. Her wiha Nebez, ji alî dîrokî ve jî berê xwe dide Xanî û dibêje, “Ramanwerê Kurd E. Xanî (1650/1-1706), bang li Kurdan kiriye ku; bibin yek, dewleteke Kurdan a serbixwe ava bikin, xwe ji bin nîr û destê Tirk û Farisan xelas bikin û lê padîşah, pere, tac û çandêke Kurdan bigerin” (Vali, 2005: 105). Mînakdana ji dîrokê û palpiştiya ku Nebez xwe pê ve girê dide, bi me dide nîşan ku Nebez ji alî dîtina neteweparêziyê ve li ser ramana seretayîparêz dimîne. Li gorî Nebez, “Reseniya neteweparêziya Kurd di armanca wê a dîrokî de veşartî ye: ev yek ne lêgerîna avakirina dewleteke terîtoriyal e, lê lêgerîna armanca dewleteke neteweyî ye” (Vali, 2005: 106).

A. Hassanpour, ziman daniye navenda ramana xwe a neteweparêziyê. Li gorî wî, ziman hêmana avakar a sereke a netewebûn û zanava neteweyî ye û zimanê wê î nivîskî, şaneka pêşketina hişberiya neteweyî ye. Di bêjara Hassanpour de, “Têgiha neteweya Kurd; civakeke dîrokî ye ku di nava xwe de li çîn û tofan dabeş bûye û sînoren wê serê pêşîn bi pêwendiyên etnîk û çandî û bi taybetî jî bi ziman û bi demajoyên zimanî ên pratîk ve hatiye diyarkirin” (Hassanpour, 2005: 115). Hassanpour, bêjara xwe a li ser neteweparêziya Kurdan bi tenê li ser ziman nahêle; hem ji alî heyamî ve hem jî ji alî siyasî û desthilatî ve, mîrtiya Kurdan li ramana xwe dike palpişt û wiha dibêje, “Hêza siyasî a Kurdan di sedsalên pazdehemîn û şazdehemîn de xurttir û kartêkkertir bûye û wekî pêşketineke hevdem jî zimanê Kurdî di van serdeman de wekî zimanê wêjeyê hatiye bikaranîn û şoreşeke wêjeyî li dar ketiye; Wêjeya Kurdî, ji fêrgehên mizgeftan, ên li gund û bajaran, afiriye. Malbatên xanezad û begên feodal hem ji vê afirandina wêjeyî re bûne destek hem jî piştevanî lê kirine” (Hassanpour, 2005: 128-129-143). Hassanpour, ramana xwe a neteweparêziyê di bingeha etnîsî de ava dike û hewl dide ku ji bo neteweparêziya

Kurdan kesê yekem peyde bike û E. Xanî wekî yekem neteweparêzekî Kurd bide nîşan.

Hamit Bozarşan, serê pêşîn balê dibe ser teoriyên neteweparêziyê û wiha amaje pê dike, “(...) Dibe ku teoriyên ji bo her demê hatî qebûlkin ji bo hin neteweparêziyan ne têbor û li dar be. (...) Bi taybetî jî dibe ku hin neteweparêziyên kêmaran ji hin jêderkên dîtir zabin” (Bozarşan, 2005: 201). Pê re jî gotina Celadet Bedirxan a di nameya ku ji M. Kemal re nivîsiye, tîne bîra me û dibêje, “Neteweparêziya Kurd a ku her ku diçe geşe dide, hem ji neteweparêziya Ermenan kartêk girtiye û hem jî ji neteweparêziya Tirk ku di helûmercên kozmopolît a Stenbolê de her ku çûye notir bûye, kartêk girtiye û wekî karvedan û beranberiyekê bi pêş ketiye” (Bozarşan, 2005: 203). Bozarşan, di vê qonaxê de, bi taybetî kartêka serîhildana Şêx Ubeydullah û kartêka wê a ramanî, ku doza Kurdistaneke serbixwe dikir, ji ber çavan dîr dike. Bozarşan, piştî ku bala me dibe serê û dibêje “sedema şûndemana heyam bi heyam a neteweparêziya Kurd ew e ku; di nava serkêşan de armanceke polîtîk a hevpar tune ye” (Bozarşan, 2005: 206) pê re jî wiha li ser zêde dike û dibêje, “Serîhildana Koçgîriyê di teşegirtina neteweparêziya Kurd de bi roleke mezin û girîng rabûye û piştî ku M. Kemal rejîma xwe bi cî kiriye û polîtîkayên xwe ên der heqê Kurdan de guherandiye, her ku çûye hişberiya Kurdbûnê a herêmî bi pêş ketiye û neteweparêziya Kurd tundraewtir bûye” (Bozarşan, 2005: 210-217.)

3. KOVARA HAWARÊ

3.1 Mercên Dîrokî ên Derketina Kovara Hawarê

Heta roja derketina kovara Hawarê (15ê Gulana 1932yan), li welêt û li dinyayê gelek qewimîn û guherînên siyasî, ramanî û çandî pêk tên. Kurd jî bi awayekî ji awayan di nav vê çerxa lihevqulibîn û guherînan de ciyê xwe digirin û têra xwe jî kartêka van qewimînan li Kurdan dibe. Bi taybetî jî beriya şerê cîhanê ê yekemîn ku axa dewleta Osmanî parçe bi parçe ji dest wan diçe û piştî şerê rizgariyê a Tirkiyeyê êdî dewleta Osmanî jî ji navê radibe, dewleteke dî, K.T.yê şên û ava dibe.

Piştî avabûna K.T.yê, hebûna Kurdan bi hemû hêman û sedem û dîrok û piçke û kesîdeyan ve tê neyînkirin. Û Kurd êdî çi wekî gelekî çi jî wekî piçkeyên K.T.yê wekî tune tên hesabandin. Di serî de zimanê Kurdî û çand û hêmanên folklorîk jî tê de, hemû reng û awayên ku nîşaneyên Kurdbûnê ne di her warê jiyane de tê qedexekirin. Ev yek dike ku navbera Kurdan û dewletê biqete. Kurd ji ber vê polîtîkaya dewletê qebûlnekirina xwe didin der. Lê belê polîtîkaya dewletê a derbar Kurdan de ku ji berê de hatiye danîn. Loma jî hember van qebûlnekirinan bersiveke tundyarî li Kurdan li wan tê vegerandin. Ji ber hindê jî qonaxeke dîtir dest pê dike û êdî têkoşîna lêgerîna mafên neteweyî bi awayekî dîtir tê meşandin.

Sedemên ku em ê karibin bêjin di derketina kovara Hawarê de bûne kartêk, kêr zêde di beşa duyem a vê xebatê de hatin diyarkirin. Helbet dê gelek kêrhatî be ku em careke dî jî aliyê wan ê siyasî û çandî û zimanî bêjin û di xebata xwe de biçin.

Di warê siyasî û desthilatê de, doz û daxwazên ku derbar Kurdan e, bi serîhildana Emîr Bedirxan dest pê dike. Lê belê, her wekî me di berê jî çêl kiribû, serîhildana Emîr Bedirxan, ji ramanê neteweyî bêtir li dijî navendîkirina polîtîkaya dewleta Osmanî û li ser parastina desthilata Mîrtiyê ye ku mîrtiya Kurdan di nav dewleta Osmanî de bi awayekî xweser li dar bû. Piştî ku serîhildana Emîr Bedirxan têk dişike û desthilata navxweyî a Kurdan ji destê çîna arîstokrasî, yanî ji mîr û began derdikeve, êdî sere û giregirên dîtir ên Kurdan, yanî şêxên Kurdan dibin pêşeng û rêberên gel û hema çend sal bi dû re jî serîhildana Şêx Ubeydullah li dar dikeve. Loma jî, doz û daxwazên rêber û civaka Kurd jî reng li xwe diguherînin û li

şûna xweseriya mîrtî û begtiyê, doza xweseriya giştî dibe sedema rabûna gelekî. Ji ber hindê jî, wekî me di beşa berê de jî diyar kir û bi kurtasî da zanîn, serîhildana Şêx Ubeydullah wekî yekem serîhildana Kurdan tê qebûlkirin ku di warê dozdariya serbixwetiya Kurdan û hizirîna axeke terîtoryal de li dar ketiye.

Tevî ku Serîhildana Koçgirî, bi rêkxistineke Kurdan a siyasî li dar ketiye û rêkxistin, ji alî xwende û ronakbîrên Kurdan ve bi armanca avakirina Kurdistanê hatiye danîn jî, tevger di vê doz û daxwaza xwe de bi ser nakeve û bêyî ku kartêkeke mezin li ser gel û civakê dayne, têk dişike.

Serîhildana Şêx Se'îd ku di bin banê rêkxistina Azadiyê de xwedî programekê ye û rabûneke bi pîlan û bi awayekî birêkûpêk gel û serîhildanê bi rêkxistin dike, ji ber ku beriya dema xwe a pîlankirî dest pê dike û serkêşên wê zû dikevin destê desthilatdaran, bi awayekî gelek diltezîn têk dişikê. Lê belê encamên serîhildanê ên siyasî û çandî pir berbelav dibe di nav civaka Kurdan de. Lidarketina vê serîhildanê bi xwe pir aşkera nîşanî me dide ku piştî şênbûna K.T.yê jî ramana neteweparêziyê di nava Kurdan de pûç nebûye û doz û daxwaza wê venemiriye.

Ji ber hindê ye ku; piştî şeş salan ji serîhildana Şêx Se'îd, di bin rêkxistina Xoybûnê de serîhildana Agirî li dar dikeve. Wek me berê jî diyar kiribû, rêkxistina Xoybûnê, heta wê çaxê rêkxistina herî bi rêkûpêk e ku ji bo doz û ramana neteweyî hatiye danîn. Celadet Bedirxan yekem serokê vê rêkxistinê ye ku ev yek wekî sedem û jêderkên siyasî a derçûna kovara Hawarê xwedî bayex û girîngiyekê ye. Her wiha, gava em bala xwe dibin serê, em dibînin ku digel Celadet, rayedar û avakarên yekem ên rêkxistinê, ji ronakbîrên Kurdan ên xwende û serokeşîr û giregirên civaka Kurdan in.

Her wiha rêkxistina Xoybûnê mînakeke yekîtiyê danî rastê ku heta wê çaxê ev yek bi awayekî xurt û birêkûpêk nehatibû holê. Rêkxistina Xoybûnê, çî wekî rayedar çî wekî avakar çî wekî rêber çî wekî çalakger çî wekî piştgir çî jî wekî endam, hemû çîn û rengê civaka Kurd anîn cem hev û bi birêkxistina serîhildana Agirî kir ku Kurd bi hemû aliyên xwe ve di nav vê tevgerê de cî bigirin. Loma jî em dikarin bêjin ku ji aliyê siyasî û civakî ve rêkxistina Xoybûnê xurttirîn û kartêktirîn rêkxistin e di danîna raman û îdeolojiya neteweparêziya Kurd de.

3.2 Jêderkên Rewşenbîrî ên Derketina Hawarê

Di warê kar û xebatên rewşenbîrî û entelektuelî de jî, reng û awayê sedem û jêderkên kovara Hawarê gelek balkêş e. Gava em li avakar û lijneya rêveberiya navendî a Xoybûnê dinihêrin, em pir bi rihetî dikarin bêjin ku; hin endamên rêveberiyê, ên wekî Celadet Bedirxan, M. Şukrî Sekban, Memdûh Selîm, di dema CTTK û CHYê de di xortaniya xwe de bûn; perwerdehiya xwe li Stenbolê dikirin û bi dîtî û raman û felsefeya wan cemiyet û komeleyan radibûn. Her wiha, kesên wekî Haco Axa, K. Cemil Paşa, E. Cemil Paşa, O. Sebri ku di nav gel de, wekî desthilat û xwedîgotinbûnê, giraniyeke wan a xuya heye, bi rêkxistina Xoybûnê re di nav kar û xebatan de ne.

Wekî dî jî, ev xwende, giregir û ronakbîrên civaka Kurd, di nava şeş salan de bûne govan û dîtî û serkêş û çalakgerên du serhildanên ku pir bi xedarî têk şikiyane. Lê belê van têkşikînan nekarîne kartêkeke neyînî li ser doza neteweyetî û li ser ramana neteweparêz a van ronakbîran bikin. Û bi serkêşî û tevliwîna Celadet Bedirxan, ronakbîrên li Sûrî li hev kombûyî, dest diavêjin pênûsê û vê carê reng û dirûv û awayê xebata xwe a di biwara neteweparêziyê de diguherînin; û ew êdî bêtir di biwara bêjarî û nivîskî de pal û bala xwe didin ser avakariya neteweya Kurd.

Û di şert û mercên wiha de, di 15ê Gulana 1932yan de, hejmara yekem a Kovara Hawarê li Şamê derdikeve. Xwedî û rêveberê kovarê tenê Celadet Bedirxan e û kovar bi tu rêkxistin û komeleyekê ve ne pênbendkirî ye. Celadet Bedirxan piştî ku rêdana weşandina kovarê ji desthilata hingê, Fransiyayê werdigire, di hejmara 10an de, bi kurmanciya jêrîn (soranî) wiha dinivîse di kovarê de; *‘Hawar ne layen komelekêwe derdehênirê û ne le komelekêwe paray esîne’* (Hebeş, 1996: 30). Loma jî C. Bedirxan ji xwendavanên kovarê dixwaze ku alîkariyê bi kovarê re bikin. “Hawar zaroqe nûza ye. Zarowa me ye; zarowa qurdan e. Weq her zaro bi xweytiya dê û bav û bira û pismamên xwe diqare bijî. Herqes, her qurd diqare arîqariya hawarê biqe.”⁸ (Hawar, 1998: 24).

Û Hawar bi vê astengiya ku hê di hejmara yekem de xwe dide der, sala pêşî bi rêkûpêkî, yanî di mehê de du hejmar derdikeve. Tevî ku merama xwediyê wê ew bû

⁸ *Celadet Bedirxan, di Hawarê de, ji hejmara 1. heta bi hejmara 23. Li şûna dengê ‘k’ya zirav tîpa ‘q’ û li şûna dengê ‘k’ya stûr jî tîpa ‘k’ bi kar aniye. Me jî dest neda orîjînaliya nivîsê û wekî xwe jê girt.*

ku kovar heftêkî der keve mixabin ew awata bi cih nabe (Hebeş, 1996: 31). Di sala 1932yan de 14 hejmarên Hawarê derdikevin. Di sala 1933yan de 9 hejmar derdikevin. Hejmara 24an jî piştî 8 mehan û 18 rojan, di 1ê Nîsana 1934an de derdikeve. Hejmara 25an jî piştî 4 mehan û 18 rojan di 19ê Tebaxa 1934an de tê weşandin. Di sala 1935an de hejmara 26 diweşe û paşê kovar hew tê weşandin. Piştî 5 sal û 8 mehan a vê birîna weşanê, kovar 15ê Nîsana 1941ê de 10 hejmarên xwe digihîne ber destê xwendevanên xwe. Her wisan, bi vî awayî û bi demên ji hev qutbûyî, heta 20ê Çileyê 1943yan 52 hejmar tê weşandin. Û hejmara dawî a kovarê, yanî hejmara 57an di tebaxa 1943yan de diweşe û Hawarê di hew tê weşandin.

Heke em bala xwe bidin mawey û temenê kovarê û heke em wan dem û salên ku kovar neweşiyaye nejmêrin, em ê karibin bêjin temenê kovarê qut û gilover 5 sal û 7 meh û 3 roj in. Lê ku em wan salên ku kovar neweşiyaye jî têxin nav hesabê em ê karibin bêjin temenê kovarê ji 11 salan zêdetir e. Pê re jî me divê em bêjin ku Hawar heta hejmara 24an hem bi tîpên Latîni hem jî bi tîpên Erebî weşiyaye û wek ziman jî Kurdî û Fransî derketiye. Hejmara 24an jî tê de heta hejmara dawî (hejmara 57an) kovar tenê bi tîpên Latîni derçûye. Û em dibînin ku heta hejmara 54an jî yek heb be jî nivîsarên Fransî di kovarê de ci girtine. Her wiha, di biwara xebat û çalakgeriya ronakbîrî û entelektueliyê de me divê em bala xwe bidin ser hin navan ku di naverok, rengûawa û berdewamiya Hawarê de bi rol û kartêkeke erênî rabûne.

3.3 Rewşenbîrî û Taybetiyên Çîni ên Nivîskarên Hawarê

Gelek bîrewer û rewşenbîran di kovara Hawarê de nivîsîne. Van nivîskaran bi Kurdî (Kurdiya Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Jêrîn-Soranî) nivîsarên xwe belav kirine. Em ê di vê beşê de bêtir bala xwe bibin ser nivîskarên ku nivîsarên xwe bi awayekî domdar belav kirine û ji hêlekê ve jî bûne nivîskarên kovarê.

Celadet Bedirxan: Ji malbateke xanezad û welathez e ku ji bo aqûbeta xweş a Kurdan her û her di nav tevgerekê de bûne. Di serî de serîhildana Emîr Bedirxan, hemû endamên malbata Bedirxaniyan di nav karûbar û têkoşîna bidestxistina mafê Kurdan de ci girtine. Herçî Celadet Bedirxan e, danêr û avakarê kovara Hawarê ye û wekî gotina xwe ‘Ez pîr bûme. Di derxika canê min de çil bihar bişkivîne. Qurma

bedena min çil zivistan dîtine” (Hawar 1998: 669) bi hesêbkirineke dem û demsalî di 26ê Nîsana 1894an de li Stenbolê bi dinyayê ketiye. (Hebeş, 1996: 31). C. Bedirxan kurê Emîn Alî Bedirxan e û bi perwerdehiyeke baş radibe. Xwendina seretayî û navînî li Stenbolê kuta dike. Hê di ciwaniya xwe de bi germî dikeve nav jiyana siyasî û di xebatan de cî digire û pê re jî têkiliyeke xurt bi nivîsînê re datîne. “Piştî şênbûna K.Tyê, der heqê Sureyya, Celadet û Kamûran Bedirxan de ferman tê derxistin û Celadet digel birayê xwe Kamûran xwe digihîne Elmanyayê û li wir beşa hiquqê dixwînin. Celadet piştî demekê vedigere Suriyeyê û her wekî me li jorê jî diyar kiribû di kar û xebata danîna rêkxistina Xoybûnê de cî digire û bi karê seroktiya yekem a rêkxistinê radibe. Ew di dema serfihildana Agirî de bi awayekî xwe digihîne çekdaran û piştî têkşikîna raperînê berê xwe dide Tehranê. Şahê Îranê bi hatina wî dihise û ji bo ku Celadet karê siyasî neke dixwaze wî bi karekî girê bide. Lê Celadet ev yek qebûl nake û Şah C. Bedirxan spardeyî Iraqê dike. Lê Celadet car dî xwe digihîne Sûriyeyê û dotmama xwe Rewşen Bedirxan ji xwe re tîne” (Hebeş, 1996: 41). C. Bedirxan, di sala 1932yan de dest bi weşandina kovara Hawarê dike. Kovara Hawarê 52 hejmar derdikeve û piştê weşana wê radiweste. “Celadet piştî Hawarê, ji Nîsana 1942yan heta Adara 1945an kovara Ronahiyê derdixîne. Kovara Ronahî jî xwerû bi Kurdî û bênavber 28 hejmar derketiye. Celadet ji bilî van her du kovaran hejmareke bayexdar pirtûk nivîsîne. C. Bedirxan, di 15ê Tîrmeha sala 1951ê de vê dinyayê bi cî dihêle û li goristana Şêx Xalid Neqşebendî a li Şamê li cem bavpîrê xwe tê veşartin” (Hebeş, 1996: 43). Her wiha Celadet Bedirxan, bi navên wekî Herekol Azîzan, Seydayê Gerok, Nêrevan, Bişarê Segman, jî nivîsan belav dike di Hawarê de (Kovara Hawarê, 1988: cild, I-II)

Kamûran Bedirxan: Ew hem birayê Celadet hem jî alîkarê yekem û sereke ê birayê xwe bû. “Ew di 21ê Tebaxa 1895an de li Stenbolê tê ser rûyê erdê. K. Bedirxan piştî ku ji Elmanyayê vedigere li Libnanê li bajarê Bêrûdê bi cî dibe û ev bajar dibe navenda çalakiyên wî ên çandî û siyasî” (Hebeş, 1996: 43). K. Bedirxan li Bêrûdê rojnameyên Roja Nû û Stêr derdixîne. Ew di nivîskariya Hawarê de gelek çalak e. “Di Hawarê de bend û kurtebend, helbest, çîrok û wergeranên çarînên Xeyyam belav dike. û her wiha gelek sureyên Qur’ana pîroz şîrove dike û hedîsên pêxember Hz. Mihemed werdigerîne Kurdî” (Hawar, 1998: 27-57). Kamûran

Bedirxan heta sala 1940î li Libnanê dimîne û paşê berê xwe dide Fransayê û di 4ê Çileyê Paşîna 1978an de li Parîsê diçe ber dilovaniya Xwedê.

Qedrî Cemîl Paşa: Di sala 1897an de li Diyarbekirê bi dinyayê dikeve. Kurê Fuad Begê Cemîl Paşa ye. Qedrî Cemîl Paşa, Zarokatiya xwe li Qonaxa Cemîl Paşa û bi perwerdeyê têr û tesel derbas dike. Piştî xwendina xwe li Stenbolê didomîne û li wir tev li karûbarên siyasî û çandî dibe. Pêşî wek avakar di nav CHYê de (Malmîsanîj, 2002: 67) û piştî jî “Di nav Xoybûnê de xebatên girîng ên siyasî dike. Qedrî Cemîl Paşa di sala 1913yan de ji bo xwendina bilind diçe Swîsreyê. Piştî ku Şerê Dinyayê ê Yekemîn dest pê dike, vedigere welêt. Wek efser dikeve şer. Li Filîstînê di şerekî li hember Îngilîzan de yekîneya Tirkan têk diçe û Qedrî Beg bi tevî hin leşkerên din wek dîl dikeve destê Îngilîzan” (Çelebi, 2010: 23-24). Piştî ku şer diqede, vedigere Diyarbekirê. Lê li Diyarbekirê jî xebatên xwe ên siyasî didomîne û bi tevî malbata xwe, malbata Cemîl Paşazadeyan tev li serhildana Şêx Se’îd dibe. Piştî têkşikîna serhildanê, digel birayê xwe Ekrem Cemîl Paşa berê xwe didin Sûriyeyê (Hebeş, 1996: 49). Li Sûriyeyê jî xebatên çandî û siyasî didomîne. Cara pêşî di hejmara sî û pîncemîn a Hawarê de nivîsara wî belav dibe ku nivîsareke bi navê “Dîwana Melê” beşeke ji dîwana Melayê Cizîrî ji tîpên Erebî vediguhêzîne ser tîpên Latînî û heta hejmara dawî ev xebata wî tê weşandin (Hawar, 1998: 848). Qedrî Cemîl Paşa piştî bi navê Zinar Silopî pirtûkeke bi navê Doza Kurdistan dinivîse (Cemil Paşa, 1991) û di sala 1971ê de diçe diyarê rehmetê.

Cegerxwîn: Di sala 1903yan de li Hesarê bi dinyayê dikeve. Xwendina xwe di medreseyan de dike û destûrnameya melatîyê werdigire (Xalib, 2009: 44). Ew bi xwe der heqê xwe de wiha dibêje, “Li ber destê Şewqî begê Erxenî şiyar bûme û min îra Kurdperweriyê biriyê” (Cegerxwîn, 2003: 126). Cegerxwîn piştî têkşikîna serhildana Şêx Se’îd berê xwe dide Sûriyeyê û li wir ronakbîrên Kurdan nas dike û di xebatên rêxistina Xoybûnê de cî digire. Piştî derketina kovara Hawarê, “di hejmara çaran de wek şa’îrekî, helbestên xwe di kovarê de belav dike” (Hawar, 1998: 83). Cegerxwîn, bi awayê helbestên xwe ên ku pîr(e)yek e di navbera şî’îrên klasîk a kêşsaz û şî’îra ne kêşsaz û modern de, peyvên Kurdî ên resen û gelêrî bi kar anî di helbestên xwe de û şî’îra Kurdî a modern ji şî’îra Kurdî a klasîk cihê kir ku Arjen Arî

di vî warî de dibêje, “Cegerxwîn peyv ji esman daxist erdê” (Arî, 2010: 42). Cegerxwîn di sala 1979an de berê xwe dide Swêdê û heta mirina xwe a di sala 1984an de li bajarê Stockholmê dijî.

Osman Sebrî: Ew bi xwe wiha dibêje der heqê bûyîn û jiyan xwe de; “Di 7ê Çileyê Paşîna 1905an de li gundê Narincê hatime dinê. Gundê me rûniştgeha serekên eşîra Mirdêsî bû. Bavê min Sebrî jî serokê eşîra Mirdêsî bû. Di pêşiya jîna xwe de, ji ber ku kurê serekê eşîrê bûm ji bo dewrekê halê hatibûm pêkanîn” (Sebrî, 2004: 9). Osman Sebrî, di qonaxeke jiyana xwe de li Kurdbûna xwe hişyar dibe û digel apê xwe Şukrî nêzikatî li serhildana Şêx Se’îd dike. Ew bi xwe girtina xwe wiha çêl dike; “Dawî dora me hat, du apên min, du xal, ez û du sed û heftê kes ji eşîra me xwestin mehkema îtîqlalê. Lê me tevan xwe nedan dest. Piştî mehkemeke kurt apê min pazdeh salan hukim kirin û em ên mayî berat kirin” (Sebrî, 2004: 10). Lê Osman Sebrî piştê di 24ê Hezîrana 1926an de car dî tê girtin û bi gotina wî ‘du salan kême mehekê’ (Sebrî, 2004: 11) di zindana Denizliyê bajarê Tirkiyeyê de dimîne. O. Sebrî, di vî mayîna zindanê de hê bêtir nêzî Kurdayetiyê dibe û hînî siyasetê dibe. Loma jî dide ser rêya siyasetê. Ji ber xebatên xwe, di sala 1929an de car dî tê girtin û piştî tê berdana di 24ê Çileyê Pêşîna 1929an de berê xwe dide Sûriyeyê. Li Sûriyeyê dibe endamê Xoybûnê. Piştî du salan di nav rêxistinê de xebatê dike, xwe ji xebata siyasî dûr dike û saziyên dîtir de xebata xwe didomîne. Osman Sebrî, wek endamekî kurê serokê eşîra Mirdêsî ji çîna arîstokrasiya bi axê ve pabend bû. Loma jî tevî ku ew perwerdehiyeke baş dîtibû jî, di warê xwendina bi Kurdî ve ne zana bû. Ew bi xwe vî yekê aşkera dike û wiha dibêje; “Min bi xwe bi hêvotina rehmetî C. Bedirxan mêldariya nivîsandina kurmancî kiriye, heke ne ji wî bûya heye ku ev mêldarî li nik min çare ne dibûn” (Hebeş, 1996: 43). Osman Sebrî, di Hawarê de nivîsarên ji çeşnên helbest, çîrok, pexşan, civaknasî, ziman û folklorê belav dike. Osman Sebrî, di 11ê Cotmeha 1993yan de li Şamê diçe ser heqîya xwe.

Nûredîn Êsîf (Nûredîn Zaza): Bêtir bi navê Dr. Nûredîn Zaza tê nasîn. Bi navê Nûredîn Êsîf di kovara Hawarê de nivîsên xwe belav kiriye. “Di sala 1919an de li Madena bi ser Xapêtê ve bi dinyayê dikeve. Ê di sala 1930yî de, digel birayê xwe Dr. Nafîz, berê xwe didin Sûriyeyê” (Hebeş, 1996: 50). Zaza piştî ku di dibistanên

Fransizan de xwendina xwe temam dike, tev li bûyerên siyasî û çandî dibe. Ew gava di Hawarê de dest bi belavkirina nivîsên xwe dike, yek ji nivîskarê herî xort ê Hawarê ye. Zaza, di gava belavkirina nivîsên xwe ên di Hawarê de û piştî wê jî li gelek welatan digere û xebatên li ser çand û neteweparêziya Kurd dike; û li Ewrûpayê bi hin hevalên xwe re “Komela Xwendekarên Kurd Li Ewrûpa ava dike” (Cewerî, 2007: 15). Nûredîn Zaza, di 7ê Çiriya Pêşîn a 1989an de li Lausanneyê diçe ber rehma Xwedê.

Qedrîcan: Di sala 1911an de li Dêrika bi ser Mêrdînê ve bi dinyayê dikeve. “Ew xwendina xwe a seretayî li Dêrikê kuta dike û paşê li Konyayê lîseya mamostetiye kuta dike” (Zengî, 2004: 9) û “demekê li bajarê Antakyayê mamostetî dike. Ew jî mîna gelek rewşenbîran dibe endamê rêkxistina Xoybûnê û bi kar û xebatên siyasî û çandî radibe” (Hebeş, 1996: 48). Piştî zor û zextên dewletê, hew dikare li Tirkiyeyê bimîne û “digel Reşîdê Kurd berê xwe dide Sûriyeyê. Demekê li Amûdê, li Qamişlo û li Şamê mamostetî dike” (Uzun, 1995: 358). Qedrîcan yek ji wan rewşenbîran e ku bi ramanekê çepgir bi kar û barê neteweparêziya Kurd radibe; û ji awirê ramana çepgir li ser neteweya Kurd disekine. Qedrîcan, hejmarek çîrok û helbestên xwe di Hawarê de diweşîne. Ew wekî şa’îr digel Evdila Goran pêşrewê helbesta modern a Kurdî tê qebûl kirin.

Gava em li profîla nivîskarê ku bi berdewamî di kovara Hawarê de nivîsîne, dinêrin, bala me diçe ser giraniya Kurmancbûna wan. Her wiha, ji bilî van nivîskarên ku bi Kurmancî nivîsîne, kesên wekî Refîq Hîlmî (Hawar, 1998: 839) û Tewfîq Wehbî (Hawar, 1998: 667-667-668) û Hevindê Sorî (Hawar, 1998: 363) û Pîrot (Hawar, 1998: 201) jî bi nivîsareke xwe a Kurmanciya Jêrîn (Sorani) beşdarî li rûpelên Hawarê kirine.

Her wiha, gava em wek sedem û merc û binkeya li paşxaneyê ronakbîrî a Hawarê dinîhêrin, tiştê ku serê pêşîn em dibînin û bala me diçe serê ev e; rengê sedem û merc û bingeha derketina Hawarê ji hin hêlan ve cudatir e ji kovar û weşanên berî xwe. Ji bo vê yekê em dikarin bêjin ku; hemû nivîskar û ronakbîrên ku nivîsarên wan di kovar û weşanên berî Hawarê de weşiyane, xwendinên xwe li Stenbolê kirine an jî bi taybetî ji bo temamkirina xwendina xwe hatine Stenbolê. Her wiha, wan nivîskar û ronakbîrên Kurdan bajarê Stenbolê li xwe kiriye war û pê re jî

her ku çûye ji gel û komên xelkê dûr û qetiyayî mane. Çendî ku hin saziyên wek CHyê hewl dane ku li bajarên Kurdistanê şaxên saziyê vekin jî, ev yek di warê xwegihîştandin, kartêkkirin û hişyarkirina gel û komên xelkê a di warê netewe û neteweparêziyê de kêr û qels maye. Loma jî Hawar, ji gelek aliyan ve cihêtir e ji weşînekên berî xwe hatine weşandin.

3.4 Nimandina Zanava Kurd Di Hawarê De

Hawar wekî yekem weşan e ku xwerû bi Kurdî, (bi Kurmanciya jorîn û jêrîn) derketiye.⁹ Ev yekembûn di biwara nimandina zanavê de Hawarê datîne ciyekî girîng î taybet. Ji ber ku danîn û nimandina zanava Kurd a di Hawarê de, bêtir di ser zimên re ye, ev yek berê me dide têgiha *cihêtiyê* ku li ser *nejihewî* tê avakirin. Jihevcihêbûna netewe an jî gelên etnîk, di gotina “Cime‘eta Xeyalî” a Benedict Anderson de bi awayekî berevajî xwe dide der. Anderson dibêje, “Ziman, di avakirina her cure cime‘etê de –*cime‘etên olî û neteweyî jî tê de (d.d)*- bi roleke avakar radibe” (Anderson, 1995: 27) Ev rol, roleke diyarkirina jihevcihêbûnê ye û pê re jî destnîşankirina nejihewiyê ye. Çendî ku ziman, di serdema pêşmodern de, tenê di ser zimanê kitêbên pîroz re yekbûnek û yekrengiyek ava kiribe jî, “Piştî ku Martin Luther King du sed sal piştî Dante Încîlê werdigerîne Almanî, Încîla bi Almanî li Almanyayê dibe tekane berhema wêjeyî ku zimanê neteweyî afirandiye; an jî dibe ew berhem ku ziman kiriye renekî standard” (Euerbach, 2010: 115). Gava em bala xwe didin ser zimanê kitêba pîroz Qur’an ku Erebi ye, rastî pîrozweriyeke dîtir tên ku di ser pîroziya Qur’anê re ava bûye. Belê, ji ber ku qedexa ye ku Qur’an li zimanekî dîtir bê wergerandin. Vê yekê, ji derveyî pîrozweriya Qur’anê, li hember zimanên dîtir pîrozweriyeke taybet ava dike ji bo zimanê Erebi; û pê re jî desthilatiyeke taybet. Loma jî, em dikarin bêjin, peyta Anderson ku dibêje, *her cure cime‘et*, di hewldana avakariya cime‘eta (yanî neteweya) Kurd de, ne kartêkker e û berevajîya wê bi roleke berastengker radibe. Ji ber hindê ye ku danerê Hawarê C. A. Bedirxan, di vî warî de zêde zêde bi şik û bêhêvî ye ku wiha dibêje, “Ji ber qo

⁹ *Tevî ku di Hawarê de nivîsarên bi zimanê Fransî hene jî, heke em wek sînorên ku Kurd lê dijîn sînorên ku Hawar bi derketina xwe ve kartêk lê kiriye bihesibînin û zimanê serdest ên wê hingê ku Erebi, Farsî û Tirkî ye, em dikarin bêjin, Fransî wekî zimanekî biyan e û her wiha li gorî ku O. Sebrî radigihîne, weşandina nivîsarên bi Fransî wekî şertekî desthilata Fransîzan a li Surî ye.*

miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan bi keweta çeqan diparêzînin: O1 yeq, Zman dudo. Lê heqe ola miletê serdest û bindest yeq bibe, hingî çeq yeq bitenê ye û bend tenê zman e” (Hawar, 1998: 405). Celadet, ne bendewar e ku dê miletên serdest di ser yekbûna cime‘eta olî re heqê Kurdan jî li wan vegeŕînin û cime‘eta mezin ku tê xwestin ava bibe. Celadet, di ser paşxaneyê ku ji sala 1840î û heta derketina Hawarê di hişûbîra Kurdan de ava bûye re diaxive. Wek me li jorê jî destnîşan kir, tevî ku Kurd bi rêjeya ji sedî 95 misilman in û bîrûbaweriyên wan ên olî û ên serdestên wan yek e jî, yekbûna cime‘teke mezin a di ser olê re, heta wê hingê her tim berevajî li ser Kurdan hatiye bikaranîn. Wekî serencama vê deravê em dikarin bêjin ku; Celadet ne li ser wê fikrê ye ku nimandina neteweya Kurd di ser yekbûna cime‘teke olî re bê kirin. Celadet wiha dibêje, “Halê me qurdan ev e. Em qetine bin destê se milet û dewletên misilman, piraniya me ji misilman e, em û serdestên me ji oleqê, ji dîneqî ne. Her sê jî xebateqe zor dixebitin qo me têxin miliyeta xwe” (Hawar, 1998: 405). Em ji gotinên wî bi awayekî zelal î aşkera fam dikin ku; serdestên Kurdan di nav hewlekê de ne û meylê dikin ku Kurdan wek cime‘eteke neteweyî nebînin. Jixwe di warê nimandinê de, eger û xala destpêkê a Celadet jî ev e; ew dixwaze di ser *cihêbûna* Kurdan re nimandina Kurdan pêk bîne û bêyî ku yekbûna olê bibe mijar, *nejiheviya* çandî, zimanî û dîrokî bide der.

Her wekî ku Kurdbûn ji bo rewşenbîrên qonaxa rojnameya Kurdistan, kovarên Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Yekbûn û Jînê bûye arîşeyekê, di qonaxa Hawarê de jî bi taybetî bûye arîşeya danerê kovarê C. A. Bedirxan. Gava em wek konjonkturî li heyamê dinêrin, em dibînin ku di qonaxa derketina Hawarê de, Kurd êdî ne tebayeke dewleta Osmanî ne. Dewleta Osmanî ji yekbûna xwe ketiye û jê K.T.yê şên bûye. Her wiha, cografyaya Kurdan jî bûye çar parçe; û Kurd di bin desthilatiya Îngilîz û Fransîz û Îran û Tirkiyeyê de dijîn. Çendî ku cografya bûye çar parçe jî, arîşeya zanavê bêtir li Kurdên ku di nav sînorên dewleta Osmanî de dijîn, bûye gelemşeya hebûniyê. Ji ber ku piştî şênbûna K.T.yê, Kurd wek gelekî etnîk û neteweyekê tune hatine hesibandin û çand û zimanê wan jî hatine qedexekirin. Vê rewşê di warê siyasî de kartêkeke mezin li Kurdan kiriye û du serîhildanên mezin, serîhildana Şêx Se‘îd (1925) û serîhildana Agirî (1926-30) li dar ketiye. Lê belê her du serîhildan jî, têkşikiyane û rewşa siyasî li Kurdan girantir bûye û rewşenbîr û xwendeyên Kurd, ji qonaxên berê zêdetir bi vê arîşeyê re lebişkîne. Û bi taybetî

Celadet Bedirxan di vî warî de ketiye nav hewldaneke taybet û nameyeke dûrûdirêj ji Mustafa Kemal Atatürk re nivîsiye. Nameya ku wekî belgeyeke dîrokî ye, serê pêşîn wekî pirtûka şeşemîn a Pirtûkxaneya Hawarê di sala 1933yan de li Şamê tê çapkirin. Piştî, ji alî Dr. Nuri Dersimi ve bo tîpên Latîni tîpguhêziya wê tê kirin û piştî çil salan, di sala 1973yan de li Helebê tê çapkirin. Name di sala 1977yan de ji alî weşanxaneya Komal ve û di sala 1992yan de jî ji alî weşanxaneya Dozê ve wek pirtûk tê çapkirin.

Celadet di nameya xwe de, digel hewldana destnîşankirina zanava Kurd, tê dixebite ku hebûna zimanekî wekî zimanê Kurdî jî bipeyitîne. Ew serê pêşîn hewlê dide ku hebûniya zanavekê ku tune tê hesibandin di ser dîrokê re dayne rastê û wiha dibêje, “Paşa Hazretleri... Mamafî ben de itiraf eylemeliyim ki Kürdistan kadim bir mefhum tarihidir ve “Kürdistan meselesi” ne zamanımızda ne de siyasetlerinin varisi olduğunuz İttihâd ve Terakki hükümeti zamanında başlamış değildir.” (Bedirxan, 2010: 39). Ev awa gotin, di heman demê de balê dikişîne ser dîrokîbûnê ku her wekî Hobsbawm jî dibêje, “(...) Pîvana yekeme ev e; divê netewe ji dîroka xwe û bi roja îroyîn ve bi dewleta heyî re pêbestî be. (...)” (Hobsbawm, 1995: 55-56). Celadet, çendî ku ne bi pêbestîya dewletekê ve be jî, her wekî Smith dibêje, “(...) çandên etnîkî di gera dîrokî de neguherîne, yanî puxtaya wan wekxwe/domdar maye” (Smith, 1994: 41). dixwaze bi heyîbûna dîrokî û di ser etnîkî ve jî hebûna *meseleye*ke bi vî rengî û di ser vê re jî hebûna Kurdan û zanaveke wekî Kurd dayne rastê. Loma jî, ji bo qayîmkirin û danîna paldera xwe, wiha bi gotina xwe de diçe, “(...) Medler’in mebdê ve menşeyine gitmeğe lüzüm yok. Kisenefon’un “Siropedi”sinden başlamak kafî. (...) Evet, Kürdistan meselesi, ne zamanımızda ve ne de selefleriniz zamanında başlamış değildir. Türkiye’de Kürdistan meselesi, Kürd ümerasının, ilk Osmanlı tarihi, “Heşt Beheşt” müellifi İdris-i Bitlisi vasıtasıyla Yavuz Sultan Selim’e sunni bir hükümdara bîat etikleri günden beri mevcuttur.” (Bedirxan, 2010: 39-40).

Her wiha Celadet, bi dîrok û zanava etnîkî ve jî namîne, berê xwe dide heyîna zimanekî ku ji sedan salan maye û şahberhemên Kurdî Mem û Zîn wekî peyta zanava Kurd dide nîşan û wiha dibêje, “(...) 1105 senesinde “Memozîn” ünvanlı eser-i muhallidini vücuda getiren büyük Kürd şairi Ahmedê Xanî, bugünkü milliyet cereyanının ilk mübeşşiridir.” Celadet, bi nîşankirina Mem û Zîn a Xanî, bi wateya

ku Euerbach dibêje, “Ji bo avabûn û pêkhatina zimanekî neteweyî, pêwîstî bi şahberheman heye; yanî pêwîstî bi wêjeyê nivîskî heye” (Euerbach, 2010: 111). Şahberhema Kurdî a nivîskî nîşan dike. Çendî ku nivîskîbûna Kurdî diçe dîrokek pêşdetir jî, Celadet bi vê nîşankirinê re, wekî mîrateya dîrokî amaje bi folklorê Kurdan dike û wiha bi gotina xwe de diçe, “Mevzuunu bir halk efsanesinden almış olan Xanî, eserinde baştan başa Kürd milliyetinden ve Kürdistan bahseder. Konuştuğu şahıslar kâmilten birer semboldür. Kürd milletini temsil eden şahsi esarete düşürür, zindanına atar ve onun halası çarelerini millete aratır ve gösterir.” (Bedirxan, 2010: 41).

Gotina Celadet a *Mevzuunu bir halk efsanesinden almış olan Xanî*, rasterast balê dibe ser dêrîniya çand û folklorê Kurdan. Heke em bala xwe bidin Smith ku dibêje, “Neteweparêzî wekî ziman û îdeolojî, nehatiye “dahêrandin”; neteweparêzî di gelek astan de çalak e û digel ku îdeolojiyê siyasî û cureyê tevgera civakî ye, di heman demê de mirov dikare wê wekî teşeyê çandî jî qebûl bike” (Smith, 1994: 129). Tiştê ku Celadet hewlê dide ku destnîşan bike ev e. Hemin ku dewleteke Kurdan tune li rastê û hemîn ku çand û zimanê Kurdan – ku tune tê hesibandin – heman û nîşaneyên Kurdbûnê ne, ev awa tunehesibandin; sedemên sereke ên hebûn û zanavê jî ji navê radike. Celadet, bîyî ku di dîrokê de dîr biçê û çel û behsa dema Medan û Kisenefon bike, yekser balê dibe çand û folklorê Kurdan û amaje bi şahberhema Kurdî dike û pê re jî bi wateya Smith danandî de, zanava Kurd wekî teşeyê çandî û zimanî datîne rastê û bêjara xwe di ser wê re ava dike.

Digel ziman, biwara wêjeyê jî biwateke bêjara zanavî ye di Hawarê de. Di çîrokeke bi navê Ber Tevna Mehfûrê de, C. A. Bedirxan, gotinên wiha bi lehenga çîrokê Rindê dide gotin. “Qo Qurdistan bi serê xwe bû, hingî her tistên welatê me, ji me dibin” (Hawar, 1998: 85). Ê bi danandina sînorekî teritoryal, bi gotina *Qurdistan bi serê xwe bû*, balê dibe ser welatekî ku wek dewlet hebûye. Ê di ser vê hebûniyê re, hebûna zanaveke bi navê Kurd jî destnîşan dike. Celadet, bes bi destnîşankirinê namîne û car dî di ser zimên re vê zanavê bimak dike û bi Rindê wiha dide gotin, “Wê gavê ev zmanê qo em pê daxêvin û ji me re şîrîn e di her derê de bête gotin û bihîstin.” (Hawar, 1998: 85). Çendî ku di dîrokê de dewletên wan hatibin danîn jî, zimanê Kurdî, diyarker e di destnîşankirina zanava Kurd de. Lê belê, ev destnîşankirin têr nake ku zanava Kurd wek zanaveke neteweyî were pejirandin.

Celadet, di pêdeçûnê de wiha bi Rindê dide gotin, “Îrû em di zivarîyê de ne, malên me ji destê me hatine standin. Çire? Ji ber qo em qurd in û dewleta qurdan nîne” (Hawar, 1998: 85). Em bi van gotinên Rindê fam dikin ku, ji ber ku îdeolojiya dewleta neteweyî serdest e û zanava ku di ser zimên re hatiye destnîşankirin, di îrorojê de zêde ne kartêkker e. Loma jî, zanava ku di ser zimên re hatiye destnîşankirin, têr nake ku zanaveke tamamkirî were danandin. Û Bedirxan, di ser van gotinên Rindê re, bêjareke neteweparêz ava dike ku ji bo destnîşankirina zanava Kurd e; û çendî ku ew li xwe dike armanca ku vê zanavê di ser zimên re ava bike jî, ji ber ku feraseta dewleta neteweyî serdest e û zanava neteweyî di ser wê re tê pênasekirin û pejirandin, ev yek bi awayekî aşkera li ser Celadet jî kartêka xwe dide der.

Her wiha, dîsan zanava Kurd, di ser dîrok û takekesiyên ku di dîrokê de ciyekî girîng î xurt girtine re jî hatiye nimandin. Dîsan C. A. Bedirxan, di nivîsara xwe a bi nav Sultan Selaheddînê Eyyûbî de, wiha dest bi gotara xwe dike, “Ensîklopediya mezin ji benda Selaheddîn ra holê dest pê dike: "Ev Kurd..."” (Hawar, 1998: 526). Ev destpêk, amaje pê dike ku di dîrokê de Kurd wekî zanavekê hebû û digel ku ne li ser navê Kurdbûnê be jî, Selaheddînê Eyyûbî wekî zanav Kurd hatibû qebûlkirin û zanîn. Loma jî, ev qebûlkirina dîrokî û navneteweyî dike ku zanava Kurd xwe bigihîne jêderkeke dîrokî ku çendî ku desthilatiyeke siyasî dananîbe jî, wek gelekî etnîk her hebûye. Celadet, bi gotinên, “Herê Selaheddîn kurd bû, ji me bû, ji mezinên kurdan bû, hêj bêtir û rasttir kurdê mezin û mirovê mezin bû.” (Hawar, 1998: 526) bi awayekî zelal û teqez xwedîfîlêkirinekê pêk tîne. Ev xwedîfîlêkirina ku di gotina *ji me bû* de belî û aşkera dibe, xwe digihîne têgihên *xwejêzanîn* û *xwejêhesibandinê* jî. Her wekî tê zanîn ku hest û pêhisînên *xwejêzanînê* û *xwejêhesibandinê*, serê pêşîn ‘em’ek piştî jî ‘dike’yek bi xwe re ava dike. Her wiha, gotina Celadet a *ji me bû* jî, rasterast amaje bi *dîkeyan* dike û bi vê amajepêkirinê re jî zanaveke ku di ser ‘em’ê re ava bûye datîne holê. Celadet wiha pê de diçe û dibêje, “(...) ji mezinên kurdan bû, hêj bêtir û rasttir kurdê mezin û mirovê mezin bû. Ji xwe mezinahî bi mezinan çêdibe.” Bêjareke bi vî rengî, têkildarî mezinbûneke ji hebûniyê ye. Tiştê ku Selaheddîn mezin dike, ne kirin û pêkanînên wî ye, bes ew *mezinê kurdan* e û ji ber ku *kurdê mezin* e *mirovê mezin* e jî. Em dikarin di vê qonaxê de pal û bala xwe bidin Palmer ku dibêje, “Tiştê ku piştê dide

ramana jineteweyekêbûnê û zanava neteweyî car dî hildiberîne, ramana yektabûn û wekhevbûnê ye” (Palmer, 2007: 279-298). Loma jî Celadet bi gotina ‘Ji xwe mezinahî bi mezinan çêdibe’ mezinahiya Selaheddîn bi mezinbûna Kurd ve dibestîne û mezinbûna Kurd wek jêderk tîne rastê û bi mezinbûna Selaheddîn a di dîrokê de hatî pejirandin, bêjareke neteweparêz ava dike. Her wiha, Celadet di ser têgihên *xwejêzanîn* û *xwejêhesibandinê* re bêjareke neteweparêz ava dike ku ev awa bêjar di heman demê de, bi awayekî di bin ve, dîkeyên Kurdan jî dinimîne û di ser van hemûyan re jî ‘em’ek ava dike û ev ‘em’a hanê dibe şaneka zanava Kurd û nimandina wê.

Her wiha, çendî ku Celadet dibêje, “Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, hiner û sinhetê de dê bixebitin” (Hawar, 1998: 23). Lê belê ev yek bes di gotinê de dimîne. Ji ber ku Celadet sere pêşîn ziman ji xwe re dike armanc û di ser zimên re jî bêjarekê ava dike. Bêjara xurtkirina sedem û hêmanên zanava Kurd. Ew sere pêşîn, ola misilmantiyê ku Kurd û serdestên Kurdan bi hev re hevol in, ji vê bêjarê bêrî û dûr dike. Pê re jî di ser ziman û avabûna neteweyan re, bi riwangeyêke sekuler li arîşeya zanavê dinêre. Û ji bo qayîmkirina zanava Kurd jî roleke kartêkker dispêre zimên. Lê belê, pê re pê re hay jê dibe ku; çendî ku bi roleke xurt û kartêkker rabe jî, ziman bi tena serê xwe dê nikaribe bibe hêmaneke diyarker a heyîna (an jî avakirina) zanava Kurd. Loma jî, hewldanên ku ew di warê avakirina zimanekî hevpar de dide, rengê siyaseta zimên dide xebatên wî. Ev rewş dike ku Celadet nikaribe xwe ji dîrok û mîrateya zimanî û wêjeyî a Kurdan bêrî bike. Vê carê pala xwe dide dîrok û kesayetên dîrokî ên Kurd ku dê karibin neyînkirin û tunehesibandina ku li heyîna Kurdan qewimiye, pûç bikin.

Celadet wekî danerê Hawarê, ew kesayet e ku hemû hoy û sedemên xwe ji bo danîna hîmê zanava Kurd danîne rastê. Û di biwara pênasekirina zanava neteweyî a Kurd de jî, bûye navekî girîng û kartêkker.

3.5 Ranêzikiyên Zimanî ên Berî Hawarê

Ranêzikiyên zimanî, ne bi kovara Hawarê dest pê kiriye. Di hin kovarên ku bi salan beriya Hawarê derçûne de, divêtiya pêşxistin û berbelavkirina zimanê Kurdî hatine bilêvkirin û pê re jî hin xebat hatine kirin ku em bi sanahî dikarin bêjin ku ev

xebat ji bo Celadet Bedirxan bûne bingehke destpêkî. Abdullah Cewdet jî, di nivîsara xwe a bi navê Bir Hitab (Rapeyvek) a di Rojî Kurd de weşiyayî, wiha dibêje, “Divê tîpên ku dê hêsanî çêkin ji bo ku zarokekî heft heşt salî karibe di nava mehekê de xwendin û nivîsînê hîn bibe, bên qebûlîkirin û dev ji elfabeya ku heta niha hatiye bikaranîn, were berdan” (Rojî Kurd, 2002: 29). Yek ji wan kesan ku heman ranêzikiyê nîşan dide Süleymaniyeli Mesud e (Mesudê Silêmanî). Mesud nivîsareke bi navê “Tîpên Me û Hêsanîya Xwendinê” di kovara Rojî Kurd de belav dike û di nivîsara xwe de çêla çetiniya hînbûn û xwendin û nivîsîna bi tîpên Erebî dike û wiha dibêje. “Ji bo hînbûna şeş tîpan hewce dike ku mirov bi heştê texlît şiklan (tîpan) hîn bibe. Peyta vê yekê jî ew e ku tîpa ‘h’ bi dozdeh awayên ku naşibin hev tê nivîsîn” (Rojî Kurd, 2002: 29). Mesud digel vê nivîsara xwe jî elfabeyeke ku ji bo Kurdî amade kiriye pêşkêş dike. Çendî ku elfabeya Mesud zêde nayê pejirandin jî, em dikarin bêjin helwesteke taybet a zimanî di xwe de dihewîne; û li xwe dike armanc ku bi rêya elfabeyeke taybet ruh û qalibê Kurdî ji qalibê Erebî dûr bixîne.

Dîsan Babanzade Îsmâîl Hakkî, di nivîsa xwe bi navê “Bilindbûna Kurdîniyê” ku Rojî Kurd de weşiyaye, balê dibe ser zimên û wiha dibêje, “A yekem ew e ku divê em zimanekî Kurdî a nivîskî û sade çêkin. Û divê di tîpên Erebî de, ku dê pê bê nivîsîn, guherîn bê çêkirin. A duyem jî, divê em kitêbên ku pêwistiya Kurdî pir zêde bi wan heye binivîsin. Wekî mînak rêziman û ferheng. Heta ev tunebin, avakirina fêrgehê nayê wê wateyê ku tu avahiyek lê kî û tê de zarokan kom bikî.” (Rojî Kurd, 2002: 73). Babanzade jî wekî Mesud, çareseriyê di nav elfabeya Erebî de dibîne û bes pêşniyaz dike ku di nav qaydeyên wê de guherîn bîn kirin da ku xwendin û nivîsîna bi Kurdî a bi vê elfabeyê hêsantir be. Her wiha, M.X. (Xelîl Xeyalî) jî bi berşankirina Mesud û Babanzade namîne; bi vî karî radibe û “cara pêşî yekem elfabeya Kurdî ku tîpên Erebî ji xwe re dike bingeh, amade dike û ev elfabe li Stenbolê tê belavkirin” (Malmîsanîj, 2002: 101). Lê belê, çendî ku mirov dikare vê kirina M.X. wekî nûtiyekê, wekî şoreşeke di nav mestere û forma ji hundir de hatî pêkanîn, bihesibîne jî, ji ber ku reformeke xurt a navxweyî di elfabe û gramer û fonetîka Kurdî de pêk neaniye û zimanê Kurdî (bi zaravayekê be jî) di nav analîtîka xwe de danehûrandiye, bes maye wekî hewldaneke pêngava pêşîn.

Heman ranêzikî di kovara Jînê de jî tê nîşandan. Di hejmarên 20, 21 û 22yan de, ji ber navê kovarê ku bi tîpên Erebî wekî “Jin” tê xwendin, wekî gazinçek wiha

hatiye gotin, "... hin xwendevanên kovarê, mana peyvika "Jîn" fam nakin û wê peyvikê "jin" dixwînin" Di domana nivîsê de, vê gazincê rengêkî dîtir girtiye û wiha hatiye gotin, "Em çi bikin, ku zimanekî Arî bi kirasê alfaba Samî bê nivîsîn, ancax ew qas mefadar dibe. ibret bigirin" (Kovara Jîn, 1986: 21-22). Lê belê gazincê ciyê xwe negirtiye û li ba xwediyê xwe hew maye wek gazincek. Daner û nivîskarên kovara Jînê, tu xebat û hewldanên guhertina elfabeya Erebi nekirine û heta hejmara dawî a kovarê jî bi tîpên Erebi nivîsîne.

3.6 Avakariya Celadet Bedirxan û Kovara Hawarê

Piştî şênbûna K.T.yê û danîna qanûnên qedexekirina ziman û çanda gelên Tirkiyeyê ên ku ne Tirk in, piranî rewşenbîr û xwende û siyasetvanên Kurdan berê xwe dan derveyî sînorên Tirkiyeyê û xwe li bajarên Şamê girtin ku wê hingê di bin desthilata Fransiyayê de bû. Celadet A. Bedirxan jî yek ji wan kesan bû. Celadet, piştî têkşikîna serîhildana Agirî, xwe ji siyasetê bêrî dîke û berê xwe dide xebata zanî û rewşenbîriyane û hewlê dide ku projeya xwe a ji çend salan bi vir de di serê wî de pijiyaye li dar bixe. Ew sedem û destpêka vê projeyê a ku ji zaroktiya wî de di serê xwe de saz kiriye, wiha tîne zimên; "Ji xwe di zaroktiya xwe de, weqê min di dibistanan de dixwend û hinî herfên erebî û latîni dibûm, tiştêq hebû qo min di çavê xwe ra diqir û ji bona herfên erebî, di dilê xwe de digot: ev elfabêqê welê ye qo dengin dide xwendin qo nayine nivîsandin, û latîni yeqcar vajiyê wê ye, herfin dide nivîsandin qo nayine xwendin" (Hawar, 1998: 263).

Celadet, piştî ku ji gera xwe a bi Noel re vedigere Stenbolê, dikeve nav koş û xebata amadekirina elfabeyê Kurdî a bi tîpên Latîni. Lê her wekî gelek xebatên destpêkî û arşivî a Kurdan kirî, ev xebat jî dikeve ber lehî û tofana ku desthilatdar radikin û hemû tiştên Celadet amadekirî, winda dibin. Celadet vê yekê wiha tîne zimên; "Weqê em veqeriyên hatin Stenbolê bi vê elfabeyê min qitêbeqe elfabeyê û ferhengeqe qîçiq nivîsand û ji bona çapê qar qiri bûn. Lê mixabin ne ew elfabê, ne jî ew ferheng îrû ne di destê min de ne. Di sala 1925an de digel hin nivîsarên min en din gehîştine heta pêşberê Mehqema Xarpûtê." Lê Celadet, dev jî xebata xwe bernade û piştî ku diçe Elmanyayê li wir jî hûrgera xwe a li ser tîp û dengên Kurdî didomîne.

Celadet hay jê heye ku divê kar û xebatên bi vî rengî ji alî zimanzanan ve bên kirin. Loma jî sedema ku wêriyaye û ew maf di xwe de dîtiye ku bi vî karî rabe, wiha çêl dike; “Ez qo qurd û qurdmanczman im û zmanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zmanên din danîye ber hev, qitqitên wi hûrhûnandine; keydeyên wî ji hev derêxistine, diqarim ji biyaniyan bêtir û kenctir dehqera wî bidim xuya qirin û zanin” (Hawar, 1998: 23) Ew bi vê gotina xwe, serê pêşîn dide zanîn ku pîlan û pergaleke wî heye ku kemiliye û hatiye ber kewna pêkanînê. Û pê re jî kirin û pêkanînên oryantalistên Ewrûpî tîne bîra me ku digel gelek civakên rojhilat û rojhilata navîn berê xwe dane Kurdan jî û li ser zimanê Kurdî jî hin xebat pêk anîne. Yek ji wan xebatan; xebata keşîşê katolîk Maurizio Garzoniyê Îtalî ye ku di sala 1878an de gramera Kurmancî nivîsiye û pê re jî ferhengeke biçûk amade kiriye. (Garzoni, 2013:) Celadet, bi gotina, “min heft heşt zimanên din daniye ber hev” (Hawar, 1998: 24) bi me dide zanîn ku ew serdestî wan zimanan e jî. Loma jî, çendî ku di warê akademîk de tu destûrname û etîketeke zimanzaniyê pê re nîn be jî, ew bi zanîna xwe bawer e û bi awayekî ji awayan jî zimanzaniya xwe datîne rastê.

Celadet bi vê bixwebaweriyê dest bi xebatên xwe dike; û di biwara zimanzaniyê de jî format û rengêkî dîtir diafirîne; ew wekî mirovekî ku wek etîket û navdariyê, ne zanyarê zimanzaniyê ye, dibe daner û avakarê gramera zimanekî. Loma jî Celadet, serê pêşîn berê xwe dide elfabeyê û biryar dide ku elfabeyê ji tîpên Latînî pêk hatî bo Kurdî dayne. Celadet di Hawarê û di nivîsara xwe a bi navê ‘Pêşgotinçeq’ de vê yekê wekî serboriyêke xwe radigihîne me û wiha dibêje, “Di sala 1919an de, me da bû çiyayên Meletyê. Em qeti bûn nav eşîra Rewan. Mêcer Nowel (îngilizeq) jî digel me bû. Mêcer zarê nîvro dizani bû, dixebitî qo hînî zarê baqur bibe, û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin medheloq, stran û çîroq berhev diqirin. Carinan me li nivîsarên xwe çavên xwe digerlandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi bilevqirineqe biyanî, lê bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend, lê belê ez, heta qo min (û, -) ji (o, -) û (î -) ji (ê -) b. p. derdixistin. diqetim ber hezar dişwarî. Ma çiman ?.. ji ber qo Mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê di cih de min kerara xwe da û ji xwe re bi herfên latinî: elfabêyeq lêqani” (Hawar, 1998: 263). Çendî ku Celadet di hejmara 13. de çêla vê serboriyê dike jî, wî dem ji xwe û ji xebata xwe nebîr û ji

hejmara yekem û pê de Hawarê bi tîpên Latînî û Erebî weşand. Ev yek jî bû sedem ku şoreşa ku diviya di elfabeya Kurdî de li dar biketa, dereng nemîne.

Celadet, di nivîseke xwe a bi navê Li Ser Yekîtiya Zimanê Kurdî de ku bi navê Xwediyê Hawarê nivîsiye, wiha dibêje, “Yekîtiya milletê Kurd bi yekîtiya zimanê Kurdî tête pê” (Hawar, 1998: 509). Ev gotin, ne tenê ji ber xebateke dorteng tê bilêvkirin, ji ber ku Celadet, reform û vejyana Kurdî bi awayekî giştî difikire, di nivîsara xwe de vê ramana xwe bi xwendevanên kovarê û bi kesên eleqedar dide zanîn. Her wiha, dema Celadet hîn dibe ku Tewfîq Wehbî elfebeyeke latînî daniye, xwe digihîne wî; têkilî pê re datîne û her du di sala 1930yê de li Şamê hev dibînin û elfabeyên xwe didin ber hev...” (Hawar, 1998: 509). Em ji vê hevdiîtinê, pir xweş hay jê dibin ku C. Bedirxan ne di xem û hewldana *yektabûnê* de ye. Ew dixwaze di çarçoveyê zaniyê û dorfireh de elfabeyekê bo Kurdî bê danîn. Loma jî, bi nefsbîçûkiya zanyarekî tevdiqere û dîtin û ramanên xwe bi ên Tewfîq Wehbî re dide ber hev. Her wiha heman awayê ramîn û reftar ji bo Tewfîq Wehbî jî li ber çavan e. Celadet, bi van gotinan vê hevdiîtinê çêl dike, “Di navbera wan de ferqin hebûn. Me dil dikir di cih de elfabeyên xwe bigihînin hev û ji herduwa elfabeyek nû bibijêrin û belav bikin” (Hawar, 1998: 509). Gotina Celadet a *ji herduwa elfabeyek nû bibijêrin û belav bikin* bi me dide zanîn ku ew alîgirê xebat û berhemeke kolektîv e. Lê belê ev daxwaza Celadet naçe serî û ew di vî karî û di xebata danîna elfabeyeke Latînî a bo Kurdî de dimîne tenê. Celadet, hinekî jî xemgîniya xwe a ji derava ku li wan qewimiye tîne zimên û wiha dibêje, “Hingê destbirayê min ê xwoşewîst û giram digot ko hîn ser elfabeya xwe dê bixebitim. Ji lewra yekirina elfabeyên xwe me avêtibû dawiyê. Di pey re. Tewfîq Wehbî Beg çû Îraqê. Lê teşxelenin nexweş qewimîn ko ji bona herkesî nas in. Digel vê hindê min jê re çend caran nivisand, lê li min venegerandibû. Vê paşiyê me zanî ko nivîsarên min negihabûn destê wî” (Hawar, 1998: 509). Piştî ku projeya yekkirina her du elfabeyan bi ser nakeve, Celadet radibe bi tena serê xwe kar û xebata xwe a di vî warî de dikudîne.

Celadet, elfabeya Kurdî a ku bi tîpên Latînî amade kiribû, di Hawarê de, bi nivîsareke bi navê Elfabeya Qurdî, digel bergindên wan ên bi tîpên Erebî belav dike. (Hawar, 1998: 25-26) û tiştê ku di vê elfabeyê de serê pêşîn bala me dibe serê ew e ku, Celadet, wê hingê tîpên “q” û “k” li gorî roja îroyîn di şûna hev de bi kar anîne. Yanî, wî dengê “k” ya ziravik bi tîpa “q” nivîsiye û dengê “q” ya stûr jî bi tîpa “k”yê

nivîsiye. Lê em dibînin ku ev awa bikaranîn heta hejmara 23. a Hawarê kudandiye û Celadet di hejmara 24. a Hawarê de ev her du deng di rewş û dirûvên xwe ên îroyîn de bi kar aniye.

Piştî ku Celadet elfabeya xwe belav dike û bi kesên eleqedar dide zanîn jî, ev yek hem kêfxweşî hem jî dilnexweşî û nerazîbûnan bi xwe re tîne. Kesên ku hay ji zimên hene kêfxweşiyên xwe bi awayekî awayan digihînin Celadet û Hawarê. Yek ji wan nivîsara Pîrot e ku dişîne bo Hawarê û tê de wiha dinivîse, “Ewey ziyatir hêwa ebexşê û tîn edat betiwana; ew rêgay teceddud û tazegiyeyeke kirdûtane be nîşane. Hewel gewahî eme wergirtin û bilaw kirdinewe tîpî (hirûfî) firengî ye. Be rasti bo jiyandinewey kurd û edebiyati kurdî eme hingawêkî palewanane ye.” (Hawar, 1998: 505). Her wiha, digel kêfxweşiyên dengên nerazîbûna ji elfabeya Latînî jî hildibin. Helbet sedema vê yekê bîrûbaweriya Îslamî ye ku wekî pêhisîn şaş tê famkirin. Nerazîbûn li ser vê fikr û parastinê ye ku mela û oldarên wê hingê dibêjin; tîpên Erebi tîpên Qur’ana pîrozwer e loma jî ew tîp jî pîrozwer in û heram e û çênabe ku li şûna wê tîpên dîtir bîn bikaranîn. Celadet li ser vê yekê serî li Şêx Evdirehmanê Garisî dide. “Şêx Evdirehmanê Garisî ku pişgirê kurdayetiya nû bû, di der heqê elfabeya Celadet û Hawarê de fetwayekê derdixîne û dibêje, “ew tîp ne heram in.” (Aydın, 2009: 1) Her wiha, li gorî ku H. Hebeş agahiya xebateke dîtir a li ser elfabeya Kurdî a bi Latînî radigihîne me û wiha dibêje; “Di dawiya sala 1928 de –ez li wê bawerê me ku haya C. Bedirxan jê tune bû- li Ermenistana Sovyetî, nivîsevanê Kurd Erebi Şemo (1897-1978) û kurdnas Margûlov digihînin dereca paşîn bona elfabeyê nû li ser bingeha latînî û di destpêka sala 1929 de wê elfabeyê bi kar tînin û heya sala 1930î kitêb û pirtûkên dibistanî pê tîne weşandin. (...) Bi wê elfabeyê rojnameya Riya Teze ya ku di 25ê adara 1930î de derketî pê tê belavkirin” (Hebeş, 1996: 89). Çendî ku em dizanin ku xebata C. Bedirxan a li ser elfabeya Kurdî a bi Latînî bi qasî sêzdeh salan dirêj dike jî, heke em li ser vê agahiya ku Hebeş radigihîne, bisekinin û em hewldana Celadet a bo xebata kollektîv a bi Tewfîq Wehbî re kirî ji ber çavan dîr nekin, em ê karibin vê bêjin; a) An bi rastî haya Celadet ji xebata Erebi Şemo û Margûlov tunebû. Loma jî wî bi tena serê xwe û bi zanîna xwe û di ser dengsaziya Kurdî re hîma elfabeya Kurdî a bi Latînî danî. b) An jî Celadet hay ji vê xebatê hebû, lê ji ber rewşa siyasî a wê hingê ku gelek çetin bû ku xwe bigihîne Sovyetê, nekarî têkilî bi E. Şemo û Margûlov re dayne. Lê çî hoy û sedem

dibin bila bibin, Celadet Bedirxan, piştî ku bi gotina xwe a “Mileteqî dîl qo zmanê xwe winda ne qiriye, weq qirtiyeqe qo mifta zindana xwe bi xwe re hilaniye” (Hawar, 1998: 64). bi vî karî û bi vê xebatê radibe û kilîteke neşikên çêdike; kilîtekê ku dê karibe deriyên hemû bendîxaneyan veke û asoyên hebûniyê li ber Kurdan xweş û geş bike.

3.7 Biwarên Bêjara Neteweparêz Di Hawarê De

Di kovara Hawarê de, hemû biwarên ku nîşaneyên çanda etnîk û heyîna neteweyî ên neteweyekê bûne mijarên nivîsaran. Di van nivîsaran de, bal li ser Kurdbûnê û li ser çand û zimanê wê hatiye kişandin. Her wiha, her yek nivîsarek jî bûye biwareke taybet a di avakirina bêjara neteweparêziya Kurd de. Em ê di vê beşê de, yek bi yek berê xwe bidin van nivîsaran û bi hûrgerînekê hewlê bidin ku reng û awayê van bêjarên ku hatine avakirin, daynin holê.

3.7.1 Dîrok û Rûdanên Dîrokî

Hemû ramanên neteweparêziyê xwedî dîrokekê ne. Tu ramana neteweparêziyê tune ye ku dîrok ji bo xurtkirina palder û argûmanên xwe bi kar neanibe û stûneke xwe bi dîrokê ava nekiribe. Hîma vê stûnê carinan di serdema ku di biwareke siyasî an jî cografîk de navê etnîsîtekê hatiye hildan û hebûna wê hatiye diyarkirin û carinan jî li ser çanda kelepûrî ku ji bav û kalan de bi berhênandina ji nû ve hatiye heta roja îroyîn, tê danîn. Her wiha her ramanê neteweparêziyê, bi awayekî dîtir li hebûna neteweyan dinêre û îdeolojiya xwe li ser awayê nêrîn û raman xwe xwe ava dike.

Li gorî seretayîparêzan (jêderkparêzan) netewe ji mêjve de hebûne. Ev dîtîna me dibê ser ramana ku heke bi cime‘etî be jî, çi bi bavikî an jî eşîrî, çi jî bi qewmî, ev komên mirovan ku piştî wek netewe rabûne, her û her hebûne û hebûna wan jî dide nîşandan ku dîrokeke wan jî hebûye di gera dîrokê de. Herçî etno-sembolîst in, borîrojê bi îrorojê ve bi sînor dikin. Li gorî vê ramanê, neteweyên modern ji gel û civakên etnîk peyde bûne. Ê herçî modernîst in, li ser wê hizirê ne ku, borîroj ji alî îrorojê ve tê bikaranîn.

Li gorî raman û awirên seretayîparêz û etno-sembolîst, gel û netewe di her rewşê de xwedî dîrokekê ne; lê belê ev jiyana di borîrojê de mayî bi awayekî bi pergal nehatiye diyarkirin. Loma jî, dîrokek heye ku piştî borîna dema niha wek dîrok nehatiye tomarkirin û sazkirina wê a wekî dîrok maye ji heyama modern re. Em bi vî awayî tê digihîjin ku heyama modern û ramana modernîzmê pêwîstiya wê a bi sazkirina dîrokekê heye; ji ber ku modernîzm li xwe dike helûmerc ku bibe destpêkek; destpêkeke wisan ku destpêkiya xwe li ser borîroja nehatî aşkerakirin, qeydkirin û destnîşankirin, dide rûniştandin. Loma jî, ramana modernîstan ku dibêjin neteweparêzî borîrojê bi kar tîne, di çarçoveya îdeolojiya modernîzmê de di cî de ye.

Di vê qonaxê de bala me diçe ser vê pirsê; nexwe, ew têkiliya ku di navbera etnîsîten pêşmodern û zanavên (neteweyên) modern de heye, çi ye û bi çi rengî ye? Li gorî Hastings, ev yek, têkiliyeke seraqetiyê ye. Hastings dibêje, “Neteweyên modern ancax dikarin bi kartêka pêşketina zimanekî zikmakî û di bin çewisandina dewletekê de û ji nav etnîsîten diyar derkevin û pêş bikevin. Rast e ku her etnîsîte neguherîye ser netewebûnê lê belê piraniya wan bûne netewe” (Özkırmılı, 2010: 35). Helbet navê vê têkiliya seraqetiyê, dîrok e. Çendî ku heta heyama modern nav lê nehatibe kirin jî, dîrok û rûdanên dîrokî; di biwara pîrtûkên pîroz ên olî, di biwara folklor, di biwara çanda gelêrî, di biwara wêjeya devkî û di biwara berhemên wêjeyî ên nivîskî, ên wekî geştûger, bîranîn û hwd. de hatine tomarkirin. Loma jî, bi saya van berhem û tomarkirinan, em dikarin bizanin ka di dem û serdemên pêşmodern de çi qewimîne û kîjan qewm û etnîsîte di nav kîjan împaratorî û desthilatdariyê de hebûna xwe domandiye. Her wiha, em dikarin di ser vê seraqetiyê re vê bêjin; çendî ku wek çarenûsa hevpar çarenûsa gelan û etnîsîteyan di nav olekê û di nav împaratoriyeke mezin de rengekî hevpar girtibe û mîna ku tunebe hatibe zanîn û qebûlkirin jî, dawîya dawî wan etnîsîteyan jî para xwe ji vê dîrokê hildaye.

Ji aliyekî dî ve, ramana neteweparêziyê dîroka xwe bi xwe hilnabijêre; wekî kelûmelên vê avakariyê, piştî xwe dide nirxên kelepûrî û jêderk û çavkaniyên olî, çandî û nivîskî ku ji berê de hebûne û wan nirxan wek alav û navgîn bi kar tîne. Çendî ku lêkera bikaranînê pêhisîneke negatîv çêdike jî, gava mirov ji alî encam û ji alî zanîna qonaxên dîrokî ve lê dinêre, her wekî Calhoun dibêje, “Ev bikaranîn dibe sedem ku em hay jê bibin ku neteweparêzî ne tenê angaştî hevşibîna etnîkî ye, di heman demê de pênaseya civakeke siyasî ye ku xwedî hin hevşibînên berbiçav e”

(Calhoun, 2007: 132). Bi kurtasî, çendî ku em qebûl dikin ku borîroj ji bo şîrovekirin û zanîna îrrojê zêde kelûmel danayne ber me û me bi sînor dike jî, gelek tomar û berhemên zengîn jî derpêşî me dike.

Loma jî, her wekî Özkırmılı jî dibêje, “A girîng ne ew e ku kelûmeleke çandî heye ku ji serdema pêşmodern maye, a girîng ew e ku ev kelûmel bi çî awayî tê neqandin, jê tê xwarin û tê îstîsmarkirin” (Özkırmılı, 1999: 23) û di ser vê seraqetiyê re dipirse û dibêje; “Gelo kirûya netewe arizî mirovên serdeq (elît) e an jî arizî girseyan e?” (Özkırmılı, 1999: 23) û ji bo bersiva vê pirsê serî li gotinên Hastings dide; “Ji bo hebûna neteweyekê ne şert e ku her kes hebûna wê bixwaze an jî li ser hebûna neteweyê hişber be” (Özkırmılı, 2010: 42). Loma jî, kakilê mijarê di bêjarê de veşartî ye ku Calhoun jî vê yekê bi vî rengî destnîşan dike; “Ne hewce ye mirov bêje, dîroka hin welatên modern diçe heta bi serdema pêşmodern; ji ber ku piştî hemû jî wekî dîroka neteweyî hatine saz kirin” (Calhoun, 2007: 9-10).

Gava em ji vî awirî ve bala xwe didinê, em dibînin ku ramana neteweparêziya Kurd, meyldar e ku wek destpêk, xwe bigihîne ramanên Xanî. Ji ber ku Xanî, serdeq û mirovê bijarte ê gelê xwe ye ku di Mem û Zînê de bi awayekî diyar û aşkera hebûna ziman û dîroka etnîsîteya Kurd kiriye û doza serbixwebûna wê a di warê aborî û siyasî de jî kiriye. Loma jî, dê ne şaş be gava em bêjin; çendî ku ramana neteweparêziya Kurd wek destpêk ramanê elîtî be jî, ji ber pergala xurt a di çand û rengê jiyana Kurdan de heyî, kiriye ku ev raman berveyî girseyîbûnê biçê.

Herçî Smith e, di vî warî de wiha dibêje, “Ji ber ku çand û awayê jiyana etnîk, çand û awayê jiyînê ê bav û kalan e, di her kes û malbata di nav etnîsîteyê de pergaleke xurt heye; ji bo ku awayê jiyîna bav û kalan neyê jibîrkirin û her nîşê ku li dû tê were agahdarkirin û hîn kirin, ev pergal tim li kar e” (Smith, 2002: 79). Me divê em di serî de balê bibin serê û bêjin Xanî, ji alî zanyarî û ramanê ve yek ji wan kesan e ku wekî *bavê Kurdan* tê zanîn û qebûl kirin. E. Xanî ji bo nivîsîna berhema xwe, dastana Kurdan a herî berbelav û têzan li berhema xwe kiriye sedem (Hawar, 1998: 1025). Yanî li gorî destnîşankirina Smith, her dastanek Kurdan jî wek nîrxên etnîkî, di bîra bav û kalan de cî girtiye û bi her cara gotin û vegotina wan nîrxan, endamên etnîsîteya Kurd careke di jî jê agahdar dibin û hînî çand û awayê jiyîna ji bav û kalan de mayî dibin. Lê belê ev hînbûyîn, bes wekî banekiyeye adetî û jiberxweveyî namîne; di hiş û bîra endamên neteweyê de warê xwe datîne, tê de dipije û dikemile

û lê dibe hişberiyek. Heke em bipirsin û bêjin, çi ye sedema vê hişberiyê, em ê biçin cem Smith ku diyar dike û dibêje, “Çanda dîrokî, nirx û welatê ku ji dem û serdema bav û kalan de mane, armancên sereke ên etnîkbûnê ne” (Smith, 2002: 88). Loma jî, nirxên etnîkî, bes ne navgîn in di avakirina neteweparêziyê de; nirxên etnîkî di heman demê de, di nav seraqetiya dîrokê de sedem in jî û ev sedembûn, eger û hokara sereke a hişberiya hatî dikirandin e. Loma jî, ev sedembûn dike ku hin îdealên deverî her hebin; û ji bo ku dîroka wê etnîsîteyê bibe xwedî seraqetiyekê, ev îdealên hanê biqulibin ser têkoşîneke fidakariyê jî. Her wekî ku Hobsbawm jî destnîşan dike û dibêje, wekî rewşeke îdeal, her nîfş heta jê tê nîfşê berî xwe kopî dike; pê re jî ji nû ve hilberanê pê dike û di van hewldanên xwe de çi qas neserketî be ew qasî jî xwe li gorî nîfşê berê kêmbûnê (Hobsbawm 1998: 18) kopîkirina ku pêk tê ne tenê ji ber rûniştina li ser sifreya hazir e, helbet ji bo qewîkirina seraqetiyê û ji bo xweveavakirinê ye jî; û ev kopîkirin dike ku aqûbeta îdealên deverî mayînde be û berhênana ku hatiye kirin, karibe xwe bigihîne nîfşên li dû xwe hatî jî.

Nexwe em dikarin bêjin; ji ber ku ramana neteweparêziyê a modern, xwe li gorî nîfşê berê, wekî teşeyeke kêmmayî dibîne û di qonaxa mezinbûnê de, di ser kêmasiya demî re ji dîrokê fam dike û dîroka etnîsîteyê wekî vehonaneke pûç an jî kakilvala dibîne, hewl dide ku dîrokê temam bike. Ev hewldan, bi gotina Hobsbawm, di qonaxa borîroja civakî a fermîbûyî (fermîkirî), (Hobsbawm, 1998: 18) de û bi qasî pêkhatina wê dikeve qonax mezinbûnê û netewe çendî ku karibin wê temam bikin ew çend xwe mezinbûyî hest pê dikin. Yanî, neteweyên ku dîroka xwe temam kirine, xwe wekî zarokên mezinbûyî hest pê dikin û wisan jî dihesibînin.

3.7.1.1 Berpêbûnên Di Warê Rûdanên Dîrokî De

Di Kovara Hawarê de, bi mebesta agahdarkirin û avakirineke hişberiyê, bêyî ku gotinên bêpalder bînin gotin û dîrokeke ji tune de bê afirandin, beşek nivîsar li ser dîroka Kurdan hatine weşandin. Gava em bala xwe dibin ser van nivîsaran, em dibînin ku armanca weşandina van nivîsaran, li ser hînkirin û agahdarkirinê ne.

Kamûran Bedirxan, di nivîsara xwe a bi navê Berê Çawan Bû de, hûrgerînek li ser berhema Ewliya Çelebî a bi navê Seyahatnâme dike (Hawar, 1998: 324). K. Bedirxan, di nivîsara xwe de bi gotinên, “Binyana millet, ziman û diroq e. Zmanê me

qetiye rê û rûj bi rûj pêşve dire. Lê li ser diroqa Qurdistanê zanîna me hêj gelec qêm e. Nivîsandina dîroqa Qurdistanê xebateqe dişwar û dirêj e.” balê dibe serê ku qonaxa nivîsîna dîroka Kurdan hê di gavên destpêkî de ye; û nivîsandina bêkil û kêmasî a dîrokeke wiha ku ne ji alî xwediyên xwe ve lê ji alî kesên ji derveyî neteweya Kurd ve hatine nivîsîn, ne ew çend hêsan e. Loma jî, K. Bedirxan, pê de diçe û dibêje, “Ji bo nivîsandina wê, berî her tiştî divê em qaniyên dîroqan xweş nas biqin, rind bizanin û gotin û kiseyên wan bigirin û bêxin zmanê xwe.” Bêjareke bi vî rengî, rasterast vê hizirê bi me re çêdike: Armanca vê nivîsarê ne ew e ku çêla tiştên bêpalder bike û dîroke ji tune de ava bike û dayne ber xwendevanan. Loma jî ew pala xwe dide berhema ku der heqê Kurdan de hatiye nivîsîn û dibêje, “divê em qaniyên dîroqan xweş nas biqin.” A rastî, em di heman demê de, di van gotinan de rastî neçariyekê jî tên ku ev neçarî, ji ber tunebûna tu rêyêke dîtir û bi gotinên, “gotin û kiseyên wan bigirin” li nivîskar diqewime. K. Bedirxan, piştî ku bi kurtasî berhema Çelebî dide nasîn, piştî jî beşên ku Çelebî di Seyahatnâme-yê de agahiya war, aqar, cografya, avanî, kanî, mizgeft, keleh û bajar û alim û zanyar û hunerwerên Qurdistanê dane, bi xwendevanan dide zanîn. Lê belê çendî ku di dawiya nivîsarê de tê gotin, *dûmahîq heye* jî, *dûmahîka* nivîsarê di hejmarên dîtir de peyde nabe û nivîsar bi vî awayê xwe ve dimîne. Loma jî em xweşîkî ji rengûawayê bêjara K. Bedirxan fam nakin.

Di hejmara bîst û heştêmîn a Hawarê de, nivîseke Osman Sebrî a bi navê Tarîxa Kurd û Qurdistanê heye (Hawar, 1998: 709). Sebrî di vê nivîsara xwe de, li ser pirtûka Emîn Zekî beg a bi navê Xulaseyêke Tarîxa Kurd û Qurdistanê disekine pirtûk ku bi awayekî du cild û bi devoka Baban hatiye nivîsîn û di sala 1931ê de hatiye çapkirin. Sebrî, bi gotinên, “Heya van demên nîzik, tu kitêbên tarixê di heqê gelê kurd û welatê wan Qurdistanê da ne hatine nivîsîn” bi me dide zanîn ku meyla wî a ji bo hebûna dîroka Kurdan, li ser zanînên nivîskî û bi palder (arguman) in. Em ji gotinên Sebrî ên “Çiqas ko mîr Şerefê bidlîsî bi navê Şerefnamê tarîxek, der heqê emaretên dema xwe nivîsandiye jî; ev kitêba han di warên dîrokî û zanisti da nabe tarîxa gel an welatekî” (Hawar, 1998: 709) fam dikin ku; ew girîng dibîne ku xebatên ku dê di vî warî de bînin kirin an jî hatine kirin, divê zanistî hatibin kirin da ku mirov karibin bi awayê nivîsîn û lêkolîna hatî kirin, bibin xwedî agahiyên qewî û rast. Loma jî Sebrî, bi gotinên, “der heqê emaretê dema xwe” dixwaze bêje, dîroka

Kurdan ku bê nivîsîn divê bi awir û riwangeyê berfireh û neteweyî bê nivîsîn. Sebrî ji aliyekî ve jî, ne razî ye ku dîroka Kurdan ku ji aliyê kesên ne Kurd ve bê nivîsîn. Loma jî ew nerazîbûna xwe wiha tîne zimên; “Ji mile din hin dîroknivîsên ereban, bê ko rûmeta zanîna dîrokî bigrin, her ji bo hin ramanên siyasî, koka gelê kurd digihandin erebên qehtanîl. Çiqas ko dirvê kurd û ereban bi hev nakevin jî, vê gotina han di serê pir mirovan da cih digirt. Ewçend cih digirt ko serwext kirina van celeb mirovan zehf dijwar bû bû.” Di vê nerazîbûna Sebrî de herî zêde bala me diçe ser gotina, “bê ko rûmeta zanîna dîrokî bigrin” û bi vê gotinê em fam dikin ku Sebrî dîrokê wekî nivîsîna çîroka serboriyên gelan (an jî eşîran) fam nake û wisan jî qebûl nake, lê berevajîya wê, ew dîrokê wekî zanist qebûl dike û ew alîgir e ku dîroka neteweyekê bi awayekî zanistî bê nivîsîn. Û ew di nav nerazîbûna xwe de, aliyekî dîtir ê nivîsîna dîrokê jî bi van gotinan tîne ziman, “(...) ji bo hin ramanên siyasî, koka gelê kurd digihandin erebên qehtanîl.” Ev gotina Sebrî, pênaseya Smith a ku ji bo awayên nivîsîna dîroka neteweparêz kiriye, tîne bîra me ku Smith dibêje, “Dîrok di kêmanî de di rewşên taybet de, li ser lihevanînan tê avakirin” (Smith, 2002: 228). Sebrî, bi vê gotina xwe, balê dikişîne ser dîroka Kurdan ku ji alî kesên neKurd ve bi awayekî lihevanîni hatiye nivîsîn û rexneya xwe a di vî warî de jî dibêje. Sebrî, di warê zanînbûnê de, bi gotinên, “Kitêba Emîn Zekî beg bi her awayî di celebê xwe da yekta ye.” heq bi pirtûka Emîn Zekî re dihêle û pê re jî di warê çavkaniyên ku xwe spartiyê de jî, bi van gotinan, “(...) di kitêba Emîn Zekî beg da jî hin kêmasî peyda bibin. Ji ber ko nivîsevan di nivisana kitêba xwe da bi her awayî xwe spartiyê kaniyên biyanî” rexneyekê lê dike. Sebrî, bi vê rexneya xwe, balê dibe ser hebûna Kurdan a bi awayekî polîtîk û çandî ku wek etnîsîteyekê her û her hatibûne zanîn.

C. A. Bedirxan, di nivîsara xwe a bi navê “XWE BINAS...” de ku tê de bang û pend û hîndekarî li xortan dike, binbeşeke bi navê Pendên Ayîniya Kurdaniyê de wiha dibêje, “Xorto! Tu çilê milletekî kevn, nîjadekî mezin î. Pêşiyên te di rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de raketî ne. Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatiyê Ariyan î” (Hawar, 1998: 551). Ev hevokên ku di ser milletbûna kevn re hatine sazîkirin, di biwara dîrokî de berê xwe didin serdemên berê û amaje bi jêderkê dike; û hewlê dide ku tîkiliyê jêderkê bi roja îroyîn ve dayne. Ev tîkilî, di ser Medan re tê danîn ku di hemû çavkaniyên dîrokî ên dinyayê de wek avaniyêke dewletî tîne zanîn û aryanî tîne qebûlîkirin. Çendî ku Smith etnîsîteyê li xwe dike stûn

û palder û dibêje, “Kana ji bav û kalan de mayî ye.” jî (Smith, 2002: 88) Celadet, bi hevoka, “Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatiyê Ariyan î”, vê zanîn û agahiyê digihîjîne ast û hindama desthilatdariyê û dewletbûnê û bêjara xwe a neteweparêziyê di ser vê re ava dike; û di ser gotina *neviyê Medan* re pêşî sedem û rengûawayê hebûnê diyar dike pê re jî di ser gotina *kurê Kurdan* re seraqetiya dîrokî ku ji ber nevîtiyê tu şik di xwe de nahewîne diyar dike û piştê jî di ser gotina *dahatiyê Ariyan î* re, seraqetiya dîrokê a berveyî siberojê destnîşan dike.

Tom Nairn dibêje, “Ramana neteweparêziyê Janusa Hemdem e” (Nairn, 2015: 146). Loma jî, em dikarin bêjin, dîroka neteweparêziyê, ji serdema modern û şûndetir, vehandinek e ku ji bo ku karibe pergala îrorojê dayne, hewcetî bi nihêrîna borîrojê dibîne. Tevî ku ev peyta hanê ji alî gelek ramanweran ve tê qebûlkirin jî, mirov nikare neyîn bike ku dîrok di destê ramana neteweparêziyê de dibe navgîna diyarkirina çarenûsa civakê û rengûawayê vê diyarkirinê jî, siberoja wê civakê (an jî neteweyê) destnîşan dike. Smith jî destnîşan dike û dibêje, “Netewe qîma xwe tenê bi xwepesinandîna bi borîroja dûr nayîne ku dê piştê xwe bide belêndana (weadkirina) abadîniyê; pê re jî, ji bo ku karibe belêndana biqedrbûn û veavakirinê watedar bike, serdemeke ku mişt bi qehremanî ye jî datîne rastê” (Smith, 1994: 247-248).

Çendî ku di Hawarê de, çend nivîsarên li ser dîrokê hatibin nivîsîn û em di vê beşê de li ser wan sekinîn jî, em ê wekî peyteke berbiçav nikaribin bêjin, “Di Hawarê de di ser dîrokê re bêjareke xurt î neteweparêz hatiye avakirin.” Ji ber ku, her sê nivîskarên ku me nivîsarên wan wekî mînak dan, ji danîna dîrokeke nenivîskî û vehandî bêtir, meyla xwe dane ser agahî û zanistên ku di pirtûkan de hene ku em bi rihetî dikarin bêjin ku ev pirtûk ji alî zanyar û ramanweran ve jî wekî belgeyên dîrokî hatine pejirandin. Her wiha, naveroka nivîsarên heyî, meyldariya *avakirina dîrokeke ji tune de* jî danayne ber me. Çendî ku em di gotinên Celadet de, rastî daneyên ku dê bibin hoy û sedema avakirina dîrokeke vehandî tînin jî, gotina wî a “Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatiyê Ariyan î.” bi me dide nîşan ku armanca van gotinan ne avakirina bêjarekê ye ku dê bihêle ku dîrokeke vehandî ava bibe. Ji ber ku di lêkolînên piştî sedsala 19. de hatî kirin jî diyar e û ji alî zanyarên dîrokê ve jî hatiye qebûlkirin ku Kurd wekî nîjad arî ne û wek qewm jî dîmahîka Medan in. Tiştê ku Celadet li vê derê dike, avakirina bêjareke neteweparêz e ku di ser zanîn û agahiya

zanistî re pêk tê; yanî her wekî Smith dibêje, hewldana agahdarkirin û hînkirina nîşê peyrew e.

3.7.2 Sembolên Neteweyî

Li her derê ku jiyan û mirov lê hene, çandek jî heye. Her wiha, her yek hêmanek çandê, ji hêla xwe ve hevpariyekê di nav wan mirovan de çêdike. Ev hevparî jî, bi parvekirina çandê a digel hev, di binhişê mirovan de bi cî dibe; piştî vê qonaxa bicîbûnê, êdî sembolên ku bi rêya çandê hevpariyek pêk anîne, zextê li binhişên mirovan dikin. Ev yek dike ku hizir û ramanên mirovan li ser van sembolên hevpar teşe bigirin; û ev sembolên hanê kartêkê li reftarên wan bikin. Û pê re jî, dike ku têgihaneke hevpar ava bibe li ba mirovên hevçand.

Her civak, her çand di ser taybetiyên xwe re xwe nas dike. Ji aliyê dî ve jî, “Her civak û çand, xwe ji civakên dîtir cihêtir dihesibîne û wisan pênaseya xwe dike. Û bi rêya sembolan jî vê cihêbûnê meşrû dike” (Brian, 2001: 15). Çendî ku carinan sembolên civakan ji hev cihê bin û carinan jî di rengê hev de bin jî, ji ber ku awayê jêfamkirin û bikaranîna wan reng li xwe diguherîne, ev yek li ber meşrûbûna wan nabe asteng. Û bi van sembolan pêşî îmajêke çandî û pê re jî îmajêke neteweyî tê avakirin. Û ev îmajê neteweyî, bi mirovan re hestê xwejêzanîne çêdike; pê re jî bi awayekî navoyî pêwîstiyek bi mirovan re çêdibe; pêwîstiya xwebûniyê. Ev pêwîstiya xwebûniyê, çendî ku navoyî ye ew çend jî derveyî ye; ji ber ku xwebûnî ji aliyekî ve jî cihêbûna ji mirovên dîtir e. Loma jî mirovên ku bi hestê xwejêzanîne û bi daxwaza xwebûniyê radibin, pêwîstî bi zanavê dibînin. Ew zanav di heman demê de, hevpariyêke komelî ye ku di netewebûnê de digihîje wate û naveroka xwe.

Li gorî Belli, “Sembolên wekî ziman, dîrok, nirxên jiyanî, nerît û çand ew sembol in ku civak ji bo ku xwe ji civakên dîtir cih bike, wan bi kar tîne. Heke neteweparêzî di vê çarçoveya xwe de were nirxandin, wate jê ew e ku neteweparêzî; li dor sembolên diyar ên wekî wekî ziman, dîrok û nerîtê, avakirina îmajêke çandî ye” (Belli, 2014: 2). Li ser vê yekê em dikarin bêjin, neteweparêzî, ji bo mirovan pêbestiyek e ku bingeha wê a çandî xwe dispêre ajar û dîroka wan a dîr. Şerekî dijwar e li dijî wan çand û nerîtên nehevpar ku dixwaze zaltî li ser pêbestiya dîrokî bike. Loma jî, “Neteweparêzî, ji aliyekî ve jî qaçibokirin e li hember wan raman û

îdeolojiyan ku ji mirovan dixwazin bila ew ji heqê xwe î diyarkirina qaydeyên jiyana xwe a çandî û civakî û ji pêbestîbûna wê biborin” (Belli, 2014: 3). Wekî dî jî, hêleke dî a neteweparêziyê heye ku bi mîtos û efsaneyan bi xwedî dibe û hin sembolên ku dê ji bo wê bibin biwara bêjara neteweparêziyê jî, bi rêya mîtos û dastanan peyde dike. Loma jî mîtolojiya hemû neteweparêziyan heye. Û mîtolojiya neteweparêz, pirî caran, ji ber pêwîstiya xwe, hin efsane, sembolên çandî û çîrokên mîtolojîk û gelêrî berevajî dike; û wan sembolan ji nû ve ava dike. Pirî caran ev sembol, an ajaleke hov û dirinde ye an jî tiştetek e ku tundiya wê ji hemû kesî ve hatiye qebûl kirin. Her wekî ku li Romayê Eyloyê Romayê, li Amerîkayê Eyloyê Amerîkayê, li Tirkîyeyê Gurê Boz, li Almanyayê Xaç Bi Gama û Eylo û li ba Kurdan jî Gurzê Rûstemê Zal, Çakûta Kawa û Teyrê Baz heye.

Ji aliyekî dî ve jî, Schnapper dibêje, “Netewe projeyeke siyasî ye; ew li xwe dike armanc ku cime‘eteke nipûnû biafirîne. Ev cime‘et, cime‘eta hevvelatiyan e; û bi sembolên xwe ve dide zanîn ku, divê êdî rengê pêbestîya civakî, neteweyî be” (Schnapper, 1994: 122). Loma jî rêber û pêşengên neteweparêz ku ji bo avakirina dewleta neteweyî rabûn, ji bo ku pergala dilsoziya neteweparêziyê ava bikin, berê xwe dan dîroka dûr ku ji qonaxa pêşolî maye. Her wiha, lehengên neteweparêz, sembol û rîtûel hatin avakirin. Û pê re jî rengên neteweyî, kesayet û lehengên karîzmatîk, cejn û delindêz hatin dahênandin. Ev sembol, ji welat (axa terîtoryal a sînorkirî), ji ala, marşa neteweyî, roj û lehengên neteweyî, û hwd. pêk tê; û mirovên ku qet hev nas jî nakin, di ser şanekîbûna re wan sembolan, wekî sembolên hevpar qebûl dikin; ew sembol li ba girseya mirovan dibin xwedî pîrozweriyeke taybet û heman girse di ser wan sembolan re xwe digihînin hev û dibin yek; û neteweyekê pêk tînin.

3.7.2.1 Ala û Welat

Ala, berî her tiştî amaje bi xwedîtiyê dike; û mirov dikare bêje di heman demê de amaje bi xwejêzanîne jî dike. “Ala, ew şanek e ku têgiha ‘neteweyekbûnê’ û ‘dewletbûnê’ hem meşrû dike hem jî dipeyitîne. Heke mijara çêlhatî welat be, ala ew koçane (tapo) ye ku mafê milkdariya li ser axê nîşan dide” (Kalaycı, 1998: 159-169). Her wiha, te divê bila alaya dewletekê be te divê bila alaya neteweyeke dewletnebûyî

be, wekî şaneka neteweyî di nav mirovên ku ji heman neteweyî ne de bûye kodeke hevpar û ji bo mirovên ku ne ji wê neteweyê ne jî wekî şaneka cihêtiyê ye.

Di hejmarê 9an Hawarê de nivîsareke C. Bedirxan a bi navê *Welat, Welatîni û Al* heye. (Hawar, 1998: 183). Nivîsar bi du beşan pêk tê. Di beşa yekem de, çêl û behsa ax û welat tê kirin. Nivîsar bi hevoka “Welat erdê bav û qalîqên me ye.” dest pê dike û serê pêşîn serî li dîrokê, li dîroka dûr dixê; û pê re jî hestekî hevpar a xwedîbûn û milkdariyê çêdike; û her wiha, dike ku sînorê heyî di qonaxa avabûna dewletekê de bibe sînorekî terîtoriyal a dewleteke neteweyî. Û pê re jî, bi gotina “bav û qalîqên” me jî hevpariyekê çêdike di nav wan mirovan de ku qet hev nas nakin û ji xwe re dibêjin, em Kurd in. Ev hevparî, bi awayekî sosyo-psîkolojîk di nav vê gotinê de di hewê ku; mirovên ku ne xizm û lêzîmên hev in û hev nas nakin, dibin xwedî yek bav û kalik. Ev bêjar, piştê bi gotina, “Xelqê welateqî, welatîyên hev in.” teqleke dîtir dide xwe; li ser axa ku hê wek dewletekê sînorên wê nehatina danîn û di nav neteweyê ku hê dewleteke wê ava nebûye de, hest û pêzanîneke *hev welatîyê* saz dike. C. Bedirxan, di pêdeçûna nivîsarê de, bi hevokên “Qam û armanca wan yeq in. Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînên xwe bêperwa dirijênin. Herê dixebitin qo welatê wan meqevit bin destên mîletên din.” Car di bêjareke neteweparêziyê ava dike û hewlê dide ku mirovên ku xwe ji bav û kalekî dihesibînin û xwedî û milkdarên axekê ne, di armanckê de bigihîne hev; ew armanc bi axê û bi cografyayêke bi navê welat hatiye simbolîzekirin. Pê re jî rê li ber wan tê xistin ka ji bo parastin û didestdehiştina wî milkê hanê, -axa welêt-, divê çî bê kirin. Û bi hevoka, “Lê mîletin hene qo welatê wan, bi awaqî, qetiye bin destên neyar û dijminan. Weq welatê mîletê me, Welatê Qurdistanê.” jî navê wî welatê ku ji bav û kalan maye û mirovên ku li serê dijîn û ji xwe re dibêjin Kurd *hev welatîyê* hev in tê danîn û rewşa welêt ku tê de ye tê diyarkirin û sînorê terîtoriyal ku dê piştî têkoşanekê bibe dewlet tê destnîşankirin. Her wiha, di pey re, bi hevokên wekî, “Herqes hej welatê xwe, hej welatîyên xwe diqe.” pêşî bi peyva *herqes* (her kes) gelemperiya mirovane tê kirin, piştê jî hezkirineke hevpar tê avakirin; û bi peyva *welatîyên* jî, amajê bi mirovên ku di nav sînorekî terîtoriyal de dijîn, tê kirin; û hezkirina ji welatê xwe mîna bivênevêtiyêke jiwêneteweyêbûn û xwejêzanîne tê saz kirin. Pê re jî, bi hevoka, “Hejqirina welêt di dilê me de hêvîneqê mezin û bilind e.” reng û awa û asta vê hezkirinê tê diyarkirin ku *evîniya tu evîndarek negihaye vê astê*. Hevoka, “Em pê

xurt, zexm û canfeda ne. Je re welatîni dibêjin.” jî, pêbestîyeke taybet di navbera evîn û welat de ava dike ku ancax bi mirinê dikare ji hev biqete. Tu nakokî di vir de ne li dar e ji ber ku jixwe sedema mirinê jî bi armanca welat û hezkirina welêt pêbestîkirî ye. Û hevoka, “Welatîni di hundirê me de agireqî mikedes e.” dibe hevoka derbê. Bi vê hevokê bêjara neteweparêz, di warê ax û milkdariya ku ji bo axê heye û di warê hebûna welêt de, digihîje asta xwe a balatir. Ji ber ku êdî, milkdariya axê, evînî û hezkirina welêt û hevpariya van hêmanan, pîrozwer in. Û ev pîrozwerî ji bav û kalan bi vir de ye sedema hebûnê û ji roja îroyîn ve jî domdariya hebûnê diyar dike.

Di beşa duyem de jî ala dibe mijara nivîsarê. Hevoka “Her millet xweyîyê aleqêye. Al nîşana millet û welêt e.” dîsan balê dibe ser milkdariyeke hevpar. Welatekî hevpar heye û nîşaneke wê milkdariyê jî divê; û navê wê jî ‘ala’ ye. Her wiha, di serî de tê destnîşankirin ku ‘ala’ *sembolê e* û referansa vê sembolê jî welat bi xwe ye. Bi dû re jî hevoka, “Tevayiya heyîna miletan di ala wan de civiyaye.” hebûnê li mirovên Kurd ku li ser axekê û di welatekî hevpar de dijîn, dike arîşe. Êdî ala egereke hebûnê ye ji ber ku hemû hêman û sedemên *heyîna millet* di alayê de li hev civiyaye. Ala ew sembol e ku heyînê temam dike; û pêşiya hestê kêmmayîne digire. Loma jî heke ala tunebe, mirov dê nikaribe çel û behsa heyînê bike û helbet dê hestekî kêmmayîne bi temamî dor li mirov bipêçîne û mirov di wê heyîna netemambûyî de bifetise; loma jî ala sembola temamkirina heyînê ye. Hevoka, “Al namûs, rûmet û bextê miletan e.” vê bivênevêtiyê temam dike. Ala êdî ji bilî ku şaneka heyîna netewe û welatekî ye; ew di heman demê de yek ji sembola bivênevê a heyînê ye ku divê were parastin û berevaniya wê bê kirin. Her wiha, heke em bala xwe bidin ser peyvên ku di warê wategirî û watezaniyê de xwedî referans in, em ê karibin van şîroveyan bikin.

Namûs; reng û awayekî mirovan a navoyî ye ku gelek bêhnpakîyên wekî dilrastî, dilpaqijî, xweyîrêgezbûn, biedeb û tore bûnê di xwe de dihevine û bi giştî di wijdanê mirovan de diheve.

Rûmet; reng û awayekî mirovan a derveyîn e ku bi nirx û şerefa takekesî ve pêbest e ku kesên dîtir rêz û hurmetê lê digirin.

Bext; ew peyv e ku bi wateyên wekî şans, çarenûs, qismet, ewlebûn û yewm û pêparî tê. Ji bilî wateyên qismet û yewmê, hemû hemû wateyên di wek sembola li alayê tê barkirin.

Hevoka, “Ala her miletî je re beha ye.” ji alî qîmetdariyê ve hêjayîya alayê dike tiştêkî giştî û navneteweyî û kêma zêde wê ji pîrozweriyê dûr dixîne; û di şexsiyeta her neteweyê de jî car di wê dike tiştêkî girîng û pîrozwer. Û pê re jî, hevoka, “Di cejn û şahinetan de kesr, seray, xanî û qûçeyan pê dixemilînin” alayê dike tiştêyê derveyî û bîrawî (dîtbarî) ku wekî ‘xeml û şeml’ jî tê qebûlkin. Lê hevoka bi dû re ku dibêje, “Di ber wê re diborin, slavan le diqin, wê maç diqin, datînin ser serên xwe.” bi rengêkî dîtir pîrozweriyek saz dike ji bo alayê. Ew êdî ne tiştêyê e; ji paçên rengîn pêk nehatiye. Ew tiştêkî dîtir tîne bîra mirovî; ew tişt têgiha welat bi xwe ye; û ala jî mirovî dike ji wî welatî. Û divê li ser pîrozweriya welêt re, pîrozweriyê arizî xwe bo alayê bê sazkin. Pîrozweriya ku ji bo welêt dihat nîşandan, mirina ji bo welêt bû; û hebûna welêt sedema hebûna mirovî bû û mirina mirovî a ji bo welêt jî sedema hebûna welêt bû. Ev reng pîrozwerî bes ji bo welêt bû û referansa xwe ji “mirin û hebûn”ê digirt. Lê pîrozweriya alayê, xwe dispêre pate û silavdayînê, maçkin û danîna ser serê xwe. Li vê derê me divê em dîsan berê xwe bidin wategirî û watezaniya peyv.

Pate (silav) dayîn; wek pate=silav, di warê leşkeriyê de, bi wateya, rêzdarî û qebûlkirina fermandarî û rajorîyê tê û wek silav jî, bi wateya qebûlkirina heyînê, kesbûnê û dayîna peyama aştiyê, tê.

Maç kirin; bi du wateyan tê ku her du wate bi hev ve pêbest in. Ew wate, *hezkin û pîrozwerî* ne. Mirov bêtir tiştên ku hem ji wan hez dikin û hem jî ji bo wan pîrozwer e, pêşî maç dikin piştê jî datînin ser serê xwe. Mirov vê hezkin û pîrozweriyê bo kitêbên pîrozwer ên wekî Qur’an û Încîl nîşan didin.

C. Bedirxan, di nivîsara xwe de, pêşî bi gotina, “Ala her miletî bi çend réngan û bi şiqleqî din e.” cihêtiya neteweyan datîne rastê û piştê jî, ji bilî ku pîvanên wê; bêje, dirûv û rengê alaya Kurdan, jî diyar dike. “Ala qurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, sor, sipî û qesq e, di nava wê de roj diçirise” (Hawar, 1998: 183).

Heke em bi awayekî tevdeyî li mijarê hûr bibin, em ê karibin bêjin; digel ku welat aşopkirina sînorekî terîtoriyal e jî, çendî ku ev sînor ne şiklekî durist î geometrîk be jî, ji ber xetên wê ên diyarkirî, sînorekî destnîşankirî ye û dirûvekî wê

heye. Loma jî, ev çeveng xwedî sînorekî ye û ji ber hindê jî, di warê sînor û bicîkirina rengan de xetên alaya Kurdan hatiye bisînorkirin. Û reng û dirûv û alaya Kurdan, wekî sînorekî hevpar ku dê hest û raman û aşopkirineke hevpar li ba mirovên ku xwe wekî Kurd bi nav dikin çêbike û dê derbar homojeniya neteweyê de hizireke hevpar bi wan re çêke. C. Bedirxan, di nivîsara xwe de, sînor û dirûvê negeometrîk ê welat ku ji axekê pêk tê û gel û neteweyek milkdarê wê ye, digihîne sînorê alaya Kurdan û bêjara xwe a neteweparêz di ser wê re ava dike.

3.7.2.2 Marş (Sirûd)

Me dabû zanîn ku li gorî Hobsbawm, netewe û neteweparêzî berhemeke endezyariya civakî ye û hişberiya neteweyî jî mînakê herî berbiçav a “gerdîşên dahênandî” ye. Hobsbawm, bi vê gotina xwe, hewl dide ku bide zanîn ku; neteweparêziyê ji ber bicîanîn û lidarxistina raman û îdeolojiya xwe ev gerdîş afirandine û ew gerdîş ne ji ber sosyolojiya diyalektîk û jiyanî a gel û neteweyekê hatine dahênandin. Herçî Özkırımlı ye ew jî dibêje, “Gerdîşên dahênandî, komêk pêkanîn û banekî ye ku bi awayekî aşkera an jî bi dizîka hatiye qebûlkirin û rengûawayekî xwe î delindêzî û sembolîk heye. Gava ev pêkanîn tim û tim tên dubarekirin, norm û qalib, reftar û nixêndî diyar ji alî mirovan ve tên navoyîkirin û bi awayekî xweger (otomatîk) di navbera borîroj û îrorojê de pirekê ava dike û hestê timûtimtiyê çêdike. Ev gerdîş, li xwe dikin armanc ku di navbera mirovên ku civakê pêk tînin de yekbûn û piştevaniyê ava bikin. Di vî warî de rêbazên ku herî zêde tînin bikaranîn, rîtûelên domdar û ayîn û delindêz in” (Özkırımlı, 2010: 147-148). Nexwe em dikarin bêjin; marşên neteweyî jî di asayiya xwe de, dibin parçeyên jevneqet ên rîtûelên ku ramana neteweparêziyê diafirîne. Ji ber hindê jî awayê pejiwandina komên xelkê ên marşên neteweyî, ji bo pihêtkirin û xurtkirina hişberiya neteweyî gelek girîng e.

Li gorî Anderson jî, “Ew rewş û kawdanên hevdemî, ku her kes heman tiştî hest pê dike û pê bawer dike ku kesên di jî heman tiştî hest pê dikin, ancax di dema gotina stran û helbestan de çêdibin û ev yek ancax dikare bi zimanê stran û helbestan were vegotin. Di gotina marşên neteweyî de jî ezmûndariyê hevdemî heye. Di demên wiha de, mirovên ku ji hev re nenas in, bi heman newayê heman risteyan

dixwînin. Û tu yek ji wan mirovan jî nizane ka ew kes kî ne û li ku ne; ew kesên ku wekî wan hest pê dikin û bi heman dengî heman stranên dibêjin” (Anderson, 1995: 163). Ji ber ku Anderson bi awayekî modernîst li arîşeya neteweparêziyê dinêre, ji ber çav û dêhna xwe dide alî ku; di dîroka dûr a gelên etnîsî de, stran û dastanên ku bi awayekî stranî jî tên gotin hene; û bêyî ku sînorekî terîtoriyal bê aşopkirin û destnîşankirin, bêyî ku hewldana yekrengkirinê bê dayîn, di ser ziman, di ser bîrûbaweriyên, di ser desthilata navxweyî û di ser hêmanên çandî re hevhestiyek çêbûye û ev hevhestî ji raman û îdeolojiya netewetî û neteweparêziyê zêdetir, di rengê xwe î etnîkî de dide der. Loma jî Anthony D. Smith, neteweparêziyê di riwangeyê zanan û etnîsîteyê de pênase dike û wiha dibêje, “Neteweparêzî, ji doktrîneke siyasî û şêwazeke siyasî bêtir awayekî çand, îdeolojî, ziman, mîtolojî, simbolîzm û hişberiyê ye ku vedanga xwe li rûzemînê belav kiriye; û her wiha netewe jî, awayekî zanavê ye ku wate û pêşîniya wê ji alî vê çandê ve tê pêşhesibandin” (Smith, 1994: 147). Loma jî em dikarin bêjin; dibe ku hin helbest hebin ku di ser ramana îdeolojîk re wek marş hatine nivîsîn û bi aheng hatine gotin, lê belê ev yek hevpariyê ku tê xwestin çênake li ba mirovan; ji ber ku ji bo parvekirineke giştî û neteweyî çandê hevpar tiştekî bivênevê ye.

Di hejmarê 9. a Hawarê de, şî‘îreke Mustefa Ehmed Botî a bi navê Marşa Kurdî bi tîpên Erebi hatiye belavkirin (Hawar, 1998: 503). E. Botî, bi navê şî‘îra xwe ku wek Marşa Kurdî daniye, serê pêşîn marşê (sirûdê) di Kurdbûnê de simbolîze dike û bi risteyên “Gelî biran werin cengê/Bişoyin dil ji vê jengê/Bibêjim ez heta kengê/Nehin yek j'me bi vê rengê” dest pê dike û bangê dike li wan mirovên ku wekî Kurd tên zanîn. E. Botî, di banga xwe de, balê dibe ser qonaxa netewebûnê ku béceng û têkoşîn naçe serî. Botî, di şî‘îra xwe de, hewldana xwe a simbolîzekirin û danîna simbolên neteweyî didomîne. Risteya, “Ez ko kurd im ez kurdî me” balê dibe ser neteweya bi navê Kurd û bi gotina ‘ez kurdî me’ jî, yek ji egera sereke a netewebûnê, yanê kurdîbûnê datîne rastê. Heke em bala xwe bibin serê û li ser peyva *kurdîbûnê* hûr bisekinin em ê karibin bêjin peyva *kurdîbûnê* bi du wateyan tê. 1- Mirovê ku ne di ser ajara xwe re lê belê di ser zimanê ku pê dipeyve û xwe derdibire re wekî Kurd tê hesibandin û qebûl kirin. 2- Mirovê ku bi çand û nerîtên Kurdan rabûye û vê çandê rengê xwe daye awayê jiyana wî mirovî. E. Botî, bi risteya, “Ji cîkê xwe re ez gorî me” jî du peyvên ku diyarker in bi kar tîne. 1- Ji *cîkê* xwe re: Ji

awayê bikaranîna peyva “cî-cih” e ku cî bi cî wek “cîyê û cîkê” tê bilêvkirin û bikaranîn. 2- Ez *gorî* me: Wek serencama xwe, gorîbûn hem encameke bêhemd e hem jî bihemd e. Armanca Botî a li vir, encameke hişberî ye ku bi peyva *cîkê* pêşî sedemê ava dike û pê re jî amaje bi şûnekê, bi warekî dike ku wek sembolekê nav lê bûye *welat* û her wiha bi peyva *gorî* jî amaje bi hişberiya ku der heqê wî ciyî de heye dike û pîrozweriyekê li encama sedemê bar dike. Risteyên, “Ne bêdost û bêxwedî me/Gel ala be li serê rê me” jî sedema sereke a banga xwe datînin rastê ku ew jî gel, yanî netewe ye. Botî, bi van risteyan, banga xweheyîkirina gel (netewe) dike û dixwaze bêje, hebûna gel (netewe) dikare bibe ala û *alayê* wek sembola hebûna neteweyê dide der. E. Botî, di vê şî’ra xwe de, bi bibîrxistinan di ser sembolîzekirina kurd, kurdîbûn, cî (welat) û ala re, bêjareke neteweparêz ava dike.

Di Hawarê de, pênc marşên dîtir hatine nivîsîn ku Marşa Xortan, Marşa Canbêzaran, Marşa Felatê ji alî Osman Sebrî ve, Marşa Rêçenasan û Marşa Keyanî jî ji alî Cegerxwîn ve hatine nivîsîn. Gava em li bala xwe dibin ser van marşan, em dibînin ku bi peyvên Xortan, Rêçenasan, Canbêzaran, Felatê û Keyanî kateorîzekirinek heye di beş û çînên neteweyê de ku her beş hêmanên neteweyekê ne û her beşek dikare di hindama xwe de bibe hêmanên sembolên neteweyî.

Xort; wek dînamîk û çalakên civakekê tên zanîn û qebûlîkirin. Loma jî, lîlîvêxistina civakekê û gihîştandina wê a bi mirazê xwe, bi livbaziyan pêk tê ku ew jî bi çalakîyên xortanî dikare bigihîje encama xwe. O. Sebrî, di şî’ra Marşa Xortan de, (Hawar, 1998: 691) pêşî bi risteya “Kurd in em şêrên çiyar in, dê bijîn serdest û gûr” balê dibe ser *şêrbûnê* ku wek semboleke xurtbûnê di mîtos û dastan û çîrokên hemû gelan de cî daye xwe; û pê re jî Kurdan wekî şêrên çiya sembolîze dike û bi gotinên *serdest û gûr* jî sedem û encama şêrbûnê datîne rastê ku; tê zanîn ku şêr serdestê hemû ajalan e. Di risteya, “Doza me tola welêt e, bistînin bi qevdê şûr” de jî, armanca ku dê bi şêrbûna xortan bi dest bikeve diyar dike. Û di dawîya şî’ra xwe de, risteya “Xortino rabin dem nîzik bû, bo felatê şer kirin” saz dike û di banga xwe a bo xortan de hem mebesta xwe dide der û hem jî bêjara xwe a neteweparêz ava dike.

Her wiha, me divê em di vê qonaxê de bala xwe bibin ser hin peyvên da ku em karibin mebesta xwe diyartir û zelaltir daynin rastê.

Rêçenas; ew kes e ku hay jê heye û dizane dê bi kîjan rê û rêçikan bimeşe û bide ser kîjan şopê û bigihîje armanc û mebesta xwe. Wek xuya ye, di wateya peyvê

de, bangek û şanîdanek heye ku ew jî amaje bi rewşenbîr û xwendeyan dike. Cegerxwîn di şî'îra xwe bi navê Marşa Rêçenasan de, (Hawar, 1998: 712) bi risteyên, “Pêşî her tîştî riya me zane bûn û pêşketin/Em fedakarên welat in rêçenasên millet in” destnîşan dike ku sedema rêçenasiyê xwendin û zanebûn e. Û hema bi dû re jî bi risteyên “Begler û axayê kurdan ser bilind in xanedan/Şêx û seydayên dilovan rê me dan din û îman” çîn û beşa civakê ku wekî rêçenas tên qebûlkin, diyar dike. Tiştê ku di van risteyan de bala me dibe ser xwe ew e ku; beg û axa, wek desthilatên civakî, ramanî, aborî û rêveberiyê û şêx û seyda jî wek desthilat û rêçenasên bîrûbaweriyê hatine destnîşankirin. Cegerxwîn, bi risteyên, “Nav û dengê milletê kurd çûye heta Hind û Çîn/Her bi ceng û her bi zanîn pasibanê ilm û dîn” jî gelşa hebûnê ku di wan heyaman de bi polîtîkayên neyînkirinê a Dewleta Tirkîyeyê li civak û neteweya Kurd qelibiyê, arîşedar dike û bi risteya, ‘Nav û dengê milletê Kurd çûye heta Hind û Çîn’ dixwaze bêje, çendî ku bê neyînkirin jî, Kurd wek neteweyekê di dinyayê de tên nasîn. Û bi risteya, ‘Her bi ceng û her bi zanîn pasibanê ilm û dîn’ jî dide zanîn ku Kurd hem bi serkeftûbûna xwe a di warê cengê de hem jî bi serkeftûbûna xwe a di warê pasibanîya ilm û dînê de, hebûna xwe li dinyayê dane nîşandan û peyitandin.

Canbêzar: Yekser bi wateya kesê ku canfîda ye tê. Kesê canbêzar xwedî armançekê ye ku bi serhildanê radibe û ruh û canê xwe di wê sexmeratiyê (oxirê) de dide. O. Sebrî, di şî'îra xwe a bi navê Marşa Canbêzaran de, (Hawar, 1998: 1062) bi risteyên, “Kurde gelparêz, ji bo serxwebûn/Divê birîjînî, bi comerdî xwîn” wek merca sereke a gelparêziyê (neteweparêziyê) rijandina xwînê qebûl dike û her wiha pênasîya canbêzariyê jî dike. Bi dû re, bi risteyên “Him divê xebat, ji bona welat/Da bibin Xudan, rêzik û qanûn” jî amaje bi welatekî dike ku dê bi avabûna xwe ve jî bibe xudan rêzik û qanûn. Heke em bala xwe bibin ser peyvên rêzik û qanûnê, em ê bibînin ku ji bo siberojê bêjareke neteweparêz tê avakirin; ew bêjar li ser armanca danîna dewleteke neteweyî ye ku li ser rêzik û qanûnan meşrûiyeta wê hatiye danîn û qebûlkin. Di risteyên, “Divê hon her yek, mina gurê har./Sînga xwe vekin, bajon ser neyar.” de jî, bi şibandîna ‘mîna gurê har’ hem tundiya xwînrijandinê ku dê ji alî canbêzaran ve were pêkanîn hem jî dijiwariya şer û tundiya ku di şer de tê pêkanîn tê diyarkirin û bi risteya, “Di rêya welêt, em giş canbêzar” jî, amanca ku hatiye kirin tê

gotin û di ser peyvên ‘rêya welêt’ re sedema canbêzariyê tê danîn û her wiha ‘rêya welêt’ dibe sedema avakirina bêjara neteweparêz.

Felat: Bi wateya rizgarbûn (xelasbûnê) tê (Bedirxan, 2009: 139). Di hewan û naveroka wateyê de, zilmek an jî stemkariyek an jî zorlêhatinek heye ku mirov hewlê didin ku felatekê pêk bînin. Loma jî, O. Sebrî di şî‘îra xwe a bi navê Marşa Felatê de (Hawar, 1998: 1077) bi risteyên “Daxwaza me ramana me girtina welat/Me jin navê bi bindestî her divê felat/Welatê me Kurdistan e pêgera şêran” yekser amaje bi felatê dike û pê re jî balê dibe ser sînorê terîtoriyal; warekî bi navê Kurdistan ku têgiha welat tê de dihewe. Û pê re jî bi risteyên “Jî Keyqubad heya digihê Astiyaxê zor/Med serdest bûn di Asya da li jêr û li jor/ Bizdandî bûn Selahedin heft qîran bi şûr/Piştî wî jî di me rabûn pîr şah û emîr” di ser dîrokê û di ser şervanî û qehremanî û desthilatiya Kurdan (û mirovên ku wekî Kurd tên zanîn) re, dikeve nav hewla nîşandana kokdarî û jêderkîbûna neteweya Kurd; û bi vî awayî bêjara xwe a neteweparêz ava dike.

Keyanî: Di binyata xwe de, bi koka ‘key’, bi wateya qraliyê tê. ‘anî’ wek parkît, wateya kes û pîşeyên ku navên wan hildidin, dide (Tîgrîs, 2001: 33). Û bi hewîna vê wateyê jî balê dibe ser desthilatiyê. Loma jî Cegerxwîn, di risteyên pêşîn a şî‘îra xwe a bi navê Marşa Keyanî de, dibêje, (Hawar, 1998: 1077) “Her bijin al û key xwendegah û sera/Her bijîn xurt û kurd en ji dil ên bira” û yekser bi sembolan bêjareke neteweparêz ava dike. Di risteya yekem de, di ser sembola al (ala) re nimandinek tê pêkanîn û ev nimandin di ser key û sera (seray) re –şûn û warê desthilatiyê- tê xurtkirin û bi xwendegah –şûn û warê zanîn û mêjiyê- re jî tê temamkirin. Serê pêşîn me divê em bêjin ku bêjareke bi vî rengî, bêjar û daxwaza Xanî, a ku di risteya “Peyda bibitin me padîşahek” (Xanî, 2008: 37) de tê dîtin, gaveke dî jî pêşdetir dibe û ‘ala’ jî tev li wê bêjarê dike. Helbet ku ciyê ku ala lê dimilmile û dibe sembola neteweyekê, şûn û warê desthilatiya neteweyî ye ku her ji mêj ve ye ew şûn wekî ‘sera-seray’ hatiye binavkirin. Cegerxwîn, bi şûn û warekî wekî xwendegah jî, balê dibe ser ramana neteweyî ku dê bi zanîn û xwendinê lê were avakirin. Cegerxwîn, bi risteyên “Pehlewan ko nebin kengê pêk tên hemî/Xwendevan ko nebin kengê pêk tên hemî” balê dibe ser du awa çalakiyê ku yek jê *pehlewani* ye û a dî jî *xwendevani* ye. Yek avakara serayê ye a dî jî avakara zanîn û ramanê ye. Lê Cegerxwîn, ji bo xurtkirina bêjara xwe a neteweparêz, di dawiya şî‘îra xwe de rû ji zanînê ba dide û bi risteyên “Xortino herne ceng/Rengê Ristem bi

deng/Da bijîn xurt û rind/Serbilind em hemî.” Pêşî rêyek li ber xortan dixê ku ew rê şerê felatê ye û bi gotinên ‘Rengê Ristem bi deng’ jî ji bo bêjara xwe a neteweparêz havildariyekê ji dîrok û dastanan peyde dike û di ser Ristem re (Ristemê Zal) jî mêrxasî û cegerdarî û qehremaniya ku ji bo felata welat û jiyana serbilind pêwîst e, sembolîze dike.

3.7.3 Cografya û Etnografya

Nivîskarên Hawarê, bi awayekî birêkûpêk û bi berfirehî agahiyên der heqê cografya û etnografyaya Kurdistanê dane û pênasayên etnografyaya Kurdistanê kirine. Gund û bajar û bajarokên Kurdistanê wek şûnên cografîk ên ku Kurd lê dijîn hatine diyarkirin û rabûnûrûniştina wan û awayê jiyana wan, bi mînakkirina hêmanên çandî û folklorîk hatine nasandin.

3.7.3.1 Berpêbûnên Di Warê Cografya û Etnografyayê De

Osman Sebrî, wiha dest bi nivîsara xwe a “Çiyayê Sasonê” dike, “Ev çiya wek pir çiyayên Kurdistanê çiyakî asê û pêgera wî dijwar e. Lê ne wek piraniya çiyayên mayî nenas e. Ji mêj ve bi xurtî û mêrxasiya eşirên têda, di welatê Kurdistanê da bi nav û deng e” (Hawar, 1998: 692) û berî ku çêla Çiyayê Sasonê bike, bi gotina, *wek pir çiyayên Kurdistanê*, balê dibe ser tevdehiya cografyayê bi sînor ku çiyayên wê dişibin hev; û navê wê cografyayê jî Kurdistan e. O. Sebrî di berdehama nivîsarê de, bi hevokên “Ev çiya ji berê da bi dijwariya cih û mêraniya xelkê têda bi nav û nas e. Ji roja ko biyanî ketine welatê Kurdistanê heya îro xelkê wî çiyayê serên xwe ji wan ra danenin e û berê tîfinga xwe ji sînga wan ne guhastin e” (Hawar, 1998: 692) balê dibe ser kesên ku li derdora Çiyayê Sasonê dijîn û reng û çawabûna taybetiya mirovan. O. Sebrî, pêşî amaje bi binavûnasbûna mêraniya xelkê te de dike û pê re jî bi gotina, *welatê Kurdistanê*, bêjara xwe a li ser cografyaya ku bi nav kiribû qewîntir dike û mirovên ku di wê cografyayê de dijîn pênas dike û mirov û cografyayê digihîne hev. O. Sebrî piştî ku bi giştî Çiyayên Sasonê bi tevî bîst û sê çiyayên tê de

dide nasîn, wiha dibêje, “Ci gava ji xelkê Sasonê teng hatiye, anê hikûmetekê bi ser wan da girtiye, xwe avetine serên van her se çiyayê û xwe di navçavên wan da ji hingên neyaran parastine.” (Hawar, 1998: 692) û girîngiya çiyayan a wekî war û stargeh a li cem Kurdan destnîşan dike. Sebrî, vê destnîşankirina xwe li ser bêjara warbûnê ava dike. Loma jî, di rastiyê xwe de diyar dike ku di rewşên *tenghatinê* de, dîsan *war û diyareke ku welatê Kurdan e* li Kurdan dibe stargeh. Piştî jî O. Sebrî balê dibe ser awayê jiyîna Kurdan a komî û eşîrî di wî warî de û dibêje, “Eşîrên Sasonê: Di nav û dorhêlên çiyayê Sasonê da hevde 'eşîr hene. Ji van eşîran Ezebo, Pisino, Zekeri, Mûsî, Bûbî û Şerwên di nav bîst û se çiyayên ko me navên wan li jor gotî da dimînin” (Hawar, 1998, 692). Lê belê Sebrî, taybetiyên van eşîran, rabûnûrûniştina wan û çanda wan a jiyânî ku bi nêrî û adetan dagirtiye bi me nade nasîn.

Nivîskarê Hawarê Mihemed Cemîl Paşa, di nivîsa xwe a bi navê Çiyayên Silîvan de, piştî ku bi gotinên, “Çiyayê Elbatê bi timami bi darên hêjîran xeniilandî ye. Dirêjahiya wî çiyayî 30 û pehniya wî 25 kilomêtir heye” (Hawar, 1998: 932) pênaseya çiyayê Elbatê dike û bi gotinên, “Hêja bûna vi çiyayî nemaze ev e ko tê de kana kevirên aşan peyda dibin. Divê neyê ji bir kirin ko aşên Kurdistanê kevirên xwe ji kana vi çiyayî tînin” (Hawar, 1998: 932) bi me dide zanîn ku çanda aşvanî û aşgerandinê berbelav e di jiyana Kurdan de. Û pê re jî, der heqê spehîtiya cografyaya Çiyayê Silîvan de agahiyên dide û fêkî û xwarinên ku tê de ne dide nasîn û dibêje, “Di Narikê de nizikahî ve sih gund hene. Ev gund cihê cihê giş bi navdeşt û çiya, bi av û bi aş e. Havîn û pehîza vî çiyayî gelek şîrîn û hênik e. Navdeştên vi çiyayî giş dehl, rez û bi darên fêkî teji ne. Ev erdê ha yê navdeşt bi satar in” (Hawar, 1998: 932). Û bo me destnîşan dike ku ji xelkên derdora Çiyayê Silîvan re adet e ku li cî û warên xweş û spehî bijîn. Û pê re jî dibêje, “Ev xelk sê roj û sê şevan li vê dimînin û roja çaran axayê Silîvan bi tevî zaro û xatûna xwe ve tene Erqenisê. Xelk diçin pêşiya Axê û bi şahî gelek tifînga berdidin. Axa bi malbat û zaroyên xwe vê tene serê kaniyê û xelk dest bi govend û şûr û mirtalan dikin û govandê digerînin.” Em ji van gotinan tê digihîjin ku di aliyê desthilatiya navxweyî de axa beşek ji desthilatan in û Kurdên wê herêma hem pêgirtiyê axayê xwe ne hem jî hezkirên wan in. Nivîskarê nivîsara Çiyayê Silîvan, bi gotinên “Di kurdistana me de li deştê Şor û Deqnat, li çiyê Helda û Boşat bi nav û deng in. Şor û Deqnat di deşta Silîvan de ev cih in ko ji

qûntara çiyê avên bîst, sih aşî bi hev re û bi carekê ji kanikê dertê ser rûyê erdê” (Hawar, 1998: 932) pêşî bi gotina, *di kurdistana me de*, bala me dibe ser cografyaya giştî ku ji sînoren diyar pêk tê û pê re jî em fam dikin ku av û aşvanî wek çandekê jiyânî gelek girîng û berbelav e li dora Çiyayê Silvan.

M. E. Botî, bi risteyên “Serê çiyayê Cûdî tu raweste û binêr/Axa welatê kurdan hemî zîv e û tev zêr” (Hawar, 1998: 976) dest bi şî’îra xwe a bi navê Çiyayê Cûdî dike. Û hema bi destpêkê re bêjara xwe a cografyaya Kurdistanê bi Çiyayê Cûdî dide nasîn û bi gotina, *axa welatê kurdan*, jî hem Cûdî dike warê neteweya Kurd û hem jî nîşaneya cografyayekê. M. E. Botî, bi risteyên, “Çendî xweş î, bilind î, tu ey çiyayê Cûdî/Te çend nav û nîşan hişt ji bo vî qewmê kurdî/Bejna te bejna Zînê, mêranî wek Memê al” (Hawar, 1998: 976) jî spehîtiya Cûdî û girîngî û giranbhatiya wî a ji bo *qewmê Kurdî* diyar dike û vê yekê bi risteya, “Bejna te bejna Zînê, mêranî wek Memê al” hem ji alî cografîk ve hem jî ji alî folklorîk ve digihîne bêjara neteweyî.

Qedrî Cemîl Paşa, di nivîsara xwe a Gawestiyayî û Koçerên Kurdan de, agahiyê digihîne xwendevanan. Nivîskar bi hevoka, “Berî dora sed salî pire kurmancan koçer bûn” (Hawar, 1998: 1091) pêşî bala me dibe ser awayê jiyîna Kurdan a berî sed salî. Û pê re jî digel ku agahiyan der heqê jiyana koçeriyê de dide jî, bi hevoka, “Zivistanê, berê xwe didan nîvro, ji ber pûk û berfa zozanan direviyan, dihatin germiyanan, biniya çiyayên Kurdistanê” (Hawar, 1998: 1091) bi me dide famkirin ku li welat û li ser axeke bi navê Kurdistan çar demsal digel hev tê jiyandin; gava li herêmekê zivistan be li herêma dî jî germiyan e û navê vî welatî jî Kurdistan e. Her wiha Qedrî Cemîl Paşa, piştî ku li ser sînorê axekê diyar dike ku koçer hene li ser axa Kurdan û awayê jiyana wan, awayekî jiyana beşeke ji xelkê Kurdan e jî û bi hevoka, “Ji Ferêt heta Dicle li vê deşta hana fireh cî cî koçeran datanîn” (Hawar, 1998: 1091) jî bi berevkî ve sînorê vê axê diyar dike ku mirov dikare wê wek axeke terîtoryal bisêwirîne. Qedrî Cemîl Paşa, piştî ku bi hevoka, “Ji ber wê ye ko di pey terikandina koçeriyê ra em dibînin, birek ji ‘eşîrekê di germiyanan da ye: birekî din li çiyê bi cî bûye” (Hawar, 1998: 1091) agahî dide me ku eşîra Mirdêsiyan jiyana koçerî terikandiye û balê dibe ser avabûna peyva Gawestî ku ji çand û awayê jiyane ava bûye û dibêje, “Wek remzekê hatiye nas kirin; gawestiyayî ew in ko ji eşîra xwe

a bingehîn veqetiyane” (Hawar, 1998: 1091). Nivîskar, bi rêya koçeriya eşîra Mirdêsiyan, regekî jiyane dide nasîn û peyvekê tev li ferhenga Kurdî dike.

Her wiha Xwediyê Hawarê (*Celadet Bedirxan. d.d.*), berê xwe dide jêderka vê peyvê û pirsê ji O. Sebrî dike ku ew bi xwe ji eşîra Mirdêsiyan e. O. Sebrî di hema hejmarê de nivîsarekê bi navê Mirdêsan û Gawestiyên Wan belav dike û li ser cî û war û rabûnûrûniştinê hûr dibe; û li ser mîrnişîna Mirdêsan û rewş û sedema qelsbûn û belawelabûna eşîrê rastiyêke dîrokî aşkera dike (Hawar, 1998: 1096).

Herekol Azîzan, bi nivîsa xwe a NEWRÛZ BÎST Û SISÊYÊ NISANÊ, bala me dibe ser nêrît û adet û awayê jiyane a Kurdan. Ew bi hevokên, “Herçî Kurdistan, nemaze welatê jorîn dîtine, qenc bîr dibin ko ev cejna mezin, cejna me a mili û nijadîn, Newrûz, ji tebîeta welatê me bi xwe hatiye der; şertên jiyîna welatê me ew xwestiyê” (Hawar, 1998: 976) yekser di ser cejna neteweyî û nijadîn re bêjareke neteweparêz ava dike; û wê bi *tebîeta welat* ve dibestîne. Nivîskar pêşî der heqê avûhewa û kêşwera welatê Kurdan de agahiyan dide, qulibîna zivistanê a ser biharê û qedîna berf û pûk û sermayê çêl dike û awayê jiyane a di van deman de dide zanîn û piştî jî wiha dibêje, “Xwedê vê hêviya mirovan dibe serî û bihar tête rû; dinya vedije û herçî milletên îranî yên ko berî herkesî û bi rêberiya Zerdeşt yekîtiya Xwedê nas kirine vê rojê şahînet dikin û je re newrûz an nûroj dibêjin. Ji ber ko di gera rojê de roj û heyameke nû dest pê dike” (Hawar, 1998: 976). H. Azîzan, pêşî ji alî nijadê ve *îranîbûna Kurdan* destnîşan dike, pê re jî bawermendiya bo Zerdeşt û Zerdeştîyê a bi baweriya yekxwedayî, diyar dike û awayekî jiyîne û kelepûra Kurdan a *şahînetkirina wan a di vê rojê de* çêl dike ku nav lê dikin *newrûz an jî nûroj*. Ev awa gotin û bêjar, hem di warê neteweyî hem di warê bîrûbaweriya olî hem di warê adet û nêrîten ku li gel û neteweyekê bûne kelepûr de bêjareke neteweparêzî ava dike; û pê re jî bi gotina, “Ji ber ko di gera rojê de roj û heyameke nû dest pê dike.” di warê zanistê de rasterast asta neteweya Kurd û îranî diyar dike.

Herekol Azîzan, bi gotina, “Ehmedê Xanî vî şairê kurdan ê mezin, yê ko daye pey her tiştê milletê xwe ê millî û nijadîn; di Memozîna xwe de (qala Newrûzê jî kiriye,” ji Mem û Zîn a E. Xanî jî gelek riste û beytan li dû hev dinivîse mînakî dide. Û bi şîroveyeke wekî, “Ji qesideyên Xanî dixuye ko di wê heyamê de kurdmancan ev cejin bi ayînine mezin şahînet dikirin û ev cejin gelek biqedir

dizanin.” destnîşan dike ku şahînetkirina di vê rojê de ji Kurdan re bûye adet û awayê jiyînê (Hawar, 1998: 977).

Şa’îrê bi navê Hesên, di şî’îra xwe a bi navê Welatê Kurdan de, hewla pênasêkirina cografyaya Kurdan dide û wiha dest bi şî’îra xwe dike, “Kurdistan xweş e cihê kalikan/Tev xwîn dirêjin newal û çalan” (Hawar, 1998: 559). Şa’îr Hesên, di destpêkê de sînorekî diyar dike; sînorekî ku bi awayekî terîtoryal û siyasî hatiye xeyalkirin û pê re jî hem di xeyalan û hem jî di sînorên cografîk a dinyayê de hatiye destnîşankirin. Hesên, di berdewama şî’îra xwe de, di danasîna xwe a Kurdistana welatê Kurdan de, berê xwe dide bakur û risteyên wekî “Geliyê Zîlan geliyekî teng e (...) /Çiyên serhedan çiyayin delal (...)” dinivîse û hewlê dide ku wek cografya ciyên sereke bi xwendevanan bide nasîn. Hesên digel ku xweşahî û spehîtiya cografyayê dide nasîn û hewl dide ku li ser wan “balabûneke” Kurdbûnê ava bike jî, hewldana xwe tenê bi nav û spehîtiyên cografyayê nahêle û bi risteyên “Pêşiyê te zor bûn li hemû erdan/Ekbetan cihê Şehmerşahê me/Kî Axsarşah e ew jî ji me ye/Keyqubad belê ew jî ji me bû” berê xwe dide dîrokê û awayê hebûn û navdariya Kurdan a di dîrokê de diyar dike û pê re jî bi risteyên “Pir eqîlbend û mîlîterperwer bû/Astiyax herê ew jî ji kurdan” hewlê dide ku rengûawayê Kurdan a nasîna di dîrok û nava neteweyên dî de bide der û a dawî bi risteyên, “Welatê Medan bilind û bi şan/Welatê Medan welatê kurdan/” (Hawar, 1998: 559) jî gotina xwe a dawî dibêje û di warê cografyayeke sînorkirî û terîtoryal de bêtareke neteweyî û neteweparêziyê ava dike.

Nivîskar Hişyar, di nivîsa xwe a bi navê Navên Kurd Ê Kurdmanc Ê Cihên Kurdistanê de, (Hawar, 1998: 716) balê dibe ser ra û jêderka navên ciyên ku Kurd lê dijîn û guherîn û guhertina wan navan. Hişyar pêşî dipirse “Çima ji me re dibêjin kurmanc?” û bi pirsê xwe re jî hewl dide ku etîmolojiya navê Kurmanc bi rêya dîroka mîtolojiyê bibersivîne û wiha dibêje, “Gava Nûh û hevalê xwe (heştê) peya li ser çiyê ji keştiya xwe bi derketin, li pesara çiyayê Cûdî gundekî nû ava kirin. Je ra dibêjin (Heştiyan). Ew gund îro jî ava ye. Piştî ko însan pir bûn û zeman dirêj bû û nijad jî hev derketin û li rûyê zemînê belav bûn; kurd li warê bavê xwe man. Ji ber vê yekê hate gotin (kurd-man-li-cî-)” (Hawar, 1998: 716). Hişyar, bi vê pênasêya xwe ve, dîrok, mîtoloji, ziman û cografyaya Kurdan, yanî Kurdistanê bi hev digihîne û bi gotinên wekî, “Ji xwe bajarê Cûdî (Şernex) e. Esilê vê gotinê jî (Şehrê-Nûh) an (Şehrê-nû) ye, kurmancîke xwerû; bi mana (Bajarê Nûh) an (Bajarê nû)” (Hawar,

1998: 716) balê dibe ser guherandina navê nîrxên Kurdan û di warê zimanê Kurdî û kok û jêderkên wê de, ramanê ku zimanê neteweyî li xwe dike hîm û bingeh ava dike û helwesteke zimanê neteweyî datîne rastê. Û Hişyar di dawiyê de jî bi şîroveyeke rapir wiha dibêje, “Herwekî navê Nemrûd (Nîmroz.) yanî (Nivroj) e” (Hawar, 1998: 716).

Gava em bala xwe didin nivîsarên ku cografya û etnografyaya Kurdan li xwe kirine mijar, em dibînin ku nivîskarên nivîsaran ne tenê bi mebesta agahîdanê ev nivîsar nivîsîne. Wan di nivîsara xwe de hewl daye ku bêjarekê ava bikin li ser cografyaya hevpar ku di nav sînorekî diyar û terîtoryal de ye û navê vê cografyayê jî Kurdistan e. Her wiha, nivîskaran danasîna cografya û etnografyaya Kurdan û welatê Kurdan a bi awayekî şilfitazî têr nedîtiye; loma jî carûbaran dîrok, carûbaran jî mîtolojî û carûbaran jî ziman li xwe kirine piştgir û palder da ku karibin bêjara xwe a li ser neteweparêz ava bikin.

3.7.4 Çand û Folklor

Folklor bi awayekî giştî wekî, “Hişûbîra hevpar û ezmûna ku tê parvekirin” (Oğuz, 2007: 12) tê pênasekirin. Bi vê re jî, em dikarin bêjin, piraniya hêmanên folklorê ji kodên çandî pêk tê. Ev kod bi awayekî beranberî hev, ji hemû aliyên komên xelkê ve tên nasîn. Û ev nasîna hanê dike ku kod bibin xwedî taybetiyeke gelemper û bibin sedem ku mirovên ku nasyarê wan kodan in xwe ji hev û nêzî hev bihesibînin û wisan jî bizanibin. Di heman demê de ev nasyarî û lîngwîstîkî dike ku mirov hay ji mîrateya xwe a neteweyî bibe. Her wiha li gorî Oğuz, “Têgiha ‘mîrateya neteweyî’ zanava neteweyekê an jî welatekî ava dike, wê pênase dike û cudatî û hebûniya wê a li hember neteweyên dîtir dide xuyan û dike ku ew neteweyên dîtir wek ‘dîkeyek’ê bibîne” (Oğuz, 2001: 5-8). Loma jî em dikarin bêjin; ev kodên ku ji çand û folklorê neteweyekê ne, di heman demê de hem haveyn û hem jî berhîma neteweparêziyê ye jî. Gelên ku di bin banekî de, yanî li ser axeke hevpar dijîn û xwedî çanda hevpar in, bi parvekirina van kodan di feraset û ramana ‘yekgel’ de digihîjin hev. Pirî caran, paşperdeya dîrokê banê hevpar diyar dike. Ji ber ku daneyên devkî ên dîrokî jî wekî berhênan û qada çalakiyê a çanda gelên qebûlîkirin, dîroka çanda devkî ne tenê çavkaniyên dîroka nivîskî ye, di heman demê de navgînên

neteweparêziyê ên sereke û bivênevê ye û bi saya wê hişûbîra dîrokî di jiyana neteweyê de bi cî dibe. Digel ku berhemên folklorîk û çanda devkî, mîrateyên serdema berê ne û di nerîtan de dijîn jî, di heman demê de jî berhemên nû jî dihewînin di xwe de. Ji ber ku nerîtên nivîskî û devkî jî veguhezkerên çandê ne, her qebûleke hevpar, di jiyana neteweyekê de nerîteke nû dide jiyandin; nerîteke ku di her carê de xwe vediafirîne û veberhênanê dike.

Ji aliyekî dî ve jî, Smith gava îdeolojiya neteweparêziyê rave dike, balê dibe ser çandê jî û wiha dibêje, “Ji bilî afirandina ekonomiya neteweyî û sazkirina rêveberiyê xweser, afirandina çandê neteweyî (sîstema nirxên hevpar û pênasekirina zanaveke ku bi wê ve pêbest e) ji armancên avakirina dewleteke neteweyî ye” (Smith, 2002: 182). Loma jî, têkiliyê rasterast heye di navbera destpêka xebatên folklorê û hişberiya netewebûna civakên ku di nav sînorên împaratoriyan de dijîn. Rewşa ku di dema beriya Hawarê û di dema Hawarê de li dar e, heman rewş e; împaratoriya Osmanî û serdestiya wê rûxiyayê û gelek civakên ku di nav sînorên wê de dijîn jî bi hişberiyê netewebûnê rabûne û wan xweseriya xwe a dewletî daniye. Lê Kurd di vî warê de zêde jêhatî û hişber tevnegeriyane û gelek tişt û heman kêmanî ku hilberîneke neteweyî di nav civaka Kurdan de ava bibe. Tiştê ku di Hawarê de, wekî tevgerê rewşenbîrî hatiye armanckirin jî temamkirina vê kêmasiyê ye; û di warê çand û ziman û folklorê de, ji bo pêkanî û lidarxistina armancê rêgez hatine danîn û xebatên hatine kirin; û pê re jî hewldaneke avakirina bêjareke neteweparêz hatiye dayîn. Heke em qonaxê hinekî kurteve bikin, em ê karibin bêjin:

Heta Şerê Cîhanê ê Yekemîn, di nav xwende û rewşenbîrên Kurdan de, raman û halet î ruhiyeya romantîk ku; pêhisîna jêcihêbûneke arizî xwe bi mirov re çêdike û pê re jî cihêtiya xwe a ji neteweyên dîtir datîne rastê, bi firehî cî ji xwe re nedîtibû. Piştî ku şer bi dawî bû û du serhildanên Kurdan bi encameke karesatî têk çûn, şikestineke psîkolojîk di giyanê rewşenbîrên Kurdan de çêbû; loma jî ramana azadiyê hê bêtir di aşopan de bi cî bû; û di asta ramanî û îdeolojîk de bizaveke romantîk-neteweparêz dest pê kir. Wekî encama vê yekê jî, eleqeya ji bo jiyana gel, kelepûra neteweyî zêdetir bû.

Her wiha, gava em bala xwe dibin ser nivîskar û rewşenbîrên ku berî Hawarê di kovar û rojnameyên Kurdî û Kurdan de nivîsîne, em dibînin ku zêdetirî wan li

Stenbolê û ji gelê xwe û ji jiyana adetî, çandî a neteweya xwe dûr dijîn. Loma jî, çendî ku kovar û rojname digihîjin warê ku gel tê de dijî jî, kartêka berhema çapkirî tenê di nav xwende û rewşenbîran de çêdibe û nagihîje serencameke ku tê xwestin û hêvîkirin. Lê belê, gava em bala xwe dibin ser Hawarê, em dibînin ku rewş ne wisan e. Çendî ku Hawar li Şamê çap dibe û ji wir belavî Kurdistanê dibe jî, daner û xwediye wê di nav gelê xwe de dijîn û pê re jî nivîskarên ku têkiliyeke germ û aktîv bi kovarê re datînin jî, di nava gel de ne. Her wekî ku Yıldırım diyar dike, “Piştî ku ramana romantîzmê cî û qadeke berfireh ji bo xwe peyde kir, eleqe û nêziktêdan ji bo jiyana gel zêdetir bû; pê re jî lêgerîn û peydekirina hemû kan û jêderkên hêmanên ku di nav kirûya “netewe”yê de dihewin, di jiyana gel de hatiye pêkanîn” (Yıldırım, 1994: 21). Loma jî, piştî qonaxa ku me çêl kir, bes rêyek mabû ku bihata kudandin; serlêdana li komên xelkê û mîrateya wê a ku di jiyana wê a beyar û destlênegeriyayî de dihewe. Jixwe halet-î ruhiye û ramana romantîk ku êdî kartêka xwe xweşikî li xwende û rewşenbîrên Kurd dikir, ev rê li wan kir rêya bivênevê. Ji ber hindê jî, Hawarê jî da ser vê rêyê û berê xwe da kana neteweyî ku di nava gel de ye. Helbet ew mîrate, çavkaniya hemû hêmanan bû ku di nav ‘kirûya’ neteweyê de dihewiyan. Ji aliyekî dî ve, Oğuz destnîşan dike û dibêje, “(...) Kodên girîngtir ên çandî, mîtî û folklorî xwe dispêrin dîroka pêşolî û pêşumetî û amaje bi gund dikin; û loma jî ev yek bûye egera sereke a avabûna netewebûna gelên Ewrûpaya Navîn û Bakur” (Oğuz, 2010: 36-45). Xwende û rewşenbîrên Kurdan ên wê hingê jî, bi vê refleks û raman û hewldana ku Oğuz destnîşan dike rabûne û piştî ku meraq û eleqeya xwende û rewşenbîran bêtir çûye ser berhemên gel û folklorîk, bi taybetî xwendeyên Kurd, piştî ezmûna rojnameya Kurdistan, kovarên wekî Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Jînê, hay jê bûn ku ji wêdetirê misilmanbûna xwe, divê bibin xwedî zanaveke cuda; loma jî baldariya ku ji bo awayê zimanê ku gel pê diaxive û ji bo berhemên “mîrateyên neteweyî” hebû, kir ku sekuleriyeke taybet û arizî xwe, ku ol neyîn nake û naavêje dûrî waran, ava bibe di nav xwendeyên Kurd de. Em dikarin di vî warî de Cegerxwîn wekî mînak nîşan bidin ku wekî melayekî Kurd ku şa’îrê dema Hawarê ye, mînaekeke berbiçav e.

3.7.4.1 Berpêbûnên Di Warê Çand û Folklorê De

Her wiha, me divê em diyar bikin ku, wek xebatên destpêkî, daneheva berhem û mîrateyên folklorîk di Kovara Jînê de hatiye kirin. Bêguman em dikarin bêjin ku xebatên daneheva berhemên çandî û folklorî a di Jînê de hatine kirin, yek ji hîmxebatên vê biwarê ne. Lê belê xebata ku di Jînê de hatiye kirin, hem pir dorteng bûye hem jî bi pêjnîtî û hewldaneke xwenaskirin, navlixwekirin û pê re jî bi peyitandina xwe a wek heyînekê li dar ketiye. Di Hawarê de, bi awayê xebat û derpêşkirina wan, qonaxa xwenaskirin û peyitandina hebûniya xwe qulibiye ser xweavakirinê; û çand û folklor di vê xweavakirinê de bi roleke handa rabûne.

Loma jî, di hejmara yekem û di sernivîsa bi navê Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê de, piştî ku bi gotinên, “Qareqî qo biqare biçê serî, divêt jê re pronivîseq bête çêqirin. Me pronivîsa xwe ser bingehên jêrin lê qiriye.” (Hawar, 1998: 23) bi kurtasî sedema xebatê hatiye diyarkirin û heft xalband li dû hev hatine rêzkirin. Xalbenda sêyem wiha dibêje, “Ber hevqirina çîroq, çîrçîroq û her texlît laje û stranên qurdî û birêve belavqirina wan” (Hawar, 1998: 23). Û bi van gotinên xwe ve jî hê di hejmara yekem de bingehê bo çand û folklorê tê danîn. Loma jî bi gotina, “Qareqî qo biqare biçê serî” divêtiyek tê avakirin û di nava vê divêtiyê de, karê neteweyî ciyekî xwe î girîng heye û ji bo wê jî jê re *pronivîsek* hewce ye. Ev pronivîsa (pêşnivîsa) ku ji bo wê rojê wek *pronivîs* e, ji salên berê de mane ku ne sal û ne meh û ne jî roja zayîna wan tên zanîn. Ew ji nerît û çanda neteweyekê ne û hemûyan di nav hev de folklorê wê neteweyê ava dikin ku peytên sereke ne ji bo hebûna etnîkî a wê neteweyê û cihêwazbûna wê neteweyê ji neteweyên dî. Bi dû wê re, di xalbenda çarem de wiha hatiye gotin, “Senifadin û belavqirina diwanên qurdî. Bi van ve jînenîgarîyên şair û mirovên bijarte jî dê bîna belav qirin” (Hawar, 1998: 23). Ji gotina “senifa(n)din û belavqirina diwanên qurdî” armanc, berhemên klasîk ên Kurdî ne ku digel berhemên folklorîk stûneke xurt in ji bo hest û ziman û çand û toreya hevpar a neteweyekê. Û danhev û belavkirina wan a digel berhemên çandî û folklorî tiştekî bivênevê tê dîtin ku di vê reftarê de armanc ev e; tê xwestin ku xebata daneheva berhemên folklorîk –berhemên devkî- û xebata senifandin û belavkirina diwanên Kurdî –berhemên nivîskî- digel hev bimeşe. Ji ber ku her berhema nivîskî dê bi zimanê xwe î hevpar bibe peyt û nîşaneyê hebûna berhemên devkî û her

berhema devkî jî dê bibe palpišta berhemên nivîskî. Û dê bê nîşandan ku berhemên nivîskî bi rola xwe a veguhêzker rabûne û di ser berhemên folklorî re jî hatine afirandin. Her wekî Mem û Zîn a Ehmedê Xanî ku Xanî berhema xwe li ser dastana Memê Alan rûniştandiyê û di ser çîroka evînî a Mem û Zînê re jî bala kes û komên xelkê kişandiyê ser gelê (neteweya) Kurd. Pê re jî di xalbenda pêncem de wiha hatiye gotin, “Sehitî li ser reks û Keydeyên stranên qurdî.” Çendî ku parçeyek ji folklorê neteweyekê ne û kod û hêmanên çandê di xwe de dihewînin jî, cureyên govendê, stran û bi taybetî jî klamên dengbêjiyê di çand û folklorê Kurdan de ciyekî girîng î stûnî digirin. Ji ber ku kilamên dengbêjiyê, di heman demê de jî dastan û çîrok, rûdanên dîrokî û kodên çandê di xwe de dihewînin; û digel mêjûyê, kesûkûsên girîng û ne girîng ên di nava wê rûdanê de cî girtine jî qal dikin û dîroka ku nehatiye nivîsîn, nerîta ku nehatiye tomarkirin jî bi rêya vegotina klamî vediguhêzînin. Herçî stran in, di her yekê de qaydeyek heye; bi her qaydeyê awayekî gotina stranê pêk tê; û ew awa jî kêf û şahîkirina gelekî (neteweyekê) dide der û di warê rengê jiyana neteweyekê de nîşaneyên berbiçav datîne ber mirovan. Û ev beş û hêmana folklorê, çanda pevtêkiliya mirovên neteweyekê bi me dide zanîn da ku em bi vê zanîna karibin rengûawayê kes û endamên wê neteweyê pênase bikin; çanda rabûnûrûniştina wan a bi hev re nas bikin û cudatiya wan a ji kes û endamên neteweyên dîtir aşkera deynin rastê.

Em bes bi van her sê xalbandan, xalbandên sêyem, çarem û pêncem, dikarin bêjin ku; ev xalband bi tena serê xwe helwesteke danîna bingeheke folklorîk a hebûna neteweya Kurd e ku Öztürkmen jî dibêje, “Berî her tiştî, wekî dîsîplîneke serbixwe, derketina folklorê ne ji derveyî têgiha dewleta neteweyî ye.” (Öztürkmen, 1998: 15-16).

Heke em ji aliyê zimên ve bala xwe bidin sedema helwest û bizava daneheva berhemên folklorî û çandî, em ê karibin bêjin; qet nebe di dema derketina Hawarê de xemeke wisan tunebû ku zimanekî ku ji alî piraniya komên xelkî ve bê famkirin, were avakirin. Ji ber ku; heke em serdema Wêjeya Kurdî a Klasîk deynin aliyekî, nivîsên kovar û rojnameyên ku bi Kurdî weşiyên, hema bêje bi temamî nêzî zimanê gel bû û çî Kurdekî ji komên xelkî ku bi xwendinê zanibûya bi hêsanî dikaribû ew nivîs bixwendana. Çendî ku di serî de Celadet Bedirxan û pê re jî xwende û rewşenbîrên di Hawarê de nivîsîne, hay jê hebûne ku ziman hêmana sereke a

netewebûnê ye û parek zêde ji giyanê neteweyî derdibire û digel ku Celadet di Hawarê de wiha nivîsiye jî, “Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e” (Hawar, 1998: 23) dîsan jî tu tirs û fikara wan tunebû ku kesek ji zimanê Hawarê fam neke; ji ber ku wan bi zimanê ku gel pê diaxivî dinivîsî û berhemên folklorî ji xwe re dikirin çavkanî. Loma jî, em dikarin bêjin; di dema Hawarê de, çendî ku danheva berhemên folklorîk ji alî kelepûrê ve tevkariyeke baş û hêjayî gotinê li zimên kiriye jî, helwest û bizava danheva van berheman bêtir ji bo lirastêdanîna mîrateya Kurdî û Kurdan e ku dê di ser folklorê re neteweya Kurd bi xwe û pê re jî bi neteweyên dîtir bide nasîn.

Di warê dannasandina folklorê Kurdî a bo neteweyên dîtir de du mînakên mezin û berbiçav hene li ber destan. A yekem, di hejmara 3. û di birê Frensî a Hawarê de, nivîseke bi navê Le Folklore Kurde heye ku ji alî C. A. Bedir-Xan ve hatiye weşandin (Hawar, 1998: 71-72-73). A duyem jî di hejmara 4. a Hawarê de dastana Memê Alan epîzot bi epîzot û bi Frensî hatine weşandin (Hawar, 1998: 89-90). Her du nivîsar jî ji alî C. A. Bedir-Xan ve hatine wergerandin û weşandina wan nivîsaran di hejmarên dî de jî kudandiyê. Li vê derê em rastî çalakiyeke wergerandinê a berovajî tî ku em dikarin bêjin ev yek di vî vî warî de wekî hewldana yekem tê dîtin. Ji ber ku heta wê demê jî em lê rast nayên ku berhemeke folklorîk a Kurdî li zimanekî dîtir hatibe wergerandin û weşandin. A duyem jî, wekî tê zanîn, heta destpêka serdema nozdehemîn, kelepûrên ziman û berhemên folklorîk ên Kurdî ji alî mîsyonerên rojavayî ve wekî nimûne hatine berhevkirin û li gelên biyan hatine nasandin an jî di muzeyan de hatine hêvişandin.

Heke em têgiha “mîrateya neteweyî” û kartêk û taybetiya wê ku cudatiya etnîsî û neteweyî pir aşkera û zelal datîne rastê, careke dî jî bînin bîra xwe, em ê xweşikî bibînin ku ev hewldan û pêkanîna Hawarê û C. A. Bedir-Xan di warê aşkerakirin û lirastêdanîna cudatiya neteweya Kurd de gelek berbiçav e. Her wiha Celadet ev yek ne tenê di warê folklorê, di heman demê de di warê zimanê Kurdî de jî ev yek pêk aniye û ji hejmara yekem de, dest pê kiriye û bi zimanê Frensî ew dane nasîn. Em dikarin bêjin, tiştê ku Celadet li vê derê kiriye, ji vegotin û çêlkirina cudabûna Kurdan zêdetir dannîşana cudatiyê ye; yanî wî bi wergerandina dastana sereke a Kurdan, Memê Alan; serê pêşîn nîşan daye ku Kurd wekî etnîsîteyekê xwedî dastaneke neteweyî ne ku her kes pê haydar e an jî dizane. Pê re jî Kurdbûn bi vê

xwedîbûnê re ji etnîsîteyê veguhastiye biwareke polîtîk û bi rêya folklorê bêjareke neteweyî û neteweparêz afirandiyê.

Her wiha, Herekol Azîzan, nivîsareke bi navê “Mişo û Xido” belav dike. (Hawar, 1998: 147). Di vê nivîsarê de, Mişo û Xido du dengbêjên ji deşta Sirûcê ne û diçin serdana Hawarê. H. Azîzan pêşî bi kurtasî wan dide nasîn û dibêje, “Mişo di dora pêncî salî û Xido jî di dora sî û pênc saliyên de ye.” H. Azîzan dibêje, “Ji me re Même Alan strandin, Xido bû Mem û Mîşo Zîn.” Vegotina bi vî şeweyî, me digihîne ramana jêderkî; ji ber ku çendî ku Mişo û Xido di roja îroyîn de bin jî, ji ber ku ew bi can û giyanê xwe ve bi dastanê ve bestandî ne û wekî endamên etnîsîteyê dastan di xwe de mehandine, dikarin bi hêsanî wekî lîstikvanên şanoyê jî bikin û xwe têxin şûna Mem û Zînê jî. Digel vê yekê jî, ciyê dengbêjan di jiyana Kurdan de bi du rengên sereke derdikeve pêşberî me. Di wan dem û qonaxan de, dengbêj di jiyana Kurdan de, serê pêşîn ew kes e ku cî bi cî, war bi war digere û hem ji her derê berhemên gel ên folklorîk dixwe bîra xwe û hem jî çî kilamên dastanî, çî çîrokên lehengî û têkçûn û şahî û kêfxweşiyê kiribe mijara kilamên xwe û ew di kilamên xwe de anîbe ziman, careke dî jî derpêşî gel dike û bîra neteweyî geş û zindî dihêle. A duyem jî, dengbêj hunermendê gel e; hem di warê bîra borîroja gel de nimandina gel dike hem jî ew hunermend e ku li cem mîr û axayan xwedî qedr û qîmet e û di warê hunermendiyê de jî rewşenbîrê roj û dema xwe ye. Loma jî H. Azîzan, di nivîsara xwe de, yek ji hêmana sereke a çand û folklorê Kurdî, yanî du dengbêjan dike mêvanên Hawarê; û ji du aliyan ve nimandinê saz dike; yanî bi hêmanên herî xurt ên çand û folklorê nimandina çand û folklorê dide kirin û bi taybetî dastana Memê Alan bi wan dide gotin. Memê Alan dastana sereke û hevpar a neteweya Kurd e ku piştî ku Xanî ew dastan wekî Mem û Zîn û bi renekî dîtir nivîsiye û tê de çêla Kurdan, zimanê Kurdî kiriye. Loma jî, Herekol Azîzan jî, di ser dastana Memê Alan re hevpariya heyî car dî tîne mexderê û pê re jî hestê xwejêzanî û pêbestîbûna mirovan a ji bo çand û folklorê xwe, bi devê hunermendên gel dide gotin û pîrsa hebûniyê, ne bi gotinên qerase û ji jor ve, lê bi devê du dengbêjan dide peyitandin û bi rêya dastana hevpar nîşan dide û ew bi xwe jî ji hundirê zanava etnîk de bêjara xwe a neteweparêz ava dike.

Heke em di ser vê yekê re bidin rê em ê karibin bêjin; tiştê ku bi kirin, çalakî û sepandinên kovara Hawarê pêk hatiye, şoreşek e ku di warê bipergalkirinê çandî û

folklorî de pêk hatiye û ji ber ku aliyê wê î ekonomîk û sîstema rêveberiyê kêr maye, neteweparêziya Kurd bi qasî ku tê xwestin û tê armanckirin, li ser hîmeke xurt û qewîn rûnenîştiye.

Wekî dî jî, em bi hêsanî dikarin bêjin ku bi taybetî xebatên di warê ziman û folklorê de hatine kirin, her û her di kartêka îdeolojiya neteweparêziyê de bûne û digel vê jî, ziman û folklorê jî kartêk li îdeolojiya neteweparêziyê kiriye û di serî de ziman, her du jî bûne hêmanên sereke ên avabûn û bipergalkirina îdeolojiya neteweparêziyê. Loma jî, Ersoy dibêje, “Ji ber ku di nav çarçoveyêke dîrokî de teşe daye xwe, folklor ji aliyekî ve jî îdeolojîk e” (Ersoy, 2013: 59). Her wekî ku di qonaxên netewebûna gelan de ji folklorê kelk tê girtin, Hawar jî li ser ramana neteweparêziyê, bûye bizaveke ku folklorê Kurdî dike yek ji nîşaneyên zanava hebûna Kurdî. Û -digel zimanê Kurdî- ji bo lirastêdanîna hebûniya Kurd û zanava Kurd, di warê folklorê de jî, bêjareke neteweparêz ava dike û hewldanê dike da ku karibe qonaxa peyitandina hebûniyê biqulibîne ser qonaxa avakirinê.

3.7.5 Bîrûbaweriyên Olî

Di serdemên pêşmodern de, mirov di nav komikên civakî ên wekî bavikî, olî, etnîk, bajar-dewlet û împaratorî de dijîyan. Piştî geşedana modernîzmê, bi kartêka şoreşa Fransîz û şoreşa Endustriyê, îdeolojiya neteweparêziyê her ku çû berbelavtir bû û di gera dîrokê de gelek netewe-dewlet ava bûn û awayê jiyîn û pergala mirovan a jiyânî jî guherîn. Çendî ku modernbûn dualî û duberî ye jî; aliyek jê li xwe fikir armanc ku rû û berê xwe bide hemû dinyayê û aliyê duyem jî li xwe fikir armanc ku wekî civak; çand, ziman, ol û zanava xwe biparêze. Lê ev her du aliyên modernbûnê, ji alî îdeolojiya neteweparêziyê ve cî bi cî bi awayekî cihê hat bikaranîn û pêkanîn. Di demajoya avabûna hin netewe-dewletan de, raman û îdeolojiya neteweparêziyê ziman, welat, dîrok, çand, folklor, etnîsîte û ol, ji bo danîna pergala xwe wekî hêmanekê bi kar anî. Di vî warî de, hewl hatin dayîn ku dîrok, folklor, ziman û ol bîn yekrengkirin û standardkirin. Her wiha em dikarin bêjin; ev yekrengkirin ji bo diyarkirina cihêtiyên neteweyekê ên ji neteweyêke dî ji bo ramana neteweparêziyê tiştêkî bivê nevé ye. Loma jî Schnapper dibêje, “Netewe projeyêke siyasî ye; ew li xwe dike armanc ku cime‘eteke nû ava bike” (Schnapper, 1994: 157). Ev cime‘et,

cime‘eta hevvelatiyan e. Ji bo avakirina cime‘eteke bi vî rengî, êdî divê rengê vê cime‘etê û pêbestîya wê a civakî ne ol be, lê belê “divê ev pêbestî neteweyî be; yanî divê rengê vê cime‘etê siyasî be.” Navê rengê vê pergalê laîkî ye ku tê qalkirin. Laîkî; li ser dualiyê modernbûnê ku aliyek wê li xwe dike armanc ku çand, ziman, ol û zanavê biparêze, hatiye danîn. Lê belê ev yek di her netewe-dewletê de ne wekî hev û ji hev cihê hatiye pêkanîn. Ji ber hindê jî di avakirina vê *cime‘eta nû* de, ku navê wê wekî *cime‘eta hevvelatiyan* hatiye lêkirin, teksîriya tu tiştêkî nayê kirin û bi taybetî sazî û kevneşopiyên olî ên ji berê de mayî an ji navê tîr rakirin an jî ji nû ve, li gorî sazkeriya cime‘eta nû tîr birêkûpêkkirin. Ev yek ji bo ku pergala dilsoziyê a îdeolojiya netewe-dewletê bê danîn, tê pêkanîn. Loma jî hin netewe-dewletan bere xwe didin parçekirina pergalên dilsoziyê ên berî xwe. Di vî warî de, pêkanînen Komara Tîrkîyeyê, ji bo vê projeye û ji bo avakirina neteweyeke nû, wekî mînaekeke berbiçav li rastê ye. Wekî nas e, piştî rûxîna Dewleta Osmanî, K.T.yê şên bû. Piştî danîna komarê jî, xwedîdarî (otorite) û saziyên kevneşopî ên olî hatin feşilandin û ji navê hatin rakirin. (T.C. Resmi Gazete-13 Aralık 1925) Ev yek ne ji bo ku ola neteweyekê bê parastin hat kirin. Ev yek; ji bo ku êdî ol û pergala olî, ji wê gavê û şûnde ji bo îdeolojiya neteweparêz a netewe-dewleta nû xizmetê bike, hat bicîanîn. Loma jî, di rastiya xwe de a ku ji navê dihat rakirin, ne ol bû; a ku ji navê dihat rakirin, sazî û pergalên olî û dilsoziya bo wê heyî bû. Ji ber ku, gava em li demajoya piştî jinavêrakirina van saziyan dinêrin, em dibînin ku piştî saziyên dîtir ên olî hatine avakirin di nav pergala nû a komarê de. Heke em di ser pîrsa; “gelo neteweparêzî olek e?” li gelemşeyê binêrin, em ê karibin bêjin ku; neteweparêzî ne ol e. Her wekî Gellner gotî, “(...) neteweparêziyê civakan berveyî homojenîzasyoneke çandî tan daye û bi vî awayî, ji bo ku karibe di nav civaka endustriyî de xwe bi rêxistin bike, rêgezeke kêrhatî bi dest xwe ve aniye” (Gellner, 1992: 12). Heke em li ser vê gotina Gellner pê de biçin em ê karibin bêjin, gengaz e ku raman û pêkanînen neteweparêziyê bi awayekî hişk têkeve hewla homojenkirinê (yekrengkirinê) û rengê olê bide xwe.

3.7.5.1 Ranêzikiyên Di Warê Olê De

Hawar, di warê biwara olê de jî xwe nedaye alî û di hin waran de ranêzikiyên xwe aşkera aniye biwara xwendewarî û nivîskariyê. Lê belê, ev ranêzikî, ne ji bo ku ol di destê raman û îdeolojiya neteweparêziya Kurd de bibe destikê kêrê hatiye nîşandan. Ranêzikiya ku ji bo olê hatiye nîşandan, heta tu bêjî bes di ser rastiya civakê û rewşa heyî re ye. Û nihêrîna li cografyaya Kurdan jî di ser awirê qebûlkirina pirolî re ye.

Danerê Hawarê C. A. Bedirxan, ji bo ku balê bibe ser taybetiya cihêbûna Kurdan a ji neteweyên dîtir wiha dibêje, “Ji ber qo milletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan bi keweta çeqan diparêzînin: O1 yeq, Zman dudo. Lê heqe ola milletê serdest û bindest yeq bibe, hingî çeq yeq bitenê ye û bend tenê zman e” (Hawar, 1998: 405). Celadet, bi van gotinên xwe, ji bilî ku balê dibe ser zimanê Kurdî, aliyekî dî ê rewşa heyî jî datîne rastê. Ew jî hevoliya Kurdan û serdestên wan e. Û ew hem ne bendewar e ku dê milletên serdest di ser yekbûna cime‘eta olî re heqê Kurdan jî li wan vegeerînin û *cime‘eta mezin* ku tê xwestin ava bibe û hem jî ne li ser wê ramanê ye ku ol yek ji wan hêmanan e ku mirov wê ji bo aqûbeta xweş a ramana neteweyî bike destikê kêrê. Tevî ku Kurd bi rêjeya ji sedî 95 misilman in û bîrûbaweriyên wan ên olî û ên serdestên wan yek e jî, ew hay jê heye ku bîrûbaweriyên olî heta wê hingê her tim berevajî li ser Kurdan hatiye bikaranîn. Wekî serencama vê deravê em dikarin bêjin ku; ew ne li ser wê fikrê ye ku nimandina neteweya Kurd di ser yekbûna cime‘teke olî re bê kirin û loma jî hewldaneke wî a bi vî rengî nade der. Celadet pê de diçe û wiha dibêje, “Halê me qurdan ev e. Em qetine bin destê se millet û dewletên misilman, piraniya me ji misilman e, em û serdestên me ji oleqê, ji dîneqî ne. Her sê jî xebateqe zor dixebitin qo me têxin miliyeta xwe” (Hawar, 1998: 405). Em ji gotinên wî bi zelalî fam dikin ku; serdestên Kurdan di nav hewlekê de ne û meylê dikin ku Kurdan wek cime‘eteke cihê û neteweyî nebînin. Loma jî dê ne gengaz be ku Kurd karibin yekbûna xwe a wekî *cime‘teke mezin* a di ser olê re ava bikin. Celadet, bi van gotinên xwe ve, di rastiya xwe de, amaje bi xweseriya ol dike û bêjara xwe a neteweparêz di biwareke derolî de ava dike.

Dîsan Qedrîcan, di nivîsa xwe a bi navê ‘Gelo ne wisan e?’ de, di ser derketina Hawarê re, rewşa Kurdan bi du xalbendan vedibêje. (Hawar, 1998: 204). Di xalbenda yekem de, wiha dibêje, “1-Mirovên qurdmanç qo dixwînin, xudan îlm û xudan cih dibin, li paş xwe vedigerin û li milletê xwe dinêrin milletê xwe pir li jêr dibînin, ji bona ihtirasta xwe a şexsî û heywanî, li wî milletî nabine xwedî û dibêje: «ez ne ji wî milletê qurd im.»” Qedrîcan, bi van gotinên xwe, ji hêla berevajî de li gelemşeyê dinêre û dîsan di ser vê yekê re, behsa hestê xwekêmdîtîne dike ku ew jî dîsan li pêşberî gel û neteweyên dîtir çêdibe. Û ew vê rewşê, ji hundir de û di biwara jihevbûnê (hevnetewebûnê) de rexne dike. Qedrîcan piştî jî, di xalbenda duyem de, wiha dibêje; “2-Miletê qurd, di pêyî muslimanyê re, ji her miletan bêtir, ola xwe ajotin ji murşîdê xwe û her çend milletên musliman hene, bi çavê biraên mezin li wan mêze qir. Lê sed esef wan bi çavên şefketê li me mêze neqir in. Di hekê me da piropaxanda çêqirin; gotin «Miletê qurd ji taîfa ecîna, û mutriban e, Qabiliyeta tu tiştî di wan de tune ye»” (Hawar, 1998: 204-205). Qedrîcan, di van gotinên xwe de, balê dibe ser du awiran. Awirê yekem, diçe ser ranêzikî û xwedîflêkirina Kurdan a bo misilmaniyê (mebest ji ola ku piraniya Kurd jê ne). Qedrîcan, li vê derê amaje pê dike ku di civaka Kurdan de, ji hêla olî ve, di hişê Kurdan de, avabûna *cime‘eta mezin* ji zû de pêk hatiye û loma jî Kurdan hewcetî pê nedîtiye ku di vê cime‘etê de li ser wateya *jêcihêbûnê* rawestin û pê ve bimînin. Awirê duyem jî, diçe ser ranêzikiya neteweyên dîtir ku Kurdan *bi çavê birayên mezin* li wan mêze kiriye, lê belê wan *bi çavên şefqetê* li Kurdan mêze nekiriye. Heke ev rexneya gazincî di ser hêmanên dîtir re; hêmanên ku di avakirina neteweyekê de hêmanên sereke ne, bihata kirin, me yê karibûya bigota rexne jî gazinc jî ne di cî de ye. Lê belê rexneya hatî kirin, di ser hebûna dilsoziya Kurdan a ji bo *cime‘eta mezin* re ye. Her wiha, Qedrîcan di domana xalbenda duyem de wiha dibêje, “Heta, piropaxanda di wan li milletê me jî tesîr qir. Ji lewra zana û mezinê me ji qurdmançiyê dûr reviyar, bûne pêşdarê îlm û îrfan, mêranî û her tiştên milletê biyanîyan.” Qedrîcan li vê derê rexne li melayan dike ku ji tebeqeya entelîjensiyaya civaka Kurd in û balê dibe ser pîrozweriya Erebi ku di ser zimanê Qur‘ana pîroz re pê re çêbûye û melayan ji bo xatirê Qur‘anê Kurdan dev ji Kurdî berdaye û meyla xwe dane ser Erebi û tê de xebitîne. Gava em her du xalbendan digel hev bifikirin, em ê dîsan biçin ser gotina Anderson ku dibêje, “Ziman, di avakirina her cure cime‘etê de –*cime‘etên olî û neteweyî jî tê de (d.d.)*- bi

roleke avakar radibe” (Anderson, 1995: 27). Loma jî, bêjara ku li vê derê tê avakirin, di ser propagandayekê re ye ku bi gotinên, “Miletê qurd ji taîfa ecîna, û mutriban e, Qabiliyeta tu tiştî di wan de tune ye” tê kirin. Ev gotinên hanê, vebeyîna bêjarên neteweyên dîtir ên misilman e ku siya xwe daye ser neteweya Kurd. Qedrîcan, bi van gotinên xwe ve, ji aliyekî dî ve jî balê dibe ser vê yekê û dixwaze bêje; ji bo pêşlêgirtina demajoya netewebûna Kurd, endamiya Kurdan a ji bo *cime'eta mezin* heyî, bi awayekî xerab tê nîşandan; dilsoziya wan a ji bo *cime'ta mezin* re heyî li çerxa lêpirsînê tê xistin û di ser vê yekê re jî hewl tê dayîn ku Kurd xwe nedin ber hêmanên xwe ên etnîkî û neteweyî û ji bo dilsoziya *cime'eta mezin* bi xwepeyitandinê re mijûl bibin.

Cegerxwîn bi nivîsara xwe a bi navê Rastiyê Bibêjin Çendî Ko Li Ser We Be Jî (Hawar, 1998: 508) ku bi tîpên Erebi hatiye nivîsîn, bang li melayên Kurdan dike û balê dibe ser wan ku di pêşketina civaka xwe de bi rola xwe a olî ranabin û di aqûbeta neteweya xwe de ciyekî baş nagirin. Her wiha, tiştê ku li vê derê serê pêşîn bala me diçe serê ew e ku; Cegerxwîn bi xwe jî mela ye û banga xwe li feqî û melayan dike ku ew bi xwe jî endamekî wê çînê ye. Cegerxwîn, serê pêşîn awayê têkilîdanîna melayên Kurd a bi civaka xwe re rexne dike û wiha dibêje, “Lewra şêx û melayên me rojekê ji me re nabêjin ko ji xwe re dibistan û medresan çêkin.” Ew melayên Kurdan, ne tenê wekî nûnerên olî dibîne, her wiha wekî nûnerên rewşenbîrî û seydatiya civakê jî dibîne û bi hêviyekê gazî li wan dike. Cegerxwîn, pêşî dipirse û dibêje, “Çiman em serbilind nabin?” piştî jî ew bi xwe dibersivîne pirsê xwe; “Lewra em wekî xelkê ji hevalê xwe en belengaz re bi dilxweşî civatan çênakin. Melayên xelkê bi tevayî civat û xebatê ji milletê xwe re dikin, peran dicivînin, belengazê xwe pê xwedî dikin. Em, melayên kurdan ji belengazê milletê xwe dixwun û nadin.” Cegerxwîn ji vî aliyê ve helwesteke Koyîyî (H. Q. Koyî) dide der. Loma jî, berî ku rexne li pêkanîna û siyaseta deshilatên derveyî û neteweyên dîtir bike, serê pêşîn kêmasiyê di giregir û rewşenbîrên civaka xwe de dibîne. Cegerxwîn, di heman demê de balê dibe ser pirsê zimanê neteweyî û zimanê olî. Çendî ku Kurd di warê endamiya *cime'eta mezin* de bi xwe re nakevin tu gelemşeyan jî, bi a Cegerxwîn sedema ku Kurd di dinyayê de dercivak mane yek jê jî zimanê olê ye. Ew wiha dibêje, “Em şanzdeh salan dixwînin, hêj nizanin erebî mijûl bibin û nikarin çend xeberan bi erebî binivîsînin û zimanê xwe jî ji bîr dikin û nizanin bixwînin.” Ev awa

bêjar, yekser xwendina bi zimanekî biyan sedema şûndemana civakekê qebûl dike û balê dibe ser zimanê neteweyî. Jixwe Cegerxwîn, di vê balbirinê de zêde xwe eware nake û bêjara xwe a di vî warî de wiha tamam dike; “Lewra em gazina ji mêla û xwendewarên xwe dikin. Heta nuka ji me re kitêb bi zimanê me nenivîsîne, bi şûn xwe de hiştine. Hind û Efxan û Îran bi zimanê xwe dinivîsîn; çima em bi zimanê xwe nanivîsîn?” Van gotinên Cegerxwîn rasterast û car dî bala me dibe ser gelemşeya zimanê *cime'eta mezin*. Cegerxwîn pirsgirêka zimanê olê û zimanê neteweyî di bêjara xwe de ava dike û ji rengê rexne û gazincên xwe jî dide der ku ew alîgir e ku zimanê olê û zimanê neteweyî ji hev biqetin û zimanê olê li zanîn û xwendina civakê nebe berasteng û bila ciyê xwendina bi zimanê olî û ciyê xwendina bi zimanê neteweyî ji hev cihê be û Cegerxwîn bi van gotinan, di warê têkiliya ol û neteweyê de, bêjara xwe a neteweparêz bi vî rengî saz dike û dide der.

Kovara Hawarê, ji bilî ola Îslamê ku piraniya Kurdan li ser wê olê ne, bala xwe biriye ser ol û bîrûbaweriyên dîtir jî. Feqîrê Telqînbej, di nivîsara bi navê Telqîna Êzdiyan de, agahiyên li ser telqînxwendina Êzdiyan dide. (Hawar, 1998: 1062). Digel wê jî, balkêş e ku di dema derketina hafa lêpirsîna roja axiretê de, pirsên ku dê ji mirovekî Êzdî bîn pirsîn û bersiva ku ew ê bide li dû hev tên dayîn. “Mirîd, kesol Telqîn e, asin e. Wê beye ser te nikl û nikin e, Wê pirs bikê, bêjê tu j'kijan ol e. Tu bêje ez î êzdî me. Bi Mûsa pêxember re derketime serê Çiya Tûresin e; Bi Îsa pêxember re çûme Quds û Xelîl e. Bi Mihemed pêxember re çûme Meke û Medîne.” Bi tevî bersivan, naveroka bersivan jî balkêş e ku; di hafê de, berî ku pirsên takekesî bîn bersivandin, qebûlkirineke hemû olan wekî bersiva *kîbûnê* xwe dide der. Yanî, piştî ku kesê derketî hafê, piştî ku bîrûbaweriyê xwe a olî dibêje, di heman demê de jî, wekî divêtiyeke hebûniyê, xwe ji hemû olan dihesibîne û *xwejêzanîneke* mirovane ava dike. Em bi vê nivîsarê careke dî jî dibînin ku pirsê ol û netewe di warê avakirina bêjara neteweyî a di Hawarê de wekî arîşeyeke girîng xwe nade der û bîrûbaweriyê olî nabe alava avakirina bêjara neteweyî.

Dr. Kamûran A. Bedirxan, di nivîsara xwe a bi navê ZERDEŞT Û RÊYA ZERDEŞT de, agahiyên li ser baweriyê zerdeştî dide û bi gotinên, “Navê kitêba zerdeştiyan Avesta ye. Nivîsevanê wê Zerdeşt e.” (Hawar, 1998: 675) diyar dike ku dema nivîsîna vê kitêbê bi ewleyî hêj nehatiye diyarkirin. K. Bedirxan, di berdewama gotina xwe de, destnîşan dike û dibêje, “Zerdeşt ji me ye û îro di Kurdistanê de hin

kurd hene ku pê bawer in. Ew Eyzedî ne.” Helbet girîng e ku K. Bedirxan digel ku hejmareke zêde ji sedî Kurd misilman in jî, agahî dide ku hin Kurd hene ku baweriyên wan ên olî zerdeştî ye. Û bi peyveke Bedirxan bala me diçe ser têgihên *xwejêzanînê* an jî *jixwehesibandinê*. Bedirxan, bi gotina Zerdeşt ji me ye, jixwehesibandinekê ava dike û bêjareke ku di warê olî û bîrûbaweriyê de jî cihêtiyê nexwe nav gelê (neteweya) Kurd ava dike. Di vê bêjarê de ku bi temamî û bi binecihî li ser neteweparêziyê ava bûye, *cime‘eta mezin* cime‘eta neteweyî, yanî Kurdbûn e. Loma jî, bawerkirina hin kurdên ku navê wan Eyzedî ne, nabe berasteng li ber Kurdbûna wan. K. Bedirxan, pê de diçe û di ser bîrûbaweriyê zerdeştî re, bêjara xwe a neteweparêz bi van gotinan digihîne asta jorîn; “Ji ber ko zanayê Kurdistanê ê berê Zerdeşt bû, ji bo me zanîna binyan û qeydeyên rêya Zerdeştî çak e. Ji vê zanînê medeniyeta me a kevn, bilindî û kêrhatiya hişê me, dilpakîya MILETÊ KURD xuya dibe.” Ev gotin, bi temamî hem ji alî dîrokîbûna bîrûbaweriyê Zerdeştî ve hem jî ji alî gihajî û jêbûniya wê ve, yanî ji alî etnîsîteya wê ve -ku îro roj nav lê netewe ye-, bêjareke neteweparêz e. Ji ber ku serê pêşîn Zerdeşt *zana* ye, pê re jî xwedî *qeydeyên binyan* e, digel van jî pê *medeniyeta me a kevn peyde bûye* û dawîya dawî jî *kêrhatiya hiş û dilpakîya Miletê Kurd pê xuya dibe*. Li vê derê hewce dike ku em careke dî jî bala xwe bidin Palmer ku dibêje, “Tiştê ku piştê dide ramana jineteweyekêbûnê û zanava neteweyî car dî hildiberîne, ramana yektabûn û wekhevîbûnê ye” (Palmer, 2007: 279-298). K. Bedirxan, yektabûna ku Palmer çêl dike, bi temamî dide ser Zerdeşt û her wiha bi gotina *ji me ye* jî par ji bo neteweya ku a me ye çêdike û bêjareke neteweparêz ava dike.

Ji aliyekî dî ve, gava em ji awirê cime‘eta mezin re li ranêzîkiya Hawarê a bo heyîna olan dinêrin, em dibînin ku qebûlkirineke xuya û rûniştî heye di warê ola Îslamê de. Ji ber ku gava Celadet A. Bedirxan elfabeya bi tîpên Latînî bo nivîsîn û xwendina zimanê Kurdî datîne, hin nerazîbûn tên nîşandan û tê gotin ku tîpên bêyî tîpên Qur’anê (tîpên Erebi) heram in bo Kurdî. Celadet bêyî ku vê yekê bi neyînkirinekê û hişkiyekê biparêze û bide qebûlkirin, radibe serî li Şêx Evdîrehmanê Garîsî dide. Li ser vê yekê Şêx Evdîrehmanê Garîsî fewtwayekê derdixe û bi gotinên, “Bikaranîna tîpên Latînî bo Kurdî tîp ne heram in.” (Aydoğan, 2009: 12) fetwaya xwe belav dike. Ev reftara ku Celadet nîşan dide, reftareke taybet e; ji ber ku ew hewl dide ku li ba cime‘eta hundirîn razîbûnekê hundirîn û pê re jî razîbûn û

qebûlkirineke neteweyî çêbike. Çendî ku mirov dikare bêje, di vê yekê de, dîsan ola Îslamê û hêmanên wê ên ji pergalên dilsoziyê hatine bikaranîn jî, ji ber ku ev yek ne li dijî gel û neteweyên dîtir ên ne misilman in pêk hatiye, di hundirê xwe de taybetiyekê jî dihewîne. Vê taybetiyê rengkî xwe î xweser ê sekuleriyê heye. Ev reng sekulerî ol û civakê ji hev naqetîne; berevajîya wê, nûtî û guherînxwaziyê di nav pergalên dilsoziyê de ku ji bo olê heye, digihîne çareseriyekê.

Her wiha, dîsan Kamûran A. Bedirxan, ji hejmara 27an heta bi hejmara 57an (hejmara dawî), ayetên Qur'ana pîroz û hedîsên pêxember werdigerîne Kurdî û bi elfabeya Kurdî a bi tîpên Latîni belav dike. Ev reng ranêzikî û pêkanîn, du tiştên girîng bi xwe re tîne: 1) Ji aliyekî ve, hişkebaweriya Kurdan a ku li ser tîpên Latîni ava bûye, nermtir dike û zimanê Kurdî û bîrûbaweriyên wan ên olî nêzî hev dike. 2) Ji aliyekî ve jî, di ser bîrûbaweriya olî re, dûrketina Kurdan a ji zimanê xwe dişikêne û dike ku nêzîkahiyeke hestî û ramanî çêbibe di navbera her du hêmanan de –ew her du hêman zimanê Kurdî û Erebi ne- ku girîng in ji bo pêkhatina neteweya Kurd.

3.7.6 Ziman

Ziman, navgînek e ku mirov ji bo xwegihandina mirovê dîtir, ragihandina tişteki bo wî mirovî an jî wergirtina tişteki ji wî mirovî, vê navgînê bi kar tîne. Her wiha, ziman, bi vê taybetiya xwe a duhêlî ve, hem xwe heyî dike û hem jî heyîna mirovê dîtir qebûl dike û datîne rastê. Ziman, hem ji alî kesîdeyê û hem jî ji alî civakê ve girîngtirîn serçavî ye; ji ber ku di teşegirtina zanava kesîde û civakê de bi rol û kargîniyên girîng û mezin radibe.

Wekî di jî, hêla civakîbûna zimên heye ku di biwara raman û îdeolojiya neteweparêziyê de jî lêkolîn li ser hatiye kirin. Di van lêkolînan de, pîrsa, ‘gelo ziman neteweyan diyar dîkin an jî netewe zimanan diyar dîkin’ zaltir bûye. Ji ber ku taybetiya zimên a jihevcihêker, ji alî ramanwerên neteweparêziyê ve wekî encameke pêkanîna îdeolojiya neteweparêz hatiye qebûl kirin ku Abercrombie dibêje, “Ji ber ku neteweparêzî, hem bi avaniyên kollektîv ên wekî ol û ziman bi xwedî dibe hem jî digel rengê xwe î etnîsît ku hem jihevcihêker e hem jî jihevker e, hestê jihevcihêbûnê bi kesîdeyan re çêdike” (Yanik, 2013: 20-16). Her wiha, ji kîjan hêlê ve lê bê nihêrîn jî, tiştê ku aşkera li rastê ye ev e; ziman di jihevcihêbûna neteweyan de hokareke

girîng e. Ev jihevcihêtî her wekî Akarsu dibêje, “Digel ku ziman dihêle ku netewe ji hev cihê bibin jî” (Akarsu, 1994: 52) her zimanek xwedî teşe û formekê ye ku Humboldt ji berevajiyê ve li pirsê dinêre û dibêje, “Netewe jî teşe û formên xwe ên neteweyî didin zimên” (Akarsu, 1994: 52).

Hemin ku her ziman xwedî jêderkekê ye, tevî ku wek mêtû neyê zanîn ka zimanê yekem kîngê zaye jî, bêguman her zimanek xwedî dîrokekê ye. Gera dîrokê a van zimanan, digel hevkartêkiya ziman û kesan, teşeyek daye zimanan û her wekî Akarsu dibêje, “Avabûna teşeya yekemîn a zimanan kiriye ku netewe ji hev cihê bibin” (Akarsu, 1994: 51). Ev jihevcihêbûn sedemeke mezin û girîng e ku her neteweyek, di biwara zimên de bibe xwedî mîrateyêke cihê jî. Çawan ku Humboldt jî dibêje, “Ziman ne berhemeke çêbûyî û qediyayî ye, ziman çalakiyek e” (Akarsu, 1994: 9) ev çalakî ku navê wê ziman e, di ger û demajoya dîrokî de, bi her pêkanîne re, hem rengêkî taybet dide xwe û hem jî dide civakê. Ji ber ku ziman her cara ku tê berhênandin û wek çalakiyekê tê bicîanîn, di hiş û bîrê de cî dide xwe û di ser hokarên ku jiyanê diyar dikin re, rengê neteweyê, yanî rengê civaka mezin diyar dike.

Ji hêla dî ve, Herder dipirse û dibêje, “Gelo ji bo neteweyekê, tiştêkî ji zimên hêjatir û giranbihatir heye ku ji bav û kalê wê maye jê re? Di nava zimên de, hemû nerît û kelepûr, dîrok, ol û rêgezên hebûnî (û xwebûniyê) dijîn; ziman dil û giyan e” (Özkırımlı, 1999: 15). Zimanê ku ji borîrojê tê û di nava îrorojê re dibihure û berveyî siberojê diçe, di nav mirovên ku pê diaxivin de, mîna ku Porzing jî dibêje, “Di her zimanî de dinyabîniyêke taybet heye” (Porzig, 1974: 55) dinyabîniyêke hevpar ava dike. Ev dinyabîniya hevpar ku bi kartêka zimanê hevpar ava dibe, rengêkî taybetî xwe dide neteweyê; ev reng di heman demê de dike ku ziman jî bibe xwedî rengêkî arizî xwe. Ziman bi van yekan re jî dibe hokara herî girîng ku civaka etnîkî vediguherîne ser neteweyê.

Her wiha, pênaseya Herder a mirovbûnê jî balkêş e ku dibêje, “Mirovbûn ew wate ye ku zimanekî te heye û tu di nav civakê de dijî” (Özkırımlı, 1999: 34). Herder, zimên bêyî mirov û di biwareke dermîrovî de nahizire û rengûawayên mirovbûnê bi zimên ve dibestîne. Heke em ji vê pênaseya Herder bidin rê, em dikarin bêjin; ziman di ser hewcetiya mirovbûnê re dibe hokara takekesbûnê; û ziman di heman demê de reng û teşeya xwe dide kesîdeyê jî. Loma jî, her kesîdeyek

di ser zimanê yekreng û yekteşebûyî re xwe digihîne mirovên dîtir ên civaka xwe û dinyabîniya hevpar jî, di ser vî zimanê yekrengbûyî û yekteşebûyî re ava dibe. Ji aliyê dî ve Humboldt jî balê dibe serê û dibêje, “Ziman, çemberek li dora gelê ku gihajî wî ye çêdike, ancax gava kesek bikeve nav çembereke dîtir dikare ji nav vê çemberê derkeve” (Kılıç, 2010Ç 51). Heke em li ser vê gotina Humboldt bimînin, em ê karibin bêjin, nexwe sînorê ku cihêtiya jiyana gelên etnîkî diyar dike, serê pêşîn bi zimên ava bûye. Û vî zimanê ku di nav çemberê de ye hiştiye ku hevpariyê çandî û jiyani jî pêk bê. Her wiha, vê hevpariyê di heman demê de cihêtiya neteweyekê ji neteweyên dîtir jî diyar kiriye.

Smith, di vî warî de dibêje, “Girîngiya neteweparêziyê a li ser îdeolojiya taybet û sembolan, amaje bi wateyê kûrtir, amaje bi raman, ziman û hişberiyê dike” (Smith, 1994: 136). Li vê dere, bala me diçe ser sê hêmanan; raman, ziman û hişberî ku di demajoya avabûnê de kartêkê li hev dikin û ji hev dixwin. Smith, neteweparêziyê wekî tevdehiyê lêferzkirinan nabîne û loma jî cî û keysê dide ramanê ku bi rêya zimên hişberiyekê ava dike. Her wiha, her wekî ku Kılıç jî diyar dike û dibêje, “Li gorî pergala hizirîna Humboldt, di navbera ziman, raman û karaktera neteweyî de pêbestîyê organîk û jihevneqet heye” (Kılıç 2010: 48) ziman ji bo neteweyekê berî her tiştî sembolek e; semboleke karakterîstîk e ku di avakirina zanava hevpar de xwedî kartêkeke girîng e. Her wiha, ziman sembola avabûna hişberiya ‘em’ê ye jî. Ev hişberiya ‘em’ê, bi yekteşeyîbûna ziman gengaz e ku zimanê yekteşeyî ku em behsê jê dikin, zimanê devkî û qisekirinê ê neteweyekê ye ku ji ger û qonaxên dîrokê, bi rêya çand û kelepûr û banekî û pêkanînên jiyane, heta roja îroyîn hatiye. Jixwe Humboldt jî vê yekê wiha destnîşan dike û dibêje, “(...) Karaktereke ziman a diyar heye; her wisan netewe jî ne di kelepûr, banekî û kirinan de, lê di zimên de berbiçavtir dibe” (Kılıç, 2010: 47).

Li gorî vê destnîşankirina Humboldt, netewe bi awayekî berbiçav di cihêtiya zimên de xuya dibe. Ji ber hindê jî, dibetiyek tê de heye ku neteweparêzî jî bibe teşeyek û rengê ji vê cihêtiya ku bi hayjêbûnê derdikeve rastê. Smith gava pênaseya naverokî a neteweparêziyê dike, wiha dibêje, “Neteweparêzî ji dîtane (doktrîn) û şewaza siyasî zêdetir, teşeyê çandî ye; loma jî neteweparêzî teşeyê îdeolojî, ziman, mîtolojî, simbolîzm û hişberiyê ye. Netewe jî, di vî warî de, dirûvekî zanavê ye ku wateya wê ji alî teşeya vê çandê ve ji pêş de tê ferzkirin” (Smith, 1994: 147).

Loma jî, neteweyîbûna zimên û têkiliya ziman û neteweyê a bi hev re, mijareke sereke ye di lêkolînên ku li ser neteweparêziyê hatine kirin. Û rastiyeke e ku kartêka ziman û neteweyê a li ser hev, bi awayekî beranberî pêk tê.

Schleicher dibêje, “Divê di warê jihevcihêbûna mirovan de, xuyakirinên derveyîn ên wekî dirûvê qoqê, rengê por û hwd wekî pîvan neyên qebûlkin –ji ber ku ev hemû ne tiştên neguher in- û divê di vê jihevcihêbûnê de, ziman wekî hêmana hîmî û sereke were qebûlkin. Jihevcihêbûna mirovan ku li ser zimanan e, jihevcihêbûna herî xwezayî ye” (Akarsu, 1994: 51). Nexwe, em dikarin pirsekê ava bikin û bêjin; ‘gelo di vê têkiliya beranberî hev de, giyanekî çawan û bi çi rengî çêdibe ku rengê xwe dide kesê de û mirovên ku di heman *civaka mezin* de dijîn?’ Serê pêşîn em ê bala xwe bidin Fichte ku dibêje, “Ziman giyanê neteweyî vedibeyîne” (Özkırımlı, 1999: 35). Heke em hinekî li ser lêkera ‘vebeyandin’ê bimînin, em ê karibin bêjin; vebeyandin derbirana taybetiyekê ye; û her wiha dibe ku ev vebeyandin di nav gelek taybetiyan de derketibe pêş û bêtir hatibe xuyakirin. Loma jî, heke em di ser vê gotina Fichte re bihizirin em ê karibin bêjin ku ev vebeyandin ne beranberî xuyangeke rengûawayî ye. Belkî parçeyekî ji rengûawayê heyî ye. Herçî Humboldt e, wî wekî qadeke giyanî jî xebat li ser ziman kiriye û di vî warî de dibêje, “Ziman di heman demê de xuyanga derveyîn a giyanê neteweyê ye; zimanê neteweyê giyanê wê ye, giyanê wê jî zimanê wê ye” (Akarsu, 1994: 52) Çendî ku Humboldt jî di ser xuyangê re bala me dibe têkiliya di navbera ziman û neteweyê de heyî jî, gotina wî a “zimanê neteweyê giyanê wê ye, giyanê wê jî zimanê wê ye” gumana me a ku li ser têkiliya ziman û neteweyê çêdibe, dişikîne û bi bivênevêtiya ku ava dike, rengê giyanê ziman û giyanê neteweyê di biwarekê de dike yek. Loma jî êdî em ê karibin bêjara neteweparêz ku di vî warî de hatine afirandin, xweşikî raxînin mexderê.

3.7.6.1 Bêjara Neteweparêz Di Biwara Ziman De

Di Hawarê de, herî zêde li ser ziman dîtin û boçûn hatine gotin û nivîsîn. Di gelek biwaran de; ji alî hevrengebûna wê a giyanî û ramanî, ji alî çand û folklorê ve, ji alî wêjeyî ve, ji alî dîroka wî û taybetiyên wî ên zimanî û zimanzaniyê ve, nivîsarên cure cure û helbest hatine nivîsîn. Yek ji wan nivîsaran, nivîsara gernameyî-çîrokî a

bi navê Şêranîya Zmanê Qurdmancî a Celadet A. Bedirxan e. Celadet, di vê nivîsarê de, ji bo kovara Hawarê gerekê bo Bêrûtê dike. Ew bi gotinên, “Xelq di ber min le dibihurîn. Pîr û ciwan, jin û mêr, dewlemend û belengaz.‘; ji her rêzê, ji her rayî, ji her nijad û miletî” (Hawar, 1998: 163) dixwaze bêje, gelek reng û awayên mirov li Bêrûtê hene; û bi vê qada teng jî namîne û bi gotinên, *ji her rayî, ji her nijad û miletî*, bi taybetî balê dikişîne ser jihevcihêtiya nijad û neteweyên dî; û serê pêşîn jihevcihêtiya heyî bi qebûlekê û bi balkişandinekê datîne rastê. Di gera Celadet de, çend xort li kolanê lê der dibin. Celadet wan, bi gotinên, “(...) çend serîyên bi qum û destmal li min der bûn.” rengûawayê jiyana wan kesan bi me dide hisandin ku em têdigihîjin ew bargir in. Piştî ku ew û Celadet hev dinasin û çend gotin bi hev re dipeyivin, tevî ku Celadet jê dipirse “-Xorto, tu xelqê qû derê yî?” û tevî ku xort bi devoka ji Bedlîsê qise nake jî dibêje, “-Ez xulam ez Bedlîsê me.” Celadet lê vedigerîne û dibêje, “Ma çire dibêjî qo bedlisî yî, ji zmanê te qifş e qo tu ji dora Mêrdînê yî.” Li ser vê yekê, xort dibêje, “Belê, xebera te rast e, lê ez eslê xwe dibêjim. Ez bedlisî me, lê di mihacirîyê de derqetim...” Xort, piştî van gotinên xwe ji Celadet dipirse, “(...) ma ez xulam tu ji qûjan welatî yî ?” Celadet, piştî vê pirsê xort, bersiveke ne pir balkêş lê kartêkker dide xortî û dixwaze bila xort bi xwe tê derxîne. Belê, xort Botfûna Celadet tê derdixîne. Li vê derê tiştê ku Celadet dide der û dixwaze balê bibe ser û bi vê diyalogê aşkera bike, yekrengiya giyanê zimanekî ye ku ji gelek rengan pêk tê. Û digel vê jî, hem Celadet û hem jî xort vî zimanî bi heman awayî bi nav dikin û dibêjin, “Qurdmancî.” Pê re jî, xort di nav pevaxaftinê de dibêje, “(...) Ax ez xulam, tu nizanî qurdmancî çikas şêrîn e” (Hawar, 1998: 164). Celadet, bêyî ku şîroveyekê bike an jî gotina xortî erê an jî na bike, ji xort dipirse, “Na herê. qurdmancî qîngê bûye şêrîn?” Xort, bi dengê xwe î ji giyên tê dibêjiyê, “Bi serê te ê ezîz, tu zman weq qurdmancî ne şêrîn e. Ez bi tirqî rind nizamim, lê min ew gelekî bihistiye. Li Irakê min erebî û ingilîzi gelek bihistine. Li Sûriyê her rûj erebî û Frensizî dibihîsim. Ez van datînim ber hev û dibinim qo şêranîya zmanê qurdmancî di tu wan de nîn e.” Ev gotinên ku xort dibêje, ne ên xortî ne ne jî ên Celadet in ku dixwaze bi devê wî mebesta xwe bigihîne xwendevanan. Ev dengê ku di gotinên xortî de diheve dengê giyanê zimanekî ye; ku navê wî Qurdmancî ye. Celadet, vî dengî û vî giyanê ku di təkiliya zimên û netewe a bi hev re de gihane hev û regekî ji yekrengiya arizî xwe girtine, bi me dihisîne û bi rêya gotinên, “Li Irakê min erebî û

ingilîzi gelec bihistine. Li Sûrîyê her rûj erebî û Frensîzî dibihîsim” jihevcihêtiya zimanan û her wiha a neteweyan jî datîne rastê û bêjara xwe a neteweparêz di ser zimanê giyên û giyanê zimên re ava dike.

Dr. Kamûran A. Bedîrxan, di nivîsara xwe a bi navê, Edebiyata Welatî de, (Hawar, 1998: 27) pêşî bi gotinên, “Piraniya miletan pîrî car ve rastiyê seh ne diqirin, ber ne diqetin. Li ewropayê, miletin hebûn qo hej zmanên xwe ne deqirin. Zmanên xwe qîçiq, teng, nespehi û nehêja didîtin.” girîngiya zimanê dayikê çêl û behs dike. Piştî jî, dîsan ji qonaxa Ewrûpiyan mînakê dide ku ew pê hisiyane û girîngî dane zimanê xwe û bi gotinên wekî, “bajarî, gundî qo xwendinê zani be, zmanê wan seh diqirin, û qitêbên wan dixwendin...” û bi gotinên *bajarî, gundî* û bi gotinên *zimanê wan* balê dibe ser zimanê ku hevpariyekê di nav civakê de çêdike û giyanên mirovan digihîne hev. Her wiha, K. A. Bedîrxan, di dawiya nivîsara xwe de, ji bo ku mebesta nivîsara xwe bigihîne aqûbeta wê, wiha dibêje, “Xanî xurtiya zmanê xwe hêj wê gavê hesiya bû, û ji wan re qo pê ne dinivîsandin bi beyta jêrîn dixwest bide zanîn «Safî şemirand vexwar durdî/Mavendi -derî lisanî- qurdî» Êdin çax e, qo em bidin pey Xanî.” K. Bedîrxan, pala xwe dide şahberhema Kurdî û E. Xanî ku ji ger û çerxên dîrokê bi vir de ye wekî kesayetê mînakî e; Ev paldayîn, di heman deme de balê dibe ser seraqetiya têkiliya di navbera ziman û civakê (neteweyê) de ku giyên bi zimên reng daye xwe û zimanê ku rengê giyên girtiye. K. Bedîrxan bi vê bawerdariyê, bêjara xwe a neteweparêz di warê zimên de, li ser hoy û sedemên dîrokî, giyanî û hezkirina zimanê xwe ava dike.

Herekol Azîzan, di nivîsa xwe a bi navê Zilamek û Zimanek de, li ser zimanên mirî disekine û balê dibe ser zimanê Îbranîkî ku wek pêaxaftin êdî ji navê rabûbû lê wek giyanê ziman di pirtûka pîroz a Cihûyan Tewratê de hê jî mabû û bi hewla Elyêzer car dî, di ser Tewratê re, geştir û berbelavtir bûbû. (Hawar, 1998: 944). Azîzan, bi gotina “Belê heke ew zilamê xurt û bi vên peyda bû, zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mirî vejîne.” ji jêhatîbûna zilamekî (mirovekî) bêtir, balê dibe ser giyanê zimanekî ku li ba mirovekî zindî maye û li kar e. Azîzan balê dibe ser hebûna berhemên ku bi zimanekî hatibin nivîsîn û pê re jî çêla Tewratê dike û dibêje, “Ibranî zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalê erebiyê ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û nivisandin.” Ev balpêdan, berê me dide giyanê zimanekî ku di kitêba pîroz a civakeke mezin (neteweyekê) de hewiyaye

û paşê jî ji nû ve hatiye zindî û geşkirin. Azîzan, di pêdeçûna nivîsara xwe de dibêje, “Herçî miletên bindest û bêziman an bêzimanê nivîskî divêt jê ibretê bigirin.” û balê dibe gengaziya bêzimanmayîna Kurdan a di siberojê de. Loma jî, hewcetî pê dibîne ku bêjarekê ava bike li ser vê rewş û deravê ku zimanê Kurdî tê de ye û wiha didomîne gotina xwe, “Herçî em kurd, me ziman, me zimanekî delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vî zimani pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin” (Hawar, 1998: 945). Celadet di ser hebûn, zindîbûn û likarbûna zimanê Kurdî re, balê dibe ser hebûna Kurdan û wiha pê de diçe; “Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletî êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne wezîfa xwe a milî pêk ve ne anîne û bi kêrî miletê xwe ne hatine. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletekî bihesibîne divêt bi kêrî wî bêt.” Azîzan, bi girîngiya giyanê zimên dest bi nivîsara xwe dike, piştî avantaj û kêrdariya hebûna zimanekî datîne rastê û dawîya dawî jî, bi gotina, *ne bi tenê wezîfeke şexsî lê wezîfeke milî ye jî*, çarçove û zemîna bêjara xwe berfirehtir dike û wêdetir dibe û di ser peyva *wezîfeke* re divêtiyeke neteweyî ava dike û vê divêtiye wisan di cî de nahêle û di ser peyva *milî* re jî sînorê çandî, civakî û siyasî ê zemîn û çarçoveya zimanê Kurdî diyar dike û bêjara xwe a neteweparêz ava dike.

Kovara Hawarê, di qonaxa derketinê de, bi xebat, hewldan û hokariya Celadet Bedirxan, ji belavkirin û danqebûlkirina bêjarekê zêdetir, pala xwe daye ser avakirinê. Her wiha vê pal û meyla avakariyê kiriye ku di ser zimanê devkî û rojane re, hejmara xwendewariya Kurdî were zêdetir kirin û xwedîtîlêkirina ku tê xwestin di asta hişberiyê de pêk bê. Loma jî, di warê zimên de, ji bo berbelavkirina ramana neteweparêz, rêbazeke wisan nehatiye hilbijartin ku xwe ji tune de heyî dike an jî hêman û rewngûawayê heyî ji heyîna xwe mezintir nîşan dide û bêjara xwe jî di ser vê yekê re dixê hiş û serê mirovên ku bi giyanê heman zimanî di dara jiyane de cî digirin.

3.7.7 Wêje

Berhemên wêjeyî, carinan ji alî hêmanên ku dinimînin ve, girîng in. Ev hêman, carinan çandekê, carinan qewamekê, carinan raman û îdeolojiyekê, carinan jî

di nav tevdehiya jiyanê de, piçke û parçeyên jiyanê ne ku wêje wan dinimîne. Herçî nimandina çandê ye, carinan dikare bigihîje hafa nimandina çanda giştî û neteweyî jî. Neteweya ku xwedî çandê etnîk e, di heman demê de xwedî jêderkeke mîtosî û bîranînên dîrokî ye jî. Her wekî Smith pênase dîke û dibêje, “Netewe ew komemirov in ku axeke dîrokî, mîten hevpar û bîranînên dîrokî, ekonomî û çandê girseyî a giştî û maf û berpirsiyên hevpar bi endamên xwe re parve dîke” (Smith, 1994: 75). Heke ku çand, hemû tevdehiya raman û zanîn û nirxên civakê be ku ev hemû di demajoya dîrokî de hatibin afirandin, helbet ziman hêmana sereke ye ku kartêkeke mezin li çandê dîke û mirov nikare çandê ji derveyî zimên û ji bilî zimên bihizire.

Zimanê ku di çanda civakan de bûye hêmana sereke, di heman demê de, di warê diyarkirina cihêbûna neteweyekê ji neteweyekê de, bi roleke diyarker rabûye. Û ziman, çî wekî zimanê desthilatiya împaratoriye, çî wekî gelên etnîk ên ku di nav împaratoriye sînorfirê de mane, heta dema nûvedana çapxaneyê bêtir devkî û axaftinkî mane. Berhemên ku berî vedîtina çapxaneyê hatine nivîsîn, bi qasî ku mirov karibe bêje li ser mirovên ku bi heman zimanê qise dikin kartêkeke mezin kiriye, zêde berbelav nebûne. Loma jî ramanwerê wekî Anderson ku ramanwerê modernîst e û di warê ramana neteweyî û peydebûna îdeolojiya neteweparêziyê de, heta tu bêjî bes xwe ji kartêkên etnîkî dûr dihêle, dîsan jî bala xwe dide kartêka zimên a li ser avabûna neteweyê û dîtinên xwe ên di wî warî de wiha tîne ziman û dibêje, “Netewe, wekî cime’eteke xeyalî û polîtîk, bi pêşketina kapîtalîzma çapxaneyê geşe bi zimanên herêmî xistiye” (Anderson, 1995: 52-54) û kartêka zimên a li ser raman û îdeolojiya neteweparêziyê, ji peydebûn û geşedan û berbelavbûna pergala kapîtalîzmê cihê nahizire.

Helbet ne diyar e ka tîkiliya di navbera ziman û zanava neteweyî de ji kîngê ve ye heye û em ê nikaribin bêjin ji vê demê de dest pê kiriye. Ji ber ku rengê vê tîkiliyê li gorî demê û li gorî taybetiyên etnîkî ên neteweyan diguhere. Rola ku ziman di avabûna zanava neteweyî de pê radibe pîrcure ye û gelek hokar hene ku vê yekê diyar dikin. Digel vê yekê jî, çendî ku ziman ne hoy û merca bivênevê a neteweparêziyê be jî, di tevgerên neteweparêz de tim û tim wekî hêmaneke sereke û diyarker hatiye bipêşdekirin. Sedema vê yekê jî kargîntiya wî ye. Ev kargîntî, di biwara çand û dîrokê de wekî veguhêzkar li dar û li kar e. Heke em ji wêjeyê, wekî wêjeya gelêrî fam bikin ku di serdema pêşmodern de û berî kapîtalîzma çapxaneyê bi

awayekî devkî, aktîv û kargîn hatiye pêkanîn, em dikarin bêjin ku; wêje jî û wekî pratîka wê vebêjî jî, ast û kartêka kargîniya zimên zêdetir dike û di biwara bêjarê de di hafa jorîn û refa pêşîn de cî digire.

Bêguman biwara herî kargîn a pêkanîn û xuyakirina zimên, wêje ye. Wêje ji bo parastin û veberhênana çanda neteweyî yek ji biwarên sereke ye. Ji ber ku ziman rasterast bi ramanê ve têkildar e û her wekî Humboldt gotî, “Ziman di heman demê de xuyanga derveyîn a giyanê neteweyê ye; zimanê neteweyê giyanê wê ye, giyanê wê jî zimanê wê ye” (Akarsu, 1994: 52) ev giyan ji aliyekî ve jî di vegotinên wêjeyî de dihewe û ciyekî taybet dide xwe. Ev ciyê taybet, bêtir bala xwende û rewşenbîran dikişîne. Û awayê liv û reftarên rewşenbîr û bîrewerên biwara nivîskariyê vî ciyê hanê xuyangtir an jî qewîtir dike.

Wêje, ji bo *cime ‘etên mezin* ku xwestine yekbûna xwe a neteweyî ava bikin – an jî qewîtir û pihêttir bikin- xwedî girîngiyeke jênager e. Ji ber ku wêje rojîna neteweyekê ye; çîroka borîroja wê, îroja wê û siberoja wê vedibêje. Û heke vegotin û şeweyên bêjara wê li ser ramana neteweparêz ava bibe, wê hingê; wêje dibe xwedî sê rengan; 1- Ji bo neteweyekê ku di qonaxa netewebûnê de ye, dibe wêjeya avakar. 2- Ji bo neteweya ku qonaxa netewebûna xwe tamam kiriye û wêje wek saziyekê li dar e, dibe wêjeya angaje 3- Ji bo neteweya ku xwe ava kiriye dibe biwareke xwederbirînê.

3.7.7.1 Bêjara Neteweparêz Di Biwara Wêjeyê De

Di dema Kovara Hawarê de ku em ê li ser hin mînakên berhênanên wê bisekinin, Kurd hê di destpêka qonaxa avakirina neteweya Kurd de ne. Loma jî, hemû nirxandin û analîz û peytên ku em ê bikin, dê di ser awayê yekem re be ku, di qonaxa avabûna neteweya Kurd de, bi tamamî û bi taybetî bi rol û mîsyon û karekî avakar rabûye û mohra xwe li hemû berhem û berhênanên bîrewerî û xwendewariyên Kurdî ên peyrewên xwe xistiye.

Celadet Bedirxan di nivîsara bi navê Armanc, Awayê Xebat Û Nivîsandîna Hawarê de ku wekî manîfestoya Hawarê ye, wiha dibêje di xalbenda sêyemîn de, “3- Ber hevqirina çîroq, çîrçîroq û her texlît laje û stranên qurdî û birêve belavqirina wan” (Hawar, 1998: 23). Celadet, bi danîna vê xalê, di biwara wêjeya gelêrî de,

hewla daneheva bîra çand û jiyana adetî a Kurdan dide. Û çî ji alî awirê kesîdeyî ve çî jî ji alî awirê komelî ve, destnîşan dike ku dê feraseta wêjeya Hawarê ji bo danehev, hêvîşandin û parastin û geşkirina bîra çandî a neteweyî be. Celadet, vî awirî bes bi çanda giştî û wêjeya gelêrî jî nahêle û balê dibe ser dîwan û berhemên ku berî Hawarê hatine çapkirin û di xalbenda çaremîn de wiha dibêje, “4- Senifadin û belavqirina diwanên qurdî. Bi van ve jînenîgarîyên şair û mirovên bijarte jî de bîn belav qirin.” Ev her du xalband, ne tenê balê dibe ser borîroj û paşxaneyê wêjeya Kurdî. Her wiha, ev yek qebûla borîrojê û dîroka çand û wêjeyî ye jî. Loma jî, çendî ku bi gotinên şilfîtazi û aşkera nehatibe gotin jî, di nava xwe de bêjareke neteweparêz dihewîne ku hem xwedî angaştekê ye û em vê yekê jê fam dikin: Ê me ne ji tunebûnê ye. Ji berbelavbûna hemû nîrxên heyî ne. Loma jî, ramana me a neteweyî li ser jêderka etnîkî ava bûye û em ê îroroj û siberoja neteweyî jî li ser vê borîrojê ava bikin.

Dr. Kamûran Bedirxan, di nivîsara xwe a bi navê Edebiyata Welatî de, serê pêşîn çibûna wêjeyê a ji bo neteweyekê dide zanîn û wiha dibêje, “Edebiyata welatî, ew edebîyat e qo ji jîna mîletî, ji hiş û dilê wî, ji dîroq û çîrçîroqên wî, ji stran û lajeyên wî hiltêt” (Hawar, 1998: 27). Di vê hevoka K. Bedirxan de, çend biwarên derbar bêjara neteweparêz de hatine bikaranîn; bi gotina *jîna mîletî*, yekbûn û tevdehiyekê tê destnîşankirin, bi gotina *hiş û dilê wî*, hebûna zanîn û agahiyeke der heqê xwe de tê diyarkirin û bi gotina *dîroq* jî, der barê borîrojê de hayjixwebûnek tê derbirandin. K. Bedirxan, piştî ku agahî dide xwendevanan ku li Ewrûpayê hin mîlet hebûne ku edebiyata xwe ne bi zimanê xwe lê bi zimanê biyanî dixwendin û dinivîsîn û loma jî zimanê xwe teng, nehêja û biçûk didîtin. K. Bedirxan pê re jî dibêje, “(...) di welatên ewropa û rohelat de hete seh qirin qo ev rê dernaqeve û ev awa naçe serî.” û balê dibe ser têkiliya ziman û wêjeyê û kartêka wan a li ser komên xelkê. K. Bedirxan, di pêdeçûna nivîsara xwe de, çel dike ku piştî ku ev gel vejeriyane ser zimanê xwe, êdî jiyana xwe hê xweştir û hê bêtir haydarî xwe jiyane û bi van gotinan didomîne, “Edin her qes zana nezan, bajarî gundî qo xwendinê zani be, zimanê wan seh diqirin, û qitêbên wan dixwendin.” û balê dibe ser girîngiya xwendina bi zimanê xwe. K. Bedirxan, wekî gotina dawî, dibêje, “Paşî vê gotinê, kesda me, awayê edebiyata me ji xwe têt seh qirin, û ew rêya qo em tê re dixwazin herin bi xwe vedibe û diqeve pêşiya me.” Bi van gotinan, qonaxa avabûna neteweya

miletên dî wekî mînak dide ber Kurdan û ji wan dixwaze ji bo ku heman qonax û heman serencam bibe para Kurdan jî, divê Kurd wekî *miletên* dî bikin û wêjeya xwe bi zimanê xwe binivîsin û bixwînin. K. Bedirxan, di vê nivîsara xwe de bêjara xwe a neteweparêz pêşî di ser ziman re ava dike û wê di biwara wêjeyê de bi cî dike û dibêje.

Nûredîn Êsif, çîroka xwe a bi navê Keskesor, di dorbera serîhildana Şêx Se'îde de dihone. Çîrok ji serî heta dawiyê, beşek ji serîhildanê, reftar û tevgerînen gel ên di dema şer de û ranêzikiyên wan ên ji bo serîhildanê, vedibêje. (Hawar, 1998: 748). Çîroka Keskesor bi van gotinan dest pê dike; "Di sala 1925an de bû. Wê salê , ez hin nû diçûm dibistanê, lê dibistana tirkan." Yekem hevoka çîrokê bi me dide hisandin ku dê hevokên bi dû re bîn, bi giştî dê ji tiştên gihajî wê heyamê bin. Loma jî, ji ber ku sala 1925, sala şer e û di heman demê de jî sala têkşikîna serîhildanê ye. Her wiha, gotina *lê dibistana tirkan* ku di dawiya hevokê de tê gotin, amaje pê dike ku zimanê dibistanê ne Kurdî ye û her wiha hem cihêtiyê datîne mexderê hem jî di ser vê cihêtiya zimên re bingehek amade dike ji bo bêjara neteweparêz. Êsif, bi gotinên wekî "«Şer... kurd... tirk... standin...»", "« Şer... top... tîfing... kuştin... hatin...»" jî gehîneka sereke û yekem a bêjara xwe tamam dike. Êsif, di pêdeçûna çîrokê de, digel piştgirîdanê, bi van gotinan, "Rojekê: «Hatin... nêzik bûn... kurd hatin...»" digotin. Xort û mêr bi çekên xwe ve, bi dahol û zirne hin siwar, hin peya bi hezaran û bi dengên her bijî kurd... her bijî kurdistan... her bijî serbestî..." kêfxweşiya gel a ji bo serketinê vedibêje. Ev awa gotin, ji vegotina hestên kêfxweşiyê ên gel û komên xelkê zêdetir, bi armanca nivîskar ve pêbestî ye ku dixwaze di ser vê yekê re, biwarekê ava bike. Belê ev biwar, biwara bêjara neteweparêz e. Gotinên wekî "Hatin... (...) kurd hatin..." digel ku mizgîniya serkeftineke nêzik dide jî, tirsê jî wêdetir dike. Ev yek car dî, her wekî di nivîsarên Rojî Kurd û Jînê de heyî, -digel ku di dema nivîsîna çîrokê de serîhildan têkşiyaye jî- hewlê dide ku hestên bixwebaweriyê bi komên xelkê re çêke. Her wiha, gotin û bikaranîna sloganên wekî "her bijî kurd... her bijî kurdistan... her bijî serbestî..." jî, ji bilî sêwirandin û xwestina dewleteke neteweyî a ji sînorekî terîtoryal pêkhatî ne tiştek e. Me divê em bejin ku; digel ku Êsif çîroka xwe wekî dawî û aqûbeta serîhildanê bi dawî dike jî, di vê çîrokê û di biwara wêjeyê de, hem hewlê dide ku qonaxeke hatî jiyandin di bîra neteweyî a

dîrokî de bi cî bike û hem jî bêjara xwe a neteweparêz ava dike û tê dixebite ku di hiş û mêjîyê xwendevanên xwe de vê bîrê kûrtir bike.

Osman Sebrî di çîroka xwe bi navê Li Gornistaneke Amedê de, dîsan bala me dibe ser serîhildana Şêx Se'îd. (Hawar, 1998: 585). Sebrî, çîroka xwe li ser xewnerojekê saz dike. Lê xewneroj bêtir di rengê kabûsekê de ye ku bi roj tîn dîtî. Sebrî, pêşî bi gotinên, "Ciyê ez biçûyamayê nêzing bû di bihekê de Filistîn, Şerq el-Urdun, Sûriyê derbas kir û li tala serê kaniyê li sînore welêt raperîm. Di navbera Mêrdîn û Wêranşehrê re min xwe gihande ser Diyarbekirê." Sînore ku wekî *welat* bi nav dike, wekî sînorekî etnik diyar dike. Ji ber ku di dema nivîsînê de, hemû gelên etnîk û netewe an bêdewlet in an jî wekî mîrtî an jî dewletekê di bin mandaya Fransîz û Îngilîzan in. Her wiha, vegotina di ser xewnê re û xeyala avakirina dewleteke bi sînore terîtoriyal jî bi me dide zanîn ku Sebrî çîroka xwe li ser ramanê neteweparêz ava dike û loma jî gotina "(...) li sînore welêt raperîm." bi kar tîne. Peyva sînore, li vê derê hem cografyayêke ku gelekî etnîk lê dijî hem jî sînorekî terîtoriyal dinimîne. Sebrî, bi dû gihîştinê re, berê xwe dide Diyarbekir û texma Deriyê Çiyê û wiha dibêje, "Lê gava gihîştîme Diyarbekirê li hela Derê Çiyên tîrêjek nûrê weka keskesorê lê sitûr bi ber çavên min ket. Çavên min deliyan hinekî ez wer mat mam paşî min xwe lê girt û çûm. Gava gihîştîme tîrêja nûrê weka perperokê ko per dişewitin ez di jor da hatime xwar û ketim" (Hawar, 1998: 586). Sebrî, di van hevokan de, çend gotinên ku dibin palpiştên bêjara neteweparêz bi lehengê xwe dide gotin. Gotina *tîrêjek nûrê weka keskesorê* serê pêşîn rojê tîne bîra me. Ji ber ku keskesor di ferhenga Kurdan de tê wateya bûka baranê, roj di vê gotinê de di nav metafora keskesor de hatiye bicîkirin û di ser rojbûna wê re jî keskesor ew tişt ye ku tîn û şewqa xwe dide. (Farqînî, 2004: 987). Ev tîn, tîna serîhildanê û şewq jî bi taybetî şewqa Şêx Se'îd e ku rêbertiya serîhildanê kiriye. Her wiha, peyva *nûr* ku bi taybetî di şûna peyvên 'şewq, şewl, ronahî'yê de hatiye bikaranîn jî, metafora ku şewqê dide, balatir û pîrozwertir dike. Û em ji serî de tê digihîjin ku bêjar ne tenê ji bo sazkirinê lê ji bo sazkirina nîrxên ku wek pîrozwer tîn dîtî û qebûlîkirin, tê bikaranîn. Jixwe Sebrî jî, di vegotina xwe de, bi xwe vê yekê diyar dike û wiha dibêje, "Şêx Se'îdê Kal. Min hêdî hêdî xwe gihande tîrêjê." Piştî Sebrî, di ser serîhildanê û rêbertiya Şêx Se'îd re, mîna ku spasiya xwe lê bike, dibêje, "Ey ke'ba qewmiyeta min Şêx Se'îdê Kal! Te... te zincîra dîliya qewmê min bi zexmiya dil,

piraniya zanîn û rastiya xwe qetand. (...) Ev qevmê ko çarsed hinde sal in xwe ji bîr kiribû, xwe winda kiribû, bênav û bêzanîn mabû, ketibû xewa mirinê, di wê xewê de ew şêr te hişyar kir.” Sebrî, di van gotinan de jî danîna bêjara neteweparêz ku pîrozweriyê jî bi xwe re ava dike, didomîne. Jixwe gotina “ke’ba qewmiyeta min” bi tena sere xwe û bi referansa xwe ve ast û hafa pîrozweriya ku Sebrî dixwaze ava bike, diyar dike. Her wiha, Sebrî jî her wekî Bruinnesen destnîşan dike ku “Serîhildana Şêx Se’îd serîhildana bêhempa ye” (Vali, 2005: 181) Loma jî dibêje, te zincîra qewmê min qetand û şêra di xew de şiyar kir. Şêrê ku şiyar bûye neteweya Kurd e ku ji netewebûna xwe dûr ketiye. Û digel Şêx Se’îd, Sebrî jî, bi vegotina xwe a xewînê û bi bêjara xwe dixwaze bila ew şêr tim û tim şiyar bimîne. Sebrî di pêdeçûna vegotina xwe û di xewna xwe de, tê dixebite ku bi Şêx Se’îd re pêwendiyê dayne û pê re qise bike. Loma jî gazî dike û dibêje, “Ey şehîdê gewre! Piştî mîrê ola Muhemmed! Hîmê heyîna kurdanî ye!” Û di vê gazîkirina xwe de, car dî, pêşî bi gotina “şehîdê gewre”, yekem ast û hafa ku Şêx Se’îd datîne wir destnîşan dike û pê re jî bi gotina “Piştî mîrê ola Muhemmed!” vê astê digihîjîne ast û hafa temsîliyeta pêxemberiyê.¹⁰ Her wiha Sebrî bi gotina “Hîmê heyîna kurdanî” vê temsîliyete di asta neteweparêziya Kurd de bi cî dike û digel ku Şêx Se’îd ne tekane kes e jî di wî warî de, Sebrî bêjara xwe a neteweparêz di ser vê nirxê re ava dike. Sebrî dev ji gaziya xwe bernade û axirê Ezîz Axayê Silopî derdikeve pêşberî wî. Ezîz Axa ji leheng re dide zanîn ku ew di civînekê de ne, loma jî bi hevaltîya xortekî wî dadixîne ber çemê Dîjleyê. Her du apên lehengî ên ku bi Şêx Se’îd re hatine dardekirin jî li wir in. Leheng bi mamê xwe re dikeve guftûgoyekê û hîn dibe ku ew li wir rojnameyekê derdixînin û navê rojnameyê jî Hişyarî ye (Hawar, 1998: 587). Li vê dere me divê em amaje pê bikin ku, çîrok di ser xewnerojkekê tê vegotin; û tevî ku lehengên dîtir ên di çîrokê de di xeweke abadînî de ne jî, navê rojnameyê Hişyarî ye. Hilbijartina navekî bi rengî jî, bi me dide zanîn ku Sebrî dixwaze beje, mirin û xew ji bo her ademîzadekî tişteki bivênevê ye, lê bele ji bo gihandina armancê û aqûbeta erênî û çak a neteweyî *hişyarî* tişteki bivênevê ye; û dîsan bêjara xwe a neteweparêz di vê peyva *hişyarî* re ava dike. Sebrî guftûgoya leheng û apê xwe didomîne û piştî ku leheng hin agahiyan der heqê rojname û awayê derçûna wê de hîn dibe, ji apê xwe dipirse, “- Ma ji bo çi hûn Ehmedê Xanî nakine seroka civata zanînê?” li ser vê yekê

¹⁰ Me divê em li vê dere diyar bikin ku pêxemberî digel naverok û berpirsî û pênaseya xwe ve rengdêreke astbilind e jî, temsîliyet wê astbilindiyê li xwe dike referans û pesna wê astê dide.

apê leheng lê vedigerîne û dibêje, “- Ehmedê Xanî çavdarê tevayiya xebatên zanîne ye” (Hawar, 1998: 588). Ev gotina apê leheng, tavlê Mem û Zîn û ferhengsaziya Xanî tîne bîra me ku wek me di beşên bere de jî dabû zanîn û destnîşan kiribû ku Xanî hem wek bavê zanîn û zanyariya Kurd û hem jî wek bavê neteweparêziya Kurd tê zanîn û qebûlîkirin. Her wiha, me divê em amaje pê bikin ku Şêx Se‘îd digel rêberiya xwe, digel alimiya xwe a olî nimandina şûr –*desthilata hêza tundrawiyê*-dike û Xanî jî wek şa’îrî û zanyariya xwe nimandina pênûsê –*desthilata hêza zanîne*-dike.

3.7.7.2 Hêmaya Şûr û Qelemê û Çîroka Gazinda Xençera Min

Di bêjarên neteweparêz de, car caran hin tişte û simbol regekî hêmayî girtine; û ev simbol di ser van hêmayan re jî bûne tiştêya bêjara neteweparêziyê. Ev simbol carinan xwedî rengûawayeke olî ne, carinan jî tune ve hatine afirandin, carinan jî nav hêmanên çandî ên dîrokî dûr tîne neqandin, carinan hin ajal dibin simbol, carinan heyînen derxwezayî û dermîrovî dibin simbolên neteweparêziyê û carinan jî tişte (object) dibin simbol û bi tişt û wateyên ku bi bîr dixin, rengûawayekî şanekiyê digirin. Pierre Guiraud destnîşan dike û dibêje, “Kargîniya şanekê ew e ku di berheliya (îstîqameta) pevtêkiliyekê de nimandin û beloqkirina hêmaya duyemîn e” (Kalaycı, 1998: 159-169). Nexwe em dikarin bêjin ku; şaneka ku di bêjarekê de dibe simbol, bi simbolbûna xwe re jî hêmayan diafirîne; ew hêma, ên hişûbîriyê ne ku ji şanîker û têşanekê pêk tîne.

Herçî simbol e, dikare bi gelek awayan bê bikaranîn. Ji ber ku şanek bi referansên ku diyar dike watedar dibe û pê re jî dibe simbol. Loma jî simbol, bi mebesta ku kirûyên şênber an jî razber ava bike û di hiş û bîra mirovan de wateyên kûr bi bîr bîne, tîne avakirin. Yıldırım dibêje, “Simbol ew bernîşane ye ku dikeve şûna tişte, nirx û raberîyeke ji derveyî xwe” (Koca, 2010: 88). Helbet, carinan heyînen zindî dibin simbol û dikevin şûna nirx û raberîyeke razber û carinan jî tiştêyên nezindî dibin simbol û dikevin şûna nirx û raberîyeke razber. Loma jî, em dikarin bi kurtasî bêjin; simbol ew bernîşane ye ku dikeve şûna tiştên diyarkirî. Ji bo vê yekê em dikarin wekî mînak bêjin ku; sembola neteweparêziya Tirk, Gurê Boz e, li Romayê Eyloyê Romayê, li Amerîkayê Eyloyê Amerîkayê, li Almaniyayê Xaçê Bi

Gama û Eylo wekî simbolên neteweparêziyê hatine qebûlkin. Her wiha li ba Kurdan jî Gurzê Rûstemê Zal, Çakûta Kawa wekî simbolên neteweparêziyê hatine desnîşankirin.¹¹ Em di ser referansên van sembolan re dikarin bêjin ku; taybetiya hevpar a van sembolan ew e ku; hemû jî hêzek, tundiyeke û şidetekê di xwe de dihewînin.

Em ê di vê çarçoveyê de; ji bo ku karibin têkiliya ku şanek di navbera şanîker û têşanê de ava dike û wan digihîne hev diyar bikin. Loma jî, em ê serê pêşîn berê xwe bidin E. Xanî ku di roja îroyîn de ji alî gelek ramanweran ve wekî pîr û danerê ramana neteweparêziya Kurd tê nasîn. Xanî, di berhema xwe a bi navê Mem û Zînê de, di gelek waran de simbol bi kar anîne ku hin ji wan waran, ol, evîn, afirandoxî, dinya fanî û dinyaya wî alî, astronomî, zanîn û zanistî û felsefe û çand û civak e. Di nav van sembolan de, simbolên ku balê dibin ser heyîna etnîsîta a gelê Kurd û ji bo aqûbet û siberoja wî a baş wekî tiştayên bivênevê tînan şanîdan jî hene. Ev simbol, ‘şûr’ û ‘qelem’ in ku cara pêşîn ji alî Xanî ve hatine bikaranîn. Xanî piştî ku dibêje, “Rabit ji me jî cîhanpenahek/Peyda bibitin me padîşahek” (Xanî, 2008: 37) û digel gazinca xwe a tunebûna desthilateke Kurdan hêviya xwe a di vî warî de jî vedibêje, bi vê çarçoveyê ve bestandî, hêmaya ‘şûr’ û ‘qelem’ diafirîne û wan bi awayekî simbolên rê û egerên serkeftin û pêkhatina ‘xeyala xwe’ jî destnîşan dike û wiha dibêje, “Şîrê hunera me bête danîn/Qedrê qelema me bête zanîn” (Xanî, 2008: 37). Xanî, piştî ku bi van beytên xwe destpêkek ji bo ramana xwe çêdike, piştî serê pêşîn li ser rol û encama ‘şûr’ disekine, hema di pey re jî balê dibe ser û dixwaze bêje bêyî ‘şûr’ tu hêz û kartêk û tawana ‘qelem’ê nîn e û wiha dibêje, “Namûs e li hakim û emîran/Tawan çî ye şa’îr û feqîran” (Xanî, 2008: 37). Xanî, ramana xwe a derbar têkiliya ‘şûr’ ‘qelem’ê de wiha zelaltir û aşkeratir dike, “Herçî bire şîrî destê himmet/Zebt kir ji bo xwe mîrî dewlet” (Xanî, 2008: 37). Xanî, bi vê beyta xwe, hem ji aliyekî ve amaje bi hêza ku dê bi *libakirina şûr* bê zanîn dike hem jî dixwaze bêje ji bo lidarketina dewleteke Kurdan hêza yekem û sereke, *hêza şûr* e û ji bo likarketina *hêza qelemê* jî tiştêkî bivênevê ye; û em ji van beytên Xanî fam dikin ku ew ‘şûr’ û ‘qelem’ê wekî simbolên danîna dewleteke (hikm û desthilatî) Kurdan dibîne û di vê dîtina xwe de jî hêza şûr dixwe rêza pêşîn.

¹¹ *Piştî heyamên Hawarê Teyrê Baz jî wek ji simbolên neteweparêziya Kurd hatiye destnîşankirin û qebûlkin. Lê belê ji ber ku em nekevin şaşîyeke anakronîk em ê Teyrê Baz ji derveyî dahûrandina xwe bihêlin.*

Xanî di berhema xwe de, bi çend beytan be jî li hember helwestên împaratoriyan a der heqê qebûlnekirina wan a Kurdan rabûye û mîrateyeke ramanî, siyasî û çandî hiştiye li dû xwe. Loma jî, H. Q. Koyî jî di şî'îrên xwe de daye ser şopa Xanî û wî jî hêmaya 'şûr' û 'qelem'ê wekî sembolên neteweparêz bi kar aniyê. Koyî di warê têkiliya 'şûr' û 'qelem' de wiha dibêje, "Be şîr û xame dewlet payedar e/Ê min xamem heye, şîr nadiyar e" (Koyî, 2004: 150). Koyî jî her wekî Xanî, 'şûr' û 'qelem (xame)' wek du hêman û kartêkên jihevneqet diyar dike û ji bo hebûn an jî avabûna dewletekê wan bivênevê qebûl dike. Her wiha Koyî, di şî'îra xwe de jî van her du sembolan wekî şanekeke hêmayî bi kar tîne. Wekî dî, Koyî, şûr û qelem wek pardarên hev jî qebûl kirine û wiha gotiye, "Şîr û qellem şerîk in lem 'esre da, dirêxa/Şîrim qellemtraş e û kalanî ye qellemdan" (Koyî, 2004: 85). Ev pardarî bi xwe re jibêgaviyekê saz dike; heke şûr bi tenê hebe ne tu tiştê e, heke qelem bi tenê hebe ne tu tiştê e; *şûr* tundiya xwe a no û tûj ku di xwe de dihewîne, bi semboleke alîkar a wekî *qellemtraşê tûjî* û notiya xwe derbasî qelem (xame) dike û wan ji bo hev dike hevalbendên bivênevê ku; heke qelem tûj nebe dê nikaribe binivîse û ramanê bîafriîne û ava bike; heke ne ji hêza ramanê *-hêza qelemê-* be dê hêza tundrawiye – *hêza şûr-*nikaribe wê hêzê di xwe de bibîne ku tûjî û notiya xwe nîşan bide.

Celadet A. Bedirxan jî dide ser şopa Xanî û Koyî û di çîroka xwe a bi navê Gazinda Xencera Min de, di navbera 'xencer' û 'pênûsê' de têkiliyeke simbolîst datîne (Hawar, 1998: 519)¹². Celadet bi hevoka, "Ji zû ve ye min lê nenihêrtibû" dest bi çîroka xwe dike. Ê bi vê destpêkê re jî peyamê radigihîne ku hêza ku ji ber 'xencer'ê heye, ji demekê ve ye ne li dar û ne li kar e. Lehengê çîrokê, hewcetiya 'qelem' ku bi 'şûr' heye, bi gotinên, "Berî çend roja qelema min keh [ko] bûbû. Li kêrika xwe geriyam, neket destê min. Min çavê xwe li dora xwe gerand û li tiştêkî digeriyam ko bikare qelema min tûj bike. Çavê min bi xencerê ket. Rabûm ber wê ve çûm." diyar dike (Hawar, 1998: 519). Em ji gotina, *li kêrika xwe geriyam* fam dikin ku heta wê hingê tercîha leheng a ji bo tûjkirina qelemê, kêrik e. Lê ew neketiye dest. Sembola kêrik a li vê derê, bi me dide zanîn ku; ji bo tûjbûna qelemê, 'şûr' ne tiştêkî bivênevê ye û hêmaya ku bi sembola kêrik di vê qonaxa çîrokê de li kar e, ji bivênevêtiya ku Xanî û Koyî ava kirine, dûr e. Leheng piştî ku çav bi xencerê dikeve,

¹² *Celadet, transpozeyêke simbolîst di navbera 'şûr' û 'xencer' de çêdike û her wiha wekî şopgerekî Xanî û Koyî, hem xwe ji lasayîkirina wan bêrî û rizgar dike hem jî hêza 'şûr' û referansa wî a tûjî û notiyê di dirûvê kinbûn û xwêliyê de kêmtir û nermtir dike.*

wê ji ciyê wê werdigire û dibêje, “Min qelesa xwe da devê wê. Nedigest ne jî jê dikir. (...) Jenga wê nivî bûbû.” Di van vegotinan de bala me diçe peyv û lêkerên ku bi referansên xwe û ji berevajiyê ve bi şaneka ‘şûr’ re dibin hevpar. Gotinan leheng a ji bo xencerê, *nedigest ne jî jê dikir*, ji hêzketina ‘şûr’ e ku Xanî û Koyî ‘şûr’ ji bo danîna hikum û desthilateke bi navê dewlet, tiştêkî bivênevê didîtin. Her wiha, peyva jeng jî bi me dide nîşan ku hêza ‘şûr’în bi awayekî demî ketiye ber bêkêriyê û hêza wî hew kare bi kêr bê û çalak be. Leheng, piştî ku bi xencerê re diaxive û sedema jênekirin û tûjnekirina wê jê dipirse û dibêje, “Xencera delal, te xêr e, mebit ko tu ji min xeyidî bî, ma min çî bi te kir ko tu ji min bixeyidî?” Xencer li leheng vedigerîne û dibêje, “- Ma lê, ji te xeyidîme, ma çawan ji te naxeyidim. Te ez avêtim nav kitêb û kaxizan, te ez kirim hogir û hevala bermayên qaşûlên dar û qirş û hevsera caw û potikên zibilgehê. Ne li min dipirsî, ne jî li min dinihêrî. Heta niho min deng nedikir, min xwe di dinyayê de tayhebûyî dihesiband.” Ev diyaloga ku di navbera leheng û Xencera xeyidî de pêk tê, serencama dûrketinekê bi me dide zanîn ku Celadet ji hêza ‘şûr’ zêdetir bi hêza ‘qelem’ê bawer e û pê kar dike. Lê belê, di pêdeçûna diyalogê de, Xencer wiha dibêje, “Lê nabit, tu tişt, ne ziman, ne xwendin ne nivîsandina te bêtir min naçe serî. Bidî eqlê xwe heta niho tu û milletê xwe hûn çawan mane, çawan we zimanê xwe wînda nekiriye û îro dizanin pê biştexilin. Heke ez nebiwama ji zû ve te û milletê te we ê zimanê xwe wînda bikirana” (Hawar, 1998: 520) û sersariya ku leheng bo Xencer kiriye rexne dike û girîngiya hêza xwe a di heyîkîrîn û avakirina desthilateke (an jî dewleteke) Kurd de diyar dike. Û ji niha û pê de divê leheng çî bike û çawan tevbigere wiha destnîşan dike, “Ji lewra ez benî qedrê min bizane, ji min dûr mekeve, min ji xwe dûr meêxe û bi min ne qelesa xwe lê parsuwên dijminên xwe jêke!...” (Hawar, 1998: 520). Awayê bêjareke bi vî rengî, serê pêşîn destnîşan dike ku leheng rol û peywira ‘xencer’ baş fam nekiriye. Loma jî Xencer bi gotina, *qedrê min bizane*, dide zanîn ku kêmasiya pêk hatî ji ber xemsariya bo Xencerê hati kirin û ji ber qedrnedayîne ye. Û Xencer, bi gotina, *bi min ne qelesa xwe lê parsuwên dijminên xwe jêke!...*, rol û peywira Xencer a hatî jibîrkirin an jî baş nehatî famkirin, destnîşan dike.

Wekî dawî em dikarin bêjin, hêmaya ‘şûr (xencer)’ û ‘qelem’, du sembolar in ku di bêjara ramana neteweparêziyê de rêyên avakirina deshilatê (an jî dewletê) nîşan dikin. Her wiha, her sê pêşengên ramanwer jî, Xanî, Koyî û C. Bedirxan, têkiliyeke

taybet di navbera ‘şûr’ û ‘qelem’ de peyde kiriye ku; di vê têkiliyê de bêgaviyeke diyalektîk heye û yek yekê dî heyî û ava dike. Û dîsan yek ji taybetiyekê ew e ku; her sê ramanweran jî bi heman awayî têkilî di navbera van sembolan de danîne; her du simbol jî bi tena serê xwe xwedî hêz in lê belê ji bo watedarbûn û bîaqûbetbûna hêzên heyî, pêwîstiya wan bi hêza hev heye.

Heke em wekî heyama dîrokî û konjonkturî li demê binêrin, em ê xweşikî hay jê bibin ku Kurd ne xweşikî xwedî çek ‘şûr’ in ne jî di civaka Kurdan de xwendin û nivîsîn û bîrewerî berbelav e. Loma jî bikaranîna hêmayeke bi vî rengî ku bi ‘şûr’ û ‘qelem’ tên simbolîzekirin, ji bo her sê şa‘îr û nivîskaran jî tiştêkî bivênevê ku diviya di wan deman de bihata peydekirin û bikaranîn.



Encam

Têgiha neteweparêziyê ku di sedsala 18. de li Ewrûpayê derketiye, piştî Şoreşa Fransîz û Şoreşa Endustriyê û pê re jî bi geşedana pergala kapîtalîzmê berbelavtir bûye; û vê yekê kiriye ku împaratoriyan pirnetewe û pirçand birûxin. Loma jî, neteweyên ku di nav sînorên van împaratoriyan de jiyabûne, kartêk ji raman û îdeolojiya neteweparêziyê girtine, hestên wan ên neteweyî xurttir bûye û keys li wan çêbûye ku dewletên xwe ava bikin. Her wiha, di nav sînorên Dewleta Osmanî de jî, pêşî li herêma Balkanan piştî jî di beşên dî de neteweyan kartêk ji ramana neteweparêz girtiye û ji bo avakirina dewleta xwe a neteweyî li liv û tevgerê ketine û heta şerê dinyayê ê yekemîn, beşek mezin ji Kurdan mane di nav sînorê vê dewletê de.

Me divê em berî her tiştî bidin daxuyandin ku; ji ber ku hîm û binyata Dewleta Osmanî pêşîniyê dida Îslambûn û Osmanîbûnê û Kurd jî wekî gelekî etnîk di nav vê dewletê de mabûn û bi hest û baweriyeke xurt pêgirtiyê vê pergale bûn, ramana neteweparêziya Kurd bi lezeke pir hêdî di nav civakê de cî dide xwe û bi pêş dikeve. Loma jî li ba Kurdan, raman û tevgera neteweparêz, bi taybetî piştî salên 1840î ketiye nav vê liv û tevgerê û cî daye xwe. Kurdan, pêşî bi serîhildan û şer hewl daye ku di vî warî de bigihîjin armanca xwe; û heta destpêka salên 1900î du serîhildan li dar ketine û her du serîhildan jî têk şikiyane. Piştî ku di pergala Dewleta Osmanî de hin guherîn çêbûne û heyama Meşrûtiyeta 2. dest pê kiriye, civakên ku di nav vê pergale de dijîn, karibûne ku bi serbestî rêkxistinê xwe daynin û sazî û komeleyên ku mafê civak û neteweyên xwe biparêze, ava bikin.

Digel vê yekê jî, Kurdan heta şerê dinyayê ê yekemîn, karibûne di asta rewşenbîriyê de xebatê bikin û sazî û dezgehên ku dê ramana neteweparêziya Kurd ava bikin. CTTK û CHyê, di vî warî de girîngtirîn dezgeh in ku ji bo birêkxistinkirina Kurdan û berbelavkirin û geşkirina ramana neteweparêziya Kurd hatine danîn. Di van sazî û dezgehan de, xebatên cure cure hatine kirin. Bi xebatên van saziyan, weşînekên wekî RKTyê, Kovara Rojî Kurd, Kovara Yekbûn, Kovara Hetawî Kurd, Kovara Jîn û Hînger derketine. Di van weşînekan de, nivîsar hatine nivîsîn û hewl dane ku ramana neteweparêziya Kurd xurt bikin û berbelav bikin. Her wiha, Rojnameya Kurdistan ew weşînek e ku ne di bin banê saziyekê de, lê belê wekî

helwest û hewldaneke rewşenbîriya takekesî û malbatî hatiye weşandin. Ev rojname, bi derketina xwe ve, di warê neteweparêziya Kurd û ji bo berbelavbûna bêjara wê de bûye pêşeng û rênîşander bo xebata ku di biwara bîrewerî û rewşenbîriyê de tên kirin.

Weşînekên ku di heyama dawîn a Dewleta Osmanî de derketine, bi taybetî ên ku beriya şerê dinyayê ê yekemîn weşiyane, ji ramana xurtkirina neteweparêziya Kurd û pê re jî ji danîna dewleteke neteweyî zêdetir, li ser ramana yekbûna bi Dewleta Osmanî re mane. Ji ber ku rewşenbîr û danerên van sazî û weşînekan bêtir xwestine ku bila di nav sînorên împaratoriya Osmanî de mafên Kurdan bîn dayîn û Kurd jî wekî endamekî ûmeta Îslamê xizmeta xwe a bo xelîfe û Dewleta Osmanî bikin. Loma jî, heke em tenê di biwara bêjariyê de jî bihizirin, em ê karibin bêjin, ramana neteweparêz a wê heyamê ku di nav weşînekan de reng û awayê xwe dide der, ji hêla doza mafên xwe ên neteweyî ên giştî ve kût û kêmane.

Piştî şerê dinyayê ê yekemîn, di heyama têreborînê de ku Dewleta Osmanî êdî bi temamî ji hêz û desthilata xwe ketiye û bere bere parçe bûye, rewşenbîrên Kurd, ên ku di nava şerî de cî dane xwe û piştî şer veşariyane Stenbolê, car dî ketine nav hewla domandina xebata neteweparêziya Kurd ku ji ber şer nivçe maye. Xebatên ku di vê heyamê de hatine kirin, ji xebatên heyama berê ku hê Dewleta Osmanî li dar bû, ji hêlekê ve xurttir in. Di vê heyamê de, bi taybetî du weşînekên ku derketine, Kovara Jînê û pirtûka Hînkê, di biwara bêjara neteweparêziya Kurd de, hê xurttir sekinîne û her wiha em dikarin bêjin di van weşînekan de xebatên cihêtir û xurttir hatine kirin. Di vê heyamê de, xwedîti li mîrateya ku ji heyamên berê mane, hatiye kirin û vê yekê jî kiriye ku heyama salên 1918-1919an ji bo geşbûna ramana neteweparêziya Kurd bibe xala werçerxê.

Kovara Jînê serçaviyeke girîng e di biwara neteweparêziya Kurd de. Di kovara Jînê de, hem ji alî siyasî hem ji alî dîrok hem ji alî zimên hem ji alî wêjeya neteweyî hem ji alî cografyaya ku Kurd lê dijîn û wekî sînorên terîtoriyal tên sêwirandin û hem jî ji alî folklorê ve ji çavkaniyên sereke û yekemîn belge û agahî hatine tomarkirin û belavkirin. Di kovara Jînê de, hewl hatiye dayîn ku ramana neteweparêziya Kurd bibe xwedî hîm û bingeheke xurt û berbelav bibe. Di vê biwarê de, nivîsarên li ser ol, ziman, dîrok, hestên neteweyî ên hevpar, nerî û kelepûr, mît û dastan û nivîsarên li ser yekîtiya neteweyî hatine nivîsîn. Digel van hemûyan jî tiştê

ku bal biriye ser xwe ew e ku; di kovara Jînê de, hin ramanên li ser tîpên Erebfî (Aramî) ku ji bo nivîsîn û xwendina Kurdî berastengiyên çêdikin, hatine diyarkirin. Tevî ku tu guherînên berbiçav û radîkal di wan de nehatine kirin jî, ev nêrîn û ramanên hanê piştî bûne serçavî ji bo xebatên Celadet Bedirxan ku ji bo xwendin û nivîsîna Kurdî elfabeyêke Latînî daniye. Her wiha, Hînker ku wekî pirtûkçeyekê hatiye çapkirin, çendî ku bi tîpên Erebfî be jî, ji bo xweşaxaftin, hînbûn û hînkirina zimanê Kurdî di wê heyamê de bûye çavkaniya sereke.

Me destnîşan kiribû û gotibû; ji bo afirîna ramana neteweparêziyê, hewcetî bi komik û beşeke civakî heye ku ev komik kifş dike ku ‘gel’ êdî ‘neteweyek’ e; û pê re jî li ser vê kifşê hewl dide ku hiş û hoşêke “neteweyî” ava bike. Di vê qonaxê de hokar û kartêkeke dîtir derdikeve holê; rola rewşenbîr û xwendeyên civakê. Ji bo pêkhatina yekîtiya neteweyî û ji bo ku hevpariyên dîrokî li hevpariyên neteweyî bîn qulibandin û hişberiya neteweyî li girse û komên xelkê bîn veguhezandin, rêxistinên rewşenbîran û çalakiyên wan bi rol û kartêkeke mezin î girîng radibin. Ev kes û rêxistinên çêlhatî ne tenê di destpêka qonaxên avakirinê de, di hemû qonax û demajoyên wê de cî didin xwe.

Di vî warî de gava em berê xwe didin Hroch, em dibînin ku neteweyan bi du rengan li hev dabeş dike û wan wekî neteweyên biçûk û neteweyên mezin bi nav dike. Li gorî Hroch, “Di neteweyên mezin de, ji bilî feodal û gundiyan, çîneke sêyemîn derketiye rastê û vê çîna hanê xwe wekî nûnera hemû neteweyê nîşan daye û geşe bi xwe daye. Ev çîna nû neteweyêke wisan disêwirî ku dê roj were û hemû kesîde bibin hevwehatiyên wekhev; loma jî, bi kartêka vê çîna nû neteweyên mezin derketine holê” (Hroch, 2011: 29). Her wiha, Hroch neteweyên biçûk wiha pênase dike û dibêje, “Neteweyên biçûk, ew yekeyên etnîk in ku bindestên neteweyên dîtir in, veneguherîne ser yekeyeke siyasî û di zimanê xwe î wêjeyî de jî kelepûreke wan tune ye ku karibin seraqetiyê di berhênanên çandî de pêk bînin (heke di wextekî de ev kelepûr hebûye jî wînda bûye an jî rastî dejenerasyoneke giran hatiye)” (Hroch, 2011: 30).

Gava em pênaseyên Hroch li xwe bikin palder û bidin rê, em ê bibînin ku neteweya Kurd di her du reng pênaseyê de jî bi cî dibe, ji ber ku;

1. Di neteweya Kurd de, ji bilî feodal (mîr, axa) û gundiyan, çînek derketiye ku xwe nûnera neteweyê hesibandîye; aqûbeteke xweş û hêvîda ji bo neteweya

xwe sêwiriye û ji bo vê yekê jî li liv û tevgerê ketiye; û li gorî pênaseya Hroch em dikarin bêjin, Kurd ji vî alî de dikevin nav kategorî û lihevdebeşkirina neteweya mezin. Piştî du serhildanên ku bi serkêşiya Emîr Bedirxan, (1840) û Şêx Ubeydullah, ji civaka Kurd çêneke ku ji xwende û rewşenbîran pêk tê, rabûne û wan doza vê nûnertiyê kiriye. Em dikarin navên Mîqdat Mîthad Bedirxan, Sureyya Bedirxan, Abdullah Cevdet, Ehmed Ramîz, Fuad Temo, Bedîuzeman Mela Se'îdê Kurdî, Xelîl Xeyalî, Memduh Selîm beg, Tewfîqê Silêmanî (Pîremêrd), Babanzade Îsmâil Heqî, Kemal Fewzî, Hilmiyê Siwêregî, Law Reşîd, Kadri Cemil Paşa, Celadet Bedirxan, Kamûran A. Bedirxan, Qedrîcan, Osman Sebrî û Cegerxwîn wekî mînak bêjin ku ji çîna giregir, xwende û rewşenbîr in.

2. Berevajîya pênasekirina Hroch, wêjeyeke neteweya Kurd a xwedî kelepûr û kevneşopî heye ku hem ji alî wêjeya gelêrî û mît û dastanan ve xwedî nîrx û hêmanên bi vî rengî ye û hem jî ji alî wêjeya nivîskî û klasîk ve xwedî şahberhemeke wekî Mem û Zîn e; loma jî tu windabûn û dejenerasyonek li ziman û wêjeya Kurdî neqewimiye. Loma jî em pir bi rihetî dikarin bêjin ku di vî warî de jî pênaseya Hroch a bi awayê 'neteweya biçûk' hatî kirin, li neteweya Kurd nayê; ji ber ku ziman û wêjeya neteweya Kurd tu carî jî winda nebûye an jî neketiye ber çerxa dejenerasyoneke giran.
3. Her wiha em dikarin bêjin, pênase û teoriya Hroch, di warekî de ji bo neteweya Kurd li dar e. Me destnîşan kiribû û gotibû gava ramana neteweyîbûn û îdeolojiya neteweparêziyê geş bû, bi qasî şeş sed sal temam bûbûn ku neteweya Kurd di bin desthilatiya neteweyê de dîtir de bû.¹³ Loma jî em dikarin bêjin, li gorî pênaseya Hroch, Kurd bes ji vî aliyê ve dikevin nav kategoriya neteweyên biçûk.

Digel van peytan, gava em bala xwe didin ji alî taybetî, litevgerêketin û pêkanînan ve, neteweya Kurd bêtir nêzî pênaseya neteweyên mezin e. Heke em qebûl bikin û bêjin; ji ber ku Kurd bi qasî hezar salên dawî ye di bin desthilata neteweyên dî de dijîn û loma jî neteweya Kurd di nav kategoriya neteweyên biçûk de ye, em ê careke dî jî berê xwe bidin Hroch ku pêşdeçûna neteweparêziya neteweyên

¹³ *Piştî peymanê Qesr-î Şîrîn (1639), beşek ji Kurdan di bin desthilata Safewîyan beşek jê jî di bin desthilata Osmanîyan de mana û wekî encama vê peymanbestinê cografyaya Kurdan bûye du parçe.*

biçûk bi sê qonaxan dabeş dike. Hroch van qonaxan wiha pênase dike: “Di qonaxa Ayê de, bi gelemperî, komeke ji xwende û rewşenbîran pêk hatî, nêzikî û eleqe nîşanî ziman, çand û dîroka neteweya ku bindest e, didin” (Hroch, 2011: 50). Qonaxa Byê, “Qonaxa ajîstasyonê ye ku ji bo ku hişberî û şiyarbûna neteweyî di nav komên xelkê de belav dibe û rengûawayekî girseyî bigire, tê pêkanîn. Di vê qonaxê de, bi nîşaneyan tê dîtin ku eleqeya rewşenbîrî a bo nirxên neteweyî zêdetir bûne loma jî bi ajîstasyonê hestê neteweyî û ramana neteweparêziyê dibe xwedî karakterekê” (Hroch, 2011: 50-51). Li gorî Hroch ev qonax, qonaxa haveyngirtina hişberiya neteweyî ye. Herçî qonaxa Cyê ye, Hroch dibêje, “Di vê qonaxê de êdî hişberiya neteweyî bi temamî di nav komên xelkê de berbelav bûye. Çendî ku hemû endamên neteweyê ne xwedî vê hişberiyê ne jî, pareke mezintir ji endamên neteweyê êdî vê yekê li xwe kiriye arîşe û tevgera neteweyî li hemû welat belav bûye û di qonaxê em dikarin çêla hişberiya neteweyî bikin” (Hroch, 2011: 50-51).

Gava em ji awirê Hroch, ku qonaxên geşedana neteweparêziya neteweyên ne desthilatdar destnîşan dike, bala xwe didin qonaxa ku ji Xanî heta bi Kovara Jînê hatiye, em dibînin ku; neteweparêziya Kurd, di qonaxa avakirina neteweyê de, bêtir di qonaxa Ayê de maye û çendî ku di hin demên nedirêj de hewl daye û raperînek li xwe xistiye da ku derbasî qonaxa Byê bibe jî, hewlên dayî têr nekiriye û her di heman qonaxê de maye û di cî de meşiyaye. Loma jî em dikarin bêjin, ji ber vê egerê ye ku di Kovara Jînê de bêjara neteweparêz bêtir di asta rewşenbîriyê de ye û tenê di nav kesên xwende û bîrewer de tê gengeşekin. Her wiha divê em balê bibin serê ku, cara yekem di Kovara Jînê de, bi awayekî hişberî xebata daneheva kelepûrên neteweyî hatiye kirin ku li gorî pênasekirina Hroch jî eleqeya bo çanda neteweyî zêdetir bûye.

Ji aliyê dî ve, Connor dibêje, “Hişberiya neteweyî ku Hroch wekî qonaxa Ayê wê pênase dike, di dorhêleke teng de bi kartêk e” (Connor, 2013: 25). Ev peyt careke dî jî bi me dide zanîn ku; çendî ku xebat hatibin kirin jî, qonaxa raman û hişberiya neteweparêziya Kurd a heta heyama Kovara Jînê, di derdoreke teng de maye ku ev derdor; ji kesên elît û giregir û xwende û rewşenbîran pêk tê. Tiştê herî balkêş ku bala me diçe serê ev e; piraniya ji van rewşenbîran li Stenbolê bûne û ji civaka xwe dûr bûne; loma jî têkiliya wan a bi girse û civaka xwe a esasî re jî tim û tim kêr û qut maye. Ev rewş û derav bûye sedem ku ramana neteweparêziyê ku li Stenbolê di

biwareke bîreweriyane de hatine afirandin, bi qasî ku bivê û bê xwestin negihane gel û loma jî ev raman nebûne ramaneke girseyî.

Kêrhatî ye ku em destnîşan bikin û bêjin; xebata rewşenbîriyê a di biwara neteweparêz de, piştî du serîhildanên çekdarî, (Serîhildana Emîr Bedirxan-1840 û serîhildana Şêx Ubeydullah-1880) dest pê dikin û bi lezeke hêdî be jî geşe bi wan tê dayîn. Loma jî, gava em ji vê hêlê ve lê dinêrin, em dikarin bêjin, çendî ku têk şikiyabe jî her du serîhildanan kiriye ku ramana li ser hebûna etnîkî û neteweyî a Kurdan kêm zêde di nav komên xelkê de belav bibe; lê belê ev belavbûn bi wate û naveroka ku Connor balê dibe ser, bi awayekî girseyî pêk nehatiye.

Piştî şerê dinyayê ê yekemîn, heta avabûna K.T.yê, keys hebû ku ramana neteweparêziya Kurd bigihîje armanca xwe. Lê belê rewşenbîrên Kurd ku doza mafê neteweyî a Kurdan dikirin û têdixebitîn ku ramana neteweparêziya Kurd berbelav bikin, ji ber ku xebatên xwe bes di warê rewşenbîriyê de dimeşandin, di vê yekê de bi ser neketin û beşeke mezin ji Kurdan, wekî neteweyeke ku negihîştîye mafên xwe ên neteweyî, dîsan di nav K.T.yê de man. Piştî ku K.T.yê şên bû û bi taybetî di makezagona dewletê de hebûna Kurdan û hemû nîrxên wan ên neteweyî, bi qedexekirineke balkêş, tune hatin hesibandin, têkiliya Kurdan a bi dewletê re qetiya û her ku çû sartir û dûrtir bû. Wekî encama yekem a vê dûrbûna ji komarê, serîhildana Koçgîrî li dar ket. Hin ji rêveber û pêşengên vê serîhildanê, ji kevneşopiya xebatên rewşenbîrî bûn hin jê jî di nav saziyên Osmanî de cî dabûn xwe. Her wiha, her wekî Connor jî amaje pê dike û dibêje, “Têgiha netewe ne bi giregir û rewşenbîran ve lê belê bi girse û bi komên xelkê ve bestî ye” (Connor, 2013: 25) ev hewldana elît û rewşenbîran jî, ji ber ku ji girse û komên xelkê dûr bû, negiha tu encamekê û têk şikiya.

Connor, di vî warî de pê de diçe û dibêje, “Ji bo ku hişberiya neteweyî berveyî komên xelkê berbelav bibe hewcetî bi gelek mekanîzmayan heye. Dibe ku ev mekanîzma li gorî helûmercên dîrokî û civakî ji hev guhertî bin, lê belê di vî warî de herî zêde rêya avakirina partiyên siyasî û danîna rêkxistinên çekdar tê hilbijartin” (Connor, 2013: 25). Gava em digel van çespên Connor kirî bidin rê, em ê bala xwe bibin ser Rêkxistina Azadî û serîhildana Şêx Se‘îd û em ê karibin bêjin; ev hewldan û rapêrîn, ji bo netewe û ramana neteweparêziya Kurd derbasbûna ji qonaxa Ayê berveyî qonaxa Byê ku Hroch diyar kiriye. Loma jî, gava em ji vê hêlê ve bala xwe

didin rewşê, peyt û destnîşankirina Bruinnesen ku dibêje, “Serîhildana Şêx Se‘îd serîhildana bêhempa ye” (Vali, 2005: 181) pir peyteke cîgirtî ye. Ji ber ku hem rêveber û pêşengên vê serîhildanê rewşenbîrên perwerî ne û hem jî giregirên gel in û armanc û sedema serîhildanê jî kêm zêde di nav gel de hatiye berbelavkirin û gel bi tevlêbûneke hêjayî gotinên beşdarî li vê serîhildanê kiriye. Serîhildana Şêx Se‘îd gaveke girîng î mezin e ji bo ramana neteweparêziya Kurd ku ji qonaxa Ayê berveyî qonaxa Byê çûye. Wekî nas e, çendî ku ev serîhildan bi xurtî li dar ketibû jî, têk şikiya. Ev têkşikîn di nava gel de nebû sedemek ku hêvî û doz û daxwaza neteweyî jî têk bişikê. Ji ber ku hema du salan bi dû têkşikîna serîhildana Şêx Se‘îd re, rêkxistineke dîtir, rêkxistineke bi navê Xoybûn tê avakirin ku; ev rêkxistin jî ji alî heman beşên çîna civakî a Kurdan ve tê birêvebirin û girse tevkarî û beşdariyê lê dikin. Ev rewş û derav bi me dide nîşan ku hişberiya neteweyî a ku Hroch û Connor behsê jê dikin, çendî ku ne têr û tekûz be jî, di nav civaka Kurd de ava bûye.

Piştî ku ev serîhildan jî têk dişikê, yek ji rêveber û avakarê Xoybûnê Celadet A. Bedirxan, bi armanca ku xebatên neteweparêzî ên jê û şûnde di warê ziman, çand, wêje, dîrok, folklor û bîreweriyê de bimeşîne, dest bi derxistina Kovara Hawarê dike. Kesên ku beşdarî li vê xebatê dikin, hinekî cihê ne ji nivîskar û danerên kovarên Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Jînê. Çendî ku Celadet A. Bedirxan, Kamûran A. Bedirxan û Qedrfî Cemîl Paşa ji wan kesan in ku perwerdehiya xwe li Stenbolê tamam kirine jî; kesên wekî Haco axa ku ji çîna feodal e û serokeşîr e, Cegerxwînê ku ji çîna feqî û melayên civakê ne ku bi rola entelîjensiyayê rabûne, Qedrfîcan ji çîna xwende ên zanistên fen û pozîtîf e ku dibistana mamostetî xwendiyê û wek pîşe jî mamoste ye, Osman Sebrî ku dîsan giregirê eşîrekê ye û bi hest û ramana neteweparêz şiyar û beşdarî li xebatên Xoybûnê kiriye; van xwende û rewşenbîran wek nivîskar di xebata Kovara Hawarê de cî dane xwe û bi nivîsarên xwe bêjara neteweparêz ava kirin û hewl dane ku ramana neteweparêziya Kurd berbelavtir bibe.

Gava em bipirsin û bêjin, gelo ev kirina Celadet A. Bedirxan, paşvegerînek e? Em ê nikaribin bi teqezî û bi bersiveke erênî ji bo vê pirsê bêjin, erê. Ji ber ku; a) Piştî serîhildanên Koçgirî, serîhildana Şêx Se‘îd û serîhildana Agirî, neteweparêziya Kurd ji qonaxa Ayê derbas dibe. Lê belê, berî ku ev serîhildan pêk bînin, diviya ji bo aqûbeta qonaxa Byê, gel xweşikî ji bo serîhildanê û ji bo jiyana rêkxistinîkirî bihata amadekirin. Her wekî Hroch jî diyar dike û dibêje, “Çênabe ku ramaneke

neteweparêz bi awayekî yekser ji qonaxa Ayê derbasî qonaxa Cyê bibe” (Hroch, 2011: 50-51). Qonaxa Byê, qonaxeke amadekariya qonaxa Cyê ye ku gel û komên xelkê ji bo jiyaneke hevpar û siberojeke hêvîda tên amadekirin. Loma jî, em dikarin bêjin, li neteweparêziya Kurd qewimiye ku berî ku qonaxa Byê tamam bike, yekser derbasî qonaxa Cyê bibe. b) Celadet A. Bedirxan, bi derxistina Kovara Hawarê, xwestiye aliyê kêmmayî a neteweparêziya Kurd, bi raperîneke dîtir bidomîne. Û qonaxa Byê bi vê xebat û tevgera zimanî, wêjeyî û kelepûrî tamam bike.

Loma jî em dikarin bêjin, derxistina Kovara Hawarê ne paşketina ji qonaxa Byê ye û ne jî paşvegerîn e bo qonaxa Ayê; lê bêtir hewldana temamkirina qonaxa Byê ye ku kifş û xuya ye ku kêma û qels maye. Jixwe gava em bala xwe didin naveroka Hawarê, bala xwe bidin ser kar û koş û xebatên ku di Hawarê de hatine kirin, em dibînin ku teqldaneke taybet û xurt heye di bikaranîna bêjara neteweparêz de; û her wiha raperînek pêk tê di biwara ziman, çand, folklor, dîrok, zanav û hestên hevpar de.

Di vê qonaxê de, hewce ye ku em di navbera Hawar û weşînekên berî wê de berawirdiyekê bikin. Herçî dema derketina Rojî Kurd, Hetawî Kurd û kovara Jînê ye, hîngê Dewleta Osmanî kêma zêde li ser hikm e û Kurdî, wek zimanê gelekî (neteweyekê), ne qedexe ye. Her wiha çendî ku zêde keys û delîve tune ye ku, di bingeheke îdeolojîk de, neteweparêziya Kurd bi pêş de bê kirin û ramana wê were belavkirin jî, dîsan keys heye ku bi Kurdî kar bê kirin û hestê neteweyî bi rêya zimên, di biwarên dîtir de jî bê geşkirin û xurtkirin. Her wiha, hindikbûna hejmara xwendeyên civaka Kurd wekî dezavantejeke xuya û xurt li pêşberî bîrewerên wê heyamê ye. Û pê re jî, ji ber ku bîrewer û rewşenbîrên Kurd li Stenbolê ne û li wir xebata neteweparêziya Kurd dimeşînin, ev yek wek bêkeysîyeke zêde derdixîne pêşberî wan. Ji ber ku girse û komên xelkê ku ew berê xwe didinê û dixwazin bêjara xwe bo wan bêjin, ji wan dûr e. Ev yek dibe sedemeke neçê ku xebata neteweparêziya Kurd a wê demê hatî kirin kêma bimîne û bes di nav bîrewer û rewşenbîran de were gengeşekirin û girse û civak jê dûr û bêpar bimîne.

Herçî Hawar e, ew rastî qonaxeke dîtir tê. Di heyama ku Hawar derketiye de, bi taybetî K.T.yê ava û şên bûye û desthilateke nû hatiye danîn; û vê desthilatê zimanê Kurdî, digel çand û hemû hêmanên wê ên jiyane ve, qedexe kiriye. Yanî, tu keys û delîve nîn e ku Hawar, çendî ku dûr be jî, qet nebe di nav sînorên wê dewletê

de derkeve û karibe xweşikî li xwendevanan were gihandin. Gava em bala xwe didinê, piştî lihevdebeşkirina rojhilata navîn, hejmareke zêde Kurd di nav sînorên K.T.yê de mane û ev yek jî gelek çetinî û zehmetî çêkiriye ji bo belavkirin û gihandina kovarê bo parçeyê bakur ku Kurd bi boşahî û zêdehî lê dijî. Çendî ku rewşa hingê ji vî aliyê ve dezavantajek e jî, ji ber helûmercên parçeyên dîtir li Hawarê bûye avantajek. Ji ber ku gava Hawar li Şamê dest bi weşana xwe kiriye, herêm di bin desthilata Fransiyayê de bûye û çendî ku hin nexweşiyên siyasî û desthilatî çêbûne jî, bi taybetî di warê qedexekirina zimên de tu astengî derneketiye pêşiya wan.

Heke em ji alî rola ku pê rabûye bala xwe bibin ser kovara Hawarê, em ê karibin bêjin:

1. Hawar, bi awayê derketina xwe û bi kadroya nivîskarên xwe ve, piştî têkşikîna serîhildana Agirî bûye sedem û serçaviya hêviyên cihêreng. Hawar ji alî Celadet A. Bedirxan ve hatiye derxistin û kesên wekî Kamûran A. Bedirxan û Qedrî Cemîl Paşa ku xwendinên xwe li Stenbolê kirine, hene di nav nivîskarên wê de. Lê ji bilî wan, hejmareke zêde ji wan kesên ku di kovarê de nivîsîne, ji çalakger û nivîskarên heyama berê cihêtir in; ew kes in ku hem li warê xwe dimînin û hem jî di gelek aliyên jiyana rojane de nêzî gel û komê xelkê ne. Û ji alî gel ve wekî rewşenbîr jî tên qebûlkirin. Loma jî, vê rewşê ji alî xurttirkirin û berbelavkirina raman û bêjara neteweparêz ve keyseke pir baş daye Hawarê. Em dikarin bêjin; ji ber ku ev keys, di nava xwe de hêviyeke derbar siberojê dihewîne, cihêreng e.
2. Hawar bi bêjareke pir xurt dest bi weşana xwe kiriye. A ku xurtiyê dide bêjarê û lê dibe palder, angaştê wê ye ku di nivîsara bi navê Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê de wiha tê gotin, “Hawar dengê zaninê je. Zanin xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vediqe” (Hawar, 1998: 23). Di naveroka nivîsarê de, hemû awayên xebatê ku dê bi temamî di warê nîrx û hêmanên neteweyî de bînin kirin tên daxuyandin û her wekî Hroch destnîşan kiriye, bang li gel û komên xelkê tê kirin ku digel armanca wê bimeşin û di dawiya nivîsarê de wiha tê gotin, “Hawar hawara we ye/Deng û gazina we ye/Jîn û zanîna we ye/Werin, hawara me bin” (Hawar, 1998: 24). Li vê derê, me divê em balê bibin ser ku, dîsan her wekî ku Hroch diyar

kiriye, ji bo ku qonaxa Byê pêk were, divê gel jî bi awayekî hişberî û şiyarbûyî di nav xebata neteweyî de cî bigire. Loma jî bêjareke neteweparêz a berbelav divê jê re û Hawar, biwara wê bêjarê ye. Her wiha, em dikarin bêjin; Hawar, ji alî hêmanên etnîk û çanda neteweyî ku bi siyaseta wê ve radibe, di heman demê de, qonax û biwara qetîna ji desthilatên xwe ye jî.

3. Qetîna ku em çêl jê dikin, serê pêşîn di biwara zimên de pêk hatiye. Hemû weşînek û kovarên ku berî Hawarê di nav sînorên Dewleta Osmanî de hatibûn weşandin, bi du zimanan; bi zimanê Osmanîkî (Tirkiya wê hingê) û bi du zaravayên Kurdî, (Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Jêrîn-Soranî) hatibûn weşandin. Lê belê, em di Hawarê de, rastî zimanekî nayên ku zimanê serdestên Kurdan e. Yanî, tiştê ku em li vê derê dixwazin balê bibin serê ew e ku; ji Rojnameya Kurdistan heta bi Kovara Jînê jî, çî weşînekên ku di nav sînor û di bin desthilata Osmanî de weşiyane, bi du zimanan, bi Kurdî û bi Osmanîkî weşiyane. Lê belê, Hawarê bi dûrketina ji zimanê Tirkî, nîşaneyeke xurt a qetîna ji serdestên xwe nîşan dide. Lê belê me divê em diyar bikin ku; her wekî weşînekên berî xwe, di Hawarê de jî nivîsarên bi zaravayên Kurdî Kirmanckî (Dimilî, Zazakî û Goranî) tune ye û ev yek wekî kêmasiyekê dide der.
4. Her wiha, Hawar bi vê helwest xwe, hewl dide ku rengê zanava Kurd jî dayne rastê. Ji ber ku di heyama weşînekên berê de Kurd wekî teb'ayekê Dewleta Osmanî dihatin dîtin û qebûlkin. Zaltiya fikira ûmetî û siyaseta osmanîbûnê dihişt ku gelên etnîk ên ku di nav sînorên împaratoriye de dijiyan, bêzanav bimînin. Loma jî, wek me dabû nîşan ku gelek nivîsarên ku di rojnameya CTTKyê û di kovarên Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Jînê de hatine weşandin, gava çêl û behsa Kurdan dikin, serê pêşîn û bi taybetî balê dibin ser ku Kurd wek gelekî teb'ayî Dewleta Osmanîyan e û paşê hewlê didin ku heyînekê, navekî, zanavekê bo Kurdan pênase bikin û daynin holê. Em dikarin wekî mînak nivîsa Xelîl Xeyalî nîşan bidin ku wî di nivîsa xwe a bi navê "Weten û Îttîfaqa Kumanca(n)" de, berî ku çêla zimanê Kurdî bike, wiha dibêje, "Kurmanc di nav qewmê Usmanî da unsurek mezin e, dîndar e, ciwamêr e, jêhatî ye. (...)" (Malmîsanij, 1998: 129). Xeyalî, ancax piştî van gotinan dikare çêla Kurdan bike û wek gelekî etnîk heyîna wan û ziman û zanava wan

bîne rastê. Lê belê, Hawar bêjara xwe li ser vê yekê ava nake. Wek me destnîşan kiribû, di heyama Hawarê de, ramana neteweparêziya Kurd û bêjara wê di qonaxa Byê a Hroch diyarkirî de ye. Ji ber hindê jî, di heyama Hawarê de, qet nebe wek giyan û hestên hevpar, qonaxa qetîna ji serdestên xwe dest pê kiriye. Û ji bo aqûbeta baş a vê qonaxê jî, pênasekirin û danîna zanava Kurd divê. Çendî ku ev yek wek têkoşîna heyîbûn û xweheyîkirinê di serhildanên Şêx Se'îd û Agirî de wek pratîk hatibû pêkanîn jî, ast û zemîna wê a bêjarî kêm bû; ji ber hindê jî şiyarbûn û baweriya girseyî a di vê biwarê de kêm mabû. Loma jî Hawar, bi gotina "(...) xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vediqe" (Hawar, 1998: 23) dest bi weşana xwe dike. Bêjareke wekî 'xwenasîn', nimandina hebûniyê pêk tîne; digel ku aliyê kêmmayî a vê hebûniyê nîşan dide jî dike ku kesîde an jî civak bi vê arîşeya navxweyî pê bihise da ku karibe wê temam bike. Qonaxa temambûnê di heman demê de demajoya avabûna zanava neteweyî ye jî. Hawar bi bêjara xwe a ku ji derveyî teb'abûnê ava dike, hem wekî kirdeyekê di vê qonaxê de ci dide xwe û hem jî wek me destnîşan kiribû, bêjara zanava Kurd ava dike.

5. Digel vê yekê jî, Hawar di warê sekuleriyê de jî gaveke cihê û xurt diavêje. Çendî ku me li jor çêl jê kir û der heqê awir û nêziktêdana Hawarê a olê de hin dahûran pêk anîn jî, me divê em bêjin ku; sekuleriya ku daner û rewşenbîr û nivîskarên Hawarê jê fam dikin û pêk tînin, ne neyînkirina olê û ne jêdûrketin e. Gava em bala xwe didin ser nivîsarên di kovarê de weşiyane, em vê yekê xweşikî dibînin. Jixwe Celadet A. Bedirxan, di hejmara yekem de gava cara pêşîn elfabeya Kurdî a bi tîpên Latînî dide nasîn, wiha dest pê dike; "BI NAVÊ YEZDANÊ PAQ Ê DILOVAN Û MIHRÎVAN" (Hawar, 1998: 25). Gava em li vê destpêkê dinêrin, pir bi xweşikî dibînin ku armanc ji danîna elfabeya Kurdî a bi tîpên Latînî, hem dûrketineke siyasî a ji desthilatîyê ye hem jî hewcetiyeke zimanî ye ku di roja îroyîn de jî bi zimanzanan ve nas e ku tîpên Latînî bêtir li dengsaziya Kurdî tê. Her wiha me divê em di vî warî de balê bibin ser destpêka nivîsara Celadet ku di heman demê de helwesteke Xaniyî ye jî. Ji ber ku Xanî jî bi beyta, "Sernameyê name, namê Ellah/Bê namê wî natemam e wellah"¹⁴ (Xanî, 2008: 19) dest bi

¹⁴ *Bi Kurmanciya îro: "Sernavê kitêbê ye navê Xwedê/Bê navê wî her kêma e bi xwedan"*

şahberhema xwe a Mem û Zînê dike. Tiştê ku li vê derê girîng e û bala me dikêşe ser xwe ew e ku; Xanî kirasekî Kurdî li Besmeleya ku her bi Erebi tê gotin, biriye. Celadet jî, çendî ku bi tîpên Latînî be jî, dide xuyakirin wî di gelek waran de daye ser şopa Xanî. Her wiha, helwesta van her du pîtolên (dahîyên) Kurd bi me dide hisandin û zanîn ku ew ramana xwe a neteweparêz wekî olekê nabînin; beranberî wê ew olê wekî pergal û sîstema bawerkirina berzûbala dibînin û di ser neteweyan re qebûl dikin. Loma jî, li vê derê helwesteke neteweyî datînin ku li ser vê dîtinê hatiye rûniştandin; “Ol wekî pergal û sîstema bîrûbaweriya Xwedayî, ji bo hemû neteweyan e; û divê her netewe karibe bi zimanê xwe pêdiviyên ola xwe pêk bîne.”

6. Raperîna Hawarê bêtir di biwara zimên û di piçkeyên wî de pêk tê. Danîna elfabeya Kurdî a bi tîpên Latînî, amadekirina rêzimana Kurdî û pê re jî sazkirina ferhengeke peyvên a bi Kurdî, şoreşeke hîmî û bingehîn e ku hatiye lidarxistin. Ev şoreş, berî ku şoreşa mezin û esasî biçê serî, li rastê hatiye danîn. Yanî ev her sê xebat, xebatên bingehîn in ku hewcetî çênake ku *hebûnî* were nîşandan û were peyitandin. Berî ku qonaxa duyemîn a şoreşekê tamam bibe, di navîna vê şoreşê de şoreşek pêk hatiye di biwara çand, ziman û wêjeya Kurdî de. Loma jî şoreşeke encamî ye; lê ne şoreşeke beravêtî ye. Gava em berê xwe didin rola ku Hawar di vî warî de pê rabûye, em dibînin ku bingeha xebata tamamkirina aliyê kêmmayî a qonaxa Byê, xurttir hatiye danîn. Ev bingeh ne tenê di warê teknîkî de ye ku gramer û elfabe hatine amadekirin; helbet di warê çand û dîrok û folklor û ol û hêmanên dîtir de ye ku hiştiye ku xebata danehevên peyvên Kurdî û dastan û çîrok û dîrok û agahiyên etno-cografîk bi awayekî sistematîktir werin kirin. Ev yek ji aliyekî ve jî vegereke xurt a bo kelepûrê ye jî. Digel vegera bo kelepûrê, parastin û heyîkirina wê ye jî. Ji ber ku di heyama berê de, bes di kovara Jînê de xebatên daneheva nîrx û berhemên kelepûrê hatibûn kirin. Hawar, teqleke dîtir dide vê xebatê û çend gavên xurttir pê dide avêtin. Ji ber ku di Hawarê de, kelepûr ne ew nîrx e ku ji borîrojê maye û divê wekî mîrateyeke ji bav û kalan mayî di kewarê de bê hiştin û her jê bê xwarin û. Kelepûra Kurdî di Hawarê de, yek ji hêmana esasî a avakar e ku; xerxa bingeha avahiya neteweya Kurd pê tê çêkirin. Her wiha tiştê ku dike ku kelepûra Kurdî di Hawarê de ne tenê

kelepûreke mîratmayî be, bêjara Hawarê ye. Di nivîsa bi navê Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê de tê gotin, “Her qesê qo xwe nas diqe; diqare xwe bide nas qirin” (Hawar, 1998: 23). Helbet xwenaskirin û pê re jî xwebûn ne bi îrroj û siberojê ye. Ev yek bi dîrok û kelepûrê ve bestî û têkildar e. Kovara Hawarê, tişteki wisan pêk tîne ku di heyama berî wê de bi awayekî baş û xurt nehatibû kirin. Heke em bipirsin û nêjin; “Çi ye ew tişt?” Bersiv “Xwenaskirin” e ku yekser bi kelepûrê ve bestî ye. Xwenaskirin, wek pênaseyeke sosyo-psîkolojîk, digel kesîdeyan ji bo neteweyan jî gava pêşîn û sereke ye. Heke em car dî berê xwe bidin xebatên ku berî Hawarê hatine kirin, em dikarin bêjin; bi taybetî di Rojî Kurd û Jînê de, berî ku di warê *xwenaskirinê* de gel wekî neteweyekê bi xwe ve were hisandin û were şiyarkirin, hewl hatibû dayîn ku Kurd xwe bi neteweyên dîtir bidin nasandin. Loma jî di her biwarê de bêjara van kovaran li ser nîşandan û peyitandina *hebûniya* xwe ava dibû û hewla ku dihat dayîn jî her di vî barî de bû. Hawar, bi danzanîna divêtiya *xwenasînê*; hem kelepûrê wekî mîrateya ji bavûkalan mayî nabîne hem wê ji bo îrroj û siberojê dike nirxeke aktîv hem di ser kelepûrê re bêjara xwe a neteweparêz ava dike û hem jî di navbera borîroja dûr û nêzik û îrroj û siberojê de dibe pir(e)yeke xurt û mezin.

7. Pir(e)bûna Hawarê, bi taybetî di biwara wêjeyê de pêk tê. Hawar, hem ew biwar e ku kelepûrê de careke dî jî geş û zindî dibe hem jî hem ew biwar e ku di wêjeyê de borîroj û îrrojê de digihîjin hev û wêjeya Kurdî a klasîk dimîne wek hêjahiya xwe a klasîkbûnê. Di Hawarê de hîm û bingeha wêjeya Kurdî a modern tê avêtin. Ev awa reftara nûjenxwazî hem kirasekî nûtir û dîtir li zimanê Kurdî dike û hem jî dike ku zimanê Kurdî bigihîje kelepûra xwe û pê ava bibe. Wekî nas e, dîwan û şî‘îrên wêjeya Kurdî a klasîk, ji ber kartêka Dewleta Osmanî a di warê desthilatê de, ji ber kartêka zimanê Erebi a di warê olê de û ji ber kartêka zimanê Farişî a di biwara wêjeyê de, heta tu bêjî bes bi peyv û qalibên zimanên dîtir hatine nivîsîn. Çendî ku çîna rajor, xwende, mela û entelîjensiyaya medreseyê ji van şî‘îr û dîwanan baş fam dikir jî, kartêka van berheman, bi qasî ku diviya, di nav civakê de çênedibû û gel jê fam nedikir. Ji ber ku gel û komên xelkê, bi zimanê xwe î çandî û kelepûrî; bi zimanê xwe î xas î petî diaxivî û hay ji Erebi û Farişiya bilind

tunebû. Em dikarin bêjin; ji ber ku entelîjensiyaya Kurd a wê demê, ji vî aliyê ve guh nedaye hewcefî, daxwaz û bendewariyên gel; şa'îrên wêjeya Kurdî a klasîk, ji aliyê hevzimanî ve ji gel dûr û qetandî mane; gel wan ji dûrî ve, wekî heyîneke dûredest hez kiriye û vê rewşê jî kiriye ku pîrozweriyeke jêbêrîfî û parêzbandî ava bibe bo wan. Hawar ew biwar e ku terk û qelişteke di vê pîrozwerî û jêbêrîtiyê de çêdike û coyekî dîtir, mesîleke dîtir ji zimanê Kurdî re vedike da ku berveyî aqûbeta xwe bikişe. Ev mesîl bi bikaranîna zimanê gel ê çandî û kelepûrî hatiye vekirin. Bi zimanê gel ê xas î petî, berhemên klasîk hatine nasandin û hêjahiya wan hatine daxuyandin. Her wiha, hindêk çîrok û helbest û nivîsarên ku bi zimanê gel ê rojane û pêaxaftinê hatine nivîsîn jî, di warê xwe de ên yekem û pêşîn in ku em dikarin helbesta Bilûra Min a Seydayê Gerok wekî mînak bêjin (Hawar, 1998: 798). Ev helbest, bi awirekî modern û bi bikaranîna zimanê gel ê kelepûrî hatiye nivîsîn. Loma jî, vê helbestê kiriye ku şî'îr û dîwanên bi forma klasîk hatine nivîsîn, bimînin wek mîrateyeke ji wêjeya klasîk û pê re jî mesîla wêjeya Kurdî hêleke dîtir hilibijêre ji xwe re. Her wiha, em dikarin bêjin, vê rewşê ji tunekirinê zêdetir, kiriye ku wêjeya Kurdî a klasîk bêtir xuyanî û li ber çavan be. Ji ber ku ji bo nivîsîna bi zimanê şî'îrên klasîk hostetiyekê divê; û ev hostetî jî ne tenê bi hêlekê ye, lê belê pirhêlî ye. Loma jî êdî her kes nikare şî'îrên bi wî qalibî û bi wî rengî binivîse; û ev yek dike ku pîrozwerî û jêbêrîtiya şî'îrên klasîk renegekî dî bigire; renegekî wisan ku di borîrojê de maye û anîn û lasayîkirina wan a di roja îroyîn de, hem dê wan beqem û bînirx bike û hem jî dê cî û rê nede ku ziman û wêjeya Kurdî bibe nirx û berhemeke roja îroyîn. Loma jî Hawar, bi pir(e)bûna xwe ve hem wêjeya Kurdî a klasîk û modern ji hev dike û hem jî wan bi hev digihîne.

Hawar, di nivîsara destpêkî de û bi derketina xwe re, wiha dibêje ji xwendevanên xwe re, “Hawarê siyaseta ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyaseta bila ew mijûl bibin” (Hawar, 1998: 23). Em dikarin vê peyama ji berevajî de bixwînin û wiha jê fam bikin: Hawarê dê bi siyaseta siyaseta re mijûl nebe, ew ê bi siyaseta ziman çand, dîrok û hemû nirxên hevpar ên neteweyî re mijûl bibe. Smith li ser sedema peydebûna netewe û ramana neteweparêz disekine, wiha dibêje, “Tiştê ku hiştiye ku avabûna neteweyan ev çend balkêş bibe, kartêka şoreşên bi sêhêlî ên Rojavayê ye.

(...) Şoreşa ku di karbeşiya kedê de li dar ketiye, şoreşa ku di kontrolkirina rêvebirinê de li dar ketiye û şoreşa ku di biwara bipergalkirina çandê de li dar ketiye” (Smith, 2002: 173). Tiştê ku Celadet A. Bedirxan bi derxistina Hawarê xwestiye pêk bîne hêla sêyemîn e; lidarxistina şoreşeke çandî û zimanî. Ji ber ku çanda Kurd, wekî hêmaneke neteweyî, wek nirxeke neteweyî, cara yekem di kovara Hawarê de gihîştîye wateya xwe û bi awayekî çalak çêl jê hatiye kirin û nivîsarên mînakî derbar çandê hatine nivîsîn. Heke mirov bipirse û bêje gelo ev şoreşa Celadet bi rêya Hawarê li dar xistî, gihîştîye aqûbeta xwe? Em ê karibin bêjin; gava em ji roja îroyîn de berê xwe didin xebatên ku hatine kirin û li ser reng û awayê kartêka wan xebatan disekin; em pir bi xweşikî dibînin ku ev şoreş pir xweş bi ser ketiye; ji ber ku di hemû waran de, teql û raperîneke xurt li çand û zimanê Kurdî xistiye; siberoja wê diyar kiriye û renekî taybetî xwe, taybetî zanava Kurd daye nirxên wê ên neteweyî. Û heke em di vî warî de bala xwe bidin Hagen, em ê bêtir di mijarê de bigihîjin. Hagen destnîşan dike û dibêje, “Di heyama Elizabeth de, li hember Katolîkiya Roma, li ser ziman û olekê (mezhebekî) hevpar ‘hişberiyê em’ê bi pêş ket ku ol û ziman bûn hêmanên çandî ên hevpar” (Schulze, 2005: 121). Heke em dema Elizabeth a Îngilistanê û dema Hawarê a Kurdistanê bidin ber hev, em ê karibin bêjin; Ji ber ku ola Kurdan û a desthilatên wan yek bû, ne hewce bû ku Kurd di ser zanava neteweyî re ‘dîke’yek biafirînin, loma jî digel peyt û destnîşankirinên ku heta niha me kir, em ê bi zelalî bikarin bêjin ku: Hawarê hewl da ku di warê çand û zimanî de ‘hişberiya em’ê ava bike, di nav civaka Kurd de berbelav bike û bide rûniştandin; û pê re jî bi bêjara xwe a neteweparêz kartêkê li demajoya avabûna zanava Kurd bike.

Her wiha, Hawar bi awayê derketina xwe ve, bi awayê domandina weşana xwe ve, bi awayê naveroka nivîsarên xwe ve, bi awayê bêjara xwe a neteweparêz ve; û bi helwest û kargîniya xwe ve, reftar, çalakî û raperîneke *xwebûnê* ye.

Çavkanî:

- Akarsu, B. (1995), *Wilhelm Von Humldt ta Dil-Kültür Bağlantısı*, (Birinci baskı), İstanbul Matbaası
- Akpınar A., Bilir S. ve Sebüktegin T, (2006), Şeyh Ubeydullah İsyanı Üzerine Yeni Belgeler, İstanbul **Vesta Dergisi**, (6), 23
- Aktoprak, Ü. E. (2009), *Ulusun Tahayyülünde Anadili*, (Anadilde Eğitim Sempozyumu, 2, (30-31 Mayıs 2009), Ankara Eğitim Sen Yayınları, 181-182
- Alakom, R. (1998), *Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Avesta,
- Anderson, B. (1995), *Hayali Cemaatler (Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması*, (İkinci Baskı), İstanbul Metis Yayınları
- Arî, A. (2010) Yê Ku Peyv Ji Esman Daxist Erdê: Cegerxwîn, *Kovara Bîr*, (7), 25,
- Balibar, E. ve Wallerstein, I. (1991), *Irk, Ulus, Sınıf, Belirsiz Kimlikler*, (Birinci baskı), İstanbul Metis Yayınları
- Bedirxan, C. A. (2009), *Ferhenga Kurdî*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Avesta
- Bedirxan, C. A. (2010), *Bir Kürt Aydınından MUSTAFA KEMAL'e Mektûb*, (Birinci basım), (Hazırlayan, Mustafa Aydoğan), İstanbul Doz Yayınları, (*Wergera nameyê ji Tirkiya Osmanîkî bo Kurdî, Leylî Leyla*)
- Berger B., Berger L. P. ve Kellner H. (1985), *Modernleşme ve Bilinç*, İstanbul Pınar Yayınları
- Black, C. E. (1989), *Çağdaşlaşmanın İtici Güçleri*, (İkinci baskı), Ankara Verso Yayınları
- Bozarlan, H. (2005), Türkiye'de (1919-1980) Yazılı Kürt Tarih Söylemi Üzerine Bazı Hususlar, Abbas Vali, (Editör), *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, (Birinci basım), İstanbul Avesta Yayınları
- Brian, F. (2001), *Çağdaş Sosyal Bilimler Felsefesi, Çokkültürlü Bir Yaklaşım*, (Çev, İsmail Türkmen), İstanbul Ayrıntı Yayınları
- Bruinessen, M. V. (2005), Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Milli Uyanışının Ortaya Çıkışındaki Rolü, Abbas Vali (Editör), *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, (Birinci basım), İstanbul Avesta Yayınları
- Bruinessen, M. V. (2011), *Kürtlük, Türklük, Alevilik, Etnik ve Dinsel Kimlik Mücadeleleri*, (Dokuzuncu basım), (Çev. H. Yurdakul), İstanbul İletişim Yayınları
- Calhoun, C. (2007), *Milliyetçilik*, (Birinci basım), (Çev Bilgen Sütçüoğlu), İstanbul İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları
- Cegerxwîn, (2003), *Hayat Hikayem*, (Birinci basım), İstanbul Evrensel Basım Yayın

- Celîlê, C. (2001), *Kürt Aydınlanması*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Avesta
- Cemil Paşa, K. (Zinar Silopi), (1991), *Doza Kurdistan*, (İkinci basım), Özge Yayınları
- Cewerî, F. (2007), *Nûredîn Zaza û Kurteçîrokên Wî*, Kovara W, (14), 32
- Connor, Walker. (2013). *Ulus ve Ulusalçılık*, (Aktaran: Abdulcelil Kaya, Ulus İnşa Sürecinde Etnik Partiler: SINN FEIN ve BDP, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Uluslararası İlişkiler Anabilim Dalı, Ankara.
- Çamsoy Z. (2007), *Milli Mücadele Döneminde Kürdistan Teâli Cemiyeti* (1918–1927), (Ankara Üniversitesi, Türk İnkilâp Tarihi Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi)
- Çelebi, E. (2010), *Qedrî Cemîl Paşa*, Kovara Bîr, (7), 57
- Çiğdem, A. (1999), *Aydınlanma Düşüncesi*, (İkinci basım), İstanbul İletişim Yayınları
- Çuhadar, H. C. (2009), *Türkiyede Ulusalçılığın Değişmeyen Simgesi: Onuncu Yıl Marşı*, Anadolu Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 9(2), 29
- Dilgeş, F. (1998), *Kurdistan (Rojnameya Kurdî ya Pêşî)*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê
- Duverger, M. (1998), *Siyaset Sosyolojisi*, (Birinci basım), İstanbul Varlık Yayınevi
- Erözden, O. (1997), *Ulus-Devlet*, (Birinci basım), Ankara Dost Yayınları
- Ersoy, R. (2013), *Folklor Çalışmalarının 100. Yılında "Folklor-Milliyetçilik" İlişkisi Üzerine Bazı Düşünceler*, Milli Folklor Dergisi, 99, 67
- Euerbach, E. (2010), *Yabanın Tuzlu Ekmeği*, (Birinci basım), İstanbul Metis Yayınları
- Farqînî, Z. (2004), *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê
- Garzoni, M. (2013), *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*, Stenbol Weşanên Avesta
- Gellner, E. (1992), *Uluslar ve Ulusçuluk*, (Birinci basım), (Çev, Büşra Ersanlı ve Günay Göksu Özdoğan), İstanbul İnsan Yayınları
- Giddens, A. (1994), *Modernliğin Sonuçları*, (Birinci basım), (Çev, Kuşdil E.) İstanbul Ayrıntı Yayınları
- Gökalp, E. (2007), *Milliyetçilik: Kuramsal Bir Değerlendirme*, Anadolu Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 7 (1), 279-298
- Gökberk, M. (1999), *Felsefeye Tarihi*, (Onbirinci basım), İstanbul Remzi Kitabevi
- Göldaş İ. (1991), *Kürdistan Teâli Cemiyeti*, Doz Yayınları, İstanbul, 1. Basım

- Guibernau M. (1997), **20. Yüzyılda Ulusal Devlet ve Milliyetçilikler**, (Birinci basım), İstanbul Sarmal Yayınevi
- Hassanpour, A. (2005), **Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil (1918-1985)**, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Avesta
- Hawar (1998), (Çapa yekem), Stockholm Weşanên Nûdem, I (1-23)
- Hawar (1998), (Çapa yekem), Stockholm Weşanên Nûdem, II (24-57)
- Hebeş, H. (1996), **Raperîna Çanda Kurdî Di Kovara Hawarê De**, (Çapa yekem), Berlin Belavgeha Hogir
- Hîngerê Zimanê Kurdî, (2008), **Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti**, (Birinci basım), İstanbul bgst Yayınları
- Hobsbawm, E. J. (1995), **1780'den Günümüze Milletler ve Milliyetçilik**, (İkinci basım), (Çev, Osman Akinhay), İstanbul Ayrıntı Yayınları
- Hobsbawm, E. J. (1998), **Tarih Üzerine**, (Birinci baskı), Ankara Bilim ve Sanat Yayınları
- Hobsbawm. E. J. (2006), **Geleneğin İcadı**, (Birinci basım), İstanbul Agora Kitaplığı, İstanbul
- Hroch, M. (2011), **Avrupa'da Milli Uyanış**, (Birinci basım), İstanbul İletişim Yayınları
- İnternet: Aydoğan, İ. S. (2009), **Celadet Bedirxan, Çavkaniyên Hawarê û Kurdayetiya Nû[1]**, di mêjûya 12/09/2015an de, ji navnîşana <http://pawen.tr/gg/Celadet-Bedirxan,-%C7avkaniy%EA-Hawar%EA-%FB-Kurdayetiya-N%FB,htm>, hatiye wergirtin
- İnternet: Aygöl, H. H. (2008), **Türk Modernleşme Sürecinde Dil Olgusunun Sosyolojik Analizi**, Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Süleyman Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Sosyoloji Anabilim Dalı, Isparta 23-25-27-30-72-74, di mêjûya 30/09/2015an de ji navnîşana eprints.sdu.edu.tr/465/1/TS00617.pdf hatiye wergirtin
- İnternet: Belli, A. S. (2014), **Milliyetçilik Ve Sosyal Psikolojik Zemini**, 2-3, di mêjûya 20/09/2015an de ji navnîşana http://www.turkishstudies.net/Makaleler/2089486563_21BelliAy%C5%9FeSerap-sos-420 hatiye wergirtin
- İnternet: Connor, W. (2013), **Ulus ve Ulusalçılık**, Aktaran: Abdulcelil Kaya, **Ulus İnşa Sürecinde Etnik Partiler: SINN FEIN ve BDP**, Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Uluslararası İlişkiler Anabilim Dalı, Ankara 25, di mêjûya 30/11/2015an de ji navnîşana acikarsiv.ankara.edu.tr/eng/browse/26961/tez.pdf hatiye wergirtin
- İnternet: Çiçek, M. F. (2013), **Türkiye ve Irak Kürt Ulusal Hareketlerinin Karşılaştırmalı Analizi**, di mêjûya 23/10/2015an de ji navnîşana <http://docplayer.biz.tr/267791-T-c-atilim-universitesi-sosyal-bilimler-enstitusu-kamu-yonetimi-ve-siyaset-bilimi-ana-bilim-dali.html> hatiye wergirtin

- İnternet: Erdoğan, M. (2008), *Milliyetçilik İdeolojisine Dair*, di mêtûya 16/07/2015an de ji navnîşana http://www.ozgurtoplumundegerleri.com/res/Mustafa_Erdogan_Milliyetçilik_Ideolojisine_Dair.pdf hatiye wergirtin
- İnternet: Kılıç, Y. T. (2010), *Wilhelm von Humboldt'ta Ulusal Kimlik ve Dil Sorunsalı: Yabancıliğin İçinden Bütün'e Ulaşma Çabası*, 43-45, di mêtûya 17/09/2015an de ji navnîşana www.journals.istanbul.edu.tr/iuaded/article/viewFile/.../1023010852 hatiye wergirtin
- İnternet: Resmi Gazete. (1925), *Tekke, Zaviye ve Türbelerin Kapatılması*, Resmi Gazete 30 Kasım 1925 tarihinde kabul edilip'de yayımlanarak yürürlüğe giren 677 sayılı kanun: di mêtûya 12/11/2015an de ji navnîşana https://tr.wikipedia.org/wiki/Tekke,_zaviye_ve_t%C3%BCrbelerin_kapat%C4%B1lmas%C4%B1 hatiye wergirtin
- İnternet: Yanık, C. (2013), *Etnisite, Kimlik Ve Milliyetçilik Kavramlarının Sosyolojik Analizi*, di mêtûya 23/08/2015an de ji navnîşana <http://kaygi.home.uludag.edu.tr/issues/2013/2013-20-16.pdf> hatiye wergirtin
- Kalaycı, H. (1998), *Bayrak, Milliyetçilik, Kutsallık*, Birikim Dergisi, (105-106), 49-77
- Kedourie, E. (1971), *Avrupa'da Milliyetçilik*, (Birinci basım), Ankara Milli Eğitim Bakanlığı Basımevi
- Koca, S. K. (2010), *Genel Hatları İle Kültür Ve Sembol İlişkisi*, S.A. Ü Fen Edebiyat Dergisi, II (16), 56
- Kovara Jîn, (1986), (Çapa yekem), Upsala Weşanên Deng, Cild: I-II-III-IV-V
- Kovara Rojî Kurd, (2002), *Rojî Kurd*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên War, (1, 2, 3)
- Koyî, H. Q. (2004), *Dîwan*, (Çapa yekem), Stockholm Weşanên Nefel
- Malmîsanij, (1999), *Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti*, (Çapa duyem), Stenbol Weşanên Avesta
- Malmîsanîj, (2002), *Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Avesta,
- Minorsky, V. ve Thomas B. (2008), *Kürt Milliyetçiliği*, (Birinci basım), (Çev, Karahan, E., Akkuş, H. ve Uğrulu, N.), İstanbul Örgün Yayınevi
- Nairn, T. (2015), *Milliyetçiliğin Yüzleri*, (Birinci basım), İstanbul İletişim Yayınları
- Öcal, M. O. (2001), *Küreselleşme ve Ulusal Kalıt Kavramları Arasında Türk Halkbilimi*, Millî Folklor Dergisi, (50), 20
- Öcal, M. O. (2007), *Folklor: Ortak Bellek Veya Paylaşılan Deneyim*, Millî Folklor Dergisi, (74), 23
- Öcal, M. O. (2010), *Türkiye'de Mit ve Masal Çalışmaları veya Bir Olumsuzlama ve Tektipleştirme Öyküsü*, Milli Folklor Dergisi, (85), 51

- Özakıncı, C. (1998), *Dil ve Din*, (Üçüncü basım), İstanbul Payel Yayınevi
- Özkırımlı, U. (1999), *Milliyetçilik Kuramları: Eleştirel Bir Bakış*, (Birinci basım), İstanbul Sarmal Yayınları
- Özkırımlı, U. (2010), *Milliyetçilik Üzerine Güncel Tartışmalar: Eleştirel Bir Müdahale*, (Birinci baskı), İstanbul İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları
- Özsoy, F. ve Eriş, T. (2007), *Öncesi ve Sonrasıyla 1925 Kürt Direnişi*, (Çapa yekem), Stenbol Weşanên Pêrî
- Öztürkmen, A. (1998), *Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik*, (Birinci basım), İstanbul İletişim Yayınları
- Palmer, L. (2007), *Milliyetçilik: Kuramsal Bir Değerlendirme*, (Vgz, Gökalp, E.), Anadolu Üniversitesi Sosyalbilimler Dergisi, 7(1), 279-29
- Porzig, W. (1974), *Dil Denen Mucize*, (Birinci basım), Ankara Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, I. Cilt
- Ramzî, A. (2007), *Emir Bedirhan (20. Yy’ın başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek)*, (Birinci basım), İstanbul bgst Yayınları
- Sadoğlu, H. (2003), *Türkiye’de Ulusçuluk ve Dil Politikaları*, (Birinci basım), İstanbul İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları
- Schnapper, D. (1994), *Yurttaşlar Cemaati*, (Birinci basım), İstanbul Kesit Yayıncılık
- Schulze, H. (2005), *Avrupa’da Ulus ve Devlet*, (Birinci basım), (Çev, Binder, T.), İstanbul Literatür Yayıncılık
- Sebrî, O. (2004), *Bîranînên Min*, (Çapa yekem) Stenbol Weşanên Aram
- Smith, A. D. (1994), *Millî Kimlik*, (Birinci basım), (Çev, Bahadır, Ş.), İstanbul İletişim Yayınları
- Smith, A. D. (2002), *Ulusların Etnik Kökeni*, (Birinci baskı), Ankara Dost Yayınları
- Tîgrîs A. (2001), *Pêşkî û Parkî*, (Çapa yekem), Stockholm Weşanên Medya
- Tunaya Z. (2015), *Türkiye’de Siyasal Partiler*, İletişim Yay. İstanbul, 2. Cild
- Uzun, M. (1995), *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, İstanbul Tüm Zamanlar Yayıncılık, (1)
- Vali, A. (2005), *Kürtlerin Soykütükleri: Kürt Tarih Yazımında Ulus ve Ulusal Kimliğin İnşası*. Abbas Vali, (Editör), Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri, (Birinci basım), İstanbul Avesta Yayınları
- Wagner, P. (1996), *Modernliğin Sosyolojisi; Özgürlük ve Cezalandırma*, (Birinci basım), İstanbul Sarmal Yayınevi
- Xalib, D. (2009), *Kurtejnênîgariya Cegerxwîn*, Kovara W, (28), 38
- Xanî, E. (2008), *Hemû Berhem*, Diyarbekir Weşanên Lîs

Yıldırım, D. (1994), *Türkiye’de Folklor Araştırmalarının Gelişim Devreleri*, Milli Folklor Dergisi, (3), 29

Yıldırım, E. (2014), *Modernite ve Milyetçilik Kuramları Üzerine*, Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi, (6), 21

Zekî, M. E. (2002), *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, (Çapa yekem), (Ji Soranî bo Kurmancî, Ziya Avcı), Stenbol Weşanên Avesta

Zengî, D. (2004), *Qedrîcan*, (Çapa yekem), Stenbol, Weşanên Komal



KURTEJIYAN

Agahiyên Kesane



Paşnav, Nav : Döğêr Dilaver
Aîdiyet : T.C.
Ci û mêjûyê bûyînê : 05/03/1965, Silvan
Telefon : 0 505 522 55 19
Faks :
E-mail : dilaverdoger@gmail.com

Perwerdehî

Derece	Beşa Perwerdehiyê	Mêjûya derçûnê
Doktora
Lîsansa Bilind
Lisans	Dicle Üniversitesi, Eğitim Fakültesi, Matematik Ana Bilim Dalı	07/10/1985

Tecrûbeya Karkirinê

Sal	Cî	Görev
30	Diyarbakir	Mamostetiya Matematikê

Zimanê Biyanî

Îngilîzî

Yayınlar

.....

Hobiler

.....